

# NUDEM

No 25 1998



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî





Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

## Firat Cewerî



Hejmar 25, sal 7

Bihar: 1998



Şerdên abonetiyê (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya: 280 Sek

Ewrûpa: 80 DM

Amerika, Austaralia,

Kanada: 50 \$

Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê: Wêneyê

Mîqdat Mîthed Bedirxan

Çapa bergê:



Pergala bergê û rûpelan:

Nûdem



Adres: NÜDEM


Termov. 52 2tr.

176 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

- 4 Sedsaliya rojnamegeriya kurdi ♦ FIRAT CEWERÎ
- 6 Pêşgotina KURDISTANÊ ♦ MIQDAT MİTHED BEDIRXAN  
Werger: Z. ZINAR
- 12 Rojnamgeriya kurdi û dirok ♦ K. M. EHMED Werger: Elişêr
- 24 Rojnameya KURDISTAN û sed saliya wê ♦ ROJAN HAZIM
- 43 Xopan ♦ ZEYNEL ABİDİN
- 44 İsa Şans û rojnameya "Silvan Sesi" ♦ ROJEN BARNAS
- 49 Kurdbûyin ne şerm e ♦ İSA ŞANS Werger: S. ROŞAN
- 54 DAXUYANIYEK JI NÜDEMÊ ♦
- 55 Ji bo ci em derdikevin ♦ EDİP KARAHAN
- 59 ...Dicle-Firat ♦ MUSTAFA AYDOGAN
- 72 Medya Güneşî... ♦ OSMAN AYTAR
- 75 Pirsgirêkên rojnamegeriya kurdi ♦ CAN GULŞENOGLU
- 77 Zahmetiyên rojnamegeriya kurdi ♦ SÜLEYMAN ÇEVİK
- 81 Rojnamegeriya kurdi ya piştî 12ê ilonê ♦ FEHİM İŞIK
- 84 Şiirek ji ♦ ŞÜKRÜ ERBAŞ Werger: ABİDİN
- 85 Rojnamgeriya kurdi li başûrê Kurdistanê... ♦ SIDQİ HIRORİ
- 99 Xizmeta Xellîê Çeçan û malbata wî ♦ WEZİRË EŞO
- 102 Derdê bêdawî ♦ KEMAL FEWZİ Werger: M. DEHSIWAR
- 105 Şiirek ji ♦ BÊWAR İBRAHİM
- 106 Rojén me yên taybetî ♦ M. SELİM BEG Werger: ZINARÊ XAMO
- 110 Xwe binas... ♦ CELADET ALİ BEDIR-XAN
- 118 Jiyan û ramanên Celadet Bedir-Xan ♦ ZERDEŞT HACO
- 129 Xendek ♦ E. H. MIHEMED
- 137 Hevpeyîn bi Brader re ♦ NÜDEM
- 141 Nuho an jî Kalo ♦ ŞEREFXAN CİZİRİ
- 155 Kurdistana enfalkiri ♦ XELİL DUHOKİ
- 172 Hevpeyîn bi İlhan Culemengî re ♦ MUSTAFA ALADAG
- 183 Dîsa çend gotin li ser zimanê R. Hazim ♦ LALEŞ QASO
- 194 Rexne û rexnegirî ♦ N. ZAXURANİ
- 197 Civaka IT û pirsa kurdi ♦ MÜRAD CIWAN
- 212 La Rochefoucault ♦ FAWAZ HUSÊN
- 214 Kovar û rojnameyên kurdi ♦ LOKMAN POLAT

# SEDSALIYA ROJNAMEGERIYA KURDÎ



FIRAT CEWERÎ

"Vê cerîdeyê de ez ê behsa qencya ilm û marîfeta bikim; li kuderê mirov dielime, li kuderê medrese û mektebên qenc hene, ez ê nişâ kurda bikim; li kuderê çi şer dibe, dewletên mezin çi dikin, çawa şer dikin, ticaret çawa dibe; ez ê hemîyan hikat bikim."

MIQDAT MÎTHED BEDIRXAN, *Kurdistan*, 1898

... Ez dikarım bi titrəz ji we re bibejim ma "Ji qewmekî ku bi tenê ji hezari yek bi xwendin û nivîsandinê dizanin bi zimanê wî qewmî derxistina rojnameyekê bi kêñî çi tê?" Yen ku vê titrəzê dikin, nizanin ku hişyarbûna mîletekî carinan deyndarê mirovskî du mirovan e. Bi taybeşî ji qewmekî mîna qewmê kurd ku jê şârekî mîna Fuzûlî, leşkerekî mîna Selahaddin-i Eyyubi derketiye çîma wê bi kultur û zanebûna komeke bîçük ya rewşenbîran tonak nebe?

Kurdek, *Kurdistan*, 1899

**I**sal sedsaliya rojnamegeriya kurdi ye. Yani berî niha bi sed salî rojnameya kurdi ya pêşî derketiye. Navê wê Kurdistan bû. Xwedî û berpirsiyarê wê Miqdat Mîthed Bedirxan bû. Gotina "Kurdistan" di dema desthilatdariya Osmanî de ne qedexe bû; ew navê herêmeye cografi bû. Rojnameya Kurdistan, ji Kurdistanê dûr, li Qahîreyê derdet. Hingî li Qahîreyê bi zimanê din ji kovar û rojname derdiketin. Ji ber ku ew sal, hem salêن qelsbûn û sisibûna împaratoriya Osmanî bû, hem ji dema hişyarbûna neteweýî bû. Endamên gel û neteweýîn cihê dest bi derxistina kovar û rojnameyên bi zimanê xwe kiribûn; tê de fîkrêni mili û ramanê serbixwebûnê belav dikirin.

Birêvebirê rojnameya Kurdistanê ji, ku ji malbata mîrekên Botanê bû, ji bo hişyarkîrina kurdan, ji bo ji nezaniyê rîzgarkirîna wan xwe bi hemû hêza xwe dabû rojnameyê; bi keda xwe, bi perêن xwe, bi dema xwe dixwîst ku kurd ji şîyar bibin, zana bibin, bixwînin û ji cehalet û bindestiyê rizgar û azad bibin. Miqdat Mîthed Bedirxan di hin

bendên xwe de qencî û camêriya kurdan, durustî û pakiya wan dianî ziman, lêbelê sebebê paşdemayina wan bi nezanî û nexwendina wan ve girê dida.

Nezanî di her deman de, derdê herî mezin e. Û ev derdê mezin hertim ji aliye kovar û rojnameyên kurdan ve hatiye zimên. Kovar û rojnameyên kurdan di her deman de bi misyonekê derketine. Misyonâ hisyarkirina kurdan, pêşexistina Kurdistanê, parastina kulturê, serihildana li dijî zor û sternê, eşkerekirina zîlm û neheqiyên ku li kurdan dibin; ji ber vê rewşa diyar, kovar û rojnameyên kurdan ji profesionalizmê bi dûr ketine, gelek caran mecbûr mane ku bi dizî bixebitin û ev xebata wan ya bi dizî jî ew ji aliye abori û siyasi ve xistine krîzê û bûye sebeba temenkurtiya wan.

Loma jî, fro ne mimkun e ku mirov li kovar an jî rojnameyek bi temenê sed salî, heftê salî, an jî pêncî salî rast were. Ev temenkurtiya rojnamegeriya kurdî ji bo pêşketina rojnamgeriya kurdî bûye handikapek. Handikapeke din ya rojnamegeriya kurdî jî ew e ku ew hertim li deriveyî welêt bûye. An ew li Qahireyê derketine, an li Bêrûdê, an li Stenbolê, an jî li Stockholmê. Kovar û rojnameyên ku li deriveyî tixûbêñ welêt derketine, pir bi zehmetî gîhîştine welêt û ga-va ew gîhîştine welêt jî, zîlm û stema desthilatdaran jî bi xwe re bîrin.

Kovar û rojnameyên kurdî ku bi hezar fedekariyan derketine, gelek bedel û qurbanî jî dane. Bi taybetî van neh-deh salêñ dawiyê, li Tirkîyeyê, bi sedan car kovar û rojnameyên kurdan hatine girtin, berpirsiyar û birêvebirêñ wan hatine zîndankirin, avahiyeñ hinekan ji wan hatine bombebarankirin, rojnamevan di işkeneciyê nedîti re hatine derbas kirin û bêhejmar keç û xorî û kalêñ me yên rojnamevan di nava kuçe û kolanan de hatine kuşin.

Digel van hemû astengî û sternkariyan û digel temenkurtiyê, dîsan rojnamegeriya kurdî bi ïnad dom kiriye û gîhîştiye van rojan. Lî, handîkapa herî mezin ya rojnamegeriya kurdî ew e ku ew hê jî ne bi zimanê kurdî derdikeye. Mîna hinek nivîskarêñ vê hejmarê jî dane xuyakirin, gelo mirov ê bikaribe rojnameyek ne bi kurdî -herçiqas ew ji aliye kurdan derkeve jî- ji rojnamegeriya kurdî bihesibine. Bi raya min, bi pirozkirina sedsaliya rojnamegeriya kurdî re, ev mi-jara ha jî héjâyî minaqşekirinê ye.

\* \* \*

Me ev hejmara ha bi hinceta sedsaliya rojnamegeriya kurdî, bi giranî jî rojnamegeriya kurdî û pirsgirêkên rojnamegeriya kurdî re vegetandiye. Ji bilî nivîsêñ hin nivîskarêñ me û nivîs û şiroveyen berpirsiyareñ hin kovar û rojnameyên kurdan, me ji kovar û rojnameyên kurdan yên kevin jî hin mînak hilbijartine. Hinek ji van mînakani bi kurdî bûn, hinek ji me ji tirkî dane wergerandin. Lî mixabin, hin mînakêñ girîng jî bi destêñ me neketin. Ez hêvidar im em ê vê kîmasiyê di hejmarêñ pêş de ji navê rakin.

Bi hêviya rojnamegeriyekê kurdî ya xurt, ez Newrûza we ji dil pîroz dikim. ↗

# PÊŞGOTINA "KURDISTAN"Ê

MIQDAT MÎTHED BEDIRXAN

## Bismillahîrreh- manîrrehîm.

Sed hizar şukr û hemd ji Xwedê te'ala re [ku] em musulman xulq kirin û zanîna 'ilm û me'rifetê re hiş û zeka da me. Derheqa elimandina ilm û m'erifetê re gelek Ayetên celîle û Ehadîsê şerîfe henin. [Di] dinyayê de çiqas misilman hebin, [di] gund û bajaren hemiyan de mekteb û medrese û cerîde henin. Dinyayê de ci dibe, ci nabe cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji kurda re, kurd ji gelek qewma zêdetir xweyhiş û zeka ne, camêr in, [di] dînên xwe de rast û qewî ne, xurt in û dîsa weke qew-



mên dî, ne xwenda ne, ne dewlemend in, dinyayê de ci dibe, cîranê wan Mosqof ce-wa ye, wê ci bike ni-zanîn. Lewma riya Xwedê de min ev cerîdeya ha nivîsî, bi iz-na Xudê te'ala niho her pazde roja de carekê ez ê cerîdekê bi-nivîsim. Navê vê min kiriye Kurdistan. Vê cerîdeyê de ez ê behsa qenciya 'ilm û me'rifeta bikim li kû derê mirov di'elime, li kû derê medrese û mekteben qenc hene, ez ê nişa kurda bikim, li kû derê ci şer dibe, dewletên mezin ci dikin, çawe şer dikin, ticaret çawe dibe, ez ê hemiya hikat bikim. Heta niho kesî cerîdekî holê

nenivîsiye. Ev cerîdeya min a ha ya ewulî ye. Lewma wê gelek kêmâyî hebîtin. Ez hêvî dikim kêmaya Cerîdeyê ji min re binivîsin. Hemî tişt wekî nû çêdibin kêm in, paşî hinkî diçe dikeve rê de. Ev e êdî ez ê dest meqsedê bikim. (We mînellahî tewfîq).

Hezretî Pêxember 'eleyhis' selam û wes' selam gotiye: "El 'ulemaû wereisetul enbiya." Anku 'ulema warisên enbiya ne, ji terefê Xwedê de mamûr in û we'z û nesîhetê [ku] bidin xelkê, riya qenc nişa wan bikin.

Lewma, gelî 'ulemayên kurda!

Çawa ûn we'z û nesîha nimêjê didin, welê divê ûn mîr û axa û kurmancê dinasin wan teşwîqa zanîna 'ilm û me'rifetê bikin, riya qenc nişa wan bikin, hekî ûn wê nekin, gunehê hemiya [di] stûyê we [de] ye.

Dîsa Hezretî Pêxember 'eleyhis' selam gotiye "El 'ilmu 'ilmen, 'ilm-ul ebdani we 'ilm-ul edyanî" anku 'ilm dudu ne; yek jê 'ilmê bedena ye, yek jê 'ilmê dîn û imanê ye. 'Ilmê bedena, hekîmî ye.

Gelî mîr û axano!

Heta niho kî ji we guh daye vî emrê Pêxember? Kî ji we zaruyên xwe, bîrâyên xwe, mirovên xwe rîkirine, dane xwendin? Kî ji we [di] gundê xwe de, [di] bajêrê xwe de mektebek, medrese-yek, daye çêkirin?

Gelî 'ulemano!

Ûn çire wan Hedîsa ji mîr û axa re naxwînin? Ûn çire cerîdeyêne erebî nax-

wînin, da ûn bizanin [ku di] dînyayê de ci dibe?

Dîsa Hezretî Pêxember 'eleyhis' selam gotiye "El kasîbû hebîbullah" anku mirovê kesb û kar bike, Xwedê te'ala hej wan dike. Ew mirovê ne xwenda be, nizane cerîdeya bixwîne. Ew mirovê cerîdeya nexwîne, nizane li kû derê ticaret qenc dibe. Cerîdeyêni ho [ku] tên nivîsandin, behsa hemî tiştâ dikan. Mirovê wan bixwînitin, wê bizanibe malê destê wî de li kû derê pera dike.

Van salêن ha de [li] İstenbolê mektebek hatiye çêkirin. Navê wê mektebê "Mekteba Eşîra" ye. Xêyrê zaruyên eşîra, zaruyên kesî qebûl nakin. Ji Bexda û Şamê, ji Yemenê, Şemer û Enze hemî zaruyên xwe rîdikin İstenbolê vê Mekteba Eşîra de dixwînin. Her sal du heyva diçin malênen xwe, paşê dîsa tên. Şeş, heft sala de alimên qenc ji wan derdikevin, paşê diçin gund û bajarên xwe. Dewlet her heyy pera dide wan, dibin memûr, hêdî-hêdî dibin muteserif, dibin walî.

Gelî mîr û axano!

Gunehê zaruyên we wê [di] stuyê we [de] be. Ün jî zaruyên xwe rîkin, bidin xwendin. Dewlemendêne we bila [di] gunda de mekteba çêkin, riya Xwedê da xêra bikin.

Dîsa Hezretî Nebî eleyhîs' selam gotiye "El herbû xid'etun."

Gelî mîr û axa û kurmancno!

Dinya zane [ku] kurd camêr in. Lî

[di] vî zemanê ha de, şer bi camêrî tenê çenabitin; top û tivingên we ecêb derketine, hewqa dûr diçin, cihê mirov dengê wan nebihîsit gule û berikêwan diçin, mirova dikujin, cihê mirov jê wek teyra dixuyê, berikê wan tivinga diçe dikuje. Ev top û tivingên ha, bê mekteb û medrese mirov nedikare çêke, nedikare biemilîne. Lewma bê van top tivinga cesûriya we wek mirovên destgîrêdayî ne.

Li Mushefa Şerîf de emir bûye "Cahîdû fî sebilillahi" anku [di] riya Xwedê de şerî bikin, [bi] dijminên dîn re cîhadê bikin. Dijminê dînê we, cîranê we Mosqof e. Heta niha Mosqof gelek der zebt kirine, Musulman Fileh kirine, dor wê têt Kurdistanê. Hekî we jî xwend, ûn elimîn ticareta û sin'eta, heki ûn dewlemend bibin, ûnê bikaribin xwe ji şerê wî xilas bikin. Hekî we guh neda van nesîhetê min, hekî dîsa ûn şivanî û rîncberiyê tenê bikin, [di] zemanek hindik de Kurdistan wê yekcar xira bibe. Cîranê we 'Ecem jî berê wek kurda bí. Vî zemanê paşî ewan jî qenc zanîn bê 'ilm û huner nabîtin. Ecema gelek mekteb û medrese henin, ewladên xwe rîdikin welatên dûr didin xwendin. Niho jî ji begzadeyên Ecem sê-çarek [li] İstenbolê, li Mekteba Herbiyeyê de ne.

Gelî mîr û axano!

Qenc fekirin [li] dora xwe. Ün, hingî diçe feqîr û kêm dibin. Sebeb, cahiliya we ye. El hemdû lîllah, gelek mekteb û

medrese henin. Riya Xwedê de zaruyêñ xwe rîkin, bidin xwendin, ji vê cahiliyê xilas bibin, dinya û axreta xwe mamûr bikin.

Xelk dibêjin "Hekî kurd bixwînin, wê ji alemê xurttir û dewlemendit birbin."

Dîsa Hezretî Nebî eleyhîssalam gotiye: "Utlub-ul 'ilme we lew fis'Sîni" anku 'ilm [li] Çînê bitin, herin wê derê bixwînin, bielimin.

Gelî mîr û axano!

Ez ji we dipirsin. Kî ji we heta niho mirovîk xwe rîkiriye kû derê da bixwînitin?

El hemdu lîllah! [li] Bexdayê, Şamê, İstenbolê mekteb û medreseyên hikûmetê hene, bê mesref in. Heç ji we zaruyêñ xwe teslimê hikûmetê bikit, bê mestef wê rîkin, bidin xwendin.

Berî du-sê sala, dewleta Çîn û Japonyayê şer kirin. Eskerê Çînê deh cara ji eskerê Japonyayê zêdetir bí. Hemî şera de Japonyayê karî eskerê Çînê. Werin vê carê sebeba vî halî bipirsin: Mirovên Çînê cahil in, mirovên Çînê tişkî nizanîn, mirovên Çînê nizanîn top û tivingêñ vî zemanî bielimînin. Eskerê Japonyayê top û tivingêñ xwe ew [bi] xwe çedîkin, [bi] hemî dera re ticaretê, kesb û karê dikin. Lewma dewlemend in, [bi] saya dewlemendiya xwe silahên kêm-zûka ji derên dûr kîrrîn û xweş-xweş şerên xwe kirin, karin [bi] dijminen xwe. Niho hemî [li] malêñ xwe ra-

het in, kes nikare xwe bide ser wan.

Ez [li] gelek dera gerayîme, niho jî li Misrê me. Hemî dera zaruyên çerkez û arnawud û ereba dibînim, babêwan, birayên wan rêdikin mekteba, didine xwendin.

Li Misrê Camîa Ezher de rastî hin kurdêna sora hatim. Hin ji Kerkûkê ne, hin ji milê Slêmaniyê ne, hemî dixwînin. Ez tu cara, li tu dera rastî mirovên Bota, Xerzan, Şêrwan, Hekariyan nehatime. Ez [li] tu mekteba rastî mirovên eşîretêna kurda nehatime. Ez çiqas rastî mirovên van eşîreta têm, hemî jî rêncber in, jar û reben in, sin'etekî, hunerekî nizanin.

Berî şes heyva ez ne sax bîm. Lewma vê zivistanê ez hatim Misrê. Misir biye bajarek hewqas mezin û xweş, heta mirov nebîne, mirov nikare bi wesfa wê bizanibe. Ez hêdî-hêdî ketim nêv Misriya de, 'elimîm hal û sin'etên wan, kesb û kara wan. Ev xelkêna Misrê mirovên bê zirav in, ne camêr in, lê gelek dişixulin, nawestin, li kû derê mekteb û medresek qenc hebit, nabêjin dûr û nêzik e, zaruyên xwe rêdikin, didin xwendin, dielimin sin'eta, dielimin hemî tiştâ. Niho nêva Misrê de, ji xelkê Misrê hewqas xwenda û alim hene, hewqas mirovên xweysin'et û huner hene, gelek mi'ûziyê bajêr ew xwe çêdikin. Nêv Misriya de mirov hene [ku] top û tivin ga çêdikin, mirov hene xaniyên pêncîmezel ava dikin, nêv wan xweysin'eta

de mirov henin rojê pêncî-şêst çerxiya distînin. Mal û xaniyên hemiya xweş in, hemî xweyxadim û xulam in. Û nêv wan de nexwendayê reben jî hene, lê hindik in.

Gelî mîr û axayên kurmanca!

Ez ji we dipirsin. Ji xelkê Misrê ci kêmeyîya we heye? kurd ji Misriya camêrtir in, hiş û aqilê wan zêdetir e, hemî texlîda kurd ji Misriya qencdir in. De vêca çire xelkê Misrê wê ji kurda dewle-mendit bin?

Li Misrê hin kurmanc hene,bihîstine ku ez hatime Misrê, hemî jî hatine ziya-reta min. Min halê hemiya pirsî, hemî jî dergevanî û xulamiya Misriya dikin, hemî jî binê mineta wan de ne, hina jî bêedebî kirine, ji cihê xwe derêxistîne, jar û reben bîne. Hekî xwenda bîna, hekî destê wan de jî hunerek, sin'etek hebîya, holê jar û reben nedibîn. Heyfa min têt, ji dergevaniyê, xulamiyê pê ve kérê tişkî nayêن.

Gelî 'ulema û mîr û axayên kurda!

Ün hemî esl û neslê min dizanin [ku] cedê min Hezretî Xalid Înbî Welîd e, redîyellahu teala enhu. Eşîra me Botan in, şuhreta nesla me Ezîzan in. Ez riya Xwedê de dixebeitim. Min ev cerîde çêkir, vê rê de ez gelek pere serf dikim, ze metê dikêsim. Meqseda min, qenciya kurda ye. Ün jî ji xêra Xwedê re dest hilînin, kurda bidin xwendin, zaruyên xwe bielimînin ilm û edebê, bielimînin sin'eta. Mirovên Musulman divê xwen-

da bin, divê bielimin dînê xwe.

Gelî ulemayên kurda!

Ün çire [li] camia behsa xirabiya ca-hiliyê, qenciya ilmê nakin?

Xwedê te'ala û Pêxember eleyhis-salam behsa 'ilm û cehlê çi emir kirine, ûn dizanin? Vana hemiya ji kurda re waz bikin. El hemdu lîllahî te'ala, ev e ya dikeve para min, ez dikim. Îdî ji ulemayên kurda hêvî dikim, vê cerîdeya min ji mîr û axa û kurmanca re bixwînin, derheqa elimandina ilmê de Xwedê te'ala û Hezretî Pêxember eleyhis-salam çi emir kiriye ewî bikin aqilê wan de. Ji mîr û axayên kurda jî hêvî dikim zaruyên xwe heta bibin deh-dozde salî, [li] gund û bajârên xwe de bidine xwendin, bielimînin Mishefa Şerîf û xwedina cerîdeya. Ji wî pasê bikin mekteb û medreseyên İstanbulê, Şamê, Bexdayê, da Xwedê ji hemiya razî be, da ûn ji şerê dijminê xwe emîn bin, Xwedê qencî bide mileta[ê] îslamê.

Nîha Sûdan û Misir şerî dikin. Mê-rek Sûdaniya ji ber deh mîrêni Misriya ve ne. Dîsa eskerê Misrê dikare [bi] Sûdaniyan. Em her roj cerîdeya de dixwûnin, deh ji Misriya têñ kuştin, pêncî ji Sûdaniya têñ kuştin. Sebeba vê, xelkê Sûdanê nexwenda ne, xid'e û hîleyen şerîn wî zemanî nizanîn, top û tivingen wî zemanî nînin, hebin jî nizanîn bi'emîlinin.

Cerîdeya paş vê, ez ê şerê Sûdanê û Misrê qenc binivîsim.

Par, dewleta me û Yûnaniyan şer ki-rin. Şikir ji Xwedê re dewleta me karî Yûnaniyan, heyvekê de eskerê îslamê şes bajêrên mezin û ji seda bêtir gundê Yûnaniya girtin. Jew paşê Mosqof ket nêva halê de, nehişt em zêdetir biçin, me silh kir. Şeraitê sulhê, yek jê: Yûnan wê çar milyon zêra bide dewleta me. Çiku hê ev pere nedan, eskerê dewletê hê nêv bajêr û gundê wan de ne. Yûnan wê van pera ji dewletê mezin deyn bike û bide dewleta me.

Berî wî şerî dewletê Filan gotin, qey dewleta me ji bêperetî nikare [bi] tu kesî re şer bike. Şikir ji Xwedê re, dewletê çiqas vi esker derêxist û karî dijminê xwe.

Yûnan dewleteke kiçik e. Xwedê neke hekî dewletê nikarîbiya [bi] Yûnanî, Fi-le wê bivîna yekcar dewleta misilmaniyê ji dînyayê hilînin. Lê wekî heyvekê de me hewqas bajar û gundê Yûnan girtin. Hemî dewlet man ecêbmayî ku hinde zû-zû me karî [bi] wan.

Ciqas misilman ser dînyayê hebin, hemî arîkariya jin û zaruyên eskerên [ku di] wî şerî de hatin şehîdbûyîn di-kin.

Gelî kurdno!

Ez we bibînim. Qasê [ji] destê we hat, pere bigîhînin hev, bidin muteserif û waliyên we, de rêkin İstanbulê. Ji hemî dera rêdikin İstanbulê. [Li] İstanbulê navê şehîda hemiya nivîsîne, rêdikin [ji] jin û zaruyên wan re.

Ser dinyayê de tu qewm nemane, nav û behsa Girîdê nebihîstine. Ji mêt we Girîd [di] destê Misilmana de ye. Xelkên Girîdê se para yek jê Misilman in, du par jê File ne. Tu cara File û misilmanen wê derê bê şer nasekinin. Berî salekê dîsa dest [bi] şerî kirin. Vê carê şer gelek mezin bî, gelek gund û bajêr xira bîn, şewitîn, çiftlik neman yekcar xirabîn, gelek jin û zaruyêن misilmana hatin kuştin, gelek kiçêن misilmana ketin destêن Fila de, gelek ji wan kiça bîn jinêن Fila, gelek zaruyêن misilmana sêçar salî, dê-babêن wan hatin kuştin, ew xwe ketin destêن papazêن Fila de, kirin mektebêن xwe de. Ev zaro hemî wê bîelimin Filetyê. Ev Fileyêن ha ji cinsêن Yûnaniya ne. Heyfa min tê, gelek jin û zarû û mêt hatin kuştin, bîn File. Min [bi] çavê xwe resma zarûkek misilman dît, reben çarsalî bî, Fila sê ciha birîndar kirbîn. Heta niho jî [li] Girîdê şer ne kêm e. Çiqas misilman hebin, gelek jê revîn welatêن misilmana, hinek jê hê mane [li] Girîdê, lê kes newêre biçe

gundê xwe, hemiya xwe dane hev, bajêra de rûdinin. Fila gund û zeviyêن wan ji xwe re birine. Niha çeqas misilman hebin, civiyê dikin, ar û cil û pera rîdikin ji misilmanen Girîdê re. Rebena hemî tazî û birçî mane.

Ez ji mîr û axayêن kurda hêvî dikim, derheqa qenciya kurda de ci bêt bîra kî, bila ji min re binivîsin, ez ê [di] vê Cerîdeyê de binivîsim. Wek [li] roja vê Cerîdeyê [ku] min nivîsi, dîvê kaxizê rîkin ji min re Misrê.

*Kurdistan, hej. I, 1898*

---

Ev nivîs berê mamoste Mihemed Emîn Bozâsan ji tipên erebî veguhaztiye tipên latînî. Lê me li vir orjînalâ wê bingeh girt. Di nivîsê de li hin deveran kîmasiya daçkan heye. Jî bo ku rind bête zanîn, me hin daçek di navbera kevanekên goşedar de nivîsin.

**ZEYNELABİDİN ZINAR**

# ROJNAMEGERIYA KURDÎ Û DÎROK

Dr. KEMAL MEZHAR EHMED

- Dîrok li "Kurdistan"ê û Li Ba Grubên Xwenda.
  - "Roji Kurd", "Jîn" û "Têgeyiştinî Rastî".
  - Herekol 'Ezîzan an Celadet Bedir-Xan. Goşeyên "Gelawêj".
  - Osman Sebri û "Ronahî". Rojnamegeriya Mahabadê.
  - Selaheddin Eyyûbi. Gavavêtina Mezin a "Rojî Nwe".
  - Rojnameya "Ziban" û Minorsky. Di Rojnamegeriya Kurdî de Selaheddîn.
- Pêxember û Kurd.

**G**elek zehmet e ku rojname yan kovareke kurdî bê dîtin ku qîmet nedabe dîrokê. Xwediye rojnameya yekem Kurdistan, di hejmara heştan a rojnameya xwe de nivîandiye û wiha dibêje:

"EZ zanim kurd ji tarîxa Kurdistanê tu tiştî nizanîn loma ez ê her cerîda xwe de kurt biçek tarîxa Kurdistanê ew ya ecdadê 'ezîzan binivîsim"<sup>(i)</sup>.

Şêst sal piştî vê bûyerê, dema ku xwendevanê kurd li Ewrupayê xwestin kovara Kurdistanê li ser navê Komeleya Xwendekaran derêxin, sekreterê komîteya weşanî ya kovarê 'Omer Qazî li Londrayê beyannameke bi kurdî û 'erebî belav kir ku bi vî awayî dest pê dikir:

"Ey Xwendevanê Kurd ên Delal!

Em hemû dizanin ku yek ji wan armancê pîroz ên kovara me ya delal, gihandina dîrok, edebiyat û zanista kurd bi milletê din e”<sup>(2)</sup>.

Demekê berî wê jî, kovara Kurdistan a Mahabadê di dawiya rûpela yekan a hejmarâ yekan de wiha nivîsandiye:

“Kurdistan kovareke edebî, dîrokî û civakî ya mehane û kurdî ye. Ji bo danejî yandina eserên kurd dixebite, ji ber vê em rîca ji xwendevanê kurd dikin ku ci kesê beyt, çîrok û serpêhatiyê mirovên mezin an eşîretên kurd bizane yan nivîsek li balê be yan jî jiber be, bi kurdî, farisî û erebî ya zanayekî kurd be û nehatibe çapkirin, ji me re bişîne ku em bikarin bi alîkariya Xwedê wê çap bikin ku di nav zemên de wenda nebe.”<sup>(3)</sup>

Bi ví awayî behsa dîrokê armanca piraniya rojname û kovarê kurdî bûye. Rojnameya yekemîn Kurdistan, behsa Selaheddîn, Mîrê Cizîrê û Bedirxan Paşayê mezin kiriye. Her wiha maqaleyê di derheqê dîroka giştî yên wekî behsa dîtina Emerikayê jî alîyê Kristof Kolomo de jî belav kiriye. Kurdistan, di çar hejmarên xwe de (22-25) bi dîrêjahî behsa jiyan û bîr û karêñ Mîdhed Paşa yê bi nav û deng jî kîriye.<sup>(4)</sup>

Kurdistan, bi serê xwe ji bo têgihiştina gelek milêñ jiyanâ sîyasî, rewşenbîriya kurd a di dawiya sedsala 19an û destpêka sedsala zoan de çavkaniyek girîng e. Zanaryiyê di Kurdistanê de alîkarîya dîroknîvîsan dike, ku baştir bi peywendiyê di navbera kurd, ermenî û çalakiyê welatparêzên kurd ên di nav sefîn Îttîhadîyan û ciyê Siwarê Hemîdiye di dîroka kurd a nû de û ev cure behsêñ han bîzanin.

Yekemîn kovara kurdî Rojî Kurd<sup>(5)</sup>, hersê rûpelên hejmarên xwe yên yekemîn bi wêneyêñ navdarêñ kurd xemilandiye -Selaheddîn Eyyûbî, Kerîm Zend û Hûseyîn Ken'an Bedirxan Paşa. Jîna Stenbolê<sup>(6)</sup> jî yekemîn kovara kurdî ye ku qîmeteke zêde daye dîroka kurdan. Jîn di hejmara xwe ya ioan de, maqaleyeyeke ku jî alîyê M. Nejad Tewfiq di derheqê Mewlana Xalid de hatîye nivîsandin, weşandiye<sup>(7)</sup>. Cardin Jîn yekemîn kovara kurdî ye ku zincîrek maqaleyê di derheqê dîrokê de weşandiye û koşeke taybetî jî dîroka kurd re vejetandiye. Jîn, zincîrek maqaleyê ‘Ebdul’ezîz Yamûlkî yên di derheqê dîroka bingehê malbata Baban û zincîrek maqaleyê dîroka kurdêñ Bedlîsê û kurd û Kurdistanê de û bi taybetî rewşa gelê kurd li Iranê weşandiye.

Jîna Stenbolê, di ceynî wextî de yekemîn çapemeniya kurdî ye ku berhemêñ zanayîn Ewrupayê yên wekî ew zincîra maqaleyê ji Ansîklopediya Britanyayê wergitî yên di derheqê dîroka kurd de belav kîriye.

Dîroka kurd di rojnameya *Têgeyiştinî Rastî* de baş ciyê xwe girtîye<sup>(8)</sup>. Di vir de

M. Soaneyê şareza, ku mamoste Emîn Zekî di derheqê nijada kurd de ji nivîsandi-nêñ wî îstîfade kiriye, roleke ronî leyistiye. Têgeyîştinê Rastî yekemîn çavkaniya kurdî ye ku hewil daye behsa regeza kurd bi awakî zanistî bike û tê de çend car an behsa Medya jî kiriye û wendanebûna kurdan bi muqayeseya wendabûna gelên kevin ên wekî asûrî, akadî, kildanî û elamî, belgeke dîrokî ya girîng dihesibîne.

Têgeyîştinê Rastî, çend gotar ji bo behsa dîroka Kurdistanê ya Qirna Navîn amade kiriye, ji ber ku wekî bi xwe dibêje: “Dîroka Qirna Navîn a kurdan xwediyê giringîyek e”<sup>(9)</sup>. Têgeyîştinê Rastî ji hejmara 23an pê ve, di koşeya “Tarîx û Meşahî-rêñ Kurd” de bi dirêjî behsa çend mîrektiyêñ demêñ kevin ên Kurdistanê kiriye û sebebê damezirandina wan bi vî awayî nivîsandiye:

“... Rewşa xîlafeta ‘Ebbasî xera bû û ji hemû milan ve bi wasiteya mîrovêñ wan hukûmetêñ serbixwe hatin meşandin. Qewmê kurd jî... ji vî halê perîşan îstîfade kir û ji bo ku ciyê wan tev çiya û derêñ asê ne, baştîr derketin pêş û hukûmetêñ mûnasîb tesîs kîrin<sup>(10)</sup>. Têgeyîştinê Rastî, di çend hejmarêñ xwe de behsa mîrektiyêñ kurd ên Qirna Navîn û desthilatdarêñ wan ên bi nav û deng kiriye.

Kovara Hawarê jî<sup>(11)</sup> bi para xwe qîmet daye dîrokê. Herekol ‘Ezîzan, ku naznavê Celadet Alî Bedir-Xan e, di Hawarê de gelek maqaleyêñ di derheqê dîrokê de belav kiriye. Wekî maqaleya “Kurd û Kurdistan Di Çavê Bîyaniyan de”, ku tê de behsa dîroka kurd a qonaxêñ kevin dike. Tevgera Bedir-Xan Paşa yek ji wan behsêñ wê kovarê ye ku Herekol ‘Ezîzan qîmeteke zêde daye<sup>(12)</sup>. Cardin her wî ew gotara mezin a bi navê “Kardux û Welatê Karduxan” belav kiriye ku bi dirêjî cî daye ew gotarêñ ku Ksenefon ên di sala 401ê berî zayînî di Anabasis de di derheqê Karduxan de nivîsandiye<sup>(13)</sup>.

Herekol ‘Ezîzan, bi navê “Klasikên Me”<sup>(14)</sup>, maqaleyek mezin di derheqê jîyan û karêñ kesêñ kurd ên mezin ên wekî ‘Elî Herîrî, Feqeyê Teyran, Ehmedê Xanî, Bayezîdî, Şeref Xan, Murad Xan, Mewlana Xalid, Mele Yehyayê Mizûrî, Halî, Şêx Reza û Haci Qadirê Koyî belav kiriye.

Ji bili ev tiştêñ ku me behsa wan kîrin, Hawarê di çend hejmarêñ xwe de çîrokêñ dîrokî yêñ wekî Kleopatra, Selaheddîn û Richardê Şerdil<sup>(15)</sup> weşandine.

Di vê meydanê de Gelawêj, wekî gelek meydanêñ din, yekemê rojnamegeriya kurdî bû<sup>(16)</sup>. Heta niha yek rojname û kovarêñ kurdêñ Iraqê û derveyê wan, wekî Gelawêjê qîmetê bi gelempêri dîrok û bi taybetî dîroka kurd nedaye. Gelawêj, çend koşe ji bo behsêñ cihê yêñ dîrokê amade kiriye. Wekî “Kurdên Bi Nav û Deng”, “Di Kevin û Di Koncikêñ Tarîxê de”, “Suçek Ji Dîrokê” û “Kurd Li Ba Biyaniyan”. Nivîskarêñ herî bi nav û deng ên salêñ cili (Emîn Zekî, Tewfiq Weh-

bî, Huseyîn Huznî Mukrîyanî, ‘Elaeddîn Seccadî û hejmareke din) li ser rûpelên Gelawêjê behsa dîrokê kirine<sup>(17)</sup>. Ji bîlî van hejmarek rewşenbîrên derveyî kurdên Iraqê yên wekî Osman Sebîr û N. Aza Sineyî ku behsa Heloxanê serokê Erdelan kiriye, di Gelawêjê de di derheqê dîrokê de maqale belav kirine<sup>(18)</sup>.

Carên wisan hene ku Gelawêj nîvê temarnê hejmareke xwe ji behsa dîrokê re amade kiriye. Wekî mîsal, di hejmara 5 û 6an a sala sisiyan de<sup>(19)</sup> ev gotarêñ han ên di derheqê dîrokê de weşandine: “Kurdên Bi Nav û Deng” a M. Emîn Zekî (r: 16), “Tetewwûr -Guherîn- ‘Ilmê Ictima’î” a wergera ‘Elaeddîn Seccadî (r: 10-14), “Rû-pela Dîrokê, Nezeriya Hatina ‘Eqwamê Hendo-Ewrupayî Yan Arî û Koçeran” a Salih Qeftan (r: 14-20), “Norweç Çawan Hat Girtin” a Naci ‘Ebbas (r: 56-69), “Ji-na Kurd a Bi Nav û Deng -Mestûre” ya Mihemmed Emîn Karduxî (r: 77-78), “Lenîn” a Fayîq Hoşyar (r: 81-87), “Wêneyê Minareke Kevin a ‘Imadiyeyê” (r: 89), “Paşaweyî Jîvana Mewlana Xalid” a ‘Ebdulmuhsin Hoşyarî Hewramanî (r: 93-95).

Yek ji karê bi qîmet ê Gelawêjê, belavkirina berhemên hejmarek rojhilatnas û gerokên Ewrupayê yên di derheqê kurdan de ye. Di vir de rola mamoste Naci ‘Ebbas mazin û diyar e. Di pênc hejmarêñ li pey hev ên Gelawêjê de “Guherîn” a bi nav û deng a V. Minorsky<sup>(20)</sup> weşandiye<sup>(21)</sup>. Çend meh şûn de bi navê “Geşteke Heştê Sal Berî Niha Li Kurdistanê” ji kitêba F. Millingen<sup>(22)</sup>, wekî ku bi xwe dibêje: “Ev pe-rçeyên han bi kérê we bén û tamekê bidin we”<sup>(23)</sup>, wergerandine kurdî û di çend hejmarêñ Gelawêjê de hatine belav kîrin<sup>(24)</sup>. Gelek bi ser vî karî re derbas nebûye, vêca mamoste Naci ‘Ebbas di hejmara heştan a sala 1947an a Gelawêjê de dest bi weşandina kurtiya kitêba gîring a C. J. Rich<sup>(25)</sup> kiriye, ku ev berhema han ji kesên bixwazin behsa kurd û Kurdistanê ya di sedsala 18an û bi taybetî destpêka sedsala 19an bikin, çavkaniyeke hêja ye.

Mamoste Naci ‘Ebbas bi xwe jî sebebê vî karî bi qîmet di gotareke di derheqê dî-rokê de ya bi navê “Rûpelên Zêrin Ji Dîroka Erbîlê” di Gelawêjê weşandiye<sup>(26)</sup>. Di-yariya mamoste ya dawiyê “Keçen Kurd” e<sup>(27)</sup>.

Mamoste Qadir Xeffar, Mecîd Se’id û Bekir Dilêr jî ji ingilizî berhemên bi feyde wergerandine û rûpelên Gelawêjê pê xemilandine. Wergera yekem kurtiya çend besên kitêba M. Soane<sup>(28)</sup> ye, ku di çend hejmarêñ Gelawêjê yên di sala 1945an de haniye weşandin û di dawiyê de bi xwe jî di vî warî de nirxandinek amade kiriye<sup>(29)</sup>, ku mixabin ew kulên wî yên ser dilê kurdan wisan lê kiriye ku bikeve nava çend şâsiyan. Qasekê şûn de Qadir Xefaf ji hejmara pêncan a heta dehan a sala heftan a Gelawêjê de zincîrek gotar di derheqê Rich û kitêba wî de belav kiriye<sup>(30)</sup>. Mecîd Se’id jî di sê hejmaran de “Kurdên Iraqê” ya C. Jonson belav kiriye<sup>(31)</sup>. Be-

kir Dilêr “Yekem Fermaneyê Gotî Li Babîlê” û “Nijada Kurd” ji ingilîzî wergerandiye kurdî û di Gelawêjê de weşandiye<sup>(32)</sup>.

Yek ji wan berhemê dîrokî yê herî bi feyde ku hatiye wergerandin û di Gelawêjê de hatiye weşandin, ew gotare ku behsa destpêka rojnamegeriya kurdî û pêşveçûna wê dike<sup>(33)</sup>. Gotara navê wê derbas bû, Yusif Melek<sup>(34)</sup> ji ingilîzî wergerandiye erekî û mamoste ‘Ebdûlqadir Qezzaz jî wergera wê ya kurdî çêkiriye<sup>(35)</sup>.

Her wiha bêyî navê werger, di sê hejmarên Gelawêjê de ew besên kitêba “Kêmatiyên (‘eqaliyatên) Cihana ‘Ereb” a A. H. Houranî<sup>(36)</sup> weşandiye ku peywendiya wan bi kurdan ve hebûye<sup>(37)</sup>.

Hesen Fehmî Caf -Xwedê jê razî be- çend gotarêن di derheqê dîrokê de ji farisî wergerandiye kurdî û di Gelawêjê de hatine çapkirin. Yek ji wan a bi navê “Şehzadeyê Bedlîsê” ye ku bîranînê gerokekî fransiz e û ew di nîvê sedsala 1948an de, di dema fermanrewayekî nevîyê Şeref Xan de hatiye Bedlîsê<sup>(38)</sup>. Li gor gotina wî gerokî, şehzadeyê Bedlîsê di dema pêwistiyê de dikarîbû destê wî bigihîje “bîst heta pîst û pênc hezar siwaran û hejmaraeke gelek zêde peyadeyan”, ku bi çek bişîne ci şerekî ku pêwîst bûya.

Wergereke din a Hesen Fehmî Caf, “Kurd Di Welatê Kelati” de ye, ku di hejmarâ 6an a sala 1948an a Gelawêjê de hatiye weşandin (r: 21-32, 41). Eynî wextî Hesen Fehmî Caf çend berhemên xwe yên dîrokî jî belav kiriye ku piraniya wan di derheqê kesen bi nav û deng ên Zendan in (Kerîm Xan, Lutfuhayê Xan û ‘Elî Murd). “Mêjûwî Xulmar” yek ji wan gotarêن baş ên Hesen Beg e<sup>(39)</sup>. Wekî ku ew neqîl dike, Amîre Xana jina wî Hesen Beg ji bo xîzmeta kurdan teşwîq kiriye.

Gelawêj dixwest bala xwendevanên kurd bikêse ser wê rastiyê ku yên di “riya sî-yasetê de” dîrokê neqîl dîkin kêm nînin. Ji bo ronîkirina vê meselê, wekî nimûne pêşgotina “Kurd Di Ansiklopediya Tirkî de” weşandiye<sup>(40)</sup>. Hêjayî gotinê ye, di vê gotara ansiklopediyê de ne tenê kurd ji nijada wan a eslî bêpar kiriye, belko bi eyî destûrê bi zorê eslê Sumer, Med û gelekên din gihadine nijada tirk.

Gelawêj rûpelên xwe ji kesen wekî Kerîm Xanê Zend, Mewlana Xalid Şarezorî (Neqşîbendi), Ibn El-Selah, Helo Xan, Mehmûd Xawer û gelek kesen bi nav û deng ên kurd, cîyê wan ê dîyar û bi qîmet amade kirine. “Cengîz Xan”, “Teymûr-lengê Tîrsîner”, “Jîyana Napolyon” û “Mehkemeya Louisê Şanzdemîn” nimûne-yan wan gotarêن giştî ne ku Gelawêjê car caran weşandine.

Yên hera niha me behs kirin, hemû serbarê wê dewra mezin e ku Gelawêj di da-nejîyandina dîroka edeba kurdî de dîtiye. Jînname û hejmareke gelek zêde berhemên şairên kevin û yên nû yên kurdî, beşeke zêde rûpelên hejmarên Gelawêjê gir-

tine. Gelek şair hene ku xwendevanê sade yên kurd bi riya Gelawêjê ew nas kiri-ne. Yên wekî "Exter" ku naznavê Emîn Axayê kurê Hacî Bekir Axayê Hewîzî ye û di sedsala borî de jiyaye<sup>(41)</sup>, şairê Kırmaşanî Sultanî ku ji Eşîreta Kelhûrî ye û di sala 1250yê koçî (1834-1835ê zayıñî) li bajarê Kırmaşanê yê Kurdistanâ İranê ji diya xwe bûye<sup>(42)</sup>.

Ji ber van û gelek sebebên din, çi kurdan bi xwe û ci jî biyaniyan ew gelek bilind nirxandine. Di ilona sala 1944an de, M. Lorans Rayn di derheqê Gelawêjê de nivî-sandiye û wiha dibêje: "Gelawêj, niha yek ji kovarê edebî yên herî seviya wê bilind a Rojhilata Navîn e".

Ronahî û Dengî Gîti Taze, ku di salên Şerê Cîhanê yên Duyem de organên kurdên hevpeyman bûn, hera dereceyekê baş qîmet dane belavkitina gotarên di derheqê dîrokê yên cihê cihê de. Bi taybetî ji ber vê, rêvebirêner herdûyan, Bedir-Xanî û mamoste Tewfîq Wehbî û Huseyîn Huznî Mukriyanî, ji wan kesan bûn ku bi dîrokê ve mejûl dibûn. Osman Sebrî, zincîrek gotarên di derheqê dîrokê de yên bi feyde di Ronahiyê de belav kiriye, ku beşek jê giştî û yên din jî di derheqê dîroka kurdan de ne. Wekî nimûne, di zincîreke ya ji sêzdeh gotaran pêkhatî de, bi dirêjî behsa jîyan û şerîn mezin ên Napolyon Bonapart kiriye<sup>(43)</sup>. Osman Sebrî bi eynê destûrê zincîrek gotarên di derheqê Yezidîyan<sup>(44)</sup>, hînek eşret û serokeşret û lawên kurd ên rewşenbîr de belav kiriye. "Çiroka Tarîxê" jî yek ji koşeya hejmarê Rona-hiyê yên dawîyê ye.

Dibûya rojnamegeriya dewra Mahabadê qîmeteke zêde bidaya dîrokê. Wekî di ciyê wê de me behs kir, Kurdistanâ organa Partiya Demokrat a Kurdistanê, xwe kovareke edebî, dîrokî û civakî dihesiband. Lê ji ber gelek sebebên eşkere rojnamegeriya Mahabadê ew tiştên di dilê xelkê de bûn pêk neanî.

Lê li gel vê jî rojname û kovarê Mahabadê car û caran berê xwe dane dîrokê û çend berhemên bi qîmet li pê xwe hiştine. Seyîd Mihemed Hemîdî gelek gotarêni di derheqê jînnameya mirovên mezin ên wekî Ibn Xelekan, Ibn Selah, Ibn Şeddad û Seyî Qazî di kovara Kurdistanê de belav kirine<sup>(45)</sup>.

Bi eynê destûrê kovara Niştiman jî jînnameya hejmarek kesên kurd ên bi nav û deng nivisandiye. Wekî Şêx Yusif Şemseddînê Burhanî ku serdarekî bi nav û deng ê dewra Mîrê Rewandîzê<sup>(46)</sup> û ya Mele 'Elîyê Sinoyî Şêxanî ku zanayekî bi nav û deng ê sedsala 15an bûye<sup>(47)</sup>. Gotareke Şêx Se'îdê pîşewayê serhildana millî ya kurd, belgeke hêja û girîng e, ku Niştimanê weşandiye<sup>(48)</sup>.

Kovara *Helalî* jî, ku li bajarê Bûkan dihat çapkîrin, jînnameya gelek serokên kurd belav kiriye; Qazî Mihemed yek ji wan e. Helale, gotareke xwe ya girîng a li

ser dîrokê, ji bo rêxistinên sîyasî yên kurd ên berî Şerê Cîhanê yê Yekem amade kîriye<sup>(49)</sup>.

Eger di rojnamegeriya kurdî de kovarek an rojnameyek hebe ku bi temamî xwe nêzîkî weke organeke dîrokê kiribe yan hera dereceyeke zêde wisan be, bêguman ew Rojî Nwe ye. Her çend rêvebirêne wê<sup>(50)</sup> ew weke "kovareke edebî, sîyasî û cîvâki" pêşkêşî xwendevanan kiribin jî. Rojî Nwe, di hemû waran de, bi taybetî di meydana dîroknîvîsê de ber bi pêş ve gaveke girîng avêtiye. Qet hejmareke Rojî Nwe tune ku çend gotarêni li ser dîrokê yên bi feyde tê de nehatibin belavkirin, ku piraniya wan ji bo warêni cihê yên dîroka kurd hatine amadekirin, wekî nimûne: Rojî Nwe di hejmara heftan a sala yekê de<sup>(51)</sup>, ev gotarêni han belav kirine:

Şêx Mehmûdê Nemir (r: 1-8), Şerê Şe'ibe (r: 24), Daxwazên Kurd (r: 29)<sup>(52)</sup>, Hemdî û Şêx Mehmûdê Nemir (nivîsa Medhoş, r: 30-34), Komelî Kurdistan (r: 35), Beyannameya Şêx Se'îdê Pîranî (r: 36-39), Anîna Cenazeyê Şêx Mehmûd (nivîsa Şêx Nûriyê Şêx Salih, r: 41-44), Mirovên Mezin ên Gelê Kurd, Mîr 'Ebdurrezaq Bedir-Xan (nivîsa Îsmâîl Heqî Şaweys, r: 50-53), Koça Dawîyê Ya Şêx Mehmûdê Nemir (r: 58-59), Awbarîk (r: 60-61), Mela Mihemedê Koyî (nivîsa Dersim, r: 76-81), 'Ilan Resmî (r: 92-93)<sup>(53)</sup>.

Ew mijarêni li jorê hatin nivîsandin û gelek bûyerên biçûk ên dîrokî û sê wêne- yên dema tevgera yekem a Şêx Mehmûd û wêneke melayê mezin ê Koyî di vê hejmara Rojî Nwe de hatine belavkirin. Gotara "Dîroka Neteweyê Te" ya di hejmara ioan a sala yekan a Rojî Nwe, tenê 14 rûpel e, yanî zêdetirî ji heştan yekê temamê rûpelên wê hejmarê ye<sup>(54)</sup> ku di eyîn wextî de çar gotarêni ser dîrokê yên girîng jî tê de hene<sup>(55)</sup>.

Gotarêni bi qîmet ên Îsmâîl Heqî Şaweys -Xwedê jê razî be- ên di derheqê tevgerêni azadîxwazi yên gelê kurd ên di navbera Şerê Cîhanê yê Yekem û Duyem de, ku di Rojî Nweyê de belav kirine, valatiyeke mezin tijî kirine. Wekê yên Komelî Kurdistan<sup>(56)</sup> û Navdarêni Kurd, Mele Selîm Efendi<sup>(57)</sup>, Komîteya Îstîqlalî Kurdistan<sup>(58)</sup>, Şoreşa Koçgîriyê<sup>(59)</sup> û gelek gotarêni din ên bi kêt.

Hêjayî gotinê ye, rojnamegeriya kurdî ji hemû kesên bi nav û deng ên kurd zêdetir qîmet dane Selaheddînê Eyyûbî. Piraniya rojname û kovarêni kurdî, ji rojnameya yekem Kurdistanê<sup>(60)</sup> bigir bê, gotarêni taybetî jê re amade kirine. Osman Sebrî di kovara Ronahiyê de zincîrek gotar di derheqê jiyanâ Selaheddîn de belav kiriye<sup>(61)</sup>. Selaheddîn û Ehlê Xaç, gotareke mezin a sê hejmarêni Gelawêjê ne<sup>(62)</sup>, Piraniya kovarêni Mahabadê jî behsa Selaheddîn kirine.

Cardin wêneyêni tu kesî ji mezinê dîrokî, qasî yên Selaheddînê Eyyûbî li ser rû-

pelên rojnameyêن kurdî cî negirtine. *Rojî Kurd* a kovara kurdî ya yekem, rûpela xwe ya yekem a hejmara yekem bi wêneya Selaheddîn xemilandiye. Kovara *Grugâli Mendalanî Kurz*, ku weşana karkerêن Çapxaneya Kurdistanê ya li Mahabadê bûye, wêneke Selaheddîn li ser rûpela yekê ya hejmara sisiyan belav kiriye û li vî û li wî milî wêneyê ev şî'ira han nivîsandiye:

“Her bijî ey fexrê qewmê kurd û Sultanê ‘Ereb  
Tu nemirdûyî ey Selaheddînê Eyyûbî neseb”<sup>(63)</sup>.

Berî ku em dawiyê bi rojnamegeriya kurdî û dîrokê bînin, em pêwîst dizanin ku hinekê jî li ser rojnameya *Ziban* bisekinin. Bi taybetî ji ber ku navê wê rojnameke dîrokê ya bi nav û deng belav bûye<sup>(64)</sup>.

Dema ku Mecîd Ye'qub bû waliyê Silêmaniye, dest bi dijîtiya li hemberî rojnameya Jîyan a Pîremêrd kir, wisan dixuya dixwest rojnameke din ciyê wê bigre. Salih Qeftan -Xwedê jê razî be- ku yek ji wan rewşenbîrên dilsoz ê wê demê bû, erkê derxistina rojnameke din girt ser milê xwe, ku ew jî weke *Jîyanê* li çapxanaya Şarewanî ya Silêmaniye çap dikir<sup>(65)</sup>. Rojnameya nû ji dayîk bû û navê Ziban jê re hatbijartin, lê ji bo rojnamegeriya kurdî heta dereceyekê ne navekî jê hévî dihat kîrin bû. Bi rastî jî piraniya zêde rojnamenivîsên kurdî û rewşenbîrên Silêmaniye yên dilsoz ew nav qebûl kîrin. Destkurtî, nebûna zengograf û xwestekên derxistina rojnameke nû, ku navê wê heta derecekê nêzekî Jîyan be, Salih Qeftan û Ehmed Şukrî mecbur kîrin ku herdu noqteyê ser típa “j” yê û noqteyek jî ji típa “r” yê yên li ser kîlîsheya kevin a *Jîyan* bikirînin û bikin *Ziban*<sup>(66)</sup>.

Zîban, rojnameke hefteyî û piraniya hejmarên wê şes rûpel bûn, her car 300 yan jî gelek zêde bûya 500 lib jê dihatin çapkîrin, ku 47 libên wê jê aboneyan re dihatin şandin. Rêvebirêن Zîban her carê libek jî ji Şêx Mehmûd re dişandin ku wê çaxê li başûr dest li ser bû, libek jî ji Tahir Behced Merîwanî re dişandin ku ew jî li Emeirkayê dijîya. Ji bilî vê, şes lib jî ji Edmons re dişandin ku ew ji Bexdayê bisîne Ewrupayê. Hêjayî gotinê ye Minorsky ku di destpêka salêن siyan hatiye Silêmaniye<sup>(67)</sup> yek ji wan kesan bû ku rojnameya Zîban û berî wê jî rojnameya Jîyan jê re dihat şandin.

Salih Qeftan, Ehmed Şukrî û Ehmedê ‘Ezîz Axa, ji hemûyan zêdetir nivîsên wan di Zîban de hatine belavkirin. Salih Qeftan, piraranîya gotarêن xwe bi gelempêrî ji dîrokê re û bi taybetî jî ji dîroka kurd re amade kiriye. Ji ber vê jî nojnameya Zîban di nav rewşenbîran de rojnameya dîrokê hatiye binav kîrin. Lî bi rastî jî li ser rûpe-

lên Zibanê bi xwe tu tiştek di vî warî de nehatiye nivîsandin ku ew rojnameke dîrokî ye. Li milê rastê yê Ziban tenê ev rêza han hatiye nivîsandin:

“Ziban, rojnameyekî kurdîye hemû yekşemmiwan derdeçê. Peyam: Silêmani. Beledîye. Ziban. Muherir: Salih Qeftan. Salyane bo naw şar 200 fils e bo derewe 350 fils e”. Hejmarêni Ziban yên wisan hene ku bi tu awayî ne bi giştî û ne jî bi taybetî xwe nêzîkî dîrokê nekitine<sup>(68)</sup>.

Hêjayî gotinê ye, Mecîd Ye'qub bi xwe reqîbê gotarêni Zibanê bûye, car caran tê nedaye ku gotarêni Salih Qeftan ên di derheqê dîrokê de bêni weşandin.

Bêguman berî hemû tiştî dîroka nava kovar û rojnameyên kurdî de ji şasî û kêmasiyan bêpar nînin. Nivîskarêni berî salêni şoan qîmeteke bi wî awayî rîbaza zanistî ya nivîsa dîrokê nedane. Yên wisan hene ku dîrok 'ecêb nîrxandine. N. A. di wê baweriyê de ye ku di her çerzekê de zordarek heye. N. A. di derheqê Hitler de bi vî awayî nivîsandiye: “Wisan dixuyê dinya bê Cengiz Xan û Teymûrleng nabe, ji ber vê ye ku Xwedê Hitler ji sedsala zoan te şand<sup>(69)</sup>.

Herçî rojnameya *Pêşkevîtin* e jî bi vî awayî çarenivisa gelê kurd tehlîl kiriye:

“Dema ku deng û behsê pêxemberiya Mihemmed -ruhê min sedeqeaya wî be- gîhist hemû milekî û xilxile xist nava dinyayê, wisan lê hat ku wê çaxê mezintirîn sultanê Turkistanê bixwaze xeleka koletiya wî serwerî têke guhêni xwe. Oxuz Xan, ku wê çaxê mezintirîn sultanê Turkistanê bû, mirovekî kurd ê navê wî Baxduz û ser û sîmayê wî nexweş şand xizmeta pêxember. Dema ku çavên pêxember bi wî dikeve ji ser û sîmayê wî aciz dibe. Eşîret û qebileya wî jê dipirse. Ew jî jê re dibêje: ez jî Ekrad im. Li ser vê ew hezret jî emir dike û dibêje, Xwedayê tebareken te'ala vê ta'yifeya han muwefeqê îttifaqê neke, hekene dê alem ji destê wan bikeve belayê. Edî ji wê rojê şûn de dewlet û selteneta mezin ji wan re hasil nebû”<sup>(70)</sup>.

Bêguman ev gotinêni han jî serî heta binî şas in. Li vir tenê ev bes e em bêjin: dînê İslâmê di sala 18yê koçî (639ê zayıñî) de, yanî piştî wefata pêxember û di dema fermanrewatiya Ormer de gîhist erdê Kurdistanê û piştî wê jî bi demeke dirêj gîhist Turkistanê.

Lê li gel vanî hemû kil û kêmasiyan jî rolâ rojnamegeriya kurdî di pêşdebirina lê-kolinêni dîroka kurdî de kêm nebûye. Vê jî heta derecekê tesîr li ser nesla diduyan a dîroknivîsêni me yên mezin kiriye. □

Kurmanciya wê: ‘ELİŞER

Ji kitîsa wî ya bi navê: Mêjû (Kurte Behseke Zanista Dîrokê, Kurd û Dîrok).

## **ÇAVKANI:**

- (1) Teksta orijinalê nivîsê wiha ye: "EZ zanim kurd ji tarîxa Kurdistanê tu tiştî nizanin loma ez ê her cerîda xwe de kurt biçek tarîxa Kurdistanê ew ya ecadadê 'ezîzan binifsim' (Kurdistan, hejmar: 8, 5 receb 1316, 18 teşrîna sanî 1314).
- (2) Roja 22yê kanûna paşî ya sala 1958an bi teksîr (ronî, stensîl) milekî bi kurdî û milekî din ji bi erebî hatiye çapkîrin.
- (3) Kurdistan, Mahabad, hejmar: 1, 6ê kanûna pêşî 1945, di rûpelên hindur de.
- (4) Binêre ew hejmare Kurdistanê ku Dr. Kemal Fuad bi zengografê belav kirine (Kurdistan, Yekemîn Rojnameya Kurdî 1898-1902. Bi berheykirin û pêşgotina Dr. Kemal Fuad, Bexdad 1972).
- (5) Organê Komeleya Hêvî ya Kurd bû, hejmara wê ya yekan di roja 6ê hezîrana sala 1913an de hatiye çapkîrin.
- (6) Bi temambûna Şerî Cihanê yê Yekem rewşenbirêñ kurd li Stenbolê dest bi weşandina yek ji wan kovara kurdî ya herî dewlemend Jin kîrin.
- (7) Jin, hejmar: 10, sibat 1335, r: 1-5.
- (8) Di vî warî de binêre: Dr. Kemal Mezher, Têgeyiştinî Rastî û Ciye Wê Di Rojnamegeriya Kurdî de, Bexdad 1978, r: 200-209.
- (9) Binêre: Têgeyiştinî Rastî, hej: 23, 8ê nîsan 1918.
- (10) Têgeyiştinî Rastî, eynî hejmar.
- (11) Bedîr-Xaniyan li Şamê kovara Hawarê weşandine û ew nêzîkî 11 salan jîyaye. Hejmara yekê roja 15yê gulana sala 1932an de hatiye çapkîrin.
- (12) Hawar, hejmar: 19, 17yê nîsana 1932an, r: 1-2. Hej: 23, 25ê tîrmeha 1932an, r: 1-2. Hejmar: 24, 1ê nîsana 1934an, r: 1-3.
- (13) Hawar, hej: 32, 1ê ilona 1941an, r: 4-7.
- (14) Di kovarê bi xwe de wiha nivîsandiye: "Klasîkên Me".
- (15) Hawar, hej: 59, 15yê oktobra 1942an, r: 3-4. Hej: 51, 15yê çîrya paşî 1942, r: 3-4.
- (16) Gelawêj, pişti Hawarê kovara kurdî ya herî bi temen e. Nêzîkî 10 salan jîyaye. Hejmara wê ya yekê di kanuna pêşî ya sala 1939an de li Bexdayê hatiye çapkîrin.
- (17) Em ê di dawiyê de her yek cihê bén ser behsa wan.
- (18) Gelawêj, hej: 6, hezîran 1945, r: 25-28.
- (19) Gelawêj, hej: 5-6, gulan û hezîran 1942. Ev hejmara Gelawêjê hemû li ser hev 96 rûpel e.
- (20) Orijinala gotara Minorsky a bi ingilîzî bi vî awayî ye: "Bulletin of the School of Oriental and African studies, London. Val. XI. Part I. 1943.
- (21) Binêre: Gelawêj, hej: 10, gulan-ilon 1944.
- (22) F. Millingen, wild life among the Koords, London, 1870.
- (23) Binêre: Gelawêj, hej: 5, gulan 1945, r: 66.
- (24) Beşa heftan a vê wergera han di hejmara Iran a sala 1945an de hatiye weşandin (r: 59-67).
- (25) C. J. Rich, Narrative of a Residence in Kurdistan. Vol. I-II. London, 1936.
- (26) Gelawêj, hej: 1-2, kanuna paşî û sibat 1942, r: 10-17.
- (27) Marmoste Naci 'Ebbas bi navê "Keçen Kurd" kitêba H. H. Hansen wergerandiye kurdî û di sala 1980an de hatiye çapkîrin û 204 rûpel e. Navê kitêbê yê ingilîzî wiha ye: H. H. Hansen, Daughters of Allah. Among Moslem Women in Kurdistan. London. 1960.
- (28) E. B. Soane, To Mesopotamia and Kurdistan in disguise, second edition. London, 1926.
- (29) Binêre: Gelawêj, hej: 9, ilon 1945, r: 41-49.

- (30) Binêre: Gelawêj, hej: 10, gulan-çirya pêşî sala 1946an.
- (31) Teksta vê gotarê ya bi ingilizî di kovara Geographical Magazine (kovara coxrafayê) de hatiye weşandin. (Binêre: Gelawêj, hej: 7, tîrmeha 1945an, r: 59-67. Hej: 8, tebaxa 1945an, r: 59-61. Hej: 10, çirya pêşî 1945, r: 1-11).
- (32) Gelawêj, hej: 5, gulan 1945, r: 1-8, 57-61. Hej: 8, tebax 1949, r: 23-28.
- (33) Ev gotar di sala 1944an de di kovara Komeleya Asya Brítanyayê de hatiye weşandin. (Binêre: Journal of the Royal Central Asian Association. London. 1944. September. pp. 313-314).
- (34) Yusif Melek, niviskarekî bi nav û deng ê astûrî ye, di berhemên xwe de û di wan rojnameyên ku di wextê xwe li Beyrûte bi erebî derdiketin, gelek zanyartiyêng girfing û durust di derheqê dîroka kurd de belav kirine. Bi kitêba xwe ya bi nav û deng "The British betrayal of the Assyrian", ku di sala 1936an li Emerikayê daye çapkîrin, pakteke zêde ji kurdan re kiriye û bi belge daye isbatkirin ku destê kurdan di kustina asuriyan de tunebuye. Berhemeke wî ya bi navê "Kurdistan Ew Belad El-Ekrad, Beyrût, 1945" hatiye çapkîrin heye.
- (35) Binêre: Gelawêj, hej: 4, nîsan 1945, r: 21-25.
- (36) A. H. Hourani, Minorities in the Arab World. Lonrdon. 1947.
- (37) Gelawêj, hej: 1, kanuna paşî 1948, r: 41-48. Hej: 2, sibat 1948, r: 1-7. Hej: 3, adar 1948, r: 5-29.
- (38) Gelawêj, hej: 7, tîrmeh 1943, r: 47-52.
- (39) Binêre: Gelawêj, hej: 12, kanuna pêşî 1944, r: 1-10.
- (40) Binêre: Gelawêj, hej: 2, sibat 1944, r: 15-19.
- (41) Di sala 1936an de ji dayîka xwe bûye (Binêre: Gelawêj, hej: 3, adar 1944, r: 1-4).
- (42) Binêre: Gelawêj, hej: 8, tebax 1945, r: 41-47.
- (43) Ronahî, Şam, hej: 16, tîrmeh 1943 heta hejmara 28an a adara sala 1945an. Ronahî bi alfabeşa latînî dihat weşandin.
- (44) Binêre: Ronahî, hej: 19, 1ê çirya pêşî 1943, r: 13-16. Hej: 20, 1ê çirya paşî 1943, r: 16. Hej: 21, 1ê kanuna pêşî 1943, r: 15.
- (45) Di derheqê Seyfi Qazî de binêre: Seyîd Mihemedî Hemîdî, Zanayên Kurd. Şairê millî yê bi nav û deng Hezretê Ebu'l-Hesnê Seyfi Qazî, Kurdistan, Mahabad, hej: 4, banewer (gulan) 1946, r: 1-2.
- (46) Niştiman, Mahabad-Tebrîz, hej: 7-9, xakelêwe-cozerdan 1323, r: 6-7.
- (47) Niştiman, eyñî hejmar, r: 31.
- (48) Niştiman, eyñî hejmar, r: 4-6.
- (49) Helale, ev gotara han bi vî navî weşandiye: "Komel û Ehzabêن Sîyâsi Yêndî De Rabirdo da, Basêki Mêjûyl". Helale, Bûkan, hej: 1, reşemeya 1324an, r: 14-15.
- (50) Xwedî û berpirsiyâre Rojî Nwe, parêzer Cemalê Haci Feqîyê Şalî û desteya niviskarêne Kameran (sernişîkar) û Miherrem Mihemed Emîn, Ihsan 'Ebdulkérîm, Kerîm Zend û 'Ebdullah Reza - Ejder bûn. Rojî Nwe kovareke mehanî bû, hemû bi ser hev sal û nîvî jiya û 18 hejmarêne wê derketin (ji adara 1960an heta ilona 1961an).
- (51) Rojî Nwe, hej: 7, çirya pêşî 1960. Di vê hejmarê de hemû bi ser hev 13 gotarêne serekî hene.
- (52) Mebest ew daxwazêne ku Şêx Mehmûd di sala 1930an de, piştî serhildana 6ê ilona reş pêşkeş kîrin.
- (53) Belavokeke ingilizên dagîrker e ku di roja 2yê gulana sala 1923an de bi ser rûniştiyêne Silêmaniye de belav kirin. Ev belavoka han tişî êris û tehdid in.
- (54) Rojî Nwe, hej: 10, kanuna paşî 1960.

- (55) Sisiyên wê di derheqê dîroka kurdan de ne: "Yadaştî Komeleyî J. K.", "Ehemîyyetî Mêjûwî Komarî Kurdistan" û "Silêmanî Di Sala 1820an de".
- (56) Rojî Nwe, hej: 6, ilon 1960, r: 42-54.
- (57) Rojî Nwe, hej: 8, çîrya paşî 1960, r: 21-28.
- (58) Rojî Nwe, hej: 10, adar 1961, r: 30-34.
- (59) Beşa yekan: Rojî Nwe, hej: 3, hezîran 1961, r: 90-98.  
 Beşa diduyan: hej: 4, tûrmeh 1961, r: 1-7.  
 Beşa sisîyan: hej: 5, tebax 1961, r: 18-28.
- (60) Binêre: Kurdistan, hej: 15, 12yê muherrem 1317, 22yê nisan 1315.
- (61) Ev gorata han ji pênc beşan pêk hatiye û di hejmaraên 23, 24, 25, 26 û 28ê Ronahiyê de hatiye weşandin.
- (62) Binêre: Gelawêj, hej: 6, hezîran 1949, r: 1-8, 57-61. Hej: 7, tûrmeh 1949, r: 1-12. Hej: 8, tebax 1949, r: 1-15.
- (63) Girûgali Mindalanî Kurd, Mahabad, hej: 3, tê pûşberî 1325, rûpela berga yekê.
- (64) Beşa piraniya ew zanyariyên di vir de behsa wan hatine kirin, mîn ji birayê Nurî Kake Heme, Kerim Zend, Ehmed Şukrî (Dr. Şo) û Mihemmed Emin Se'îd Rebanî wergirtine. Mamoste Kerim Zend ji bo berhevkirîna van zanyariyan geleki aîskariya mîn kir. Ji tevan re sipas.
- (65) Ehmed Şukrî, tenê hejmaraen Ziban çap dikirin û nivîsen xwe jî tê de diweşandin.
- (66) Wisan dixuyê her ji ber vê jî navê rojnameyê "Ziban" bû ne "Ziman", ku bi vî awayî gotin li navçeya Silêmaniyê tê dîtin.
- (67) Wisan dixuyê Minorsky li derûdora sala 1930an ji bo bîranîna nehsed saliya koça dawiyê ya şairê mezin Ebû'l-Rasim Fîrdewstî di riya Iraqê re çûye Iranê yan ji wir bi ser Iraqê re vege riyaye. Li Bexdayê bi mamoste Tewfîq Wehbî re serî li Çapxaneya Merîwanî daye, li Silêmaniyê jî bi Piremîrd re çûye Çapxaneya Şarewanî ya bingehê rojnameya Jîyan.
- (68) Wekî nimûne binêre: Ziban, Silêmanî, hej: 9, 14yê çîrya paşî 1937. Naveroka vê hejmara han bizzebit bi navê rojnameyê re li hev dike, ji ber ku gotareke mezin bi navê "Çawan Binivîsin" weşandîye.
- (69) Binêre: Gelawêj, hej: 5 gulan 1943, r: 7.
- (70) Peşkewtin, Silêmanî, 7ê çîrya pêşî 1920.

# **ROJNAMEYA "KURDISTAN" Û SED SALIYA WÊ**

**ROJAN HAZIM**

**A**xa bi xêr û bereket: Mezopotamya û Kurdistan. Lahndika pêşketinên mezine dîrokî. Der û pencereya medenîyetê. Warê xelkên jîr û têkoşer. Heke dîrok bi "nîvîs" ê destpêdike, hingê jî warê destpêka dîrokê! "Nîvîs" kê peyda kir? Ma Semiriyêni vî warî nebûn ku ev xizmeta herî bihadar diyarî mirovahîyê kirin. Tişte ku şoreşa mezin pêkanî di dîroka mirovahîyê da, "nîvîs" bû ku ew jî ji vî warî derket. Belêm mixabin ku ev ware, bi destê dijminên medenîyet û pêşketinan, bû gora gelek xelkan ku yêk ji wan jî Semirî bûn. Ev coxrafyaya zengîn û bi xêr û bêr, kamên gelek xwunmêja rakirin di dîrokê da û ev balkêşîya nemirovî evro jî dom dike. Dijminên medenîyet û pêşketinan, evro jî dixwazin vî warê bijûn û gîyandar bikin gorâ xelkên mayî jî.

Mezopotamya duhî parçeyekî delal û xemlin yê Kurdistanê bû û evro jî her wisa ye. Kurdistan û xelkên li Kurdistanê, evro mîratxwerên vê axê û vî warîne. Evro tête xwastin ku ev xelkên mayî jî bêne birandin û ev coxrafyaya şîrin û sipehî bibe seyrangeha xwunmêj û talankerên xelkan. Belêm hem xelkê Kurd û hem jî hemû xelkên mayî yên Kurdistanê bi berxwedanên destanî, ev xiyalâ talan û dagîrkera di gewriya wan da hêlaye û xwe ji birandinê parastine. Ev macegraya xwe parastinê, dîrok nîvîsiye û heta evro hatîye û dê bi serketinên nû ve heta hetayê jî dom bike. Li ser vê xîça berxwedan û têkoşerîyê, destanên mezin hatine nîvîsin û ev kare hêj jî didome. Xelkê Kurd û xelkên dî yên Mezopotamya û Kurdistanê, bi her awayê xebat û têkoşînê û bi rikeberîyeke nedîti, plan û

entrîkayêni talankerêni xelkan têkbirine û di vê prosesa ket û rabê da berxwedanê bijare û pêşketî dane destpêkirin...

### Maceraya “nivîs”ê

“Nivîs” berî Isa di navbeyna salên 3200 û 3000an da li welatê Semirîya li Mezopotamîyaya rengîn peyda bû û êdî maceraya “nivîs”ê dest pê kir. Pêşiyê li ser bereferşa bi kar hat. Belêm jîyan nesekinî, bi pêş ket. Digel pêşketina jîyana mirovahîyê, “nivîs” jî bi pêş ket û reng guhart; car li ser çerm, car li ser “papîrus” û paşê jî li ser kaxezê bû nexş û motifên bîr û ramana mirovahîyê. Bîr û ramana mirovahîyê “nivîs” afîrand û paşê jî her ew “nivîs” bû amûretê herî bihadar jibo pêşketina bîr û ramana mirovahîyê. “Nivîs” bû çîrîskeke nû û geş ya ronahîya mirovahîyê. Mirovahîyê “nivîs”, “nivîs”ê jî mirovahî ron kir û bi pêş êxist. Xewn û xîyala mirovahîyê, xem û şîna mirovahîyê û ken û şahîya mirovahîyê, digel “nivîs”ê bi tameke xweştir bû stran, bû çîrok, bû destan, bû helbest, bû roman û bû dîrok. Mirovahîyê xweştir û hêviya xwe bi “nivîs”ê kire ronahîya paşeroja xwe. Maceraya “nivîs”ê dom kir, ne rawesta, her roj xwe pêşve bir, xwe nû ve kir û hawara mirovahîyê gîhande sibehîya mitovahîyê. Ev prosese adeta dansa mirovahîyê ya digel “nivîs”ê bû û ev proses û danse, dê digel jîyana mirovahîyê heta hetayê jî dom bike.

Xelkê Kurd jî wekî endamekî birûmet yê malbata mirovahîyê, li goreyî hêz û pêşketina xwe, cihê xwe di vê maceraya pêşketina mezin ya “nivîs”ê da girt. Xelkê Kurd bi her reng “nivîs”ê xwe da zanîn; xem û kula xwe, şîn û girîya xwe, ken û şahîya xwe bi “nivîs”ê da der û bi her reng “nivîs”ê kire hawar! Xezîneya “nivîs”ê ya mirovahîyê, bi her reng “nivîs”ên xwe ve zengîn kir. Xelkê Kurd jî wekî xelkên dî, “nivîs” bo xwe kire amûretekî xurt yê ronahîyê!

“Nivîs”; di prosesa jîyanê da, kar û xebateke bijare û pîroz, projektor û şahida herî mezin ya dîrokê ye. Jîyan çawa têkoşîneke mezin û dijwar be, “nivîs” jî yêk jî amuretên bingehîn yê vê têkoşînê ye... Jîyan û dîroka xelkê Kurd jî bêyî navbir bi xebat û têkoşînê rengareng ve tişî ye. Yêk jî van xebat û têkoşînê bijare û berxwedanîya ronakbîrî jî, di dîroka xelkê Kurd da weşandina rojnameya KURDISTANê ye. Xêr û bereketa vî warî, gîyandayîna xwe ya dîrokî û domdar, digel hemû zor û dijwarîyan, xwun û heyecaneke nû û taze ji mirovîn ku bi bereketa vî warî gihiştî, kêm nekir û ew ilhamîa xwezayî, da mirovîn dilpak û parêzerên vê axê û vî warî. Mîratxwerên vê dîroka berxwedaner û têkoşer, wekî dîsa bi karekî nû yê “nivîs”ê rabûy, hizaran sal ji ser peydakirina “nivîs” a pêşiyê û sedan sal jî ji ser nivîsîna destana Mem û Zînê ya Ehmedê Xanîyî borî bû. Ü

"nivîs" wekî gelek caran, vê carê jî piştî Îsa li sala 1898ê, ji alîyê mirovên xelkê vê axê û vî warî, bi rengekî dî, belêm mixabin ku li cihêن dûrî wê axê, anku di jî yana koçerîyê da, li ser rûpelên rojnameyekê bi kar hat ku bibe ronahîyek jîbo wî xelkî, ku wekî ew xelkê ku pêşiyê "nivîs" peyda kirî neyête birandin û helandin û herweha di nav rûpelên dîrokê da neyête pûçkirin. Çi macerayeke mezin e: Destpêka weşandina rojnameya KURDISTANê xelekeke zêrîn ya vê macera-ya mezin e. Rojnameya KURDISTANê yêk ji hawarêن nivîskî yên neteweyê Kurd ya berî sed sala ye... Dem 22ê Nîsana 1898ê; hejmara pêşîn ya rojnameya KURDISTANê derdikeve... Ew roj yêk û evro du, ji ser destpêka weşana wê, sed sal derbaz bûn. Ne sanahî ye; sed sal! Baş e, ev sed sale wekî bayê birûskê borîne an ne? Gelo piştî sed sala, rewşa rojnamegeriya Kurdî evro çawan e? Em dê li jêr bi kurtî li ser van pirsa rawestin...

### **Portreya rojnameyê**

Navê rojnameyê: KURDISTAN

Destpêka weşanê: 22 Nîsana 1898, roja pêncsembê

Cih: Kahîre, serbajêrê Misirê / Cenewre, bajêrê Swîsê / London, serbajêrê Ingilistanê - Folkstone, bajêrekî Ingilistanê

Çap: Çapxaneya El-Hîlal, Kahîre / Çapxaneya Komela Hevgirtin û Qencîya Musulmana,

Cenewre / Çapxaneya Cerîdeya Kurdistan, Kahîre / Çapxaneya Hindîyê, Kahîre

Hejmar: 31 hejmar weşîyane

Dem: Ji 22ê Nîsana 1898ê heta 14ê Nîsana 1902ê

Peryod: Rojnameya 15 rojî (Ev peryode wekî xwe nemaye, têkçûye û rojname carina heyyê, carina jî çend heyya carekê derketîye.)

Form: Rojname ji çar rûpelan pêkhatîye. Herçend ew bi form û peryoda xwe ve ne rojnameya standart jî be, belêm ew bi dil û niyeta rojnameyê hatîye weşandin û wisa hatîye binavkirin.

Alfabeye: Alfabe: Alfabe kevin (tipên erebî - farisî) bi kar hatîye.

Ziman: Kurdî û tirkîya osmanî ye (giranî kurdî ye).

Xwudan û berpirsiyar: Mîkdad Mîdhat Bedir Xan (Ji hejmara 1ê heta ya 5ê) / Evdirehman Bedir Xan (Ji hejmara 6ê heta ya 31ê)

Rengê politîkaya wê: Welat û netewe perweî

Armanca rojnameyê: Mexsed û armanca rojnameyê di bin logoya rojnameyê

da bi kurtî hatîye

danîn: Teşwîk kirina xwandin, nivîsin û hûkirina Kurda. Û herweha ragihan-dina rewşa tête jîyan û edebîyatê... Ev armance, di hejmara yêkê û duyê da û hetta di her hejmarê da hatîye vekirin û ravekirin. Mîkdad Mîdhat Bedir Xan armanca rojnameyê wisa formule kirîye: "Bi izna Xwedê teala paş nuho, her pazde roja de carekê ez'ê cerîdekê binivîsim. Navê vê min kirîye "Kurdistan". Vê cerîdeyê de ez'ê behsa qencîya ilm û marîfeta bikim; li kuderê mirov dileime, li kuderê medrese û mektebê qenc hene ez'ê nîşa Kurda bikim (me binê wê xîç kir, RH)... Heta nuho kesê cerîdekê holê nenivîsîye. Ev cerîdeya min a ha, ya ewwulî ye. Loma wê gelek kêmâyî hebitin. Ez hêvî dikim kêmâyî-ya cerîdeyê ji min re binivîsin..." (Ji nivîsara Mîkdad Mîdhat Bedir Xan: Kurdistan, hî. 1, r. 4 - Berg I, r. 112)

"Cerîdeya ewwulî de min piçekê behsa qencîya ilm û marîfetê kiribî. Ez vê cerîdeyê sebê wê dînîvisim, da ez Kurda bieliminim xwendinê, da Kurd bîza-nîn feyda xwendinê ci qas gelek e..." (me binê wê xîç kir, RH)... (Kurdistan, hî. 2, r. 2 - Berg I, r. 122)

Di vê portreyê da hema bêjin çu tiştên nexuya nîn in. Her tişt xuya ye. Xîç û tengêng portreyê ne begem in. Portre hindî hûn bêjin ton, zelal û bîriqî ye. Di serî da identîtêta rojnameyê hatîye kivşîrin û di çarçoveyeke bihadar da hatîye bicihki-rin. Ci ye ev îdentîtêt? Ev îdentîtête Kurd û Kurdistanîti ye! Binê vê xalê bi rengekî tîr hatîye xîçîrin. Eve girîng e û xaleke bingehîn e. Detayên vê xalê ji di nav rûpe-lên rojnameyê da hatine aşkerakirin. Berjewendîyên neteweyê Kurd û welatê wan Kurdistanê hatine parastin. Bi kêm û kasî ji be, ji biratî û dostayetîya xelkên li Kurdistanê ji hatîye behskirin û eve wekî bawerîyekê hatîye parastin. Bo nimune; gelek cara ji dostayetîya Kurd û Ermenîyan hatîye behskirin û şîret li xelkê Kurd hatîye kirin ku dijî xelkê Ermenî li milê dewleta Osmaniyya cih negirin û dijminî û neyar-tîya xelkê Ermenî nekin û hetta destê xwe bidine yêk û li dijî dewleta Osmaniyya tê-koşînê bikin. Li milê dî; ji alîyê politîk ve di serî da nerim, bere bere ji şithaytir li hemberê rejima Osmaniyya helwest hatîye danan. Birayê Bedir Xanîya bi weşana vê rojnameyê, kêm anjî zêde helwesta xwe li ser zemînê hevrikîyê danane û ev rike-berîya xwe ya dijî rejima Osmaniyya domandine. Anku weşandina rojnameya Kurdistanê xelekek ji wê berxwedan û têkoşîna neteweyê Kurd ya di pêşengîya Mîr Be-dir Xan da li dijî rejima dagîrkere Osmaniyan e...

Li vê derê em naxwazin li ser polîtîka û mesajên rojnameyê bi firehî rawestin ku, ka kîjan li goreyî me rast anjî şas in. Ji ber ku ev rojnameye ji alîyê kesekî

anjî kesên wisa ve hatîye weşandin, ku ji binemaleke xan û mîr hatine û ew bi xwe jî xan û mîr bûne û hergav jî xwe wisa bi nav kirine. Di çarçoveya vê nîvîsarê da em analîza politîk nakin ku xwudan û nivîskarên vê rojnameyê bikine qalibekî ideolojîk da. Helbet tercîheke wan jî hebû û nihayet ew jî mîr û xan bûn. Hemû hawar û bangê xwe di serî da dane mîr û axayan. Belêm tiştekî aşkeraye ku birayê Bedir Xanî, digel van mesajên xwe, gazî xelkê sade jî kirine û ji wan wekî “Kurmanceno!” behs kirîye. Li wê demê di nav sîstema eşîrî ya civata Kurda da, mîr, xan û axayê Kurda bo xelkê sade “Kurmanc” digotin. Ev binavkirine di tesnîfkirina hîyerarşîya mîr û axatîyê da ye wisa bû. Dîsa li milê dî bangî “Ulema” anku zanayê Kurda jî kirine. Anku birayê Bedir Xanîya gazî hemû neteweyê Kurdistanê kirine û li ber çavên wan, di serê pîramîda neteweyê Kurdistanê da helbet mîr, xan û axa hebûn. Wekî me di serî da jî gotî, ew bi xwe jî ji wê çînê dihatin ku ew çîn wê demê li Kurdistanê di nav civatê da çîna serdest bû. Belêm digel hindê jî wan di van hawar, bang û gazîyên xwe da navika mesajên xwe kiribû “Kurd û Kurdistan”. Vê çendê welat û netewe perwerîya wan nîşan dida. Anku, digel ku wan hawar û bangê xwe di serî da digihandin mîr û axayê Kurdistanê, belêm herwisa ew bang û gazî li “Ulema” û “Kurmanc” ên Kurdistanê jî dikirin. Carina jî bi gotina “Geli Kurdno!” bangî hemû bask û çînêneteweyê Kurd dikirin... Helbet eve bi serê xwe politîkayek bû. Belêm vê politîkaya wan, bi hemû çîn û baskên xwe ve xizmeta neteweyê Kurdistanê dikir. Yêkser çu bang û hawar negihandine xelkê sade yê Kurdistanê. Eve tercîheke helbet. Belêm herweha jî çu cara dijî xelkê reben û sade jî helwest nehilgirtine, hetta tagirîya wan kirîye ku hişyar bin, bixwunin, biçin dibistana û xwe zana û têgihişî bikin... Hergav gazî mîr û axa kirine ku li xelkê xwe hişyar bin, dibistana vekin û biçûkên wan bidin xwandin. Dîsa bangî “ulema” anku zanayê Kurda jî kirine ku bo çi zorê nadine xan û axayê Kurda ku dibistana vekin ku xelk xwanda û zana be...

Herweha daku his û bîr û bawerîya neteweyî bilind bikin, şahesera edebî ya Kurdi, destana Mem û Zînê ya Ehmedê Xanîyi jî di hejmarê Kurdistanê da weşandine.

Ev çende, tiştekê derdêxe meydanê ku birayê Bedir Xanîya di vê xizmeta weşangerîyê da, welat û netewe perwerîtyeke durust û jî dil kirine. Ev gotina “perwerî” yê jî gelekî girîng e. Wan neteweperestî nekirine û xwe neêxistine dava tengbînîya neteweperestiyê. Lewma wan bi rastî neteweperwerî kirine û ew neteweperwer û welatperwerên pak û durust bûne... Ji bo van nêrînên wan bi de-

han "hevok" hene di nav nivîsarên wan da. Lê ji ber ku me nîyet nîn e, di çarçoveya vê nivîsarê da li ser rojnameyê analîzeke kûr û firehe ideolojîk û politîk bikin, lewma em vê babetê dirêj nakin...

### Hewcetiya rojnameyê

Birayêñ Bedir Xanî ji binemaleke serhildar û têkoşer dihatin. Ew bi vê kulturê û bi van agahdarî û zanîna mezin bibûn. Şikestina berxwedana babê wan Mîr Bedir Xan û mirina wî ya bi kul û kesera Kurdistanê li Şamê, ew jî dilsotî kiribûn. Ew bi xwe jî dilsotî û sundxwarîyê vê rîya xebat û têkoşîna Kurdistanê bûn. Piştî mirina babê xwe, ew kul û xema wan zêdetir bibû. Belêm di nav xelkê xwe da werarêñ bêhêvîtîyê jî didîtin. Wan ev yêke hêjayî dîroka berxwedanîya xelkê xwe nedidîtin. Wan nedixwast ku hewayê bêhêvî û teslimiyetê belav bibe di nav Kurdistanê da.

Dixwastin ku bizavek bête kirin ku xelk xwe ji bîr ve neke, xwe sist neke ku his û bîra neteweyî berze bibe. Ew çirayê ku têkoşerên doza Kurdistanê vêxistî, babê wan jî germ û gur kiribû. Dilê wan nedigirt ku ew agir vernire. Wan dizanî ku vemirîna wî agirî, mirina neteweyekê ye. Lewma jî piştî mirina babê xwe sih sala dest bi kar bûn û ew agirê ku hêdî hêdî melul û lawaz bûyî, xwastin disa gur û geş bikin. Şertên ew têda dest nedida ku gaveke politîk û leşkerî ya bi rexistinî bavêjin.

Di nav wan şertên teng û dijwar da tinê dikarin karekî weşangerîyê bikin û bi xelkê xwe bidin zanîn ku gîyanê têkoşerîya doza Kurdistanê nemirîye, sax e û hêj jî hêz têda maye ku xwe amadeyî têkoşîneke domdirêj bike. Van şertên dijwar ew dane zorê ku bi karê weşandina rojnameyekê rabin û hem wê xîça têkoşerîya bab û bapîrêñ xwe bidomînin, hem jî xwuneke taze ya serhildar û berxwedaner derzîyî xwuna xelkê xwe bikin ku hêviya jîyanê bidin û wan ber bi armanca mezin, anku Kurdistaneneke serbixwe ve, serwext û zana bikin. Maceraya destpêka rojnameya Kurdistanê li ser vî bingehê saxlem yê têkoşerîya neteweyê Kurd ava bûye. Şert û daxwazên neteweyê Kurd ew daye afirandin. Rojnameyê jî her ji destpêkê hera hejmara dumahîkê, digel hemû zor û dijwarîyê rewşa ku têda diweşîya, xelkê Kurd bi bîr û hiseke neteweyî agahdar kir, hêvî dayê û ber bi zanabûn û têkoşerîyê ve palda û zêrand. Birayêñ Bedir Xanî, di serî da şerê dijminê navîn kirin. Wan dizanî ku dijminê navîn yê sereke, nezanî û nexwandyayî ye. Wan didît ku nezanî û nexandayî jîyanâ xelkê Kurd tarî kiriye û ew tarîtî xelkê Kurd bêhêz dike; belêm li milê dî ew tarîtî hêzê dide dijminê derive yê

dagîrker ku bi vê nezanî û nehişyarîya xelkê Kurd, Kurdistanê di destê xwe da digire.

Birayêñ Bedir Xanî di kiryarên jîyanê da dîtin ku ci hatibe serê Kurda ji nexwandayî û ji nezanînê hatîye serê wan. Lewma jî wan xwast ku bi vê çeka giran, bi qelem û nivîsinê, bi rîya rojnameyê destnîşanîya vê pirsa mezin û giran bikin. Mîkdad Mîdhat Bedir Xan her di nivîsara xwe ya serî da wisa digot: "Gelî Kurdno! ... xelk hemî dizanin ku Kurd xweyhîmmet in, Kurd camêr in, cesûr in, xwîna xwe li ser wetenê xwe dirîjînin. Lî heyfa min têt ne xwenda û dewle-mend in, bêmarîfet in." (Kurdistan, hj. 2, r. 3 - Berg I, r. 123)

Dîsa jibo ku xwandevana li ser dîrokê agahdar bike wisa digot: "... paş nuho ez'ê behsa tarîxa Kurda jî bikim; esl û neslê wan ji ku ye, nîv wan de ci mîrovêñ xwenda, xweynav û deng hatine, ezê hemî binivîsim." (Kurdistan, hj. 2, r. 3 - Berg I, r. 123)

Birayêñ Bedir Xanî bi van bîr û bawerîyan dest bi weşandina rojnameyê kirin ku di wan şertan da weşandina rojnameyekê karekî gelek hewce bû.

### **Sed sal û sih û yék hejmar**

22ê Nîsana 1998ê dibe roja pîrozkirina sed salîya rojnameya KURDISTANê. Ji vê rojê berî sed sala, anku 22ê Nîsana 1898ê, cara pêşîn rojnameyek hem bi navê "KURDISTAN" hem jî bi giranî bi zimanê Kurdî derketîye. Eve helbet gelek girîng e. Ji ber vê girîngiyê ye ku li Kurdistanê ev roje wekî roja "Rojnamegerîya Kurdi" tête pîrozkirin. 22ê Nîsana 1898ê adeta destpêka salnameya rojnamegerîya Kurdi ye jî, anku ew roj bûye "mîlad" jibo rojnamegerîya Kurdi: Berî wê rojê û piştî wê rojê... Xwezî ev sed salîya rojnameyê, pîrozîya bi kêmâsi sed hejmarîya rojnameyê jî ba. Belêm mixabin ku tinê 31 hejmar hatine weşandin û ew 31 hejmar jî di midehê çar salan da û bi peryodê newekhev weşyane. Ji van 31 hejmar a jî tinê 26 hejmar mane bo evro. Pênc hejmar berze bûne. Hejmarên 10, 12, 17, 18 û 19 peyda nabin. Eve jî bi serê xwe cihê xem û daxê ye. Belêm li milê dî, gîhiştina 26 hejmaran bo evro jî bi serê xwe bûyerek e, cihê şahîyê ye. Gerçî ev bûyere ji alîyê parastina hebûnên xwe yên neteweyî ve, perşanîya me Kurda jî nîşan dide. Belêm wekî em berê xwe bidin hind hebûnên xwe yên dî, ku çawa berze dibin, anjî bi destê dijmin têne berzekirin, berzebûna şes hejmarên rojnameya Kurdistanê gelek "biçûk" dîmîne! Digel hindê jî ev çende ne "mazeret" e û beramberî hebûnên neteweyî bêberpirsiyarîya me Kurda nîşan dide... Her tişti milekê, hema di warê weşangerîye da arşîvkirina berên weşana bi serê xwe ka-

rekî girîng e û berpirsiyarîyeke mezin dixwaze, ku hem bo nîşen paşeroja xelkê me, hem jî bo mirovahîya cîhanê divê bi hewcetîyeke bingehîn ev berên weşana bêne arşîvkirin. Mirov nikare vandalîzma dijmin bike mazeret. Ji xwe karê dijmin vandalî ye, talan û wêran kirine. Divê hem mirovên ku bi karên bihadar ve radibin, hem jî xwandevan û hetta hemû xelkê me, tedbîrên parastina berên wan karan jî bistînîn ku nîşen paşerojê ji wan germahîyekê wergirin... Axir, dijgel mixabînîya berzehîya şes hejmarê rojnameya KURDISTANê, dîsa em gelekk şâ ne ku ji wan 31 hejmaran, 26 hejmar gihiştine evro û destê me.

### Birayêñ Bedir Xanî

Wekî mirov behsê rojname anjî bi giştî weşangerîya Kurdî dike, di serî da na-vêñ birayêñ Bedir Xanî têne pêş. Eve gelek tiştekî xwezayî ye. Du cot birayêñ Bedir Xanî yên ji binemala Bedir Xan Begê Botî, di danîn û destpêkirina rojname û weşangerîya Kurdî da navêñ sereke û bijare ne. Damezranerên rojnamegerîya klasîk jî, ya modern jî ev her du cot birayêñ Bedir Xanî ne. Rojnameya "Kurdistan"ê her du bira; Mîkdad Mîdhât Bedir Xan û Evdirehman Bedir Xan danîn û weşandin, ku eve hem destpêka rojnamegerîya bi giştî, hem ji ya klasîke Kurdî ye. Li milê dî, damezranerên rojnamegerî û weşangerîya modern ya Kurdî jî du birayêñ Bedir Xanî, neviyêñ Mîr Bedir Xan Begê Botî; Celadet û Kamiran Bedir Xan in. Eve ne tesaduf e. Her du cot birayêñ Bedir Xanî, hem ji binemaleke serhîdar, hem jî bi zanînêñ kîrhatî ve di standardê bilind yên xwandinê da gihiştibûn. Wan timamî jîyana xwe bi evîn, xewn û xiyalêñ Kurdistaneke serbixwe ve borandibûn. Lewma wan rojnamegerî û weşangerî bo van armanc û xweziyêñ xwe kirine amuretekî xurt. Wan ev karê rojname û weşangerîye çu cara bo xwastek û armancêñ xwe yên kesînî û malekînî bi kar neînan, belêm ev amuretên xurt, bo ragihandin û têgihandina pîrsa neteweyê Kurd û welatê wan Kurdistanê bi kar ïnan û ev amurete, hem bo hişarkirina neteweyê Kurd, hem jî bo ragihandina mesajên neteweyê Kurd, jîbo bîr û rehîya giştî ya cîhanê bi kar ïnan. Rojnameya Kurdistanê û paşê jî kovarêñ Hawar, Ronahî û Stêrê di pratîkê da temsîla van bîr û bawerîyêñ wan yên ji dil û paqîj yên di der-heqa welatê wan Kurdistanê û neteweyê Kurd da dikirin. Wan bi van amuretên xurt hem şerê dijmin û neyarêñ dagîrker dikirin, belêm li milê dî jî şerê nezanî û tarîtiya di warê xwandin û nivîsinê ya civata Kurda da dikirin û bi taybetî hawar û bang li xelkê xwe dikirin ku bixwunin, zarokêñ xwe bidin xwandin, xwe bi çeka xwandin û zanînê ve biçek bikin û hem welatê xwe, hem jî jîyana xwe ji

tarîtiyê rizgar bikin û bigihin ronahîyê... Ew bi van kar û bizavan rabûn û heta dumahîka jîyana xwe jî jibo van armancêna paqîj û mirovî xebitîn, xwe westandin, xwe êşandin, belêm çu cara gazinde ji vê xebat û westanê nekirin. Ev her du cot birayên Bedir Xanî bi van kîryarêna xwe yên birumet û bîhadar, divê bêne sengandin û bêne bîr û herweha navêna wan di dîroka rojnamegerî û weşangerîya Kurdî da bi tîpêna zêrîn bêne nivîsin...

### **Sed sal çawa borîn**

Ji ser destpêka weşana rojnameya KURDISTANê sed sal borîn. Ev sed sale wekî bayê biruskê neborîn. Wekî me di serî da jî gotî ev sed sale bi sanahî neborîne. Ev sed sale bûne xem, kul û keser, bûne wêranîya welat, bûne têkbirin û helandina ziman û kultura neteweyê me, bûne birandina xelkê me... Belêm li milê dî jî ev sed sale bi timamî û ji her alî ve, bi têkoşîneke tîr û tijî borîne li hemberî dijminen hov û har yên Kurdistanê, ku ew berxwedan û têkoşîn evroke gihiştîye gazeke bilind û li hemberî dijmin çeperên saxlem bi dest ve ïnane... Em têkoşînen ji aliyê politîk û leşkerî ve hatine kirin danin aliyekê, tinê berxwedan û têkoşîna di warê weşangerîyê da hatîye kirin bi serê xwe macerayeke mezin e. Ew çîrîska birayên Bedir Xanîya vêxistî bi weşana rojnameya KURDISTANê, bi destê têkoşerên piştî wan, ji ber hemû erişen dijmin ve hatîye parastin, tê nehatîye dan ku bête temirandin. Ew çîrîsk, herwekî têkoşîna xelkê me ya li dijî erişen dijmin bi nişîv û evrazîya ketîye, car lawaz maye, carina jî geş bûye, belêm çu cara ne temirîye...

Di midehê van sed salan da bi dehan rojname, kovar û pirtûk hatin weşandin. Belêm bi taybetî li Kurdistanâ Bakûr, ew serpêhatinên berî sed sala bi serê rojnameya Kurdistanê hatî, bi serê hemû weşanên Kurdî hatin: Hemû, ca an li nav welat di şertên illegal da, anjî li derveyî welat di rewşa koçerî û penaberîyê da weşîyan. Kêm zêde ew dijwarîyên bi serê rojnameya Kurdistanê hatî, bi serê hemû weşanên Kurdî hatin û ev rewşe evro jî dom dike...

Bi kurtî ev sed sale bi ketin û rabûna, bi şikestin û serketina, bi her awayê xebat û têkoşînan borîn û heta evro hatin. Di nav van sed salan da xelkê me carina nêzîki tixubê bêhêvîyê bû, xwe vekêşa serêk, melul û belengaz bû, belêm çu cara sitûyê xwe xwahr nekir, xwe li ber dijmin ne çemand, bi her awayî rikeberîya xwe parast û domand, ku evro êdî gihiştîye gazeke wisa bilind ku ev gaze, çeperê herî saxlem yê têkoşînê ye û ev çeperê nû, ewlehî û avnehîya şoreşa Kurdistanê ye...

## Mesaja rojnameyê

Wekî her rojname, kovar anjî bi giştî weşanê, rojnameya Kurdistanê jî arman-cek hebû û bo wê armancê plan û program danîbû. Di navika mesajên rojnameyê da, xala herî girîng agahdarkirin, hişyarkirin û gazîya hûbûna xwandin û nivîsîna neteweyê Kurd e. Birayêñ Bedir Xanî, di her nivîsarên xwe da, xem û kesera xwe ya nexwandayîya neteweyê xwe nîşadane. Wan ev yêke bi kul û ke-ser, belêm herweha bi awayê gazindeyî gotine û eve wekî êş û janeke giran bi nav kirine. Wan ev rebenî û perîşanîya neteweyê xwe hergav ïnane ziman. Wan gotîye ku bo ci ji nav neteweyê wan, dê tinê dergehvan û piştedar derkevin. Wekî li derveyî welatî rastî mirovên ji welatê xwe hatine bi gelekî ve karker, dergehvan û piştedar bûne û vê yêkê dilê wan sotîye û ev yêke adeta layiqî xelkê xwe nedîtine. Mîkdat Mîdhat Bedir Xan, ev gazindeya xwe di mana xwe ya Misirê da wisa inaye ziman: "Li Misirê hin Kurmanc hene, bihîstine ku ez hatime Misirê, hemî ji hatine zîyareta min, min halê hemîya pîrsî, hemî ji dergevanî û xulamîya Misirîya dikin, hemî ji binê mineta wan de ne; hina (hindek Misirîya - nota me) ji bêedebî kirine, ji cihê xwe derêxistine, jar û reben bîne; heki xwenda bîna, heki destê wan de ji hunerek, sin'etek hebîya, holê jar û reben nedibîn; heyfa min têt, ji dergevanîyê, xulamîyê pê ve kîrê tişkî nayêñ." (Kurdistan, hî. 1, r. 8 - Berg I, r. 116)

Helbet dergehvanî, karkerî û piştedarı, ne kîmasî û biçûkî ye û ne ji karêñ şerm û sitûxwahriyê ne.

Ew ji wekî karêñ dî, ked û karêñ birûmet in. Em wisa bawer dikin ku Mîkdat Mîdhat Bedir Xan ji neku wan kara biçûk nîşan bide, xwastîye ku hevwelatîyêñ wan ji xwanda û zana bin û herweha xwudanê karêñ dî ji bin, li ser xwandin û zanyarîya xwe bispor û şareza bin ku di meydana diplomasîyê da bişen hespê xwe bibezinin û pirsa neteweyê xwe hilkêşin ser maseyên riberiz û axivtinêñ diplomasîya cîhanê... Em dîsa wisa bawer dikin ku birayêñ Bedir Xanî, di van mesajên xwe da bi durustî û dilpakî nerazîbûna xwe ya beramberî nexwandayî û nezanîyê ïnane ziman û herweha rîya xwandinê nîşadane. Xala girîng ev e.

Li milê dî, gelek mesajên girîng yên politik ji dane hevwelatîyêñ xwe ku di her keysî da hêza xwe bikin yêk, zor û sitema rejima Osmanî qebûl nekin, berx-we bidin û memûrêñ ku rejimê rêkirine ser serê wan, ji welat derêxin û li welatê xwe xwudan derkevin: "Êdî bes e; çavê xwe vekin, destê xwe hilşnin, şîrên xwe bikişînin. Welatê we nav agirî de maye, hûn hemî nav tehlukeyê de ne; tu em-nîyet ji we re, jin û zarwa re nemaye. Herin dor mezinêñ xwe, herin dor ulema-

ya îttifaq bikin; xwe ji binê vê zulma memûra hilînin; ji we te fehêt e!” (Kurdistan, hj. 9, r. 4 - Berg I, r. 228)

Birayên Bedir Xanî, jibo hişyar kirin û zêrandina neteweyê xwe qelemên xwe bêwestan bi kar ïnane ku dijî rejima Osmanîya bibizivin û rêya ji bin zulmê derketinê peyda bikin. Evdirehman Bedir Xan di nivîsareke xwe da wisa hawarê dike: “Welatek bi edaletê destê xelkê wî welatî de dimîne. Gelî Kurdno! Hûn qenc bizanibin ku heger welatê we de memûrên serê we ji edaletê dûr ketin, welatê we destê xweyî de namîne. Nuho Kurdistan ji weke welatên di binê Tirkâ, binê destê Ebdulhemîd de ye; memûrên serê we, Ebdulhemîd rîdike. Lakîn xweyîye Kurdistanê Kurd in. Wekî neyarek hat ser Kurdistanê, Kurd’ê xwe ser bidin kuştin. Erdê wê derê Kurd dikolin, darêne wê derê Kurd diçinîn; perên memûrên Xunkar rîdike serê we, hûn Kurd didin. Lewma Kurdistan ya we ye.” (Kurdistan, hj. 9, r. 5 - Berg I, r. 229)

Di nivîsarên xwe yên dî da jî ev gotinên xwe yên hişyarker domandine: “...Ewil bi ewil divê Kurd xwe ji binê zulma wan memûra derêxin; yanî Kurd hemî cemî’ bibin, wan memûra ji Kurdistanê derêxin...” (Kurdistan, hj. 11, r. 4 - Berg I, r. 244)

Birayên Bedir Xanî, rojnameya Kurdistanê herçend wekî çekeke weşangeriyê bi kar ïnabin jî, wan herweha xwastine ku rojname, rojek ji rojekê xizmeta xebateke birêxistinî jî bike. Ji bo vê nîyeta wan Evdirehman Bedir Xan di nivîsareke xwe da wisa dibêje: “Ev hal, ev cahilî êdî bes e; aqilê xwe bînin serê xwe. Min hin axa û beglera re nivîsiye, da îttifaq bikin, dermanekî ji vî derdî re bibînin. Ez pê vê cerîda xwe jî ji we re dibêjim, divê hûn hemî tefaq bikin. Ermenî jî wî halî de we re îttifaq dikin. Hûn hemî hev re îstîqbalek qenc tehyîte bikin, hemî hev re xwe ji binê zulma Tirkâ xilas bikin. Ez’ê carna ji we re hin mirova bîşînim. Divê hûn itaet li wî re bikin. Ez xwe jî, însaellah firset bibînim, rojekê bêm ser hudûdê Kurdistanê li nav Ecem. Bi izna Xwedê, wê hingê ez’ê Kurda ji xulamîya Romê xilas bikim” ... (me binê wê xîç kir. RH). (Kurdistan, hj. 27, r. 4 - Berg II, r. 474)

Ji vê paragrafê jî kivş dibe ku Birayên Bedir Xanî nîyeta xwe ya berxwedan û serhildaneke birêxistinî hergav parastine û li hêviya bîvekê û dem û şertan bûne û xwastine ku rojnameya wan jî xizmeta gihadina van dem û şertan bike.

Evdirehman Bedir Xan daku xirabkerî û leyizên rejima Osmanî yên li ser neteweyê Kurd nîşan bide, li ser cehşîtiya “Alayên Hemîdiyê” jî rawestaye, ku heçku kêm zêde li ser evroya Kurdistanê axıvtîye!: “Ev Alayên Siwarên Hemîdî,

wek hemî îcraatê Xunkar (Sultan Ebdulhemîd, -nota me), bi nîyetek fasid hâtine danîn... Ev çend salek e ku ev alay tesîs bîn, vî zemanî de mezzerreta ewan li welat û millet kîrî, naqabilê tarîf e. Ne Kurd û Ermenî tenê, lakin iro Kurdistan bîye sê mil: Ermenî, Siwarêñ Hemîdî û Kurdêñ ne Hemîdî. Iro Kurdistanê de ev sê mil bîne neyarêñ hevdû; hevdû talan dîkin, dikujin; welat bîye mezbehék însana. Hetta gelek Kurd û Ermeniyêñ waqifê hal bûyîn, ittifaq dîkin, zulm û istîbdadê hukumetê re çarekê digerin. Kurdistanê de tu qunc nemane ku sed feryadêñ elîm jê mesmû nebit, tu der nemane ku ji xwîna masûma sor nebit. Kes ji rûhê xwe, malê xwe ne emîn e. Eve hew qas sal e Kurd û Ermenî bitefaq bîn. Lakin iro Ebdulhemîd nîfaqek we avêt nav van her du unsura de ku tarîx jê fehêt dike..." (Kurdistan, hj. 28, r. 4-5 - Berg II, r. 492)

### **Şîretêñ rojnameya Kurdistanê**

Rojnameyê ji bîlî mesajan, gelek şîretêñ gîrîng jî kirine. Di serê wan şîretan da "yékitî" têt. Ji ber ku di wê demê da jî pirsa herî gîrîng ev bû di nav Kurda da. Li ser vê çendê Evdirehman Bedir Xan di nivîsareke xwe da wisa dibêje: "...heger hûn hemî bitefaq bûn, tu kes nikare we. Hegev ev bêtefaqî li ser we dewam bike, qebilêñ Kurdan hemî yek û yek wek Hemawenda wê Kurdistanê cuda bibin, hit de wê de binê destê zulma memûrêñ hukumetê jar û feqîr bibin. Heyfa min têt, wan qebîleyên şêr ên Kurda nav sûtarêñ wan memûra de mesxere dibin!" (Kurdistan, hj. 9, r. 4 - Berg I, r. 228)

Birayêñ Bedir Xanî ev şîretêñ xwe li mîr, axa û zanayêñ Kurda jî kirine. Mîk-dad Mîdhat di nivîsareke xwe da wisa dibêje: "Gelî mîr û axano! Qenc fekirin dora xwe! Hûn hingî diçe feqîr û kêm dibin. Sebeb cahiliya we ye. Elhemdu'llah gelek mekteb û medrese henin. Rîya Xwedê de zarûyêñ xwe rîkin bidin xwendin, ji vê cahiliyê xilas bibin, dinya û axreta xwe mamûr bikin. Xelk dibêjin 'hekî Kurd bixwînin, wê ji alemê xurttir û dewlemdendir bibin'." (Kurdistan, hj. 1, r. 6 - Berg I, r. 114)

Evdirehman Bedir Xan jî her li ser dewsa birayê xwe, ev şîrete li zanayêñ Kurda kîriye: "Gelî ulemayêñ Kurda! Divê hûn her bixebeitin, ji ilmê xwe cahila jî xweypar bikin. Gunehê cahila ser we ye." (Kurdistan, hj. 8, r. 2 - Berg I, r. 208)

Şîret li mîr û axa jî kîriye û wisa gotîye: "Gelî mîr û axayêñ Kurda! Divê hûn jî arî alimêñ xwe bikin, ew muhtacê çi bin hûn ji wan re peyda bikin, hûn jî pê qeweta perê xwe arî alima bikin. Wê hingê hûn hemî dinê û axretê rihet bikin, wê hingê Kurd jî karin rojekê xweydewlet, xweyhikmet û marîfet bibin. Hegev

ne, welatê we'yê rojekê destê we derkeve, hûn'ê bibin xulamê neyarên xwe...”  
(Kurdistan, hj. 8, r. 2 - Berg I, r. 208)

Rojname şiretan li hemû neteweyê Kurd jî dike ku hem yêkitîya xwe biparêzin hem jî neyêne leyiza dijmin û şerê cîranêن xwe Ermenîya nekin, digel wan yêkitîye pêkbînin û dijî rejîma hov ya Osmanî pêkve bixebeitin: “Fekirin, Ermenî ci qas sahibhîmmet û xîret in. Ew jî wek Kurda mezlûm in; lakîn hurîyeta xwe re xwe fîda dîkin. Cahilên Kurda nezan in, Ermenîya dikujin. Ev hal Kurda re gelek xirab e. Divê ulema bêjin Kurda ku ev hal qatîlî ye. Divê Kurd xwe jî wî gunehî muhafeze bikin. Divê Kurd jî Ermenîya re bîl-ittifaq memûrên zâlim ên Xunkar rîdike serê we, bavêjin.

Şûna hûn biçin îmdada Ermenîyen mezlûm, hûn diçin wan dikujin. Ew hal gelek guneh e û gelek fehêt e...” (Kurdistan, hj. 11, r. 8 - Berg I, r. 248)

Evdirehman Bedir Xan di nivîsarên xwe yên hejmarên 26. û 27. da jî şiretên balkêş dike. Di nivîsara xwe ya “Kurda re” da wisa dibêje: “Gelî Kurdno! Ez dizanim ku heta serê we ev hukumet e, hingî hûn destê memûrên Ebdulhemîd bimînin, hûn tu cara ji vî halî xîlas nabin. Lakin hûn, şûna hûn islahê halê xwe de bixebeitin, hûn bêçarekanêن cîranêن xwe Ermenîya dikujin. Ev hal ji name necabet û ciwanmerdîya we re şeyn e. Ya dikeve derîyê semaheta we ew e ku divê hûn Ermenîyen masûm û dexîlê we, hifz û hîmaye bikin. Ew jî weke we mezlûmên Ebdulhemîd in.

Loma divê hûn pêkve ittifaqê bikin, xwe ji destê vê hukumeta zâlim texlîs bikin, bîl’ittifaq seadeta wetenê xwe re bixebeitin. Hûn istîqbalâ xwe nabînin û illa ev rîya we girtî, we ısalê xirabîyê dike.” (Kurdistan hj. 26, r. 6 - Berg II, r. 456)

Helbet şiretên birayêن Bedir Xanî kêm nabin û di her nivîsarên xwe da şîret, gazînde û mesajîn xwe yên politîk rêz dîkin, ku gelek ji wan jîbo evroya Kurdistanê jî gelek balkêş û girîng in!

Wan ev şîret û gezinneyen xwe, bi ayet û hedîseyan ve xurt kirine ku piranîya xelkê Kurd yê musulman ji bîr nekin, bawer bikin, guh bidin van şîreta û di kiryarêن xwe da bînin cih...

Aşkeraye ku birayêن Bedir Xanî di van bîr û bawerîyen xwe yên neteweperwer, welatperwer û mirovperwerîyê da ji dil in û bi nîyet û armanceke pak û si-pehî inane ziman û bo wan armanca xebitîne, têkoşîne; daku neteweyê xwe hişyar bikin ku haj zulma neyar bin, bi xwe bihesin û rîya xîlasîyê peyda bikin. Bawerîya musulmanîyê û ayet û hedîseyen ji pirtukên dînî jî, wekî argumantên teorîk bi kar ïnane. Bi her metodî xwastine neteweyê xwe serwext û hişyar bikin

û hisa neteweperwerî û welatperwerî bilind bikin. Rojnameya Kurdistanê abî-deya van bîr û bawerîyên neteweyî yên wan yên ji dil û paqij e...

### Germahîya xelkê

Rojnameya Kurdistanê her ji destpêkê ve baleke gerim kêşaye ser weşana xwe. Hindî ku rojname gîhiştîye destê xwandevana, bi germahîyeke mezin û ji dil hatîye wergirtin. Rojnameyê bi nivîsarên xwe hêvîyeke tîr û tijî daye xwandevanen xwe û ev hêvîye bi ragihandina xwandevanan belavî xelkê jî bûye. Rojnameyê tîrên tijî dirêjî perasuyêng sultan û serokên Osmanîya kirine ku seray ji vê çendê gelek nerehet bûye û belavkirina rojnameyê qedexe kirîye. Seray ji propaganda û ajîtasyona rojnameyê aciz bûye û ev nerazîbûna xwe bi kiryarên hov daye nîşan. Li milê dî, xwandevan jî li rojnameyê xwudan derketine û bi nameyên xwe ev piştgirîya xwe kîvş kirine. Vê yêkê birayêng Bedir Xanî gelek şâ kirîye û wan ev nameyêng hatî hem weşandine, hem jî bersiva wan dane...

Bo nimûne; nameyek ji Elî Kurê Huseynê Amedî hatîye: "Ew rojnameya we ya berçav a bi navê "Kurdistan" ku hûn li bajêrê Cenewreyê bi zimanê Kurdî derdixin û jibo derxistina wê we gelek hîmmet xerc kirîye, giha destê min û min rûpelên wê di çavê xwe ra derbas kirin. Min dît ku ez ci bibînim! Rûpelên wê bi şîretên rast ên di cîyên xwe da û bi nivîsarên mefadar dagirtî ne. Amanca wan şîret û nivîsaran ew e ku neteweyê Kurd bihewisînin gera li zanînê û fîrbûnê; wan ji xelmaşîya xeflet û bêkarîyê hişyar bikin; fîkrîn wan ên ku pêtîyêng ze-ka û jîritîyê ji wan radibin, ronî û zelal bikin... Ez bi umrê xwe sond dixum ku, ev rojname wisa qenc e ku hêja ye qala wê bê kirin û jibo wê sipas bê kirin..." (Kurdistan, hj. 8, r. 6 - Berg I, r. 212)

Xwandevanekî bi navê Mela Salihê Cizîrî jî di nameya xwe da wisa dibêje: "Mîrê min, Ew cerîda ku we dest pê kirî her pazde roja carekê derdêxin, carna tê welatê me; nadîten digîhe destê me, em dixwînin. Hûn hemî ku lawên Bedir Xan Begê ne, mîrê me Kurdan in. Ji mîrîn wek we, her qencîyê em întîzar dîkin. Qencîya xizmeta babê te, welatê me gelek bîye. Ev hîmmeta, mucibê şukrana me ye. Hema Xwedê hewe muwaffeq bike... Bi vê cerîdeyê, heta dinê heye te navê xwe îbqa kir. Ez benî, tu me li mearifê teşwîq û terxîb dîkî. Qencîya mearifê tiştek we ye ku kes nikare încar bike; mearif nûrek we ye ku kor xweyç-av dibin... cerîdeyêng dest ketin, min xwendin; hemî nafîe milk û milet e; hun ji edaletê re ci qenc be wî dibêjin, ji tereqqîya Kurda re ci hebe ewî dînîvisin. De vêca çire cerîda hewe menî' dîkin, nahêlin bê welatê me! Qey Sultan Ebdulhe-

mîd ji qenciyê înhîraf dike! Em dibihîsin ku hemî dera mekteb hatine înşakîrin, esbab tehyîe bîne. Welatê me, hê tu eserê tereqqî nîne. Ji vî halî malûm dibe ku Xunkar navê Kurd tereqqî bikin; divê her em ji hemîya kêm bimînin. Her Kurda li ser kuştina Ermenîya tehrîk dike. Me vêca zanî ku Ermenî mezlûm in. Me meqsedâ wî zanî; ewî divê em her li halê wehşetê de bimînin, her Ermenîya re şerî bikin. Lakîn bila emîn be ku ji nuho pê ve lê heram be, nabîne. Em bi hîmmeta mîrên xwe de, hingî ji destê me bê em'ê paş nuho xizmeta însaniyetê bikin..." (Kurdistan, hj. 14, r. 4-5 - Berg I, r. 280-281)

Dîsa xwandevanevêkî dî yê bi navê Şêx Hesen jî wisa nivîsiye: "Rojnama we ya ronî ya ku li Cenewreyê di 15 rojan da carek bi navê 'Kurdistan' derdikeve, me bi kîfxweşî û rîzdarîyeka temam ew dît û naveroka wê fam kir. Me dît ku ew rojname, bi hin peyy û nivîsan xemilandî ye, ku ew hemî, ciwamîriya we û xîretkarîya we ya neteweyî nîşan didin." (Kurdistan, hj. 16, r. 9 - Berg I, r. 317)

Ev hersê name jî nîşa didin ku rojnameyê li nav welat baleke gelek gerim kêşaye û danûstandinek peyda bûye di navbeyna rojname û xwandevana da, ku eve xewna birayêن Bedir Xanî bû ku rojname xizmeta hişyar kirina xelkê bike, wan li ser pirs û pirşîrêkên welat ron û agahdar bike, serwext bike û wan teşwîkî xwandin û nivîsinê bike. Bi van nameya heta derecveyekê gihiştibûn armanca xwe û vê yêkê ew şâ û bextîyar kiribû.

### Rewşa rojnamegerîya Kurdi

Wekî em berê xwe didine vê portre û naveroka rojnameya KURDISTANê, pîsek tête pêş; gelo ev sed salêni bi kul û keser, bi hemû zulm û zordarîyên rejimên dagîrker ve borî, bi kîrî çi hatine? Berî sed sala her reng zulma rejimê nikarîbû reng û rûyê wê portreyê beqem bike. Rojnameyê bi wan rengên geş û bigîyan yên weşana xwe, hêvîyeke mezin dabû xelkê me. Armancê pak û pîroz dana-bûn pêşîya xwe. Bo wan armancan, digel bedelên giran belêm xebat û têkoşîneke serfiraz jî dabû... Belêm mixabin, rojnamegerîya Kurdi evro jî bo wan armancê ku berî sed sala rojnameya Kurdistanê têkoşîn dikir, xebatê dike û têkoşînê dide. Ew hewcetîyên wê demê kêm zêde evro jî li serê rojevê ne. Hawar û bangên li her çin, bask û kategorîyen xelkê me dihatin kirin ku yêkitîya neteweşî pêkbînin, evro jî li serê rojevê ne û lezî û girîngîya xwe diparêzin. Herweha jîbo perwerdekirin, têgîhandin û zanakirina xelkê me li wê demê çi hawar û bang dihatin kirin, evro jî têne kirin û hewcetîya xwe ya lezîn dîsa ve diparêzin. Rojnameyê wê demê çawa bi şithayî şerê nezanîyê dikir, evro jî her ew armanc

di serê rojevê da ye. Belê! Rojeva rojnamegerîya Kurdî heçku santîm pêşve neçûye, nehatîye guhartin. Mixabin! Sed cara mixabin! Kî ye gunehkarê vê prosesa paşdamayî gelo? Tinê dijmin e? Heke bersiv ev be, hingê eve rêya herî sanahî ye, ankû hêsan e ku mirov xwe ji berpirsiyarîya dûr û xilas bike. Di serî da pêşengên bizava rizgarîya xelkê me û bi timamî neteweyê Kurd ji vê sefalet û perîşanîyê berpirsiyar in û eve gunehkarîyeke hevpişk e li hemberê dîroka neteweyê me!

Wekî mirov rewş û şertên wê demê, anku yên berî sed sala tîne ber çava, ku şertên gelek dijwar bûne; belêm dîsa ve rojnameyek bi gelekî ve bi zimanê neteweyî weşiyaye. Belêm evro? Ci "mazeret" heye gelo? Her tişt li milekê, divîya bû ku evro rojnameyeke rojane û xwerû Kurdî heba û bi vê pozisyonê sed salîya rojnameya Kurdistanê hatiba pîrozkirin! Anjî qet nebe bi weşandina "heftenameyek" e bi ser û ber û rîk û pêk û xwerû Kurdî, silav li sed salîya rojnameya KURDISTANê hatiba kirin... Belêm sed mixabin ku evro rojname û kovarêni li ser navê bizava neteweyî ya Kurdistanê diweşin, hêj jî bi gelekî ve bi zimanê dewleta dagîrker ve weşanê dikin. Eve bi yêk gotinê şermizarî ye! Eve krîtikeke herî hişk û dijwar e ku divê bizava neteweyî ya Kurdistanê li xwe bike û xwe ji vê kîmasiyê xilas bike!

Li milê dî, helbet rûyê dî yê madalyonê jî heye. Ew gef, êriş û bûyerên berî sed sala bi serê rojnameya Kurdistanê hatî, evro jî bi serê rojname, kovar, pirtûk û bi giştî weşanên Kurdî tê; qedexe kirin, ciza kirin û gelek astangên dî yên dijwar... Dîsa ew pirsgirêka nexwandalayî û nenivîsına Kurdî ku rojnameya Kurdistanê jî bo xwe kiribû derdekî mezin, evro jî pirsgirêkeke mezin e li ber weşangerîya Kurdî. Tîraja rojname, kovar û pirtûkêni Kurdî gelek kêm e û hetta di tixubê nînê da ye. Hejmara nîvenîvî ya nexwandalayîya xelkê me li bakûr, ya bi zimanê dewleta dagîrker, ji seda şestî zêdetir e. Ji xwe nexwandalayîya bi zimanê neteweyî, hema bêjin seda nehwêt û neh e! Ew perîşanî û sefaleta berî sed sala ya di warê xwandin û nivîsına Kurdî da, kêm zêde evro jî dom dike.

Evroke digel ku xebat û têkoşîna xelkê me gelek bilind bûye, belêm dîsa mixabin ku hêj jî rojnamegerîya bi Kurdî li goreyî ku dil dixwaze, gur û geş nebûye. Hêj jî kar û xebatêni di warê weşangerîyê da têne kirin bi gelekî ve bi zimanê dewleta dagîrker ve têne kirin ku eve jî bi serê xwe hem werara qelsîya di vî warî da ye, hem jî werara qelsîya bîr û hisa neteweyî ye. Di midehê van sed salan da tinê li Kurdistana Bakûr nêzîkî 200 rojname û kovar ji alîyê Kurda ve hatine weşandin, belêm ji nav van yên ku xwerû anjî bahra pitir bi zimanê Kurdî der-

ketî, temetî hejmara tilîyêñ herdu destâ ne...

Berî sed sala jî koçerî û penaberî kula weşangerî û rojnamegerîya Kurdî bû, ku rojnameya Kurdistan bi xwe jî rojnameyeke koçer bû, evro jî her ew kul dom dike. Heke evro hindek rojname anjî kovar xwerû bi Kurdî diweşin, ew jî ca an di şertên dijwar da li nav welat anjî li derveyî welat têne weşandin...

Digel hemû zor û dijwarîyan, evro jî xebat û bizava rojnamegerî û weşangerîya Kurdî li berxwe dide û bi rêveçûneke kûselekî jî be, roj bi roj grafika xwe bilind dike. Belêm dîsa ve, piştî sed sal ji ser weşana rojnameya Kurdistanê borî, rojnameyeke rojane û xwerû bi Kurdî hêj jî nehatîye weşandin. Eve bi serê xwe qelsîyeke herî mezin e di vî warî da. Belêm li alîyê dî, cihê şahîyê ye ku bi per-yodêñ dirêj û newekhev jî be, hindek rojname, kovar û pirtûkên xwerû Kurdî diweşin. Digel pirtûkên Kurdî, kovara Nûdem ya sê mehî û rojnameyên wekî Kurmancî û Azadîya Welat, ku eve jî ne rojnameyên rojane ne, hindek nimûneyên berçav in jibo vê çendê. Li milekê di warê weşangerîya nivîskî da ev pêşveçûnên baş têne dîtin; li milê dî jî cara pêşin e ku di warê weşangerîya bînahî da jî gaveke mezin hate avêtin û sala 1995ê televizyoneke Kurdî bi navê MED TV hate danîn û evro, rojê nêzîkî 18 seeta jibo Kurdistanê û derveyî welat weşanê dike. Ev gava girîng ya di warê weşangerîya bînahî da hatîye avêtin bi serê xwe bûyereke mezin û bihadar e di dîroka weşangerîya Kurdî da. Dîsa evro di warê weşangerîya guhdarşyê da jî gav hatine avêtin û çend dezgehîn radyoyêñ ku bi Kurdî weşanê dîkin hatine danîn...

Di nav qelsîya bi giştî weşangerîya Kurdî da, ev çend nimûneyên kêm yên wekî rojname, kovar, pirtûk, radyo û televizyonê, di pîrozkirina sed saliya rojnameya Kurdistanê da helbet cihê dilşahîyê ne. Ev pêşveçûnên baş û bikêr, hêviyîya bi giştî neteweyê me û bawerîya bi paşeroja xwe ve, xurt dike. Ev hêviyîya bi serê xwe werara serketinêñ sibehî ye.

### **Bi kurtî**

Heke mirov bi kurtî bêje, rojnameya Kurdistanê:

- Xwastiye bi giştî neteweyê Kurd li ser pirsa Kurd û Kurdistanê hişyar û ser-wext bike.
- Xwandevana û bi rêya wan jî, xelkê perwerde bike, hûyî xwandin û nivîsinê bike û di van waran da teşwîk bike.
- Zanîn û têgihîna li ser pêdivîya yêkbûna neteweyî bilind bike û herweha di navbeyna Kurd û

Ermenîyan da jî, dijî rejima Osmanîya şertên enîyeke xurt pékbîne û biparêze. Birayên Bedir Xanî ji bo van armanca, pozisyonâ xwe li ser tahtê netewe û welat perwerîyê danane. Wan bi van çar alîyên xwe ve xebata xwe domandine: Neteweperwerî, welatperwerî, mîrperwerî û dînperwerî. Wan ev xasyetên xwe, wekî me li jor rêz kirî, ïnane ziman û parastine. Berî her tîstî, neteweperwerî û welatperwerî li serê her kar û xebata xwe girtine. Herdu elementên dî jî wekî pişteka armanca xwe bi kar ïnane. Anku mîranîya xwe û dînperwerîya xwe, dane xizmeta xebata netewe û welat perwerîya xwe. Dîn wekî referansên xwe yên teorîk bi kar ïnane. Mîranîya xwe jî wekî pozisyonâ “rêber û mezinê civatê” bi kar ïnane ku bi van xasyetên xwe otorîteya xwe xurt bikin, daku tesîreke pozitîv li ser xelkê bikin ku xebata wan ya weşangerîyê serbikeve û bigihe armanca xwe ya têgilandin û hişyarkirina bîr û bawerîya netewe û welat perwerîyê.

### **Gotina dawîyê**

Rojnameya Kurdistanê ev sale dibe sed salî. Bi 31 hejmarêni xwe ve evro sembola rojnamegerîya Kurdî ye. Bêyi tagîrî, evro hemû kes û dezgehêneteweyî xwudanîyê li rojnameyê dikin. Wê, wekî hebûneke neteweyî dipejîrinin. Ji marksîstan bigrin heta liberal û neteweperestên tengbîn, herkes bihayekî giran dide kar û xebata rojnameya Kurdistanê ya berî sed sala. Bi xêr, rastî û şasî û kêm û kasîyên xwe ve, rojnameya Kurdistanê evro cihê xwe di nav rûpelên dîrokê da bi serbilindî, serfirazî û birûmet girtîye. Rojnameyê, berî sed sala û di nav wan şertên dijwar û rewşa civata me ya paşdahêlayî da, tîstê ku jê hatîye baş ïnaye cih an ne? Ev pirse dibe ku li hêviya bersivekê be. Belêm ya herî girîng ew e ku rojnameyê bi wê kapasiteya xwe ya di nav wan şertan da, zor daye bilindkirina his û bîr û bawerîya neteweyî û hişyarkirina xelkê, ku serwext bin û li rîyekê bigerin ku xwe ji bin zulma neyara xilas bikin, herweha welatê xwe rizgar bikin û têda bi serbilindî û serfirazî bijîn. Derdê herî mezin yê rojnameyê û weşînerên wê, birayên Bedir Xanî, ev bûye û dîyar e ku hind ji wan hatîye. Heke bi çavekî objektîv berê xwe bidine wê demê; hingê tête dîtin ku, karê ku rojnameya Kurdistanê û weşînerên wê kirî, gelekî bihadar e. Di dîroka neteweyan da, her destpêka ku xizmeta neteweyî têda ye, bi rîzdarîyeke mezin tête ragirtin. Li vê derê pîv xizmeta neteweyî, welat û mirov hezî ye. Di kar û xebata birayên Bedir Xanî ya bi vê rojnameyê da, ev hersê element jî têne dîtin. Bi weşandina vê rojnameyê hem xizmeta ziman, kultur, edebîyat û politîkaya neteweyî, hem jî xizmeta his, bîr û bawerîyên mirovî hatîye kirin. Ma ci ji vê xizmetê baştir û bikêrtîr e...

Kesênu ku xwudanê her bîr û bawerîyeke cuda, dikarin ji perspektîva xwe vê rojnameyê rave û komentare bikin. Marksîstek jî, liberalek jî, neteweperestekî tengbîn jî, dikare ji pencereya xwe li rojnameyê binêre. Belêm herkes kêm zêde, dê bikare li ser xaleke hevpiş bigihe hev, ku ew xal jî xizmeta ziman, kultur, edebîyat û polîtikaya neteweyî ye. Rojnameya Kurdistan jî eve kirîye. Di navika mesaj, şîret, gazinde û agahdarîyên rojnameyê da, maf û berjewendîyên neteweyê Kurd û welatê wan Kurdistanê hatine nexşandin. Eve xala hevpiş e jibo hemû kes û dezgehênu ku bîr û bawerîyên wan ji hev cuda ne...

Rojnameya Kurdistanê jî van hemû alîyan ve divê bête sengandin. Ev çarçoveye, rûmeta rojnameyê bilind dike. Ji ber hindê ye ku rojnameya Kurdistanê ne tinê sembola rojnamegerîyê, belêm herweha ya weşangerîya bi giştî ya neteweyî ya Kurdi ye jî.

Birayên Bedir Xanî bi weşandina vê rojnameyê kar û xebateke bihadar kirine û ew û rojnameya wan; dê heta hetayê bi rîzdarîyeke bilind bêne bîr û çu cara nayêne ji bîr kirin. Wan qelemê xwe û keda xwe ya ronakbîrîyê jibo hişyarkirina bîr û bawerîya neteweyî ya humanîst bi kar ïnane.

Neteweyê Kurd; mirovên xwudan raman û bîr û bawerîyên baş û bikêt yên di xizmeta xelkê da û herweha yên ku jibo van armanc û mexsedên pîroz bi karê giştî weşanê radibin û ditêkoşin, ji bîr nake!

Sed salîya rojnameya **Kurdistan** pîroz be! □

*Çiri 1997*

#### Çavkanî:

- Kurdistan, berg I, II. Çapa nû ya M. Emîn Bozarslan, 1991, Swêd  
(Helbet di pîrozkirina sed salîya rojnameya Kurdistanê da, divê spas li M. Emîn Bozarslan jî bête kirin ku rojnameya Kurdistan digel tipêna lafini ji nû ve çap kir û gihande xwandevana.)
- Rojnamegeriya Kurdi, Malmisanij & Mehmûd Lewendi, 1989, Swêd

#### Agahdarîyek

Di hejmara 24an de du rûpelên nivîsa Rojan Hazim ya bi navê "Kritikerî û Etîk", rûpelên 62 û 63 bi şâşî bi hev hatine guhertin. Divê rûpelê 63an berî rûpelê 62an were xwendin.

Em ji Rojan Hazim û xwendavanen xwe lêborînê dixwazin.

Nûdem

# XOPAN

Ev çi xopan e ku ez tê de me,  
Ev çi giraniya tenêbûna min  
Mija li ser dil?  
Ma ev divê ji bo guhertinê  
Ü çareseriya bêdawî  
Ku ji laşê evînê xwînê diherikîne...

Ev çi xopan e ku em tê de ne,  
Jiyan bi yên mirî şukur dikin  
Hê jî nexweş sloganên xwe yên bêxem davêن  
Ü jana xwe vedişerin bêdeng.  
Bi navê jiyana nû  
Bi navê mirovahiya rizgarkirî,  
Stêrkên dilê xwe diqetînin,  
Xwe dikin kole carinan,  
Bi şahiyeke kelogirî...

Dizanim ev ne xopan e êdî  
Xopan berê de,  
Ji bo mafê jidilbûna me hatî.  
Lê ev cehenemek e ku  
Me ji bil xwe û xwediyên xwe,  
Bi kerba nefş daxistî...

Xwezil ji berê de min bizanîba  
Ji bo avakirina cehenemeke nû  
Me çi ronahiyên ruhê xwe temirandibû...

**ZEYNEL ABİDİN**

# ÎSA ŞANS û Rojnameya "Silvan Sesi"

ROJEN BARNAS

Berî bi çendekî berhevoka rojnameya "Dicle-Fırat"ê derket. Ustad Malmışanij heşt hejmarên wê berhev kiriye û li hev sêwirandiye, weşanxana "Apec"ê jî ew çap kiriye. Xizmetek pir mezin... Ji aliyê min ve gelek spas ji herdû aliyan re jî.

Min bi xwe hejmarek du hejmarên wê li dezgehêن rojnamefroşan dîtibû. Yêن di jiyyê (emr) min de hingê xwendekarêن lîseyê bûn û perê me yê ku em bidin û pê rojname bikirin tunebû. Min û yên mîna min me dizanî ku "Dicle-Fırat" ci ye û ji aliyê kê ve hatiye derxistin, lê hew ew çend û ne zêdetir. Lê niha bi saya cefakêşıya Malmışanij eynika xebat û entellektueliya kurdan a 1962-63 yan li ber çavê me ye.

Ji bona min tiştekî girîng i dîtir jî di vê berhevokê de hebû: Du şîr û du nivîsa-ren Îsa Şans (Îsa Ruhi Silvanlı) mîna makîna zemanguheziyê ez birim Farqîna bîhara 1960î.

Bihara 1960î bû, berî darbeşa 27ê gulanê bû an di pey de bû baş nayê bîra min, lê rojek bala min pêket ku komek zilam li texteyekî daleqandî yê li dîwarê Fetwaxanê (müftülük) dinihêrin, bi dengê bilind û bi vekîtandin (hece bi hece) tiştekî dixweynin û li serê bi hev re mijûl dibin. Ji meraqan ez jî nêzîk bûm: Li ser texteyekî mîna van ên ilanan an ên aflen sinemayê rojnameke du-rûpel berepêş û berepaşkî pêvekirî ye û li ser rojnameyê jî dinivîse "Silvan Sesi". Xwediyê wê Îsa Şans û ciyê çapê jî li "Silvan Sesi Matbaası" ya li taxa Kelê bû. Bi pejnîn romantik ên xortekî panzdeh-şanzdeh salî şahiye di nava min de keliya; êdî Farqîna me jî bûbû xwedî rojname û çapxane.

Hingê li serê koşeyê hewşa Camiya Ecem yê aliyê çarşiyê ber bi hêla Belediyê ve xanîkî yek qatî hebû, ku ew der daîra muştî bû û di nav xelkê de bi navê Fetwaxa-

ne dihate bi-nav-kirin. Ji ku derê îlham girtibû nizanim, lê Isa Şans texteyekî çar-goşeyê li berahî dirêj li dîwarê Fetwaxanê, li aliyê ser cadeya mezin (Gazi caddesi) xistibû, û di derketina her hejmara nû de rojnama xwe tanî yek rûpela pêşî û yek ji rûpela paşî pêve datanî. Bi vê, mebesta wî ragihandin û nasandina rojnamê bû. Bi vî awayî Isa Şans, ne bi tenê rojname, lê "Rojnama dîwêr" mîna ya rojhelata-dûr anîbû Silîvan.

Ev ne rojnameya pêşîn bû ku li ser navê bajarê me derdiket. Ya pêşîn "Miya Farkin" (yani Miya Farqîn) bû ku li Diyarbekirê ji aliyê Abdüssettar Hayati Avşar ve dihate derxistin û li Farqînê jî ji aliyê Mihemed Eliyê birayê vî Îsayî ve dihate frôtan an belavkirin. Berî ku "Silvan Sesi" derkeve Isa Şans di "Miya Farkin"ê de dini-vîsi.

Bi vê "Silvan Sesi" yê re çapxane jî hatibû Silîvan û ev cara pêşî bû ku li Farqînê çapxane vedibû. Çapxaneya ku ji aliyê Gutenberg ve hatibû peydakirin pêncsed sal bi şûn de nihayet dihate Farqînê. Vê têjika şarsaniyetê (medeniyetê), maka belav-bûna zanîn û agahdariyê ya ku ji Almanyayê di sê sed salan de hatibû gîhiştibû tîrkan, ji İstembola paytexta dewleta Alî Osman heta Farqînê bi rîveçûna kûsî di du sed salan de hatibû, gîhiştibû me.

Ku bargeha tîpa (qerargeha tugaya) cendirma nehata Farqînê û ji bona kirîna lazimatiyên lejkerî ragihandina ihaleyan bi ilanên resmî li gora mewzûata wê çaxê ne mecbûri biya, û mecbûriyeta herî qanûnî jî di rojnameya an rojnameyên wî cihî de nebiya, ewê ev çapxane hê jî zû bi zû nehata Farqînê.

Ez wê havînê bi qasî meh û nîv du mehan li balê di çapxanê wî de mîna şagirt xebitîm.

Çapxana Isa Şans ji du-sê qase hurûfat (tîpên ji risasê rêtî) û makîneke çapê a bi destmêş pêk dihat ku di zaravayê çapemeniyê de ji vê makînê re digotin "prova tezgâhi" yanî "dezgîhê sihîtiyê". Ev gişt jî yên Isa Şans bi xwe nîn bûn, wî ew bi emanetî anîbûn.

Isa Şans hem tîprêz bû, hem çapker... hem nûçegihan bû, hem nivîskar, hem gerînendeyê berpirsiyar û sernivîskar bû û hem jî xwedîyê rojnamê. Çapxane û ma-la wî di xaniyekî yek qaftî de bûn:bihna hibr û xwarinê, ya kaxiz û nivînan gişt di nav hev de.

Serê Isa Şans mîna kewara mîşan embara lihevqelibîn û xumîna fikiran bû, mîna serê çavîka kaniyekê bi bilqîn li ser bilqînê misêwa dikeliya, û fikir jî hevûdu dizan.

Farqînperest bû: Behsa tarîxa Farqînê dikir, Farqîna di zemanê împaratoriya asûriyan, Farqîna di zemanê vegirtina Selahedînê Eyûbî... Behsa "Esla Xoros" (an Es-

ra Xorûs) û Kela Nîştonê dikir. Esla Xoros (an Esra Xorûs) ku telafuza wî rast be û di bîra min de rast mabe, -lewra min ev bi devkî jê bihîstine- hakim an dizdarê Farqînê yê di dema vegirtina wê ya ji aliyê Selahedînê Eyûbî de biye. Dîsa li gora gotina wî di dewsâ Camiya Ecem an di navbera Camiya Ecem û Camiya Mala Mîran de dêreke pir mezin hebiye ku zemanê Sultan Selahedîn Farqînê vegirtiye xelkê bajêr gişt xwe avêtine bextê wê dêrê û tê de sitirîne û her wisa jî filitîne. Dîsa li gora riwayeta wî Circîs pêxember ji ber kafiran reviyaye kafiran Circîs pêxember qefaltîne û li ber şikefta Kerîm ew şewitandine. Loma giyayê wê derê tu car hişk nabe. Behsa kela Nîştonê ya di dema asûriyan de dikir ku li gora wî Nîşton kela Boşatê biye. Wek rîzenivîsar di "Silvan Sesi" de li ser cengên împaratorên asûriyan Nebû-kednezar, Asûrbanîpal û Tigletpleser ên li dorhêla Farqînê nîvîsi.

Aşiqekî bêderman ê "Sultan Yûsif Selahedînê Eyûbî" bû. Ev bi navkirina di nav neynokan de a wî ye, ne ya min e. Wêneyekî Selahedînê Eyûbî bi destê xwe û bi pêñûsên cihêreng çêkiribû, li seriya dezgê tiprêziyê, li hember wî daleqandî bû.

Heyranê Mele Mustefa Barzanî û Doktor Beg (Dr. Yusuf Azizoglu) bû. . Pevgi-rêdanekê mîstîk û xwedayî di navbera navê Yûsif Selahedîn (ê Eyûbî) û yê Yûsif û Selahedîn (ên Mala Azîz; Doktor Beg û Selah axayê biramakê wî) de didît. Herwisa têkiliyek neyaxurî (netesadûfî) di navbera navên Mele Mustefa Barzanî û mele Mustefayê Berazî de jî didît. Barzanî zivîri bû Iraqê lê hê dest bi şer nekiribû. Ez Mele Mustefayê Berazî nasnakim lê wer xuyaye ku merivekî qenc biye. Sultan Yûsif Selahedînê Eyûbî kurdekkî sultanê İslâmî, fatihê Kurdistanê, bi hindikî fatihê Farqînê bû ku wî ew kiribû bin hikmê kurdan û yê dinê jî Doktor Beg "Yusuf Azizoglu" ku hingê pêşkêşê parlamenteerên ji Kurdistanê yên demokrasiperwer û herêmparêz û hêviya kurdperweran bû.

Şî'ra Qîmil a Mûsa Anter ku dibêje "Bi çiya ketim lo apo çiya melûl bûn rebe-no" bi awayê taybetî yê xwendina wî cazîbeke bêsalixdan weldigirt. Ji xwe min cara pêşî vê şî'rê jê bihîstibû.

Bûguman "Silvan Sesi" bi tirkî derdiket û rojnameke iðeolojîk an ya propaganda kurdîtiyê nîn bû. Ya nûçeyen herêmî bû. Di serê pêşî de İsa Şans an "İsa Ruhi Silvanlı" rasterast propaganda kurdîtiyê nedikir, lêbelê ci bigire di her hejmarê de bi riya bikaranîna hin bêjeyen kurmancî guhê meriv li kurdi vedikir: Em bêjin dêlva "viraj" an "dönemeç" a tirkî de bêjeya bi kurmancî "fetlanek" ê, di dewsâ "dere" ya tirkî "newal" a kurmancî di nûçeya xwe ya bi tirkî de bi kar tanî û ev jî di nav xwendevanan de dibû sedemê nîvşahî û nîvşasmayinê: Wi-wî! Bi kurmanciya me jî tê nîvîsandin. Ne ku bera İsa Şans bi tirkiya "fetlanek" an "newal" ê nîzanibû. Ji

şî'r û nivîsarên wî yên di hejmarêن 4, 7 û 8 ên "Dicle-Fırat"ê ji baş xuyan e ku ew bi qasî nivîskarekî rojnameyêن mezin ên İstembolê hakimê zimanê nivîskî yê tirkî ye û di aliyê bêjezanîna tirkî (kelime hazinesi) de ji qet tengasî nakişne û li xwe heyri namîne. Wekî dinê ji zane ku ci dînîvisîne û behsa ci dike. Nivîsêن wî bi serüber; kurt, zelal û dagirtî ne. Di warê axaftin û bilîvkirinê de ji mîna bi usûla "bey-efendi" yekî İstembolê bi tecwîdkî bi tirkî diaxîfî. Lîbelê di nav nivîsarêن xwe yên di "Silvan Sesi" de bêjeyêن bi kurmacî bikaranîna wî bi zanîn bû û ji taktaîka wî ya "nerm dayina berê" an ji mîna peykêن ûris "venîştina nerm" a li ser erdê bû, yanî hêdî hêdî û nermenerm bêjeyêن kurmancî nivisandin û ji berevkî ve hînkirina xelkê bû.

Di payiza 1960f de mala me çû Diyarbekirê. Têkiliya min a bi Farqînê, bi Isa Şans û bi "Silvan Sesi" re nema. Şeş sal di pey de gava ez zivirîm Silîva êdî "Silvan Sesi" nemabû. Li gora nivîsara wî ya di hejmara 8an a "Dicle-Fırat"ê - ku mixabin ez hê nû dibînim- di 23.10.1962 an de ji ber ku çapxane ji dest diçe "Silvan Sesi" ji êdî nema derdi keve.

Ci bi serî de tê?

Li gora nivîsara wî ya di hejmara 8an a "Dicle-Fırat"ê , Isa Şans di "Silvan Sesi" de bi şîweya Silîvkî (yanî bi tirkiya kurmancî li navxistî) bi navê "Di Edebiyata Kurdi de Siyahmedê Silîvi" di 21 ê çîrî (ekim) ya 1962 de dest bi rîzenivîsarekê dike û di 23yan de ji nivîsara xwe ya bi navê "Di îdeolojiya Xwedê Tirkan biparêze ya nîjadperestan de em Kurd ji hene an ne?" Ev herdû nivîsar dîbin mîna çenget xwey û dikeve nav agit. "Müstakil Diyarbakır Sesi Gazetesi" lê aşkera gîlî dike. Li gora ji wê rojnameyê neqilkirina Isa Şans a di vê nivîsarê de wî di "Silvan Sesi" de nivisandiye ku "eger rojhelatî (kurd) îmkana xwendin û nivisandina bi zimanê xwe yê bayûkalan bi dest bixin hingê ewê cehalet ji holê rabe" û bi vê riyê xwendinûnivîsandin û weşandina bi kurdî pêşniyar dike. "Müstakil Diyarbakır Sesi" bi vê bi tenê lê gîlî nake lê hêviya kuştina wî ji dike. Di sala 1962yan de li cihekî piçûk mîna Farqînê di rojnameyeke mutewazî de pêşniyar an doza mafê xwendin û nivîsandina bi kurdî kirin karê her kurebavî nînbû.

Ew Dewleta ku ehlê wê ji çep heta rast, ji nexwenda heta entellektuelan li ber gotina "**kahraman ırkıma bi gül**"[\*] bi cezbeke uxrewî ji xwe ve diçe û tê xeleyanê, ewê çawa tehemula pêşniyar, daxwazî an dîtinêن Isa Şans ên bi vî awayî bike?

Li ser vê bûyerê dewlet bi muxbîrê xwe yê Karshoglu, bi "sawci" yê xwe, bi Ali beg û bi polîs Kamberê xwe ve aşkiyê şîdandinê lê badide. Suat İlhan xwedîyê "Şehir Gazetesi" şefê buroya "Tercüman"ê tê malzemeyêن xwe yên bi emanetî paşve

dibe. Mîna masiyê li kersaxê mayî Isa Şans li aziyê dimîne û "Silvan Sesi" ji berê xwe ve tê girtin.

Di pey de Isa Şans wek memûr ketibû "Verem Savaş Dispanseri" lê di pey deme-kê de idarê ew ji kar derxistibû, doza wî di mehkemê de bû. Li kêleka dikana Seyid Tahir û li hember "yazîxana" Mahmûd axayê Kelî li ber sindoqa boyaxê bû; bi sol boyaxkirinê aboriya xwe dikirkitand. Paşiyê bi biryara mehkemê vegeriya ser karê xwe yê memûriyê.

Ji nivisandin û rojnamegeriyê re Isa Şans jêhatî û şareza bû. Çima neçû karê rojnamevaniyê nekir û bi memûriyeta "Verem Savaş Dispanseri" qîma xwe anî? Gelo destê wî ji Farqînê nedibû?

Ji şî'r û nivîsarên wî yên di "Dicle-Fırat"ê aşkera xuya ye ku kurdperwerekî bi his e. Ji ragihandinekê ya hejmara 8an tê zanîn ku ew yek ji wan heşt kesen di koma berhevkirina folklorâ kurdî de ye. Lê çîma tu car xwe nêzîkî komika welatparêz an "kurdçiyê" Farqînê nedikir? Di navbera wan de gelo tiştekî qewimî bû? Mixabin ez pê nizamîm. Heke min berê ev nivîsarên wî yên di "Dicle-Fırat"ê de xwendibiya, minê misoger van çimayan hem ji wî û hem jî ji aliyê dinê bi ïnad bipirsiya. Lê heywax êdî nikarim van pîrsan jê bikim, lewra li gora bihîstina min di sala 1990 an 9î de ji nexweşînekê miriye. Heywax û heywax!

Peydakirê çapxanê Gutenberg jî top avêtibû û ji piyasa çapemeniyê winda bûbû. "Dicle-Fırat" ku ji aliyê dewletê ve nehata girtin jî ji bêperetiyê li ser girtinê bû. Qedera Isa Şans jî mîna ya Gutenberg çêbû, ew jî ji piyasa rojnamegerî, rojnamevanî û nivîskariyê bi carekî û ji binî vekişî. Belkî iro gelek Farqînî Isa Şans bi vî aliyê wî qet nas nekin jî. Çi heyf! □

---

[\*] ji nîjadê min û qehreman re bikenc

# KURDBÜYÎN, NE ŞERM E...

ISA RUHİ SİLVANLI - İSA ŞANS

**D**i vî warî de, di rojnameya xwe ya mitewazî, Silvan Sesi de, hîn di destpêka derketina zincirê nivîsarekê de, nivîsar hatin qut kirin. Min berê, li Silîvanê, derheqê hin neheqî û bêqanûniyan de, bi çavên rojnamevanekî, hin tişt eşkere kiribûn. Ji ber vê yekê çend serbazên eskerî di rojnameya -xwedê giravî xweser e- bi navê Diyarbekir Sesi de, bangek belav kirin û tê de, gotin "em sawciyên Komarê dawetî wazifeyê dikin." Di wê bangê de "rojnameya Silvan Sesi bi nivîsarên kurdî dagirtiye û tê de bi kurdî weşan û dibistan têne pêşniyar kirin." Gotinê tînin ser vê bendê: "Heke Rojhilatî bi zimanê xwe yê zikmakî bikaribin binivîsinin û bixwînin dê cehalet ji ortê rabe." Û di pê re, "di eslê xwe de yê ku ji ortê bête rakirin laşê vî bêeslî bi xwe ye; em sawciyên Komarê dawetî wazifeyê dikin."

\*\*\*

Zincirê maqeleyên ku min di rojnameya xwe de nivisibûn, ya ewil bi navê, "bi

zaravê Silîvî di edebiyata kurdî de Siyamendê Silîvî" 21ê çiriyê; ya duwemîn ji di 23ê çiriyê sala 1962an de bi navê "ma em kurd ji dikevin ber îdeolojiya nijadperestan ya ku dibêje 'Xwedê tirkân biparêze' an na?" Wê rojê xwediyê şehrî Gazetesi Suad Îlxan ji Dîyarbekirê hat, berê ji neçarî min alavê -çapxaneyâ - xwe firotibûn û yên wî biemanet anîbûn; Suad alavê xwe xwestin û got: "Ez dê alavê xwe bibim." Û di nav axafitina xwe de, ji min re weha got: "Min buroya wergerandinê vekiriye, were em bi hev re kar bikin.." Min got: Baş e.

Di rojên 24-29 yên çiriyê de bûyerên fewqelade rû nedan. Di 30ê çiriyê de ez çûm Diyarbekirê. Min dê di buroya wergerandinê de kar bikira. Roja dinê gava ez di saet heştan de, di Dörtyolê re dibuhurîm, şefê şûbeya 1. Ali Begîn bi şeweyleke nazikane bangî min kir: - Isa , tu dikarî heya vir we-rî? Di cîpekkê de bû. Ez çûm. Got "Siwar be". Ez siwar bûm. Di cîpê de polisekî, navê wî Celal e, li Silîvanê

kar dike, hebû. Min jê pîrsî: - Xêr e? Çu bersîv neda. Min fam kir ku tiştek heye. Heya em gihiştin ber deriyê wîlayetê bêdengî hakim bû. Li ber deriyê wilayetê mudirê polîsan ji polîsekî re got: "Wî bibe!" Paytonek sekinandin, paytonê berê xwe da qereqola Çarşîyê! Wî, ez birim bodrûma qereqolê... Polîs çû. Ez bi tenê me. Tu kes ji rewşa min ne agahdar e. Hema şahidek ji heba ku ji devê wan gotinek bibihîsta ka ez tewqîfîkirî me, nezaret e an îhzar e? Da ku ez ji fam bikim.

Piştî nîv saetekê Mecnûnê sempatîk yê Dîyarbekirê, Necat, 5-10 rojnameyên Dicle di dest de hat eywanê. Ez fi-kirîm: Necat rojnameyan dide dostêن xwe û mesrefa xwe bi dest dixe. Min gazî wî kir, "Necad!" Li paş xwe mîze kir. Nêzikî pencereya min ya kevnar bû. "Himm vaye girtine. Min dizanî. Min dê te bidîta û ji te re bigota. Rojnameya *Karslioglu* derheqê te de nîvîsareke giran nîvîsiye. Ji lewre tu girtine."

Mîzacê *Karslioglu kardeşler* ji min re ne xerîb bû. Ji bo nanê xwe wisa kiri-ne, min Necat şand cem nasêñ xwe. Piştî midetekê hatin, çûn bi polîsan te axîfîn; ez ji jêrzemînê hatim derxistin.

Em di odaya emniyetê de ne. Bi telefonê li polîs Celalî digerin, piştî bersîvî, gotin: "Bravo Celal beg, em ne li hêvî bûn lê vaye te ew girtiye, pîroz be"... Yê ku ji Silîvanê dipeyîvî, polîsekî ku navê wî Polîs Kamber bû û bi *Nigdeyî* dihate nasîn; got "ecele nekin,

îşev li wir bimînin", lê yê din got "na, na em vaye têñ". Piştre, kelemçê li destêñ min xistin; em ji qereqolê derketin, ji *Bagdat Caddesi*bihurîn, hatin Deriyê Mêrdînê. Em li tankereke ben-zînê siwar bûn. Saet 14. Em gihaştin Silîvanê.

\* \* \*

Li Silîvanê, em li cem komîserê polîsan in. Sebebê girtina xwe pirs dikim. Komîser: "Dê sawcî biryar bide." Ez welê mam. Hin kesî nebihîstiye ku ez anîme Silîvanê. Saet 17. Komîser: "Îro dereng e, sibe bila bibin cem sawcî" got û ji odayê derket. Polîsan got "rabe!" Ez birim, li bin odaya qeymeqam ya kar, wê evarê ez li wê bodrumê mam.

Polisekî ciwanmîr ku navê wî Mehmed Alî ye... Haya birayê min pêxistiye. Piştre herkesî bihîstiye. Hatîn. Gotin "derbasbûyî be". Hin ji wan cesaretê didin min, hin ji henekan di-kin. Midetekê weha gotin: "Îsa, Îsa Magosa; Îsa, Îsa Magosa!" Min spasi wan kir.

Bi şev nivînê min anîn û ez li ser teraşê daran -yê ku çokekê bilind bû-, raxistim, findek pêxist û min cixareya xwe kişand. Saet 1. Deriyê bodrumê vebû, sê xort hatin dafdan hundir û derî cardin bi hişkî hate girtin. Min bala xwe dayê, xortê kêfxwes in: Hemo, Celo û Behco. Hemo bi hinan re li hev xistiye, Celo alîkariya wî kiriye; lê Behco ye li qehwexaneyê bi henekî hevalekî xwe dafdaye, ew ji çûye li ca-

mê ketiye, cam şikşyaye. Serpêhatiyên xwe bi kêfxweşî û henekî ji hev re dibêjin.

Piştî midetekê dengê xwe birrîn û berê xwe dan min. Hemo:

– Bira, rewşa te ne baş e. Xwedê, keşî pêrgî buxtanan neke. Gelo tu sebebê girtina xwe dizanî? Guh bide min ez dê ji bírayê xwe re sebebê girtina te bêjim: Daîtreya Nifûsê li ber navê te ‘xerîb’ nivîsandiye. Daîtreya polîsan navnîşana te ji deftera xwe derxistiye. Karmendan jî li Diyarbekirê di rojnameyê de tiştin li dijî te nivîsîne. Sawcî beg jî li gorî wan ewraqan birtyara girtina te daye; û tu hatiyî girtin.”

Min nema karîbû xwe ragirim.: “Hey Hemo, Xwedê te bêle, weleh ew ê weke xeberdana te be, rast dibêjî tu”.\* Ez li gotinên Hemo difikirîm: (Rojname? Necat jî gotibû, rast e... Îsal di listeya pereyê pasewanîyê de navê min tune bû; ev jî rast e. Ji ber ku nasnameya min wînda bûbû, min yekê nû derxistibû; min lê mîze kir. Ecêb e: Di cihê meheleyê de, xr. nivîsandiye. Ev xr. di maneya xerîb de bû û gotinên Hemo rast bûn.) Lê di nasnameya kevin de tiştekî weha tune bû.

Min serê xwe rakir. Hemo rast di-got û min xwe bi xwe got: Ev tertîbek e, lê pûç û li ser bingehike vala ye. Heke edalet ne siyaset be, hakim jî he-ne!...

Roja dinê di 1. teşrînê 1962an de ez birim huzûra hakim. Nasnameya min diyar kirin û piştre ji min pîrsî, ka ji

bo ci min ew nivîs nivîsiye, paşê ez tewqîf kirim û şandim girtîxaneyê.

Gava ku ez ji deriyê dadgehê derketim, çawîşek û eskerên bi tifing singû kelemçê li destên min xistin, piştî ku min meriv û û hemşehriyên xwe dîtin, me berê xwe da girtîxaneyê.

Dema ku em gihaştin ber girtîxaneyê, cendirmeyek pêş de hat û ji min re got: ”Bi tenê bisekine, ez dê fotografê te bikişînim!”

Ez ecêb mam, lê ”bi tenê” sekinîm. Ma cendirmeyen bi singû min bi tenê dihelin? Hatin li kêleka min sekinîn.

Wêne hate kişandin.

Bi ketina hundirê girtîxaneyê ve, yekî girtî pîrsî:

– Pîsmam, ê ku li ber karmendan radibe tu yi? Yêñ din bersîv dan:

– Herê wele ew e!

– Hûn dibînin ku porê wî kur neki-rine. Ew ê, karmend serê wî bifîrînin!”

Min xwe ranegirt. Ez keniyam, min got:

– Çima, qey ez ji we me ku, ji tirsa, ruşwetê bidim wan karmendan? Ewel Elah tu tiştekî nikarin bikin!...\*\*

Roja dinê sawcî beg hat koxûşa me. Di navbera me de ev axaftin borî:

– Isa, ma tu dev ji karmendan ber-dî... çê nabe?

– Sawcî beg min tu midaxeleyeke fi-lî li karê wan nekiriye. Ez dinivîsim. Heke nivîsên min naecibînin bila tek-zîb bikin. Heta dikarin bidin mehke-meyê. Ma ci heqê wan heye destdirêji-yê li hunerê min dîkin? Ji hêla din ve

ez ne bawer im ku sebebê girtina min nivisîna li ser *suûstîmaliya* karmendar be.

— Rast e, lê tu behsa kurd û kurdbûyînê dikî. Tu kurdøyetyî dikî. Heke me tu tewqîf nekira Xwedê dizane ka te ê çi binivîsanda. Tiştên welê şerm e, Isa. Binêre, ez jî kurd im. (Sawcî beg, A. Rahman Şeref Bilgiç ji Adiyamanê ye.) Ez rojnamevan im jî. Hîn jî li Adiyamanê çapxaneya min heye. Lê tiştên wisa nivisîn, gotina ez kurd im... Bi rastî şerm el...

Li ser gotina wî ya "ez jî kurd im" min weha bersîv da:

— Sawcî beg, tu him dibêjî "ez kurd im" him jî "behsa kurdbûnê kirin şerm e." Qasê ku ez dizanim di termîniilojiya resmî de kurdøyetyî tevgera îhalkirina yekitiya axa Turkiyeyê ye. Lê tiştekî weha tu caran nayê aqilê min. Lê herhal behsa kurd û kurdbûyînê kirin ne sûc e?

Sawcî beg li dora xwe mîze kir:

— Her çi dibe bila bibe, Isa. Ev tişte ne bêceza ye. Cezayê vî tiştî giran e.

— Haya min ne ji cezayê giran ne jî ji yê sivik nîne, Sawcî beg.

— Heye, heye. Ma tu ji min çêtir dizani? Ya baş ev e, were em te ji vî cezayî xilas bikin.

— Çawa?

— Em eşkere bipeyîvin. Em bi doktor re li hev bikin, ji te re raporekê li hev bînin. Xilas bibe.

Li ser vê gotina sawcî, ez jî eşkere peyîvîm.

— Ev taktîk polîtîkayeke ku ji mîj ve li *Rojhilatê* tê bikaranîn. Vî tiştî tu nabêjî, Sawcî beg. Bi raporek welê, dê zulmê ku ji mîj ve karbidest li vî welaşî dîkin, miameleyen neheq, ewrâqên sexte dê li berbê herin. Dê bêjin, ev tiştên ku behsa wan di rojnameyê de tê kirin ji alî 'şeteke' hatine nivisîn. Li dawiyê dê xelk bêje: 'Ma bi qasî Isa, kesî ev tişt teşhîr kirin? Na. Çi bû? Girtin, raporek dînitîyê dan destê wî... Çu tiştek bi wan nebû. Eşkere ye ku hertiş di destê wan de ye. Kî dikare çi bi wan bike? Dê bêjin 'li hêviya Xwedê ma'. Ma tiştekî wisa dibe? Di eslê xwe de tiştekê weha şerm e, sawcî beg, tiştê welê şerm e...

Mîna ku sawcî beg piçekî nerm bibe.

— Ez jî dixwazim tu xilas bibî, Isa. Înşalah tu dê xilas bibî. Lê bi şêweya ku ez dibêjim.

— Ez nikarim bi ya te bikim beg efendî. Ez dê itîraza bikim. Riya qanûnê çi ye, ez wê ya dixwazim.

— Vaye min rê nîşan da. Lê tu razî nabi. De hadê, fermo tu itîraza xwe bike. Heke tu poşman nebûyi, tu dê bibînîl..

— Xwedê poşmânîyê nede.

\* \* \*

Di eynî rojê de min itîraza xwe bend bi bend -deh bend-, rêzkir, zulma karbidestan û bêqanûniya wan nivisi, li gel ku bi kurdî nivisîn ne sûc e jî, tewqîfsî-

rina min bi fen û fûtên karbidestan bûye û herweha min dawa rakirina tewqîfa xwe nîvîşî.

Çar roj borîn, 7ê teşrînê 1962an êvarê gava gardiyân Fadil efendî hat koxûşa me bi qêrîn weha got:

— Muharîr! Tu li vir çi dikî? derkeve, yalah!...

Roja dinê bi serbilindî ez çûm avahiya dadgehê. *Zabit Katibi* dosyaya min da min. Min mîze kir: Wey malikê, li min xerabê!..\*\*\* Tîstênu ku li bodruma Silîvanê hevalê min Hemo gotibû hemî rast bûn!...

Min miracaatî sawcî beg kir. Çi bibînim? Rojnameya *Dîyarbekir Sesî* ya ku spasnameya sawcî çapkiribû li ser masyê bû.

Midetek darbas bû. Bi qeymeqam Alî Ihsan Utku û şes karbidestan re dawayênen min hene. Ji pênc rojan carekê diçim dadgehê. Dawa hemî li dijî min hatibûn vekirin. Heçî ez im, min bi tenê daxwaznameyek ji bo dawayê dabû. Daxwaznameya min ku di 13ê ilonê 1963an de hatibû dayîn, ne dihata meşandin. Min, di *Silvan Sesî* de, çend caran behsa vê daxwaznameyê kiribû.

Li dawiyê 23ê sîbatê 1963an de ew dawa hemî ketin ber efûyê.

Ketin ber efûyê, lê xwendevanênen ezîz, héja û qedirbilind, bibînin, dawayênen ku dewlet tê buhuri sawcî çi kir?

Hûn dê bêjin ma çi kir?

Qet!... Bi tenê daxwaznameya min

ya ku di 13ê ilonê 1962an de hatibû dayîn, bin cil kir û bi tarîxa 4-8-1963an, bi navê min daxwaznameyeke sexte, bi destê meqamê sawcî ji waliyê Dîyarbekirê re şand. Heyeta karbidestan ya wîlâyêtê jî li ser wê daxwaznameyê biryara "tu qisûrek karbidestan çênebûye" da. Ü nusxe yeke biryarê ji bo min û sawcî bi şêweyeke resmî hate şandin!..

Bi vî awayî mantîqa edaletê ya sawcî begî cihê xwe girt. Ma daweya İsa bîkeve, dê yên karmandan nekeve?

Êdî biryara tesbîtkirina, ka kî biser-kekiye hûn xwendevanê qedîşinas bi xwe bidin.

*DİCLE-PIRAT 14-Gulan-1963*

Jî tirkî: **SERDAR ROŞAN**

**Di orijinala tekstê de wiha hatîye nivisîn:**

\* "Hey Hemo Xwedê te bêle. Welleh ewê weka xeberdana tebe. Rast dybêji tü."

\*\* — Pysmam, ewê ku Liber ma'mura radybe tüyî?...

— Herê welle ewe!

— Hun dybynyn ku porê wi jê nekyryne. Ewê, ma'mura serê wi bi fyrrynyn!

— Çyma, qey ez ji We'me kû ji tırsa; rüsweta bydym wan mamura?.. Ewel Ellah Tu tyş ky nykaryn bykyn!

\*\*\* Wey malikê Lymyn Xerabê!

## DAXUYANIYEK JI NÜDEMÊ

Wek me di destpêka weşana Nûdemê de jî gotibû; em azadiya fîkrê, azadiya ferd, azadiya bir û baweriyên cûda ji bo xebata xwe bingeh dibînin. Em bawer dikin ku wê civaka me bi riya pirdengiyê bi pêş bikeve. Di pirdengiyê de fikir û ramanên cihê hene. Fikir û ramanên cihê ew e ku endamên civatê ne mîna hev difikirin, lê herkes ji bo qenckirin û pêşdexistina civatê li gora taqet û zanebûna xwe têdikoşe. Ev têkoşina bêhempa ku xwedyiyê dîrokeke dirêj e, piştî şoresa Fransayê û bi pêşketina bajarvaniyê re rengekî nû girtiye. Di her warê jiyanê de, ji bo pêşdexistina civatê, ji bo kirina siyaseteke tekûz, ji bo asîrandina berhemên hunerî û edebî yên hêja rexne hatiye holê. Rexne destnîşankirina qelsî û kêmasiyên asîrandinêr e; armanca rexneyê rênışandayinek e. Rexneya objektîv divê ne li ser kinc û por û kesayetiya asîrandêner were avakirin. Loma jî divê rexnegir di aliyê siyaset, civat, psîkoloji û mijara ku tê de pispor e an jî xwe pispor dibîne, zana be. Rexnegirekî zana ji polemîkên sivik direve, rexneya xwe bi zanistî û bi metodolojîk ava dike. Rexneyeke bi vî awayî asoya xwendevanan firehtir dike û ji bo asîrandina berhemên hêjatir dibe çavkaniyeke baş.

Em jî dixwazin rexneyên ku di Nûdemê de têne weşandin -herçiqas ew Nûdemê girê nadîn û bi tenê rexnegiran girêdidin jî- bi vê pîvana li jor be. Dibe ku carinan hin rexnegir jî vê pîvanê derkevin û rexne bibe bingehê berberî û dijminatiyê. Nûdem jî van celeb rexneyan dûr e. Em hêvidar in wê nivîskar û rexnegirên me li vê yekê bifikirin û bi pîvanên rexnegiriya objektîv û zanistî, ji polemîk û berberiyên şexsî dûr rexneyên xwe binivîsinin û bikin ku rexneya kurdî li ser vê bingehê ava bibe! □

NÜDEM

# Jİ BO ÇI EM DERDIKEVIN?

EDİP KARAHAN

Rojhilat ji sedsalan û vir de hatiye îhmallkirin û di encama vê îhmallkirinê de bûye herêmeke mehrûmîyetê. Vê yeka ha, di dema Komarê de jî dewam kiriye. Mensûbên kîjan partîyan dibin bila bibin, hemû siyasetvanê he-ta nuha hatine, ji bo ku gelê Rojhilatê û ronakbîrên wê çavtirsandi bikin, Rojhilat bi qesdi û sistematîk wek deve-reke taasûb û cehaletê û dijmina medeniyetê nişanî raya giştî ya tirk û dinyayê daye.

Muesseseyên axatî û şextiyê yên ber-mayên sîstema feodal in, wek tiştên ku bi tenê taybetiyêñ Rojhilatê ne, hatine pêşkêşkirin û di vî warî de propagande-yeke bi sîstem hatiye kirin. Gava li bajârên rojavayê yên pêşketî, heta li Stenbû-la ku navenda Tirkîyeyê ya çand û abo-riyê ye jî, çalakiyêñ terîqetan ên cûr be cûr ku beşekî bütçeya Perwerdeya Ne-teweyî yê mezin dixwin, ew qas pêş ke-tibin û organîzekirina ayînêñ eşkere li meydanê bin, ma ne neheqî ye ku mi-

rov bi tenê behsa şêxên Rojhilatê bike ?

Ger em bêñ ser mesela axatiyê, Hecî Emer Axayê Edaneyî bi tenê dikare Rojhilatê tevî axa û şêxên wê bikire. Ger gelek bûyerêñ ku di têkoşîna nete-weyî de çêbûne, bê bibîranîn, dê bi hê-sanî bête qebûl kirin ku li Rojavayê û li deverêñ din tevgerêñ paşverûtiyê yên mezin derketine ortê.

Ji gava ku di 194şan de dest bi ceri-bandina demokrasiyê û hilbijartina yek-qedemeyî hatiye kirin û vir de, gelê Rojhilatê di hemû hilbijartinan de nîşan daye ku parêzgerê maf û azadiyêñ demokratîk ê herî bi dil û can, ew e.

Di van demêñ ku ji bo maf û azadiyêñ demokratîk dest bi têkoşînê hat ki-rin de, siyasetvanêñ tengbîn tesîra tev-gera demokratîk a ji Firatê û wê de, bi demagojiyêñ cûr be cûr wek talûkeyekê nîşan daye û bi vî awayî xwestiye gelê Rojhilatê ji mafêñ wî yên siyasi bêpar bihêle. Gelê Rojhilatê di her hilbijartinê

de dengê xwe bi awayê herî bi isabet bi kar anije û bi vî awayî ew derewîn derxistine, îddîayê wan ên di warê talûkêyê de pûç kirine û di rojên têkoşîna demokrasiyê yên herî xerab de, bi aqli-selîmbûna xwe, bi tecrûbeyên xwe yên dîrokû û bi tevgerên ji ber şertên jiyana ku tê jiyan, nîşan daye ku ew keleheke demokrasiyê ya rasteqîn e.

Hem tevî têkoşînên gelê Rojhilatê yên vê demê û hem ji tevî berxwedanên wî yên ku koka wan digihêje demên dîroka me yên berê, di dîroka me de tu tevgerên nuhîtiyê qedera Rojhilatê ya xerab neguhertiye. Ji Birêvebirina Yekûtiya Neteweyî ya ku gelê Rojhilatê ji dil û can piştgiriya wê dikir û hêviya xwe pê ve girê dabû, ji bo me Kampa Siwasê ya ku ji Rojhilatiyan pêk hatibû, erdên mayinkirî yên ling, mil û serên feqîr û fiqarayên Rojhilata Başûr difirîne û bûyera sşan, wek bîranîn man.

Kesên sîvîl û resmî li her deverê û hertim heqaret li Rojhilatiyan kiriye. Ji bo ku ev zîhniyeta xerab li eskeriyeyê ji bi cîh bibe, xebat hatiye kirin. Gelê Rojhilatê bi sedsalan ancax bi minasebeta bac û xîzmeta eskeriyeyê hatiye bibîranîn. Gava lawên rojhilatê yên bi xîret li hember van rewşen hanê dengen xwe bilind dîkin, desthilatdaran bi tehdîdîn "herêmperest" û "cudaker"iyê yên ku dûrî rastiyê ne, xwestiye dengen wan tavilê bibirin. Û gelek caran ji denğen wan birîne. Halbûkî helwêst û tev-

gerên hemû siyasetvanênu me li jorê behsa wan kir, ji bo cudakeriyê bûne numneyê tipîk. Gava ronakbîrên Rojhilatî daxwaza pêşveçûna Rojhilatê kiriye, hertim dest bi eynî çîrokê hatiye kîrin û tehdîdîn "herêmperest" û "cudaker"iyê hatine dubarekirin. Gava mirov pêşveçûna herêmren Anadoliyê yên din dixwaze, nabe herêmperestî, lê gava mirov daxwaza pêşveçûna Rojhilatê bike, dibe "herêmperestî". Em vê -beyî ku tu ferqan têxin navbera Rojhilatî û Rojavayî- ji teqdîra hemû hevwelatiyên xwe yên xwedîyê eqlî selîm re dihêlin.

Rojhilatî ji ber helwêstên siyasetvanan ên cudaker, mecbûrî dengnekirinê bûne û çareserkirina pirsa xwe li hêviya siyasetvanênu me Rojhilatê nas nakin, naxwazin rastiya Rojhilatê bibînin û dixwazin hertişti bi qûndaxa tivingên cendirmeyan çareser bikin, hiştiye. Ji xwe, encama vê lihêviyêmayinê bûye xeyalşikestin.

Rojnameya me di encama vê xeyalşikestinê de derdikeye. Karê rojnameya me yê yekem ev e ku ew ê ji bo pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî bixebite û di vê rîyê de cudabûnên ku di warê fikirî de bêñ dîtin, ji orteyê rake û wan bike yek.

Rojnameya me, ji kîjan tebeqeya civakî tên bila bêñ (esnaf, tucar, axa, rîncber, karker û hwd) dê ji bo hemû hevwelatî û ciwanênu Rojhilatî yên ku bi dil û can terefdarê pêşveçûna Rojhilatê

ne, vekirîbe. Bi vî awayî ji bo lênerîneke hevbeş derkeve ortê û belav bibe, dê xebat bête kirin.

Ev rojname dê sîyaseta partîtiyê neke. Ew ê li hember hemû partîyan objektîv û bê teref be. Lê em dixwazin vê ji diyar bikin ku bêterefî û objektîvî ne ew e ku divê mirov li hember lênerîn û helwêstên partîyan ên pêşverû û paşverû pasiv bimîne. Rojnameya me dê piştgiriya fikirên ji bo xêra welêt û Rojhilatê ne bîke û li hember fikirên dijber têkoşînê bide.

Armanca me dê ev be ku em ê bi ruhê yekîtiyeke ku li ser bingehê hezkirin û rêzgirtinê ava bûye, ji bo ku pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî wek dozeke welêt bête qebûlkirin, bixebeitin.

Dema ku em tê de ne, teví ku temî-

nata wê ya qanûnî û hiqûqî tune ye ji dikare wek dema azadiyeke nîsbî ya fiili (de facto) bête binavkirin. Ev ji aliyekî ve ji ber wê qenaeta serokê Hukûmetê tê ku bi tecrubeyên di derheqa ku mirov hertim nikarin bi tahdîyê bêne idarekirin pê re peyda bûye û ji aliyê din ve ji ji ber şûura gelê me ya azadiyê ya ku li ser bingehê tecrubeyan çêbûye, tê.

Li gorî baweriya me yek ji wan astenîgen bingehîn ên ku nahêlin Rojhilat bi awayekî bi rastî pêş bikeve, qanûnen antî demokratîk in. Rojnameya me dê piştgiriya têkoşîna ku ji bo rakirina van qanûnan tê dayin ji bike. □


DICLE-FIRAT, hej, 1, 1962

Ji tirkî: MUSTAFA AYDOGAN

# Berbang



Di ware geskirina ziman û edebiyata kurdî de rola **BERBANG, HÊVÎ Û KURDISTAN PRESS** mezîn e. *Berbang* û *Kurdistan Press* di destpêka salen-ko de li Swêde û *Hêvî* ji li Parise derdi-ke. Niha, dawî li weşana *Hêvî* û *Kurdistan Press* hatiye, lê *Berbang* hê ji ji-yana xwe ya weşanî didomîne û bi ser sed hejmarî ketiye.



# BI MINASEBETA SEDSALIYA ROJNAMEGERIYA KURDÎ DİSA LI SER DÎCLE-FIRATÊ



MUSTAFA AYDOGAN

Pêşniyara ku bi minasebera sedsaliya rojnameya Kurdistanê dibêje; bila sala 1998an bibe sala rojnamegeriya kurd, ji bo bicîhanîna berpirsiyariyên di vî warî de pêşniyareke di cîhê xwe de ye. Xuya ye ev pêşniyar ji aliyê gelek rojname û kovarên kurdan ve ji maqûl hatiye ditin û wan jî dest pê kiriye û bi awayên cuda cuda besdarî pîrozkîri-na vê salê dîbin. Bi derketina berhevoka herheyât hejmarên Dîcle-Firatê, fikireke bi min re çêbû ku divê ez bi nivîsên cuda cuda her carê li ser hin xusûsiyetên Dîcle-Firatê binivîsinim. Ne ez bim jî divê hinin din bi vî karî te rabin. Ev proje hêdî hêdî di serê min de ber bi zelalbûnê ve diçû. Sala rojnamegeriya kurd ez di vî warî de bêtir bi hewes kirim. Ü gava Nûdemê ji min xwest ku ez nivîsa Edîp Karahan a ku navê wê "Ji bo çi em derdikevin?" e, wergerînim, min xwest ez bi vê wergerê re, nivîseke bi qasî ku di çarçoveya kovara Nûdemê de hilê, li ser hin xusûsiyetên Dîcle-Firatê jî binivîsinim; Mîrasa ku Dîcle-Firat li ser ava bû; hin xusûsiyetên şertên siyâsî yên wê demê; rewşa kurdan; Pêwîstiya ku Dîcle-Firat derxist ortê, rola wê û perspektîvên wê; argûmentên wan ên di warê van perspektîvan de...

Ez dixwazim diyar bikim ku armanca vê nivîsê ne ew e ku ez ê bi awayekî berfireh perspektîvên Dîcle-Firatê û argûmentên wê şirove bikim. Min di nivîsa

xwe ya berê (Ronakbîrek û Rojnameyek, Nûdem, No: 24, 1997) de xwestibû ku ez Dîcle-Firat û Edîp Karahan bi awayekî bidim nasîn. Niha ez dixwazim hin xusûsiyetên vê rojnameyê yên din, bidim nasîn. Ji ber vê yekê divê ev nivîs ji aliyekî ve - tevî ku li ser hin niqteyan bi awayekî kurt lênerîn têni diyarkirin jî-wek danasîna Dîcle-Firatê ya bi awayekî din bê nirxandin.

Ji ber ku Edîp Karahan hem xwedîyê wê û hem jî berpirsiyarê wê yê fîlî bû, ez nivîsên wî û perspektîven di nivîsên wî de têni pêşkêşkirin, wek temsîla xeta Dîcle-Firatê dibînim. Ji ber vê yekê, ez ê hin xusûsiyetên Dîcle-Firatê bi alikariya nivîsên Edîp Karahan bidim nasîn.

### Dîcle-Firat berdewama pêla 1948an

Xusûsiyeta pêvajoya ku piştî serîhildana Dêrsimê û heta 1948an hat jiyîn, ji her alyî ve, di bêdengiyeke mezin de wek xeweke giran xuya dibe. Herçiqas nemaze ji 1932an û heta 1946an bi saya Mîr Celadet Bedir-Xan Hawar (15 Gulân 1932-15 Tebax 1943) û Ronahî (1 Nisan 1942- 1 Adar 1945) û bi saya Kamiran Bedir-Xan Roja Nû (3 Gulân 1943- 27 Gulân 1946) hatin weşandin jî lê ji ber ku hem ev kovar li derveyî welêt derdiketin û hem jî ji ber qedexeya di vî warî de ji derveyî çend ronakbîrê Bakur hayê tu kesî ji van hewildanan çênedibû, van kovaran wê demê nikarîbû li perçeyê bakur rola xwe ya di warê şiyarkirin û xwenasînê de bileyizta.

Ancax gava di 1948an de li Stenbûlê "Dîcle kaynagi" (*Çavkaniya Dîcleyê*) hat weşandin, mirov dikare bibêje ku -ne pir xurt bin jî - hin tîrêjan berê xwe dabûn vê xewa giran û êdî behsa işaretên ku pêvajoya bêdengiyê hêdî hêdî be jî ber bi qedandinê ve diçû, hatîbû kirin. Piştî "Dîcle kaynagi", kurdan dev ji hewildanêن xwe yên weşanî bernedan û di 1950yî de dîsa li Stenbûlê "Şark Mecmuası" (*Kovara Rojhilate*) û "Şarkın Sesi" (*Dengê Rojhilate*) derxistin. Lê mi-xabin jiyana weşanî ya hemû kovar û rojnameyên kurdan bi emrê "İlahî" hertim pir kurt bû, ya rastî dihat kurtkirin.

Piştî girtina van rojnameyan, ji 1950yî heta heta 1958an di jiyana me ya weşanî de, tu gavêن xurt ku bi qasî wan balkêş û bikaribin xîtabî hemû "Rojhilat"ê bikin nehatin dîtin. Di 1958an de li Diyarbekirê bi navê "İleri Yurt"ê (*Welatê Pêşketî*) rojnameyeke din derdikeve. Yek ji wan sedemên derketina wê rojnameyê ew bû ku heta wê demê "tu rojnameyên Ankara û Stenbûlê cîh nedidan bûyerên Rojhilate û derd û kulên wê" û ji ber vê yekê pêwîstî bi rojnameyeke weha hebû. Jiyana wê jî ancax heta Payiza 1959an dewam kir. Lê hemû gavên ku ji 1948an û pê ve hatîbûn avêtin û tecrubeyên di vî warî de hatîbûn jiyîn, ji

bo gavê bi dû xwe re wek mîras mabûn. Ji Payiza 1959an û heta ku Dîcle-Firatê dest bi jiyana xwe ya weşanî kir, di qada weşanî de tu gavê berbiçav nehatin dîtin. Ji wê demê û vir de, gava yekem, ancax di 01.10.1962an de bi Dîcle-Firatê hat avêtin. Dîcle-Firatê bi mîraseke ne pir xurt dest bi weşanî kir, lê ew mîras têra ku di warê pîrsa welatê xwe de bi mîrxasî weşanî bike, dikir.

Jiyana weşanî ya kurdan û daxwazîn ci di wê qadê de û ci jî di qadên jîyanê yên din de dihatin kirin, pêvajoya şiyarbûn û lixwevegerînê xurttir dikir. Dewlet bê midaxele nema û li gel zilm û zora li Kurdistanê, bêtir jî li kesen ku besdarî jiyana weşanî dibûn dihat xezebê.

### **Şertên siyasi yên wê demê**

Pêvajoya bêdengiyê ne bi tenê di qada jiyana weşanî de, lê herweha di qada siyasi de jî hat jiyîn. Ji destpêka pêvajoya ku min navê "pêvajoya bêdengiyê" lê kir û vir de heta demeke dirêj, çareserkirina pîrsa kurd ji siyasetvanen ku li gor îdeolojiya resmî siyaset dikirin re hatibû hiştin. Wek di Dîcle-Firatê de jî hatiye diyarkirin, wan siyasetvanan ne rastiya kurdan nas dikirin û ne jî dixwestin nas bikin. Metodeke wan hebû, ew jî qûndaxa tivingen cendirmeyan bû. Ji bo çareserkirina pîrsê, ji derveyî devê tivingê, tu rîyê din nehatibûn bikaranîn. Ji dema ku Komara Tirkîiyê hatiye avakirin û vir de, her ev siyaset hatiye meşandin.

Di dema Partiya Demokrat de jî her eynî siyaset, yanî siyaseta resmî ya dewlette hatiye birêvebirin. Lê di dema îqtîdara vê Partiyê de, kapitalizm li Tirkîiyê pêş dikeve û ev pêşketin tesîrê li bakurê Kurdistanê jî dike. Di civatê de guhertinê berbiçav xuya dibin. Ev guhertin bi guhertinê dinyayê yên di warê şiyarbûn û rizgarbûna neteweyan de derdi Kevin ortê re, tesîrê li ronakbîrên kurdan jî dikan. Ji bo pêşdebirina doza gelê kurd wan dide fikirandin û ber bi livandinekê diajon. Ew dem ji aliyê şiyarbûn û rizgarbûna gelan jî demeke balkêş e. Çirûskênen ku ji tevgera gelan diçûn tonahiya xwe dida welêt. Bi taybetî pêla ku li basûrê welêt rabûbû, ji bo şiyarbûna vî gelê ku hogirî xeweke giran bûbû, tesîreke mezin dikir.

Ber bi dawiya salên soyî de piştgiriya Partiya Demokrat baş kêm bûbû. Siyaseta ku wê dimeşand dibû sedemên reaksiyonen mezin. Lê gava di hilbijartînên 57an de jî bû partiya yekem û bi dû hilbijartinan re bû hikûmet, êdî hem di civatê de û hem jî di nava ordiyê de dengê nerazîbûnê her diçû bilinditir dibû.

Siyaseta ku li ser bingehê înakar û asîmîlasyona kurdan hatibû avakirin, her di wê demê de jî berdewam bû. Di vî warî de ji bo bilîvkirina mafekî piçûk jî des-

tûr tune bû û her hewildanê dî vê rêtê de bi tahde û zilma dewletê re rû be rû dibû. Di vî warî de ronakbîrên kurdan li gor imkanan di ber xwe de dane, lê hertim siyaseta zorê û cezakirinê li hember wan hatiye bikaranîn. Di 17ê Çileya Pêşin de 49 kurd, ji ber ku kurd bûn û mafê kurdan dianîn zimên, hatin girtin. Mixalefeta li ser navê pêşverûti û demokrasiyê ya ku tiştê herî piçûk jî li hember hikûmetê bi kar dianî, ne ev bûyer dît, ne ew zilm û zora ku wan 49 ronakbîrên kurd anîbû zimên dît. Ew devera ku bûbû cîhê ceribandina zilm û zora nedîti, ne ji aliyê hikûmetê ve dihat naskirin û ne jî ji aliyê mixalefetê ve.

Di dawiya meha Nîsana 1960î de li gelek deveran meş û mítîng çêdibûn û polîsan her metoda êrîşkariyê bi kar dianî. Partiya Gel a Komarê (*CHP*) bi amade-kirina darbeyekê dihat tawanbarkirin. Tevî "birêvebirina awarte" jî meş û mítîng nedisekinin. Meş û mítîngên ku ji 28ê Nîsana 1960î dest pê kir, heta 27ê Gulanê her berdewam bûn. Partiya Gel a Komarê bi piştgiriya ordiyê û xwendevanan ev mixalefet organîze dikir û serokê wê di wan rojan de ji hikûmetê re eşkere digot ku ez jî nikarim we xelas bikim. Di şê Gulanê de di serî de zabitên ordiyê û endamên Partiya Gel a Komarê di mítînga ku ji aliyê Partiya Demokrat li Kızılayê hatibû organîzekirin de li Menderes xistin.

Di hundurê dewletê de hêzên cuda bi hevdu ketibûn. Partiya Gel a Komarê piştgiriya mixalefeta civakî jî wergirt û bi hêza xwe ya di ordiyê de hebû, ji bo pêkanîna programa xwe ya di dema mixalefetê de hatibû diyarkirin, îmkana îqtîdarbûyinê bi dest xist. Û di 27ê Gulanê de komîteya (Komîteya Yekîtiya Neteweyî- Mili Birlik Komitesi) ku ji derveyî hîyerarşıya ordiyê hatibû avakirin, dest danî ser îqtîdarê.

Bi 27ê Gulanê re bi gelek kesan re hêviyek çêbûbû. Gelek kesan li ser navê demokrasî, azadî û pêşverûtiyê piştgiriya wê kir.

Bi 27ê Gulanê re û bi taybetî bi qebûkirina Qanûna Bingehîn a nuh re (09.07.1961), di cepheya muxalîf de livandineke berbiçav çêbû. Çepê Tirkiyeyê jî dest bi livandineke mezin kir. Bi taybetî damezrandina Partiya Karker a Tirkiyeyê, rengekî nuh da siyasetê. Ev hin xusûsiyeten dema nuh a ku bi vê qanûna bingehîn re dest pê kir bûn. Van guhertinan bêşik tesîr li civata kurd û nemaze li ronakbîrên kurd jî kir. Desthilatdarên 27ê gulane "efûyeke siyasi" jî derxist. Lê bi "efûya wan a siyasi" re, herkes hatin berdan, bi tenê kurd di girtîgehê de hatin hiştin. Partiya Demokrat 49 kurd girtibûn û desthilatdarên 27ê Gulanê jî girtina wan domandibû. Li ser navê "pêşverûtiyê" û "dij-feodalîzmê" "55 axa" yêndi kurd ku yek ji wan jî Faîk Bucak bû, hatin sirgûn kîrin û 400 kurd li

Kampa Sîwasê hatin civandin. Bi kurtî, xeta li hember kurdan a esasî qet nehatibû guhertin. Di Qanûna bingehîn de dîsa kurd tune bûn. Maf û azadiyên kurdan ên neteweyî û demokratîk dîsa tune hatibûn hesibandin. Qanûna bingehîn wek belgeyêن Komarê yên beriya xwe -tevî ku li gora ya 1924an ji bo bikaranîna hin maf û azadiyên nisbî rê vekir jî- ji bo kurdan belgeyeke înkarkirina hebûn û maf û azadiyên kurdan bû. Projeya desthilatdaran a di warê çareserkinâna pirsa kurd de bi vê Qanûnê careke din eßkere bûbû. Mantiqê 1924an her berdewam bû. Sîyaseta Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî (Mili Birlik ñaresi) ya bi 27ê Gulanê re derketibû ortê, di warê pirsa kurd de tu guhertinin nuh neanîbûn û perspektivîn Partiya Gel a Komarê di vî warî de jî bûbûn bingehê Qanûna Bingehîn û bi vî awayî xeta nîjadperestî û kurdnenasî bûbûn xusûsiyeten wê demê jî.

Ev ji bo kurdan bûbû xeyalşikestineke mezin. Ji ber ku berê wek gelek pêşverûyên Tirkan, gelek ronakbirêن kurdan jî bi hêviyeke mezin li 27ê Gulanê nihêrîbû. Herçiqas li hember kurdan siyaseteke kurdnenas a li ser bingehê înkarkirina maf û azadiyên kurdan hatibû avakirin di rojevê de bû jî, kurdan zû bi zû xwe li mixalefetkîneke dijwar ranekîsandibû. Ji ber ku li gorî wan, tevliheviya di nav ordiyê de berdewam bû û ihtiîmala darbeyeke hêzên hîn totalîter û hîn bêtir dijminên kurdan hebû. Ev jî dibû sedema ku kurd li hember Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî bi temkîn bin. Lê tev vê jî sîyaseta 27ê Gulanê di warê lixwegerînê û lêgerîna projeyêن xwerû kurdî de, kurd dan fikirandin.

## Pêwîstiyek

Wek min li jorê jî anî zimên, kurd heta demeke dirêj dûrî pirsa xwe mabûn. Hin hewildanêن beriya darbeya 27ê Gulanê di rêya bicîhanîna vê pêwîstiyê de gavin wêrek bûn û ji bo gavêن bi dû xwe re wek mîras diman, lê dîsa jî di vî warî de her tim pêwîstiyek hatibû hiskirin. Ev pêwîstî piştî 27ê Gulanê hîn bêtir diyar bûbû.

Li gorî Edîp Karahan divê êdî kurdan bi xwe dest biavâtana pirsa xwe û li hember vê projeya kurdnenas projeya xwe ya kurdî pêşkêş bikira. Li gorî misteweşa rojeva kurdan a wê demê û çarçoveya ku wan ji pirsa kurdî re datanî, divê li hember qanûnên li dijî demokrasiyê têkoşîneke xurt bihata dayin. Divê mirov zor bida imkanên qanûnî û ev pirs bida minaqeşekirin û di vê minaqeşeyê de ji bo peydakirina fikreke hevbeş, li imkanan bihata gerîn. Ji bo vê, wasiyeteke ku bikaribe xizmeta vê projeyê bike û dengê wê bigihîne her deverê pêwîst bû. Rêyeke taybetî divê bihata dîtin.

## Dicle-Firat encama xeyalşikestinekê û bi îdîaya bicîhanîna pêwîstiyeke

Dicle-Firat bi îdîaya bicîhanîna pêwîstiyeke weha û bersivdana daxwazên di wî warî de hebûn, derker ortê. Di vê mahneyê de, Dicle-Firat berhemekê ji wan berhemên hewildana ji bo peydekirina rêyeke taybetî ye.

Di nivîsa "Ji bo çi em derdikevin?" de tê xuyakirin ku heta nuha "*tu tevgerên nuhîtiyê qedera Rojhilatê ya xerab ne guhertiye*". Sîyaseta Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî, wek îqtîdarên beriya xwe kurd xeyalşikestî kiribûn. Hêviyên ku ji wê hatibûn kirin, pûç derketibûn. Piştî ku rastiya Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî eşkere bû û li hember kurdan siyaseteke ku ji yên berê ne pir cuda hat meşandin, Dicle-Firatê her di eynî nivîse de weha digot:

"*Ji Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî ya ku gelê Rojhilatê ji dil û can piştgiriya wê dikir û hêviya xwe pê ve girê dabû, ji bo me Kampa Sîwasê ya ku ji Rojhilatiyan pêk hatibû, erdên mayinkîrî yên ling, mil û serên feqîr û fîqarayêñ Rojhilatê Başûr difirîne û bûyera ssan wek bîranîn man.*"

Ji ber vê yekê, mirov dikare bi hêsanî bibêje ku pêywendiyeke pir xurt di navbera sedemên derketina Dicle-Firatê û sîyaseta ku li hember kurdan hatibû meşandin de heye. Heta, ger mirov bibêje ku jiyana weşanî ya Dicle-Firatê raste rast encama reaksiyonên li dijî sîyaseta Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî ya di derheqa pirsa kurd de ku kurd xeyalşikestî kiribûn, bû, dê ne şaş be. Dicle-Firatê xwestiye bibe dengê vê reaksiyonê. Ji xwe, di nivîsa ku navê wê "Ji bo çi em derdikevin?" de jî ev îdîaya Dicle-Firatê û sedemên derketina wê pir eşkere têzimên:

"*Rojhilatî ji ber helwêstên sîyasetvanan ên cudaker, mecbûrî dengnekirinê bûne û çareserkirina pirsa xwe li hêviya sîyasetvanen ku Rojhilatê nasnakin, naxwazin rastiya Rojhilatê bibînin û dixwazin hertiştî bi qûndaxa tivingên cendirmeyan çareser bikin, hiştiye. Ji xwe, encama vê lihêvîmayinê bûye xeyalşikestin.*

*Rojnameya me di encama vê xeyalşikestinê de derdikeve.*"

## Bi fonksiyona peydakirin û belavkirina lênerîneke hevbeş

Xebata ji bo pêşveçûna "Rojhilat"ê ji bo Dicle-Firatê xebateke bingehîn e. Di vî warî de, minaçeşekirin, peydakirina fikireke hevbeş û jiortrâkirina cudahiyêñ fîkrî karêñ herî girîng têz hesibandin. Ji ber vê yekê, dîsa di nivîsa "Ji bo çi em derdikevin" de weha tê gotin:

"*Karê rojnameya me yê yekem ev e ku ew ê ji bo pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî bixebite û di vê rêtê de cudabûnên ku di warê fîkirî de bêñ dîtin, ji orteyê ra-*

*ke û wan bike yek."*

Her di eynî nivîsê de tête diyar kirin ku rojname bêyi ku li ferqa sinifi binihêre, dê ji bo hemû hevwelatî û ciwanên ku bi dil û can dixwazin "Rojhilat" ango bakurê kurdistanê pêş bi keve, vekiribe. Ev hevwelatî hevwelatiyêن "Rojhilatî" ne û ev ciwan ciwanên "Rojhilatê" ne.

*"Rojnameya me, ji kijan tebeqeya civakî têbila bêñ (esnaf, ticar, axa, rîncber, karker û hwd) dê ji bo hemû hevwelatî û ciwanên Rojhilatî yêñ ku bi dil û can terrefdarê pêşveçûna Rojhilatê ne, vekiribe. Bi vî awayî ji bo lênerîneke hevbes derkeve ortê û belav bibe, dê xebat bête kirin." (hejmar 1- Ji bo çi em derdikevin?)*

Ev gotin jî diyar dikin ku pirsa "Rojhilatê" û terefdarbûna pêşvebirina "Rojhilatê" ji bo jiyana weşanî wek esas têb qebûlkirin. Dicle-Firatê xwestiye di vî warî de fonksiyonekê bileyize. Wê xwestiye di warê pirsa kurd de, di nav kurdan de îmkanên fikreke hevbes bêñ bidestxistin. Wê ne bi tenê ji bo peydakirina lênerîneke hevbes, herweha ji bo belavkirina vê fikirê jî xwe berpirsiyar dîtiye. Ev jî diyar dike ku Dicle-Firatê ji bo peydakirina îmkanin weha û belavkirina lênerînên hevbes ên ku pirsa "Rojhilatê" wek bingeh werdigire, hewil daye ku wek platformeke kurdan a girîng rola xwe bileyize.

#### **"Divê pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî wek dozeke welêt bête qebûlkirin"**

Li gor siyaseta Dicle-Firatê menfaetên "Rojhilatê" bingeh e. Çi li gora menfaetên "Rojhilatê" be, ew ê piştgiriya Dicle-Firatê werbigire. Rojname herweha dê li hember fikirên ku li dijî menfaeta "Rojhilatê" ne têkoşîneke dijwar bide.

Lê gava Dicle-Firat her di eynî nivîsê de dibêje; *"Rojnameya me dê piştgiriya fikirên ji bo xêra welêt û Rojhilatê ne, bike û li hember fikirên dijber têkoşînê bide"*, mirov di derheqa gotina "welat û Rojhilatê" divê piçekî bifikire. Ger quesda Dicle-Firatê bi "Rojhilatê" welat be, gelo ev gotina "welat û Rojhilat" ji bo çi bi hevdu re hatine bikaranîn. Gelo welat û Rojhilat ji hevdû cuda ne? Ger weha be, em Rojhilatê fahm dikin, lê bi welat qed kî der e?

Gava mirov her di eynî nivîsê de paragrafa ku armanca rojnameyê diyar dike dixwîne, mirov digihêje qenaetekê. Yanî Dicle-Firat dixwaze pirsa pêşveçûna Rojhilatê wek dozeke "welêt", yanî wek dozeke Tirkîyeyê bête qebûlkirin. Ev quesd bi vê paragrafê weha diyar dibe:

*"Armanca me dê ev be, em ê bi ruhê yekîtiyeke ku li ser bingehê hezkirin û rezgirtinê ava bûye, ji bo ku pêşveçûna Rojhilatê ya çandî û aborî wek dozeke welêt bête qebûlkirin, bixebeitin."*

Di gelek waran de lênerîn ne zelal in. Gelek caran dijîtiyên berbiçav xuya dibin. Ji xwe li gora wan, armanceke Dicle-Firatê jî ew bû ku wê dixwest di pirsên esasî de, şertên lênerîneke hevbeş amade bike.

Perspektivênu ku di warê pirsa kurd û Tirkîyeyê de diyar dibin, ne bi tenê xusûsiyetêni Dicle-Firatê derdixîne ortê, her weha xusûsiyetêni salên 1960î jî derdi-xîne ortê. Ji ber vê yekê pir balkêş in. Tirkîye û Kurdistan di gelek nivîsan de - tevî ku carinan di nav rîzan de tiştên bi vê re nelihewkirî tê xwendin jî- ne wek du welatên cuda, lê Kurdistan wek herêmeke Tirkîyeyê tê pêşkşêkirin.

*"Pêşveçûna Tirkîyeyê tevahiyek e û pêşveçûna Rojhilate perçeyek e. Pir eşkere ye ku perçê tabîî tevahiyê ye." (hejm. 2 - Pêşveçûna Rojhilate û lênerînen şas)*

Di nivîsan de temaya yekîtiyê pir li pêş e. Ew yekîtiyekê dixwazin, lê ji bo vê yekîtiyê şertên wan hene. Di nivîsa hejmara 4an a ku navê wê "Li ser yekîti û bihevrebûnê" de jî tête diyarkirin ku berî hertiştî divê mirov destûrê nede ku hin hevwelatî li ser hin hevwelatiyên din desthilatdariyê deyne. Bêyî ku mirov li ferqa nîjad, dîn, mezheb û zimên binihêre, divê hemû hevwelatî li hember qanûnan wek hev bin.

Çarçoveya yekîtiyê "Misak-i Mili" ye û ev sînorê pirsa kurd e jî. Di nav Misak-i Mili de paraztina xusûsiyetêni cuda ji bo wan pir girîng e. Bo nimûne; gava gelê herêmekê bi zimanê xwe bipeyive û binivîsîne divê wek xeterekê neyê dîtin: "Di nav civata Tirkîyê de, gava gelê herêmekê bi zimanê xwe bipeyive û binivîsîne, ev ji bo çi ew qas bi xeter tê dîtin, em nikarin vêya fahm bikin?" (hejm. 2 - Pêşveçûna Rojhilate û lênerînen şas)

Min di vê paragrafê de, paraztina xusûsiyetêni di warê zimên de fahm kir, lê divê ez diyar bikim ku min tu mahne neda gotina "di nav civata Tirkîyê de". Di vira de mirov dikare bi hêsanî bibîne ku di hilbijartina gotinan de carinan gotinêni ku dûrî ruhiyeta Dicle-Firatê ne hatine bikaranîn.

Li ser ordiyê jî mirov dikare li hin gotinin xerîb rast bê. Ev di warê rola ordiyê de hem ji bo misteweya têgihîştina cepê Tirkîyeyê û hem jî ji bo ya ronakbîrên kurdan nimûneyeke balkêş e. Xuya ye di wê demê de, pêwîstiya serê kurdan li ser vê pîrsê jî bi zelalbûneke baş hebûye.

Di Dicle-Firatê de li ser ordiyê weha tête gotin:

*"Yen dixwazin ordiyê ji bo menfaetên xwe yên taybetî bi kar bînin, ew ê ji aliyê ordiyê bi xwe ve bîn ecîqandin. (hejmar 6-Qedera rejîma demokratik)*

Ji xwe, bi minasebeta salawexta wefata Ataturk, weşandina sûretê wî yê di hejmara rojnameyê ya duyem de û nivîsa ku li binê sûretê wî hatiye nivîsandin, li

ser rûpelê yekem wek pîneyekî xuya dibe.

Termînolojiya ku di rojnameyê de tête bikaranîn, tiştên ku ci li ser navê taktî-kê, ci ji li ser navê stratejiyê têne gotin, çarçoveya ku ji bo pirsa kurd tête danîn û tesbîten di warê rewşê de diyar dîkin ku bê misteweya minaçeşeya pirsa kurd, rewşa tevgera neteweyî, awayê nêzîkbûna pirsê û bi giştî rojeva kurdan cawa ne. Rojname di vê mahneyê de ji belgeyeke pir hêja ye.

### Gelo argumentên Dicle-Firatê ci ne?

Gelo Dicle-Firatê di vî warî de, ji bo ci xeteke weha meşandiye û termînolojiyeke weha bi kar anîye? Em pir baş dizanin ku Dicle-Firat û dorhêla wê mixalîfê rejimê bûn û bingehê jiyanâ wan a weşanî pirsa kurd bû. Lê tevî ku hêviyên wan ên ji Birêvebirina Yekîtiya Neteweyî hatibûn kirin, pûç derketibûn û qenaeta ku divê êdî "Rojhilatî" bi xwe dest biavêjin pirsa xwe û ji bo çareserkirinê fikireke hevbes derxîne ortê ji bi wan re peyda bûbû, gelo ji bo ci mixalefetekê xurt nekiribû, an nexwestibû bike? Min bi vê meqsedê ji li Dicle-Firatê nihêrî û di hin hejmarêne wê de, hin niqte tesbît kirin ku bi vê pirsê re elaqadar in.

Nimûneyên ku ez ê bidim -wek ku min li jorê ji diyar kir - dê ji nivîsên Edîp Karahan bêñ hilbijartin. Ji ber ku xeta rojnameyê di van nivîsan de pir eßkere ye û ya herî girîng ji nivîsên wî temsila xeta rojnameyê dike.

Ez dixwazim bi nivîsa li ser "Turkeş û Sosyalîzm"ê dewam bikim:

"*Neyse em weha bihesibînin ku Turkeş bû iqtîdar. Em ê ji kîrinêñ wî çend xalan rez bikin: 550 Rojhilatî sîrgûn, 4000 Rojhilatî ber bi Kampa Sîwasê. Li sînorêñ Rojhilatê 1000 erdêñ mayinkiri. Ev reqem nîşan didin ku ev kîrin ji wan kîrinêñ Turkeş ên ku di dema iqtidara Yekîtiya Neteweyî de kîribûn, deh caran bêtir in.* (bejmar 6- Turkeş û Sosyalîzm)

Xuya ye wê demê tirseke mezin hebûye ku hin hêzên hîn totalîstertir dikarin bêñ ser hikum. Li gorî Dicle-Firatê gava rewşêke weha çêbibe, devera ku herî bêtir zerañ bibine dê dîsa "Rojhilat" be.

"*Em bi xwe ji pêşeroja civata xwe, ne bi hêvî ne. Di rojêñ pêş de, iktîmala avakirina iqtidareke faşist a ku niqteyên wê yêñ esasî an ji aliyê sîvîlan, an ji aliyê leşkeran, an ji ji aliyê sîvîl û leşkeran ve -têkel- bêne girtin, heye. Birêvebirineke Faşist a weha dê di emrê xwe yê yekem de berê topêñ xwe miheqeç bide Rojhilatê.*" (bejmar 7- Eniya Demokratik)

Ji ber vê yekê, di hejmara 6an de di dawiya nivîsa "Turkeş û Sosyalîzm"ê de weha tê nivîsandin:

*"Birêz Turkeş ger tu berê di ser termên me re derbas nebi, tu ê nikaribî nîzama qanûna bingehîn ji ortê rakî û bê ser hikum."*

Ü piştî wê ji di navbera rejimeke "dîkta û demokrasiyê" de terciha xwe tîne zimên: " *Di navbera dîkta û demokrasiyê de, terciha xwe li aliyê demokrasiyê da-nîn, ji bo Rojhilatiyan pirsa man û nemanê ye.*" (*hejmar-7 demokratik cephe*)

Her di eynî nivisê de, bi tercîhê re, damezrandina eniyeke demokratik wek pêwîstiyekê tê pêşkêşkirin û di derheqê besdariya kurdan de ji weha tê gotin:

*"Ger li Tirkiyeyê eniyeke demokratik bête avakirin, Rojbilat dê bibe endama wê ya herî sadig."* (*hejmar-7 demokratik cephe*)

Di derheqê mixalefetkirinê û pirsên ku bala min kişandibûn de ji fikirên rojnameyê hêdî hêdî diyar dibin. Rojname ji aliyekî ve behsa siyasetên ku kurd xeyalşikestî kirine û hêviyên ku pûç derketine dike û ji ber vê yekê dixwaze li ser bingehê menfaetên "Rojhilat"ê mixalefetê bike, ji aliyê din ve ji ji bo îqrîdareke hîn xerabtir çênebe, destê wê ji koalisyonê nabe. Di vî warî de hem xeta ku tê meşandin û hem ji sedemên wê, weha têni diyarkirin:

*"Dîcle-Firat ji bo ku tu firsetan nedî destê dijminên koalisyonê wek ku heta nûha kiriye, ew ê ji nuha û pê ve ji bi giranî û hürbijarî hereket bike.*

....  
*Madem em diktayeke nijadperest naxwazin û em li dijî diktayê ne, wê gavê ger em ji koalisyonê re zehmetiyan derxînin, ma ew ê neyê wê mahneyê ku em dara bin xwe dibirin?*

....  
*Dil dixwest ku Dîcle-Firat bi awayekî hîn mukemmeltir derkeve, lê dil tiştekî di-beje û aqil tiştekî din. Ü kapasiteya xebatkarên Dîcle-Firatê têra vê mukemeltyî dike. Dîcle-Firat bi giranî, lê bi awayekî ewle ber bi hedefa xwe ve pêş de diçe.*

*Nîşîn nuh pê nizanîn, lê yên kevin dizanîn: Di dema Meşrûtiyetê de demekî bi kurdi rojname û kovar derketin. Dibistanên kurdi yên "nimûne" hatin vekirin, lê dû re... Di rîya ber bi hedefe ve cûyinê de şîara Dîcle-Firatê yekîtiya neteweyî ye û dê yekîtiya neteweyî bimîne."* (*hejmar-7 demokratik cephe*)

Lênerînênu ku li jorê hatin zimên, ji bo diyarkirina bitemkînbûna ronakbîrên wê demê pit balkêş in. Dîcle-Firat xwedîyê felsefeyeke weha ye. Li gorî vê felsefeyê xeteke siyasi pêşkêş dike. Li gorî ku diyar dibe, birêvebirên Dîcle-Firatê nedixwest rîyên ku berê hatibûn ceribandin û li gora baweriya wan, encam nedabûn an ji encamên pir xerab dabûn, dîsa biceribînin. Wan ew ji bîr nekiribûn û ji ber vê yekê, dixwest lingên xwe bi semt biavêjin û di bin ronahiya tecrubeyên

dîrokî de hereket bikin. Dîcle-Firat mixalefetê dike, lê li vê mixalefetkirina xwe baş miqate ye, da ku mixalefeta wê bi kêrî dijminên koalîsyonê neyê. Ji ber ku li gora baweriya wê, di şerê di navbera koalîsyonê û dijminên koalîsyonê de, dijminên koalîsyonê dê qet nebin tercîha wê. Yanî dijminê dijminê mirovî hertim ne dostê mirovî ye, lê dikare dijminekî hîn dijwartir be...

Ger mirov li ser gotinên ku ji Dîcle-Firatê hatine wergirtin baştir bifikire, mirov ê bibîne ku di eslê xwe de Dîcle-Firat dizane bê daxwazên ci ye, dilê wan ci dibêje. Li gorî ku tê idîfakirin, li dora wê ji kadroyen ku kapasiteya wan têra bicîhanîna van daxwazan dikan, hebûne. Lê dîsa li gora wan, dem dema bi itîna û bi aqîlî hereketkirinê bû. Li gorî ku ew idîa dikan, ew bi ya dilên xwe nakin û li gora tecrubeya "nîfşen kevin" li gora êqil dimeşin. Ji ber vê yekê, xwe realist dihesibînin.

Şîara wan a "yekîtiya neteweyî" ji ji bo paraztinê wek mertalekî diyar dibe. Dîcle-Firat mixalîf e, mixalîfeke li ser navê kurdan. Kurdên ku behsa rewşa "Rojhilatê" dikan, di wê demê ji bi "herêmperestî" û bi "cudakeriyê" tên îthamkirin. Kurdan ji ji bo paraztinê, temaya yekîtiyê û di nava vê yekîtiyê de daxwaza pêşveçûna "Rojhilatê" ajotiyê pêş. Li gor baweriya birêvebirên Dîcle-Firatê, rojnameya wan ji bo meşandina mixalefeteke bi vî rengî, wek platformeke realist rola xwe leyiztiye.

Dîcle-Firat di perspektîven xwe de ci qas bi heq derket, kîjan perspektîven wê rast bûn, kîjan şaş bûn? Bi carekê hertişt redkirin, an ji bi temamî qebûlkirin, ne metodeke rast e. Di vî warî de, di salên 7oyî de Xwedêgiravî hin qonax derbaskirî hatibûn hesibandin, lê di salên 80 û 90î de, hin qonaxên ku derbaskirî hatibûn hesibandin ji nuh ve bûn mijarên minakeşeyê û xalên rojevê. Divê xususiyetên wê rewşê di pêvajoya dîrokî de li gora şertê wê demê û bi misteweya minaçeşeya civaka me bêni şirovekirin û dersên pêwîst jê bêni wergirtin. Divê ronakbîren kurdan bi awayekî hîn aktîvtir beşdarî hewildanên ji bo bicîhanîna vê berpirsiyariyê bibin.

Di vê niqteyê de tiştek heye ku divê mirov tesbît bike. Ew ji ev e ku tevî xeta Dîcle-Firatê ya "biaqılı, hûrbijarî û bi semt" hereketkirinê ji siyaseta desthilataran a li hember gelê kurd nehat guhertin û di 1963an de 23 kurd ku berpirsiyare Dîcle-Firatê ji di nav wan de, ji ber kurdîtiyê hatin girtin û bi vî awayî jiyanâ weşanî ya rojnameyê qedîya.

## **"Ji nuha û pê ve, gava di ıfadekirinê de heta dereceyekê zehmetî bête kişandin, em ê kurdî bi kar bînin"**

Gava min Dicle-Firat dixwend, min bi carekê ji bir kir ku bê ez bi kîjan zimanî dixwînim. Heta ku ez li xwe hay bûm ku ez bi tirkî dixwînim, min digot qey nivîs bi kurdî ne. Hin dikarin bibêjin ku Tirkiya kurdan di bin tesîra kurdî de hatiye nivîsandin, ji ber vê yekê, bi te weha hatiye. Heta niha kêm kovar û rojnameyên kurdan yên bi tirkî hiseke weha xurt a bi qasî Dicle-Firatê bi min re çekiriye. Wekî din jî ger em di Dicle-Firatê de, bala xwe bidin misteweya bikaranîna zimanê tirkî, em ê bi hêsanî bibînin ku Tirkiya wê, li gora wê demê Tirkiya ronakbîran e. Li gor gelek kesan sedem, hisen Dicle-Firatê, rengê wê û ronahiya ku jê diçûrisî ye.

Em nuha jî di gelek civîn û kongreyan de, dibin şahid ku gelek ji me - kurdên Swêdê ne tê de- hîn jî rîya hêsan hildibijérin û di warê bikaranîna kurdî de tehamulî piçekî zehmetiyê nakin. Şiyana xwe ya ji bo fîrbûna zimanên biyanî, ji bo kurdî bi kar naynin. Gava em di pêvajoya bi kurdîxavtinê de, piçekî zehmetiyê dikişînin, em dibêjin, "em di warê xwe ıfadekirinê de zehmetiyê dikişînin, ji ber vê yekê em dixwazin bi tirkî bidomînin". Lî tevî ku di warê bikaranîna zimanê kurdî ya bi nivîskî de dema me bi qasî ku mirov nikare bi salê 1960î re miqayese bike li pêş e jî Dicle-Firatê wek me nekiriye. Wê tam tersê me kiriye. Dicle-Firatê bi tirkî dest pê kiriye û planên xwe yên di warê kurdî de hêdî hêdî eşkere kirine. Di hejmara heftan de jî weha dinivîsin: "Ji nuha û pê ve, gava di ıfadekirinê de heta dereceyekê zehmetî bête kişandin, em ê kurdî bi kar bînin."

### **(hejmar 7- Swaro)**

Ev rûpelên helwêsta lixwevegerînê ne. Ev xusûsiyetekê rojnameyê ya balkêş e. Divê li ser bête fikirandin.

Di beşa Dicle-Firatê ya bi navê "Ziman-Edebiyat-Folklor"ê de, bi tenê nivîsên li ser ziman, edebiyat û folklora kurdî hene. Ji derveyî wan, mirov li tu nivîsên din rast nayê. Ger mirov vê xusûsiyeta Dicle-Firatê bi beşen "ziman û edebiyat"ê yên gelek rojnameyên me yên ku di dema me de di giraniyê de bi tirkî derdi Kevin re miqayese bike, mirov ê tevî imkan û pêşveçûnen berbiçav jî ferqe-kê tesbit bike. Min di derheqê meyla Dicle-Firatê ya di warê kurdînivîsandinê de berê nivîsibû. Ez naxwazim li vira dubare bikim. Lî ger ez mijarên herheyş hejmarên Dicle-Firatê yên "Ziman-Edebiyat-Folklor"ê li jêrê binivîsim, hem xusûsiyeta rojnameyê ya di vî warî de û hem jî ferqa ku divê bête dîtin, dê baştır xuya bibin. Di vira de, van rûpelên Dicle-Firatê ji sedî sed (%100) rûpelên ziman, edebiyat û folklora kurdî ne. Em hemû dizanîn ku hem hayê berpirsiyarê

Dîcle-Firatê û hem jî hayê xebatkarên wê, ji edebiyata Tirkîye û dînyayê hebû. Lê dîsa jî mirov ji derveyî ziman, edebiyat û folklora kurdî nikare tu tiştekî din tê de bibîne.

Ziman-Edebiyat-Folklor : **Hejmar 1:** 1- Mele Ahmedê Cizîrî, 2- Koka kurdan I. **Hejmar 2:** 1- Şêx Ahmedê Xanî, 2-Koka Kurdan II. **Hejmar 3:** 1- Hecî Qadi-rê Koyî, 2- Koka Kurdan III. **Hejmar 4:** 1- Helbestên bijarte (*helbesîn bi kurdî*), 2- Xalîfîka Fersê (çîrok), 3- Edebiyat (li ser edebiyata kurdî -wergerek). **Hejmar 5:** 1- Ziman I (Li ser zimanê kurdî- wergerek), 2- Dînê û Dîno (çîrok). **Hejmar 6:** 1- Ziman II (dewama wergera hejmara şan), 2-Xecê û Siyamed, 3- Eşîrêñ Kurdan I (wergerek). **Hejmar 7:** 1- Eşîrêñ Kurdan II (dewama hejmara 6an), 2- Swaro (çîrok). **Hejmar 8:** 1- Dîroka Kurdan, 2- Kurd û Dîn, 3- Heydo û Ferho (çîrok- xwerû bi kurdî).

**"Tu dinivînî, ji bo çî? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike. Tu şiyar dikî, ji bo çî? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike."**

Wekî din jî ger em bala xwe bi awayekî din bidin rojnameyê, em ê di warê parazti-na zimêñ -wek xusûsiyeteke "Rojhilatî" - û têkoşîna li dijî asîmîlasyonê de, li gelek nîvîsan rast bêñ. Ji bo rastiya Dîcle-Firatê ya di vî warî de min ji hejmara duduyan nimûneyek hilbijart. Ez bawer dikim ku ev nimûne dê têra diyarkirina xusûsiyeta rojnameyê ya di vî warî de, bike.

*"Berê ji bo ku Rojhilatî zimanê xwe yê bav û kalan, urf û adetên xwe ji bîr bikin, Rojhilat hat ihmalkirin. İro ronakbîr û siyasetvan pêşveçûna Rojhilatê dixwazin. Li vira, armanc dîsa di hundurê xwe de hilandina Rojhilatê ye.*

*... Sedsal derbas dibin, fikir têñ guhertin, lê meqsed nayê guhertin. Tu dinivînî, ji bo çî? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike. Tu ji şiyar dikî, ji bo çî? Ji bo zimanê xwe ji bîr bike." (hejmar 2- Pêşveçûna Rojhilat lênerînêñ şas) □*

# MEDYA GÜNEŞİ GULVEDANA PÊVAJOYEKÊ BÛ...



OSMAN AYTAR

**G**otinêni li ser destpêkên nû pir in. Herkes li gor xwe wan şirove dike û encaman derdixîne. Ü gavêni weha ji bo wê demê û demêne pêşerojê dikarin bibin wesile yan jî bingehêni plan û projeyêni nû. Berî deh salan, di meha nîsana 1988an de, 90 sal di pey derketina rojnameya "Kurdistan"ê de, di pêvajoyeke ku zilm û zordestiya diktatoriya faşist a Tirkîyê dewam dikir de li Îstenbolê derketina kovara Medya Güneşiyê destpêkeke weha bi mane û hêja bû. Ew, weşana yekem a kurdan bû ku piştî darbeya 12ê ilona 1980yî di warê legal de li Îstenbolê derdiket. Medya Güneşî, bi zimanêni kurdî û tirkî, ne bi dûzan be jî, heta hejmara 1şan wekî kovareke mehane û piştî wê jî wekî rojnameyeke panzdeh rojî derket û ji bo projeyêni nû bi hejmara 63yan (15-30ê nîsana 1995an) weşana xwe bi dawî anî.

Berî ku Medya Güneşî dest bi weşanê bike, di derbarê derxistina kovar û rojnameyêni legal de di nav kurdan de hin munaqeşe hebûn. Hewldana ku ji aliyê hin ciwanêni kurd li Îstenbolê dest pê kir, perçeyek ji van munaqeşeyan bû. Xwedîyen bir û baweriyêni cuda cuda besdarî wan munaqeşeyan bûn. Nêrin, pirbabebûn; ji yên ku digotin, "ne wexta wê ye", "disa legalîzm" bigre heta yên ku pêwistiya weşa-


nekê bi her awayî danîn zimên. Dawiya dawî grû-beke ciwanêñ kurd, digel ku di derbarê hin îmka-nêñ maddî û teknikî de haziriyeke ji bo periyode-ke dûrûdirêj nehatibe kirin jî, bê dudulî biryar da û dest bi weşandina kovara Medya Güneşiyê kir. Pir wext neket navberê, yên ku rexneyêñ neheq danîn Medya Güneşiyê jî tê de hin welatperweren kurd, ji gelek aliyan ve "sansûrkirî" dest bi weşan-dina kovar û rojnameyan kirin û ev pêvajoya gul-vedana rojnamegeriya kurdî, li gel girtin, kuştin, qedexekirin, cezakirin û her wekî tiştêñ weha, her berdewam e. Kurdêñ ku ew pêvajo tê bîra wan, di-zanin. Wexta hejmara yekem a Medya Güneşiyê derket, wekî bangek, hawarek, zilqîtek ji diyarêñ kurdan dengê xwe da û di dilê gelek kurdan de bû sebeba bawerî û hêviyeke nû. Herweha pirsên wekî "ew kî ne?", "çî kes in?" jî dû hev rêz dibûn. Belê, wê demê li dervayî welêt, li welatêñ xerîbiyê û di warê illegal de hin kovar û rojnameyêñ kurdan dihatin weşandin, lê weha rasterast li ber çavê generalêñ dev-bixwîn bi navê bûr û baweriyêñ neteweyî yên kurdistanî di warê çapemeniyê de derketina meydanê gaveke ciddî û bi cesaret bû. Hele wexta mirov di binaykirina tiştan de, di li dij derketina hin tabûyan de bê sansûrbûyina Medya Güneşiyê bîne ber çavan, dê qîmeta wê hîn baştir bê xwanê.

Wekî nuha tê bîra min, li gor hin kurdêñ me, Medya Güneşî bi politikayêñ xwe yên ne sansûrkirî dest "dişewitand". Carnan wusa dibû ku hinekan digot, "ma hewqas dibe?". Lê bû û digel ji aliye dewletê girtina berpirsiyaran, komkirina hema hema hemû hejmaran, cezakirina bi hepsê û peran jî bi salan ev politikaya Medya Güneşiyê dewam kir.

Ji aliye naverok, wekî tê zanîn, Medya Güneşî him rexne lê hatin, him pesnêñ wê hatin dayin. Rexne û gotinêñ ne "dostane" jî hebûn, yên dostane jî. Di derbarê başî, kêmâsi û çewtiyêñ Medya Güneşiyê de li gor zemîn û referansên şexsan dîti-nêñ cuda hebûn. Ev, bi aliye kî normal bû, çunkî pêvajoya ku Medya Güneşî der-kekiye û weşana xwe dewam kiriye, pêvajoyeke ku him di warê neteweyî de him di warê navneteweyî de bi bûyeran xemilandî ye. Di wê pêvajoyê de sistem têk çûn, balansên siyasi yên dinyayê ser û bin bûn, rêxistin têk çûn, rêxistinêñ nû û cephe-yêñ nû ava bûn, hin hêvî têk çûn, hinekêñ nû şîn bûn. Çuqas baş, çuqas ne baş bû, ev munqaşeyeke din e, lê ji zelzeleya nav û navbera ideoloji û fîkrîn siyasi, parti,

# MEDYA

SİLOPI'DE HALK DIRENİSİ



• KURDISTANDA DEVRİM DINAMİZMİ VE BAĞIMSIZ ORGANLEME SORUŞU

rêxistin, grûb û mirovan jî têr para xwe stendin. Bê şik van bûyeran, tesîr li ser rûpelên Medya Güneşiyê jî kirin.

Li ser xetên giştî perspektifên Medya Güneşiyê hebûn û ew her dem bi awayekî xwe di rûpelên wê de nişan didan. Lê di nav rûpelên wê de gelek dîtinêñ cuda cuda jî xwe anîn ziman, tiştên zîddî hev du jî hatin gotin, munaqeşeyen jîndar çebûn. Heta carnan wusa dibû ku, li gor qewlê hinekan, her rûpel ber bi aliyekî diçû û ew pirrengî dibû mijarê hin rexneyan jî. Ji ber vê yekê jî, ger mirov di çerçeweyeke giştî de li wê pêvajoyê binêre, dê rastiya Medya Güneşiyê bi başî, kêmâsi û çewtiyên wê ve hîn baştir bê fêmkirin. □

**Osman Aytar** yek jî berpirsiyarên giştî yê kovara Medya Güneşiyê bû.

**Kemal Burkay:** "Riya Azadî û Roja Welat, helbet ji sıfırê dest pê ne kirin. Çavkaniya wan berhemên neslên berî wan bûn, ew li ser vê bingehê çebûn. Ew xelegeke teze bûn, li ser tê û sopa berxwedanê, li ser hûmê mirata çanda berê. Ew tiştên ku iro tene kirin jî, li ser hûm û berhemên berê ava dibin, ku di nav da xebata berî rize ilone jî heyê û bi vi awayî, xeleken teze tevi zincira berê dibin."

# PIRGIRÊKÎN ROJNAMEGERIYA KURDÎ Û MEDYA GÜNEŞÎ



CAN GULSENOGLU

**A**rmansa vê nivîsê ne analîzkirina dîroka rojnamegeriya kurdî ye. Em ê di vê nivîsê de bi tenê li ser problemên esasî yên rojnamegeriya kurdî rawestin. Problema herî bingehîn bêdewletbûna miletê kurd e. Lewra bêdewletbûn, mecalê nade ku demokrasiyeke netewî û bi vê re jî, rojnamegeriyeke netewî saz bibe. Gava mirov îro li rojname, kovar û weşanxaneyên kurdan dinêre, hinek îstisna ne tê de, siya siyasetê li ser gişan e. Hinek dikarin bibêjin ma ne tişteki pîroz e ku hêzên siyasî pîbarî kar û barên kulturî dibin? Bersiva min ev e: Belê, ji bo miletêkî bê dewlet sed carî pîroz e! Lê bi şertekî! Ku ew kar û barên kulturî polîtîze nekin û ji bo menfeetên xwe yên siyasî bi kar neynin.

Bêdewletbûn ne tenê sedema tunebûna an jî qelsbûna rojnamegeriyeke netewî û serbixwe ye, herweha sedema tunebûna saziyên perwerde û kulturî yên netewî ye. Gava saziyên perwerdekirinê yên netewî (akademî, enstitû, unîversîte, konservatuar û hwd.) tunebe, miletêk nikare di warê nivîskariyê de zêde bi pêş bikeve û wê ji-yana wî miletî ya ramanî û kulturî qels be, wê nikaribe berhemên hevdem û berbiçav biafirîne.

Problemeke din ya bingehîn, ji do heta îro, problemên ekonomîk e. Ev problem hem ya kovar, rojname û weşanxaneyên kurdan e, hem ji ya nivîskarêñ kurdan e. Bi taybetî ji ev problem ya sazî û nivîskarêñ serbixwe ye! Wer xuyaye ku heta hejmara xwendevanêñ kurd zêde nebe, wê ev problem neyê çareserkirin.

Tiştên jiyana ramanî û kultûrî ya miletékî dewlemend dike werger û rexne ye. Lewra herdu ji, pîvanê bi xwe re tîne. Mirov kare bi saya wergerê, sewiyeya civaka xwe ya kultûrî bi civakêñ din re mûyekî miqayese bike û bi saya rexnê ji xwe bi xwe bipîve. Ger îro baş neyê fêhmkirin ji, "Nûdem WERGER" karekî gelekî pîroz e û wê valahîyeke mezin dagire. Niha ji em hewcedarî sazkirina mueseseya rexnê ne.

Em werin ser "Medya Güneşî". Medya Güneşî piştî bêdengiyeke dîrêj, ya piştî 12ê ilona 1980, di nîsana 1988an de dest bi weşana xwe kir. Medya Güneşî piştî 12ê ilonê kovara kurdan ya pêşî ya legal bû. Gava Medya Güneşî dest bi weşan xwe kir, tenê çend rojnameyêñ tîrkan gotina "kurd" bi kar dianîn. Lê hîn kesî qala "Kurdistanê nekiribû. Ji bo vê yekê cesaret û bedelêñ mezin lazim bûn. Birêvebir û xebatkarêñ Medya Güneşiyê ev cesaret nîşan dan û bedelêñ mezin ji dan. Ew hatin girtin, işkence dîtin, zor û zehmetî dîtin, ketin hepsan... Lê di dema xwe de bûn denge gelê xwe û valahîyeke mezin dagirtin. Bêguman, Medya Güneşî ji xwedîyê xeteke siyasi bû. Lê teva wê ji, helwesteke demokratik ya ku hê kurdan nasnedikirin, nîşanî kurdan da. Pirsgirêka kurdî bi awayekî legal aktualîze kir. Zilm û zora li ser kurdan eşkere kir û bû dengê gelê xwe. Medya Güneşî tu ferq nexist navbera nêrînên siyasi û bû dengê hemû girtiyêñ kurdan. Herçiqas Medya Güneşî ne kovareke kultûrî bû ji, wê ferq nexist navbera nêrînên siyasi û rûpelêñ xwe yên kultûrî ji şâîr, nivîskar û hunermendêñ herçar pereçeyêñ welêt re vekir û bi wî awayî xizmeteke kultûrî û hunerî ji kir.

Bi kurrî wê ruhê demê zeft kiribû û bersiva dema xwe da. Wê ji weke hemû kovar, rojname û berhemêñ kurdî, di rojnamegeriya kurdî de cihê xwe yê bi şeref û rûmet girt. Ew ji gulek ji baxçeyê kultura kurdan bû. □

# ZAHMETIYÊN ROJNAMEGERIYA KURDÎ

SÜLEYMAN ÇEVİK

Berî ku ez behsa zahmetiya derxistina kovareke xwerû bi kurdî, bi taybetî jî behsa zahmetiya rojnamegeriya kurdî li Tirkîyê bikim, dixwazim hinek tiştên ku bi mijarê ve aleqeder in bibêjim.

Em tenê li weşanên ku kurdan derxistine û derdixin, yan jî xîtabî kurdan kirine û dîkin mîze bikin, dibînin ku hinek tenê bi tirkî, hinek bi kurdî-tirkî, hinek jî tenê bi kurdî ne. Rojnameyek yan jî kovarek bi temamî bi zimanê biyanî derkeve û xîtabî kurdan bike jî ew weşan ya kurdan tête qebûlkirin yan na?

Di derheqê vê pîrsê de ramanên cûrbecûr hene. Bi ya min jî mirov bi hêsanî nikare wan di rojnamegeriya kurdî de qebûl bike.

Herçiqas xwedî û xwendevanên wan kurd bin jî zimanê wan kurdî nine û ji zimanê biyanî re xizmetê dîkin. Hundirê wan kurd be jî derê wan kurd nine. Weşanên wisa mirov dikare bibêje kirasê tirkî li xwe kirine. Kesên ji zimanê xwe re xizmetê nekin û ji zimanê biyanî re xizmetê bikin mirov wê wan di kûderê de qebûl bike? Netewên ji ziman û çanda xwe dûr ketine çiqas aîdî xwe ne? Ez naxwazim têkevim nav gengeşiyêن ku di vê mijarê de dibin. Tiştên ku ez ê bibêjim wê gelempêri bin û çi kurî û çi nekurdî tevan ez qest dikim...

Bi vê salê, sed salkêن rojnamegeriya kurdî biqede jî di warê rojnamegeriyê de tecrubeyê mezin li ber kurdan tunene û kurd di warê rojnamegeriyê de îro xwediyyê qonaxeke bilind ninin. Kurdan zimanê xwe zêde di pirtûk, rojname, kovar, radyo û televizyonan de di vê sedsala borî de neşixulandine. Kurdî di nav kurdên Tirkîyê de di dibistanan de, yan jî bi awayê dersê di qûrsên ziman de nehatiye dayin, kurdî nehatiye xwendinê û nivîsandinê... Em dikarin bibêjin ku kurd hîna nû rabûne zimanê xwe di van waran de bi kar tînin. Weke ku tête zanîn ziman di şixulandina di pirtûk, rojname, kovar, radyo û televizyonan de rûdine. Ji bona vê rûniştinê jî derbasbûna wextê lazim e. Zimanê dunyayê yêñ pêşketî piştî dehsalan, sedsalan bi şî-

xulandina ziman, bi esasên xwe, bi qaîdên xwe cihê xwe girtine û di nav xelkê de belav bûne.

Kurd heger xwedî sazûmanên dewletî bana bêguman wê zimanê nivîskî bêhtir cihê xwe di nav xelkê de bigirta û wê di nav xelkê debihata xwendin û nivîsandinê. Kurdî ji ber ku di zimanê nivîsandinê de zêde bi kar nehatiye bi qaîdên xwe, bi esasên xwe bi besî cihê xwe negirtiye. Bi rastî ev ji bo herkesî ne, lê ji bo gelek kesan wiha ye. Em dizanin ku gelek kurdên Tirkîyê nikarin bi zimanê xwe bixwînin...

Kurdên li cihê edebiyata nivîskî edebiyata devkî tercîh kirine û çîrokên xwe, destanên xwe, şîrîn xwe bi devkî di nava xelkê de belav kirine. Îro hezkiriyên vî zimanî, divê rabin van qîmetên edebiyata kurdî derhal derbasî nivîsê bikin da ku ev qîmet wenda nebin...

Weke ku me got herçiqas dîroka rojnamegeriya kurdî kevn be ji, ew çend rojnamegerî di nav kurdan de pêş de neçûye. Îsal bi sala 1998an rojnamgeriya kurdî sed salên xwe diqedîne. Di nav vî sed salî de piştî derketina rojnameya Kurdistanê ewqas sal bîhûrîn ka kurd di warê rojnamgeriyê de ci dikin û ci kirine? Dema em vê pirsê dikin, dibînîn ku zêde tiştek xuya nabe. Di nav vî sed salî de kurdan gelek rojname û kovar derxistine. Lê zimanên van weşanan gelek caran kurdî nebûye. Bi zimanê biyanî nivîsîne û zimanê xwe avêtine taliyê.

Heger kurdên ku bi salan e weşangeriyê dikin, zimanê xwe bidana pêsiya îdeolojiya xwe, weke prensibek bi kurdî fîkrîn xwe, berhemên binivîsandana îro rewşa ku zimanê kurdî tê de ye bêguman wê wiha kambax neba. Ez bahwer im ku wê zimanê kurdî bêhtir pêş de çûbaya...

Ji bili vê, weşanên kurdî bi piranî bi awayekî amatorî hatine weşandin. Pirêwan di mudetên kurt de hatine girtin. Ji aliyê teknîkê ve amator bûne, ji aliyê na-verokê ve tije nebûne. Di wexta xwe de derneketine. Van gotinana ji bo me hemûyan mirov dikare bibêje. Sebebeen van nexweşiyana tevan hene, mirov dikare gunehê van tiştan tevan li dijminê xwe bar bike, yan ji bavêje stûyê hinekan, lê ev ti carî me ji vê rewşa nexweş xelas nakin...

Pêsiyê dema me dest bi weşandina Nûbiharê kir, li Tirkîyê cara pêsi kovareke islamî bi kurdî dihate weşandin. Di van salan de nivîskar û xwendevaenê me çêbûn. Dema ku em ketin vê piyasê, nivîskar û xwendevaenê me tune bûn, yan ji pir kêm bûn. Îro em dikarin bibêjin ku ev herdu ji heta derecekê pêk hatine. Nivîsen ku berê ji me re dihatin tev bi tirkî bûn, îro nivîsen tirkî qet nayê. Xuya dibe ku kêm be ji, kesen ku êdî dikarin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsinin gihaştine. Helbet ev nayê wê manê ku karê me hêsan bûye. Heta ku kurd li mekteban bi zimanê xwe nexwînin û nenivîsinin, li ser zimanê xwe meşxul nebin, bi zimanê xwe kovaran, pirtûkan, rojnameyan nexwînin, wê bi tirkî bifikirin û zimanê xwe bavêjin taliyê...

Çapemeniya kurdî, bi taybetî jî derxistina kovareke yan jî rojnameyek xwerû bi kurdî bi gelek aliyen ve zehmetiyên wê hene. Li vir ez dixwazim behsa hinek noqteyên ku giring dibînim bikim. Zahmetiyênu ku iro çapemeniya kurdî ya Tirkîyê di nav de ye di bin sê beşan de ez dixwazim rêz bikim:

### Zahmetiyênu ku ji hêla dewletê dertê

Tiştike balkêş e, Dewleta Tirkîyê herçiqas behsa demokratbûna xwe, behsa hebûna heqên kurdan li Tirkîyê bike jî ev tenê di gotinê de heye. Eşkere ye ku piştî ewqas zahmetiyê salan, piştî ewqas mirin, işkence, lêdan, hepsan û mehkemeyan hîna jî kurd nikarin sazûmanên xwe ava bîkin, çanda xwe, zimanê xwe bijînin. Nikarin pirtûk û weşanên xwe bi serbestî bi-weşînin û li nav xelkê xwe, li welatê xwe belav bikin. Dewleta Tirkîyê bi qanûnên xwe dest û piyêni mirovan li vê derê girêdaye û du dijmînên xwe yên esasi, yanî kur dû islam kiriye bin mercekê de her gav wan kontrol dike. Yan bi qanûnên xwe di heqê wan weşanan de dawan vedike, berpirsiyâren wan davêjin hepsan, sazûmanên ku weşana diweşîne mehkûmê cezayên perên mezin dike; yan jî weşanên ku berhev nebûne û dawa venebûne jî ji ber ku bi kurdî ne yan jî di heqê kurdan de ne bi kîrinên xwe yên keyfi bi meûrên xwe nahêle werin firotin, bêne xwendin û li Kurdishtanê werin belav kirin.

### Zahmetiyênu ku ji hêla kurdan dertê

Kurdên Tirkîyê îmkanekê wan i xwendin û nivîsandina zimanê kurdî nebûye. Herçiqas bi alfabeşa erebî di medresên xwe de hinek kurdan bi zimanê xwe nivîsandibin jî, jimara wan li gor nifûsa kurdan gelek kêm bû û ji ber hinek sebeban iro hîna jî kîmtir bûye. Dibistan û mamosîyênu wan nebûne ku bikaribin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsînin. Iro em li rewşa kurdan mîze dikin dibînin ku ji bo xwendin û nivîsandina zimanê xwe amade ninin. Mirov dikare bibêje kurd bi temenê xwe nebin jî di xwendin û nivîsandinê de hîna zarok in. Herweha iro em dibînin ku kurd qîmeta zimanê xwe nîzanin. Qîmeta tiştên ku wan dike kurd nîzanin. Bi qasî ziman tu tişt tuneye mirovan ji mirovîn din cihê bike. Kurd iro zimanê xwe wenda bikin, bibin mîna miletên din, tiştê ku wê wan kurd nîşan bide ciye?



Kurdan bêhtir bi gotinê hamaşî û sloganîk ku wê weka ba bifirin û herin jiyanâ xwe borandine û diborînin. Kesên ku rabûne behsa zimanê wan, çanda wan dikin pir kêm in. Gelekêن me nabînin yan jî nizanin ku encax bi parastina ziman û çandê wê kurd bikaribin li ser rûyê dunyayê bimînin. Em dizanin tiştên nivîsandî piştî gelek salan jî wê hebin, lê gotin wê bifirin û herin. Ji ber van cûr nerînan û mehrûmayina kurdan ji nivîsandîn û xwendina bi zimanê xwe, karê kesên ku bi kurdî çapemeniyê dikin zahmet e...

Zahmetiyek din, di dema me de kurd sê alfabeyan bikartînin. Li cihkî latînî, li cihkî erebî, li cihkî jî alfaba kîrîlî bi kar tînin. Kurdeki heger latînî dixwîne, bi ihti-maleke mezîn nikare bi alfabeyêن din bixwîne, heger bi alfabeyâ erebî dixwîne ni-kare bi alfabeyêن din bixwîne. Ev pirsgirêka li ber me ye û mîna her pirsgirêka kurdan kesek nizane wê çawa çareser bibe...

Zahmetiyek din di nav kurdêن Tîrkiyê de li ser bikaranîna alfaba latînî ye. Mixa-bin li ser bikaranîna "î" û "ï" an û hînek herfîn din wekheviyek tuneye. Çapemeniya kurdî iro van herdu herfan bi du awayan dinivîsin... Li gor min ev cûrecûr bi-karanîn gelek caran ji ber endîşeyen siyasi dertêن. Herkes dixwaze ku kesên din we-rin ser gotina wan. Ji ber van nerînan di nav çapemeniya kurdî de hevkariyek, alî-kariyek tuneye. Wisa xuyaye ku gelek kes endîşeyen xwe yêni siyasi li ser her tiştî digrin...

### **Zahmetiyen ku ji hêla aboriyê dertêن**

Îro pirsgirêkeke rojnamgeriya kurdî aborî ye. Hem çapemeniya kurdî, hem jî xwendevanêن kurd feqîr in. Mirovêن ku îrp çapemeniya kurdî taqîb dikin gelekêن wan xwendevan in, ji hêla aboriyê ve dewlemdn ninin. Ew kesên xwedî hebûn in, dewlemdn in mixabin li weşanêن kurdî xwedî dernakevin. Bêguman ew ditirsin ku dewlemdiya xwe, hebûnê xwe wenda bikin. Çapemeniya kurdî ji ber bêîmkani-yan nikare xwe nû bike, ji bo bala xwendevanan bikişîne tiştên nû bike, xwendevanêن kurdî jî ji ber bêîmkaniyê nikarin ji çapemeniya kurdî re bibin alîkar... Kesek newêre ilanan, reklaman bide çapemeniya kurdî. Li her deverêن dunyayê ji bona weşanek jiyanâ xwe bidomîne esasên gelemerî hene... Yan weşanek pir tête firotin zerar nake, yanê bi firotinê mesrefa xwe derdixe zerar nake. Yan firotina wê kêm be û mesrefa xwe dernexîne jî jî ilanan, reklaman distîne zerara xwe bi vî awa-yî ji holê radike. Yan jî li pişt weşanen kesên dewlemed hene, dîbin finansoreñ weşanen û mesrefa weşanê digrin ser xwe... Lê ci Feyde ji vana yek jî li cem Çape-meniya Kurdî tuneye... ☐

**Süleyman Çevik** xwedî û berpirsiyarê nivîsanen yê kovara Nûbiharê ye.

# Rojnamegeriya kurdî ya piştî 12ê ilonê

FEHİM İŞIK

Wek tê zanîn, bihara 1998an salvegera 100 saliya rojnamegeriya kurdî ye. Bê guman, di vê salvegerê de gelek konferans û civînên din jî wê bêni li darxistin û gelek rewşenbir û nivîskar wê li ser vê babetê miqaleyen binivîsinin. Di vê salvegerê de, helbet wê rojnamegeriya kurdî ya li Tirkiyê bê gengaşkirin. Eşkere ye ku rojnamegeriya kurdî li Tirkiyê piştî 12ê ilonê dest pê kiriye. Berî van salên dumahî gelek salan jî, di kar û barê rojnamegeriya kurdî de, li Tirkiyê gelek karên hêja hatîne kirin. Dikarim bêjim ku ya ku em li ser piyan hiştin, ev karên hêja yên pêsiya me ye. Lê ez di vê nivîsa xwe de, bi kurtî be jî, dixwazim li ser rojnamegeriya kurdî ya piştî 12ê ilonê rawestim.

Li Tirkiyê, bi taybetî piştî sala 1988 û 1989an kar û barê rojnamegeriyê di nava kurdan de careke din dest pê kir û kurdan dest bi derxistina kovar û rojnameyean kirin. Bê guman, têkiliyên kurdên li welêt û yên li derveyî welêt, wê demê ne ew-qasî xurt bû. Kurdên li derveyî welêt, di warê rojnamegeriya kurdî de, hem ji aliyê teknîkî ve hem jî ji aliyê ziman û naverokê ve ji kurdên li hundurê welêt bi pêşterir bûn. Îmkanên kurdên li welêt ne weke îmkanên kurdên li derveyî welêt bûn. Bêşik, astenga herî mezin li pêşberî rojnamegeriya kurdî qanûnên dewleta Tirkiyeyê bû. Qanûna dewletê ya esasî û qanûnê din, destûr nedidan ku kurd li welêt rojnameyên bi zimanê xwe û kovar û rojnameyên li dijî kîrinên rejîmê derxin.

Lê kurdan li hemberî hemû zordariyan dest bi derxistina kovar û rojnameyean kirin. Piştî 12ê ilonê kovara pêşî "Medya Güneşî" (Roja Medya) ji aliyê kurdan ve hate derxistin. Piştî Medya Güneşî kovareke din a mehane bi navê "Özgür Gele-

cek" (Pêşeroja Azad) derket. Van herdu kovaran jî di sala 1988an de dest bi weşana xwe kirin. Kovara "Deng" jî piştî van herdu kovaran, di payîza 1989an de derket. Bê guman, piştî derketina van kovaran gelek der û dorêni siyasi û rewşenbîrêni kurdan jî dest bi derxistina kovar û rojnameyan kirin. Hinek ji van kovar û rojnameyan jî ber bêimkaniyê, hinek jî ji aliye dewletê ve hatin girtin. Hinek ji kovar û rojnameyên ku niha dernakevin ev in: Medya Güneşî, Özgür Gelec, Toplumsal Diriş, Serketin, Newroz Ateşi, Vatan Güneşî, Azadî, Dengê Azadî, Ronahî, Nûjen, Roj, Hevdem, Nûroj, Pêşeroj, Ülke, Yeni Ülke, Welat, Welatê Me, Halk Gerçekçi, Yeni Halk Gerçekçi, Govend, Özgür Ülke, Newroz, Yeni Politika, Özgür Politika, Demokrasi...

Bê guman piraniya van rojname û kovarê rojane, hefteyî, an jî mehane ji aliye dewletê ve hatine girtin. Lê hê jî, hinek kovar û rojnameyên ku ji aliye kurdan ve têne derxistin, hene û li hember hemû zordestiyêni dewletê weşana xwe didomînin. Kovar û rojnameyên ku niha jî weşana xwe didomînin, ev in: Hêvi, Deng, Rewşen, Nûbihar, War, Ülkede Gündem, Azadiya Welat...

Bêşik rewşa kovar û rojnameyên em derdixin û yên din mîna hev in. Astengiya ku bingeha xwe ji qanûna esasî an jî ji qanûnên din yên dewletê digirin, li ser weşanen kurdî hê jî dom dike. Lê tişte balkêş jî ev e, ku dewlet bi taybetî li Kurdistana Tirkiyeyê kiryarêni li dijî qanûnên xwe ji li hember rojname û kovarêni li dijî rejîmê, bi taybetî jî li hember kovar û rojnameyên kurdî bi kar tîne. Ew naxwazin tu deng li dijî kirinê rejîmê derkeve. Anglo dixwaze tenê dengê wî were bihîstin.

Bêguman ev yeka ha girêdayî pirsa kurdî ye. Dewletê heta niha hebûna kurdan qebûl nedikir. Niha nikare hebûna kurdan înakar bike; lê di çareserkirina pirsa kurdî de jî, tu gavekê navêje. Ew bi hemû aliyan ve şerê qirêj pêş ve dibe û hêvî dike ku pirsa kurdî bi vî awayî "çareser" bike.

Polîtikaya ku dewleta tîrk didomîne, her wisa jî xwe di warê rojnamegeriya kurdî de jî eşkere dike. Dewletê çawan gund û bajarêni kurdan vala kir, gelek şewitand, bi milyonan kurd ji axa bav û kalan bi dûr xist û bi sedan rewşenbîr û welatparêz kuşt, wisa dixwaze ku ev kirinêni wê jî neyê bihîstin. Bêguman, ew naxwaze ku ziman, edebiyat û çanda kurdî jî bi pêş bikeve. Astengiyêni ku hê jî li ser rojnamegeriya kurdî tê domandin, bingeha xwe ji vê polîtikaya dewletê digire. Girtin û qedeşekirina kovar û rojnameyên kurdî, kuştin û zîndankirina rojnamgerên kurd, hemû bi polîtikaya dewletê ve girêdayî ye û wisa tê dîtin ku wê dewlet di demeke kurt de vê polîtikaya xwe ya qirêj neguherîne.

Helbet hertiş ne mîna roja ewil e. Di pêşketina rojnamegeriya kurdî de, berxwe-

dana kurdan, bi taybetî jî berxwe-dana rewşenbîr û welatparêzên kurdan tesîreke baş nîşan da. Kurd gav bi gav bi pêş ketin. Piştî derketina kovar û rojnameyên kurdan, peywendiyêن kurdan hem bi kurdêن Ewrûpayê re hem jî bi kurdêن beşêن din re çêbûn. Li welêt jî gelek kurd bi nêrîna rewşenbîr û welat-parêzên kurdan ji rewşa xwe haydar bûn. Her wisa dewletê jî dît ku kurd bi zor û zilmê ji mafê xwe naqerin; yanî kurd aştî û azadiyê dixwazin; perwerdeya bi zimanê dayikê dixwazin; dixwazin bi gelên din re weke bira bijin; şerê qirêj naxwazin... Yanî bi gotineke din, tesîra rojnamegeriya kurdî, di van salêن dawiyê de, di pêşketin û polîtizebûna kurdan decareke din jî çêbû û ev yeka nayê înkarkirin. Her wisa di pêşvebirina ziman, çand û edebiyata kurdî de jî, rojnamegeriya kurdî li Tirkîye-yê roleke pozitîv leyist.

Bê guman li ser rojnamegeriya kurdî gelek tiştên din jî têن gotin ûbihîstin. Di serî de jî bedela vê xebata bi rûmet, hêjayî pesnê ye. Ji ber ku vê xebatê, vê berxwedanê hera iro bedeleke mezin daye. Bi dehan rojnamegerên kurd di vî warî de şehîd ketine. Apê Mûsayê 70 salî di vî warî de bedela herî pîr bû. Lê hevalên weke Mehmet Saât Erten, Çetîn Abayay û Ferhat Tepe jî, hê di bihara jiyan xwe de ji bo pêşketina rojnamegeriya kurdî, ji bo azadiya welêt şehît ketin. Her wisa bi dehan kurd di vê riya pîroz de hatin birîndarkirin; ketin zîndanan, ji axa bav û kalan dûr ketin, bûn mihacir...

Gotina dûmahî; "Kurdistan" a Miqdad Bedirxan, di 100 saliya xwe de, bi bedelekî giran be jî, ranewestiyaye, dengê wê nehatiye birîn. Ji niha şûn ve jî ev deng qet nayê birîn. □



**Fehim Işık,** berpirsiyarê giştî yê rojnameya HÊVîyê ye. Rojnameya Hêvi ji heftê carekê li Tirkîye-yê derdikeve.

# Li çiyan miribama

**ŞÜKRÜ ERBAŞ**

Li quntara ciyayekî hûn pîr biçûk bû emtê wan  
Rahêjim wan zarokan ji cihêbûnan derxim  
Wan bibim, rûyên wan bi şewqa rojê bişom  
Êşa wan demekê bidim ber bê  
Laşê wan mîna nanê şikeva tenik  
Tiliyên wan di bîranînan de bişengî  
Şehêن baranê min li porêن wan xista...

Paşê min ew li ber sobekê germ bikira.  
Ev baxçe ye, min bigota, ev mal e, ev nivîn e  
Ev mîndera şîrgerm ya dilê dayikê  
Ev dengê kefî yê bavê bêhal  
Ji malan heta kuçan, ji kuçan heta malan  
Hemû lîstîk li benda te ne  
Hemû demsal bi te re Bihar e  
Wê êdî tu stran kederê nede  
Wê ji tu pacan xerabî neyê...


Ger min hemî hêşir ji bijangkan bida hev  
Min hemû çek li qadekê bişewitandiba  
Paşê min mirî ji goran derxista  
Li dora agirê ku zimanê wî li ezmên diket  
Min demên windabûyî bi laşê xwe maçî bikira  
Min hemû êş dageranda evînê

Ger nebe ez ê herim bi wan zarokan re li çiyan bimîrim...

Ji tîrkî: **ABIDİN**

Ji pirtûka: Dicle Üstü Ay Bulanık

# ROJNAMEGERIYA KURDÎ Lİ BAŞÜRÊ KURDISTANÊ Ü İRAQÊ



SIDQÎ HIRORÎ

**D**i nivîseka erebî de ku li jêr navê "El-Sehafe el-kurdiye.." di hejmara 16ê ya kovara Karwan ya 1983ê de belav bûbû, tê gotin ku rojnameya pêkenînê "Germe û nerme" rojnameyeka kurdî ye û hejmara wê ya yekemîn li 16.05.1911ê wesiyyabû. Belgeyê Yaqub El-Qesabî jî ku xwediyyê nivîsê ye li ser kurdبûna wê rojnameyê navê wê yê kurdî ye. Herçende nivîskar bi xwe dibêje ku di prîtûka "Tariix el-sehafe el-îraqiye" de ya Ebdulrezzaq El-Hesenî ku wî ew agadarî li ser wê rojnameyê jê standine, "Germe û nerme" bi rojnameyeka erebî tê destnîşankirin. Lê ev xuya dike ku hêj heta niha ew kovar bi çav nehatîye dîtin û lewma jî em nikarin wê wekî destpêka rojnamegeriya kurdî li başûrê welatî bi nav bikin.

Diyar e destpêka rojnamevaniya kurdî li başûrê welatî bi kovara Bang Kurd (Bangî kurd)ê dest pê dike. Ew kovareka siyasî û edebî û ayînî û komelayetî bû. Bi zimanê kurdî-tirkî li Bexdayê derdiket. Hejmara wê ya yekemîn li 08.02.1914ê derketiye. Pazde rojan carekê derdiket, 24 rûpelî bû. Pênc hejmar jê derketibûn û weha hemû hejmar li ser hev dibin 120 rûpel. Xwediyyê wê Cemal Baban bû. Her di nîverasta ceynî sala ku Sherê Cihanî yê Yekemîn tê de dest pê kirî de kovar rawestiyâ. Cemal Baban, Elî Bapîr, Şukrî Fezli, Omer Nezmî, Behaeddîn şêx Nûrî Şîrwan,

Xakî Bexdadî, Fikrî ji nivîskarên kovarê bûn<sup>(1)</sup>. Di (Bangî kurd)ê de hesta netewî cih girtibû<sup>(2)</sup>. Bi anîna mînakân di hejmareka xwe de, kovar dixwaze hesta netewî li cem xwendevanên xwe bizoxîne û bala wan bikşîne ser giringiya xwendinê di jiyana gelan de, her wekî di nimûneyê jêrin de:

*"Meselen Japonya! Em qewme biçûke çî bû! Bxuda hîc nebû. Feget bsayey se'î û teqdir qîmet wegtekeyan dewletêkî ezîmî weku Rusyey şikan û tarumar kird.*

*Meselen Ingiltre. Emaneş weku ême insan in, feget bo çî ew new'e îxtîra', û ica-de ke bsayey egl û fikiryan dîhînne wucud însanan şêt deka û hemû kesê mecbûri te'zîm û teqdirî sexisyan deken"*<sup>(3)</sup>.

Di warê dîroka kurdî li serdemâ İslâmî de Şukrî Fezlî nivîseka dirêj, bi tîrrikî di çend hejmarekên vê kovarê de belavkiribû<sup>(4)</sup>. Her weha di hejmara sêye de helbesteka Saîb Zadeyî heye tê de bo nimûne dibêje:

*"Bo tereqî milk û millet itîbadman wacib e*

*Serfî xîret çak e ba 'xeybî nekeyn em firsete"*<sup>(5)</sup>

Herweha dibêje:

*"Kurd ciden hekîm xestekî em qewme ye*

*Ba le xwab 'xeflet û wehşeta xeberman bêtewê"*<sup>(6)</sup>.

"Heta dûmahiya Şerê Cîhanî yê Yekemîn, li başûrê Kurdistanê, çî rîexistîneka siyasi, pişeyî yan komelayeti ya kurdî peydanebû "<sup>(7)</sup>. Li dumahiya şerî efserên kurd yên ku tê de besdarbûbûn vegeryan Kurdistanê û girupên siyasi yên biçûk ku armancêwan yên netewî hebûn, pêkanîn<sup>(8)</sup>. Pirraniya wan di serhildana şêx Mehmûd Berzinçiyî de li dijî dagîkerê ingilîz, yê ku Îraq wekî dewleteka erekî damezrandî, besdarbûn.

Di wê serdemê de sefareta birîtanî li Bexdayê dest bi weşandina rojnameya kurdî ya yekemîn "Têgeyîştinî Rasti" kiribû. Li ser rûpelên wê rojnameyê hewildan dihat kirin ku kurd bêñ qayîl kirin ku dev ji daxwaza hebûna dewleteka xwe ya serbixwe berbidin û girêdana başûrê Kurdistanê bi dewleta erekî ya nû ve; Îraqê, qebûl bikin.

Hejmara yekemîn ya wê heftenameyê li 01.01.1918ê belavbû û ya dûmahiye; hejmara 32ê, li 28.10.1918ê. Rojname di xizmeta siyaseta ingilîzan de bû û propagende li dijî elman û osmanîyan dikir. Tê de daxwaz ji kurdan dihat kirin ku serokên eşîrên wan yên mezîn hevkariyê bi Birîtanyayê re bikin<sup>(9)</sup> û kurd hemî milkeçen ingilîzî bin. Raxistina graffîk ya ciwan ya rûpelên wê û hebûna wêne û şiklan tê de, xwendevan radikêşane xwe.

Li roja 28.06.1919ê hêzên ingilîzan di-gel piştevaniya hêzên xwe yên esmanî

paytextê Kurdistana Îraqê yê wê serdemê; Silêmaniyê vegirt û şêx Mehmûd jî girt û hat dûrxistin bo başûrê Îraqê û ji wê derê bo Hindê. Lê bi hindê xebata kurdan li dijî dagîrkeran ranewestiya.

Piştî şkestina serhildana şêx Mehmûdî li sala 1919ê, ingiltîzan ji bo parastina berjewendiyên xwe û kartêkrinê li ser xelkê kurd Major Soan kirin hakimê Kurdistanê. Herçende Soan bes ji bo parastina berjewendiyên Brîtanyayê têdikoşî, lê divêt mirov bibêje jî ku di dîroka rojnamegeriya kurdî de damezrandina wî bo yekemîn çapxaneyê li bajarê Silêmaniyê bûyerekâ mezin bû. Rast e, bi vekirina wê, Soanî bes li ber bû berjewendiyên Birîtanyayê biparêze û propagendeyê bo siyaseta wê bike, lê piştî çendekê welatparêzên kurd jî şıyan rojnameyên xwe yên welatparêz pê çap bikin<sup>(10)</sup>.

Soanî ew çapxane ji Bexdayê anî Ker-kûkê û ji wê derê bir Silêmaniyê û li wê derê, wî bi xwe digel çend kurdan, tê de kar dikir.

Di 29.04.1920ê de Soanî rojnameya bajarê Silêmaniyê ya yekemîn; "Pêşkewtin" çap û belav kir. Di du salan de ew heftename bi berdewamî weşiya. Li ser rûpelên wê parce ji literatura kurdî ya wê serdemê dihatin belavkirin, lê her wesa nivîsên dijî kurdîniyê jî tê de cih digirtin, her wekî di hejmara roja 14.10.1920ê de ev nivîs cih digire: "Ke dengûbangî pêxemberêti Mehemed El-

Mustefa (sl'em.) be hemû layek û xelxely xiste dunyawe way lê hat ke xaagan û selatin heleqey bendeyetî ew serwore bixene gwê. Oxuz Xan ke lew wexte da gewretirîn selatinî Turkistan bû le piyawmaqulî kurd Bexduz nawî ser û sekut naşirînî narde xizmet pêxember (sl'em).. Pêxember (sl'em) ke çawî pê kewt le serû gwêlakî qızî kirdewe. Eşayir û qebayîlî pirsî, Bexduz wutî le ekrad im, ew hezretyş fermûy xuway tebareken te'ala em tayefeye muwefeq be ittifaq nekat egîna 'alemêk le dest wan be teng dên. İtir lew rojewe dewlet û seltenetî gewre bo emane réknekewtûwe pênc tayefe nebêt.."<sup>(11)</sup>

Soanî dixwest bi wî terhî kurdan weha têbîgehîne ku wan ne ci caran yekîtiya navxweyî û ne jî dewleta xwe ya serbixwe dê hebe.

Her weha Sonaî di hinde nivîsên dî yên ji ví rengî de hewil dida kurdêne gelik oldar qayıb bike ku bo milltetekê wekî kurdan ku pêçebûna wan ya birêvebirina xwe bi xwe nîne ya çêtir ew e ku bikevin bin hukmê miletekê dî û ew hezkirina Xudê ye.

Li meha hefta sala 1920ê Şerîf Paşayî daxwazên kurdan di hebûna dewletka wan ya serbixwe û piştevaniya hevsozan bo wê çendê de pêşkêşî konferansa aşıyê kir. Vî karê Şerîf Paşayî ji aliye kî ve cihê şêx Mehmûdî li başûrê Kurdistanê xuttir û bi hêztir lê kir û ji aliye din ve ji rewşenbîr û welatparêzên kurd li ser hindê haydar kirin ka çend ji bo kur-

dan, hebûna rêxistinêka wan ya ku dikare roleke serekî di xebata netewî de bileyîze, giring e.

Li 01.07.1921ê Mustefa Paşa Yamilkî rêxistina kurdî ya siyâsi ya yekemîn; "Cemî'yetî Kurdistan" damezrand (12). Wê rêxistinê rojnameya xwe "Bangî Kurdistan" weşand. Wê rojnameyê ji 02.08.1922ê heta 08.06.1923ê dom kir<sup>(13)</sup>. Vê rojnameyê, li ser berperên xwe, gazî xelkê kurd dikir ku guhertinê di dîtin û jiyana xwe de bikin bo ku rizgarbûnê bi dest xwe ve bînin, wekî mînak: di bin sernavê rojnameyê de her tim ev nivîs hebû: "Ziman gurz û rim raburd û îsta palewan 'îlme Sîla'h destê sin'et bariqê tî'x westan 'îlm e"<sup>(14)</sup>.

Wê rojnameyê gazî kurdan dikir ku hisyar bibin û xwe bi zanistî ve mijûl bikin û ew jî mîna hemû milletên cîha nê xwedî welat û dewleta xwe bin û di hejmara yekemîn de diyar dike ku ew rojname "Xezeteyêkî millî û tercumanî eskar û xadîmî qewmî kurdan e". Di hejmara duyemîn ya 14.08.1922ê de li ser nûçeya ku dê delegasyonek ji Bexdayê hêt Kurdistanê weha dinivîse: "Lem rojane da şai'eyek heye delen heyetikî nasî'he le Bexdadewe dêt bo Kurdistsan.

1. Tênageyn em heyete be emri kê dêt?  
Be tensîb çe kesî rêkxirawê?
2. Nazanîn emane ke dên nesîhetî çîman deken?
3. Eger meqsudyan emebê nesîhetman biken tabi'î İraq bin wextî xoy lam baş

niye bêjrawe û fîkrî kurd yetî heta bêt reg da dekutê û (Bang Kurdistan) le gel me'arif bo teregi û tenwîri kurdan se'î û kuşîş dekat emca le ber eme nazanîn em heyete nasî'heye bo dên û çî delen?"<sup>(15)</sup>. Ev jî digel nivîsên cur bi cur yên di wan hemî hejmarêne wê rojnameyê de diyar dikin ku bir û bawerên serbixwebûna kurdan û welatê wan ji armancê rojnameyê yên herî li pêş bûn.

Nivîskarêne kurd di nivîsên xwe di Bangî Kurdistanê de bersiv li ser propagendeyen jehrîn yên dagîrkerî didan û didan zanîn ku kurdan jî mîna hemû milletên ser rûyê erdê mafê hebûna dewleta xwe ya serbixwe heye.

Ji ber xurtbûna xebata kurdî li dijî dagîrkerê, ingilîz neçar bûn ku şêx Mehmûdî vebigerînin Silêmaniye û ilâna Memleketa kurdî bikin.

Li 02.11.1922 birayê şêx Mehmûdî, şêx Qadirî hukumeta Kurdistanê pêkanî. Li 24.12.1922ê Birîtanya û İraqê mafê kurdan di hebûna hukumeta wan de pejirand lê di sinûrên axa İraqê de<sup>(16)</sup>.

Li 15.11.1922ê rojnameya Rojî Kurdistanê wekî organa Memleketa dest bi weşana xwe kir. Sernivîskarê wê heftenameyê helbestvanê navdar M. Nurî (1898-1958) bû. 15 hejmarêne wê derketin, ya dûmahiyê roja 03.03.1923ê derket<sup>(17)</sup>.

Heftenameyaya Rojî Kurdistan li çapxaneya Soanî, ya ku ingilîz negehiştin bi xwe re bibin Bexdayê, dihat çapkiran.

Di hejmara yekê ya Rojî Kurdistan ya 15.11.1922ê de nivîsek hat weşandin, tê de rexne li rojnameyeka erebî ku li Bexdayê derdiket û Kurdistan wekî beşekê Îraqê di nivîseka xwe de binavkirî kir.<sup>(18)</sup> Evca li gor vê nivîsê girêdana kurdsitanê bi Îraqê ve ne pirsa kudî çareser dike û ne jî akincîbûna siyasî û gîografi bo îraqê zamin dike.

Li ser rûpelên Rojî Kurdistan ideolojiya serbixwebûna Kurdistanê dihat raçandin û tê de êriş dihat kîrin bo ser hemî yên ku li dijî bîr û bawerên serbixwebûnê radiwestan, bo nimûne di hejmara şesê ya 24.12.1982ê de, di nivîsekê de di bersivdanê de li ser propagende-yê îraqê û ingilîzan dînîvise ku Kurdistan nebes devera Silêmaniye ye lê hemî axa gelê kurd e. Û her weha dibêje ku ci guman li ser sinûrên Kurdistanê nîn in û xwecihê wilayeta Mûsilê kurd in. Û her di eynî nivîsê de nivîskar dimîne heyirî ka çîma miletekî din dixwaze wan deveran bigre yên ku bi sedan salan yên kurdan bûn. Û texneyê li Konferansa Lozanê dike û dibêje ku daxwazên me bo konferansa Lozanê ne daxwaza berevanîkirinê ji kêmâniyekê bû lê mafê azadbûnê bû li ser axa welatê xwe.<sup>(19)</sup>

Du dewleta şer bû li ser wan deverên ku di vê nivîsê de hatibûn binavkirin, ew jî Turkiya û Îraq bûn, digel piştевaniyeka pîrr xurt ya ingilîzan ku ew der ver bibin parçeyek ji Îraqê.

Ew dever, ji aliyê stratejîk ve, ji wan dewletan re pîrr giring bûn û her weha ew bi gazê dewlemend bûn û çandinvanî jî tê de pêşketî bû. Hizir û dîtinêni di Bangî Kurdistan û Rojî Kurdistanê de diweşîyan, bûn egerên munaqše-yan<sup>(20)</sup>. Desthilatdarên Îraqê û ingilîzan propagende dikirin ji bo ku kurdan bi hindê qayîl bikin ku ji bo wan ya çêtir ew e ku ew otonomiya di çarçoveya Îraqê û di bin çavdériya Birîtanyayê de qebûl bikin. Ew bi xwe, di rastiyê de, ci carekê, di hizra Birîtanyayê de nebû ku otonomiyê bide kurdan, lê dixwest bi rîya sozdanan rîyê li ber jinavbirina memleketê şex Mehmûdî xweş bike û intelektuelên kurd yên welatparêz ji têkoşîna wan bide paş û bi xwe jî ji aliyekî dî ve jî, wê, bi hindê, provekasyona Turkiyayê dikir.

Xuya ye ku ew propagende ya li dijî hebûna dewleteka serbixwe ya kurdî yek bû ji egerên peydabûna xeteke dî di tevgera kurdî de, ku ji bo çareserkirina pirsa Kurdistanê, otonomî di çarçoveyê Îraqê de, bû armanca wan.

Ingilîz gelek ji hukumdariya şex Mehmûdî û intelektuêlên kurd yên welatparêz yên ku bûbûn hilgirên bir û bawerên netewî û dibûn egera hişyariya netewî û radiwestiyan li dijî paşketin û bindestiyê, ditirsîyan. Lewma jî li 24.03.1923ê êrişâ xwe birin ser Kurdistanê û paytextê wê, Silêmaniye. Şex Mehmûd neçarbû ku vebikişe bo çiyayê

Sordaş. Diyar e ku rola çapxane û rojanmegeriyê li cem wan ronakbîrên serdemâ hukumdarîya şêx Mehmûdî pîrr bi qîmet bûn lewma jî wan bi xwe re ew çapxane ji bajarê Silêmaniyyê bir çi-yayî. Li sala 1923ê di şkefta Gasneyê de rojnameyeka nihînî; *Bangî Heq*, derxistin.

Ew rojname pîrr bi nihînî dihat çap û belav kirin. Tê de agahdarî û nûçe dihatin weşandin û her weha rojnameyê, di nivîsên xwe de, daxwaz ji xelkê kurd dikir ku li dijî dagîrkerî bergiriyê bîke<sup>(21)</sup>.

Berdewambûna êrişa leşkerê ingilîzan bo ser Kurdistanê, serhildayî neçar kirin ku xwe bigehînin çiyayêن asê li ser sinûran digel Iranê û weha ew neşîyan çapxaneyê bi xwe re bibin. Evca çapxane careka din ket nav lepêñ ingilîzan û wan ew vegerand bajarê Silêmaniyyê. Li 17.06.1923ê kurdan leşkerê ingilîzah ji Silêmaniyyê derxist, lê vê carê ingilîzan parçeyek ji çapxaneyê, ku çapxane bê wê karnake, bi xwe re bir. Lê kurdan di hindurê du rojan de ew perçê çêkir û weha rojnameya serbixwe careka din dest bi weşana xwe kir<sup>(22)</sup>.

Çend nivîskarên welatparêz, bi piştevaniya desthilatdarên Memleketa Kurdistanê, li sala 1923ê heftenameya *Umîdi İstîqâlî* weşand. Rojnameyê li ser rû-pelên xwe daxwaz ji kurdan kir ku bergiriyê ji welatê xwe bikin û xebatê ji bo azadî û rizgarbûna welêt bikin. Tîraja

hejmara yekemîn 1000 bû.

Di wê rojnameyê de nivîskaran pîrsa yekgirtina kurdan li bin serkirdayetiya qîralê Kurdistanê şêx Mehmûdî anîn ziman, û her weha helwêstê xwe yê wekî yek li hember pilana Birîtanyayê bo gi-rêdana Kurdistanê bi Îraqê ve berçavkirin.

Li meha şesa 1924ê leşkerê birîtanî ji erd û esmanî êrişa xwe bir ser Silêmaniyyê û ziyanêñ mezin gehandin xelkê. Hindek kesan, ji wan şêx Mehmûdî jî, xwe gihadîn çiyayêñ asê. Umîdi İstîqâlî ji rawestiya.

Ji 18.09.1924ê dagîrkeran dest bi weşandina heftenameya xwe ya probirîtanî *Jiyane we kir*<sup>(23)</sup>.

Li sala 1925ê rojnamevan û dîrokñas Husêñ Huznî Mukiryanî (1893-1947) ew çapxaneyâ xwe ya ku li Elmanyayê kiribû û li sala 1914ê anîbû Şamê û li sala 1915ê li Helebê damezrandibû veguhaste Rewandizê. Her di eynî salê de çapxaneyan li Silêmanî, Erbil û Bexdâyê dest bi çapkîrina rojname û kovar û pirtûkîn kurdî kirin.<sup>(24)</sup>

Li sala 1926ê li Silêmaniyyê Komeleye-ka kulturi- netewî bi navê "Komelî Zanistî Kurdan"<sup>(25)</sup> hat damezrandin û armanca wê vejandin û belavkirina edeb û kultura kurdî bû. Wê komeleyê kova-ra Zanistî li 1938ê, li Silêmaniyyê weşand. Xwedîyê wê Salih Qeftan (1884-1968) bû û her yek hejmar jê weşaiyabû.<sup>(26)</sup>

Heta sala 1939ê li Silêmanî, Erbil, Rewandiz û Bexdayê gelek rojname û kovar weşîyan, mîna: *Diyarî Kurdistan 1925-1926*, *Jîyan 1926-1938*, *jîn 1939*, *Zarî Kîrmancî 1926-1932*, *Peyje 1927*, *Ronakî 1935-1936* û hwd.<sup>(27)</sup>.

Ev hemî weşan, herçend e xwedî jiye-kê kurt bûn, lê karîn weha bikin ku gelek kurd bi rîya wan, dîrok û edebiyata xwe nas bikin û bizanîn ku wan jî wekî milletên din mafê azadbûnê heye. Her ew rojname û kovar belgeyek bûn li ser hindê ku zimanê kurdî jî dikare bibe zimanê fermî û edebî.

Mehnameya *Zarî Kîrmancî 1926-1932* ji aliyê Husêن Huznî Mukiryanî ve li Rewandizê dihat weşandin. 24 hejmara jê derketin û bes bi zimanê kurdî diweşîya.

Heftenameya *Jîyan* li salên 1926-1938 derdiket. Heta hejmara 406ê berpirsyarê wê Huznî Mukiryanî bû û paşî rojnamevan û helbestvanê kurd yê navdar Pîremerdî derxistina wê domand.

Van herdu kovaran senga xwe bêtir xistibû ser mafêni mirovayetî û netewî yêndan kurdan. Li ser rûpelên wan rexne li paşketina civakî hat kirin, lê her digel hindê jî pûte dihat dan bi pirsa şîrînî û xweşîya zimanê kurdî.

Mixabin, ji ber gelek egeran û ji wan, yêndan siyasi û diravî, ew kovar nikaribûn bi awayekî bi serûber derbîkevin.

Li sala 1932ê li Bexdayê Yekîti Lawani Kurd hat damezrandin û wê kovara

xwe *Diyarî Lawan* derxist<sup>(28)</sup>.

Li sala 1938ê li Silêmaniyê komeleya Birayetî hat çêkirin û wê xwe da ber pirsên siyasi û kulturî yên miletê kurd.

Li sala 1939ê li Silêmaniyê partiya Hiwa damezriya û armanca xwe kir têkoşîn ji bo serxwebûnê.

Rola van hemî girupan û bi taybetî ya dawiyê; Hiwa, di nav kurdan de mezin û karîger bû û kartêkirina wan ya mezin di hisyarbûna netewî de hebû. Hiwayê pîç pîç dest bi pejirandina otonomiye ka kurdî di hundirê Iraqê de kir.

Wan girup û partîyan, di organên xwe de, daxwaz ji kurdan dikir ku bikevin nav rîexistinê siyasi û welatparêz, yên ku xebatê ji bo bidetsveanîna mafêni kurdan yên netewî dikan.

Salên cilan di dîroka başûrê Kurdistanê de, bi xwe re gesbûn û pêşketinê di jiyana siyasi û kulturî ya wê parçeyê de tînin. Ew salên xurtbûna tevgera kurd ya netewî bûn û salên duristbûna partiyêni siyasi yên xwedî armancê netewî bûn, partiyêni ku programên wan yên pêşketî di warê guhertinkariyê civakî de hebûn. Digel vê çendê, her bi eyñî rihê, çend kovar jî derketin.

Yek ku ji çêtirin kovarên wê qonaxê tê destnîşankirin Gelavêj e. Kovar di salên 1939-1949an de, li Bexdayê, bi zimanê kurdî derdiket. Wê roleka mezin di belavkirina bîr û bawerên pêşkeftinxwaz û demokratîk û di têkoşînê de li hember faşizmê leyîst. Bi rastî jî Gelavêj

stêra geşa rojnamegeriya kurdî bû. Sernivîskarê wê yê yekemîn nivîskar û siyasetmedar Îbrahîm Ehmed bû û piştî wî sernivîskarê wê bû rojnamevan, nivîskar û dîroknas Elaedîn Seccadî.

Wê kovarê nivîskar, rojnamevan û intelektuêlên kurd yên navdar li dor xwe kom kirin, mîna: Pîremêrd, Mehemet Emîn Zekî, Refîq Hilmî, Tewfîq Wehbî, Şêx Mehemed Xal, Giyo Mukiryanî ûwd.<sup>(29)</sup>

Her weha, di wê qonaxê de, kovareka din jî, ya her bi eynî terzî baş û giring derdiket, ew jî heftenameya *Jîn* bû, ku li Silêmaniyê li salêن 1939-1963ê derdiket. 1714 hejmar jê derketin. Xwedî û rêveberê wê Pîremêrd bû.

Van herdu kovaran, hem ji ber jîdirêjiya wan û hem ji ber azadiya nivîsinê tê de, rola herî mezin di dîroka rojnamevaniya kurdî de li başûrê welatî leyist.

Li 30.03.1948ê li Bexdayê kovara serbixwe ya siyasi *Nizar*, bi zimanê kurdî û erebî derket. Sernivîskarê wê Elaedîn Seccadî bû. Di wê kovarê de, mirov dibîne ka intelektuêlên kurd, di salêن çilan de, ci Kurdistanek daxwaz dikir. Bo nimûne, di hejmara yekê de, sernivîskar armancê kovarê destnîşan dike û ji wan vê bi nav dike: "...Bi hêzxistina birayetiya kurd û ereban û pêşkeftina welatê me Îraqê".<sup>(30)</sup>

Mirov dikare ji vê nivîsê bi encamekê derbikeve ku rojnamegeriya kurdî dest

pê kir ku Kurdistanê wekî parçeyeka Îraqê bi nav bike û ew bi xwe jî armanca îraqî û nigilîzan bû. Hêjayî gotînê ye ku di guhertina armanca tevgera rizgarîxwaza kurd de li başûrê Kurdistanê kartêkirina partiyêن ku piştî Sherê Cihani yê Duyemin hatibûn duristkirin hebû; mîna: Şoress (Partiya Komunist ya Kurd) 1945, Partiya Rizgarî 1945-1946 digel Yekêtî Têkoşîn ku liqa Partiya Komunîs ya Îraqê bû li Kurdistanê. Van partiyen rojnameyên xwe yên çep diweşandin û li ser rûpelên wan daxwaza yekbûna kurd û ereban di yek dewletê de li hember imiveryalîzmê dihat kirin.

Li 16.08.1946ê ji yekgirtina Şoress û Rizgarî, Partî Dîmoqratî Kurd ku paşî navê wê bû Partî Dîmoqratî Kurdistan, hat damezrandin<sup>(31)</sup>. Avabûna PDKê dûmahiya Partiya Komunîsta ya Kurd bû, lê ne dawiya kartêkirina siyaseta komunisten Îraqê bû li ser tevgera siyasi û rojnamegeriya kurdî.

Mirov dikare bibêje ku salêن sih û cilan salêن vejîna (renesansa) edebiyata kurdî bûn, wekî nimûne xwendingeha Goranî ya nû di helbesta kurdî de serhilda û di pexşanê de jî bi kartêkirina edebiyata cîran û ewrupî şêwazên nû peydabûn.

Berhemên wan salan yên rojnamegerî bûn bingeh û jêderên herî buhadar û hêja di dîrok, edebiyat û dîroka werabûna zimanê kurdî de.

Di salêن çilan de hinek parti û girupan rojname û kovarêن xwe yên legal û nelegal derxistin. Piraniya wan ji aliye dewletê ve qedexekirî bûn û yên derdixistin jî, ji aliya desthilatdaran ve tûşî derdeseriyan dibûn. Lê digel wê hemiye jî belavkirina bîr û bawerên azadîxwaz û pêşketinxwaz girêdayî pirsên ci-vakî-netewî nerawestiyan.

Ew rewş heta sala 1958ê berdewam bû, yanî heta jinayçûna Qiralgeha Îraqê û damezrandina Komara Îraqê.

Di qonaxa yekemîn ya damezrandina Komara Îraqê de rojname û kovar bi hejmareka bêtir ji wan hemî pêncihsalêن berî xwe de derketin.

Di wê qonaxê de, rojnameya *Xebat* ya ku heta 1958ê nelegal û paşî bi aşkerayî wekî organa Partî Dîmoqrati Kurdistanê derdiket, cihê herî mezin digire. Li berahiyê navê vê rojnameyê *Rizgarî* bû, lê li sala 1953ê, di kongireya vê partiyê ya sêyemîn de, navê wê kirin *Xebat* û her ji 04.04.1959ê bi du verşonên cuda; hem kurdî û hem erebî derdiket. Heta sala 1961ê, ku tê de derxistina wê rawestiya, 462 hejmarên wê derketibûn.

Rojnameya dîtir ya wê qonaxê ya giring *Azadî* bû. Ew ji aliye liqa Pertiya Komunist ya Îraqê ve li Kurdistanê dihat derxistin. Hejmara wê ya yekemîn ya legal li meha pêncâ 1959ê li Kerkükê derket.

Îmkana derxistina rojname û kovarên legal, bû egera mişebûn û pêşketina

wan. Kovarêن taybetdar dest bi derketinê kir, wekî. Bilêse ya Neqabeya Mammostayên Silêmaniye. Herweha bo cara yekemîn di dîroka rojnamevaniya kurdî de kovareka taybetî bi pirsên cuda yên hunerî; *Huner li Silêmaniye*, ji bo jinan kovara Afret û ji bo xwendinkaran *Dengî Qotabiyan* û *Çareserkirdinî Kıştûkal* û htd. li Bexdayê û Kurdistanê derketin.

Nexweşbûna danûstandinê kurdî-Îraqî û destpêkirina şerê çekdar li sala 1961ê bûn egera ku desthilatdarên Îraqê bêtir ji zo rojname û kovarên kurdî dayêxin û qedexe bikin.

Heta sala 1968ê navbeyn navbeyn rojname yan kovareka nû derdiket lê jî-kurt û tîrajkêm bûn.

Li sala 1970ê, piştî morkirina lihevhatina Îraqê û kurda li ser otonomiyê bo Kurdistanê, desthilatdarên Îraqê hinek guhertin kirin û rê dan azadiya derbirînê, azadiya çap û weşandinê û hwd. Evca salêن 1970-1974an salêن bişkiftina rojnamgeriya kurdî bûn. Di wan salan de bêtir ji 35 navê nû di rojanmevaniya kurdî de peydabûn<sup>(32)</sup>, û zimanê kurdî bû zimanê resmî li Kurdistanê. Ji nav rojnameyên wê qonaxê hêja ye ku mirrov van navan bi bîr bîne: heftenameya *Hawkarî* ku ji 1970ê dest bi derketinê kit, mehnameya *Beyan* ji 11.1969ê, mehnameya kulturî *Rojî Kurdistan* ji 1971ê, *Roşinbîrî Nwê* 1973ê.

Rojnamevaniya wê serdemê ji bo ber-

sivdanê li ser daxwaz û pêwîstiyên xwendevanênen xwe gelek cih da pirsa bergirîkirinê ji mafêñ kurdan yên netewî, li ser pirsa avakirina cihêñ di egerêñ seran de hatibûn xirabkirin rawestiya, wê berevanî ji mafêñ kurdan li parçeyêñ din yên Kurdistanê jî kir, û herweha daxwaz ji desthilatdarêñ Bexdayê dikir ku arîkar û piştgirêñ hemî netewê kurd bin li hemî parçeyêñ Kurdistanê.

Mixabin di wê qonaxê de ji bilî rojnameya *Birayetî* ku organa PDKê û paşkoya rojnameya rojane *El-Teaxî* û hem ne jîdirêj û ne bi duristî rojane bû, ci rojnameyeka rojane ya bi kurdî nebû.

Rojnameya *El-Teaxî*, ku berî wê qonaxê bi navê *Rizgarî* û paşî bi navê *Xebatî Kurdistan* û paşî *Xebat* derdiket, ji 29.04.1967ê heta 11.03.1974ê, roja êrişa Îraqê bo ser Kurdistanê, bi zimanê erebî, derdiket<sup>(33)</sup>. Ew ji rojnameyêñ ku heví li Îraqê dihatin xwendin bû, ji berku berevanî ji mafêñ hemî rûniştivanêñ Îraqê jî dikir.

Piştî destpêkirina şerî li sala 1974ê li Kurdistanâ Îraqê, du şêweyêñ rojnamevanî têñ ber çavan, ya legal ku ser bi hukumetê bû û ya ilegal ku ya opozisyonê bû. Rojnamevaniya legal, ew rojnamevanî bû ku ji aliye dam û dezgehêñ dewletê ve, bi zimanê kurdî derdiket û wan rojname û kovaran, li ser rûpelên xwe, cih didan idolojî û propagndayêñ partiya Be'is ya hukumdar. Ew weşanname di çêtirîn û nûjentirîn çapxane-

yên Îraqê de dihatin çapkîrin. Goya ew, siyaseta hukumetê û partiya hukumdar, di nav kurdan de belav bikin, lê di ser wê hemî sansûr û kabûsê tirsê de, wê rojnamevaniyê xizmeta kurdan di pêş-debirina edeb û zimanê wan yê zanistî de kir, tê de şêwazên nû yên edebî dihatine pêş û dewlemend dibûn û herwesa jî xwendevanênen xwe bi kultur û edeb û dîroka welatê xwe dan nasandin. Sansûra li ser heyî, bû egara ku di edebiyata wê de sembol cihî bigre. Xwe, bi rengekî ji rengan, mirov dikare bibêje ku di wê rojnamevaniyê de ya ku hukumetê derdixist, rojnamevaniyeka berxwedîjî serê xwe hilda bû û zimanekî taybetî di navbera nivîskar û xwendevanan de peyda bûbû, herdu alî dişyan, pê, di hevûdu bigehin û oponyoneka hevbeş di hinek waran de ava bikin.

Rojnamegeriya ilegal, ew rojnamevanî bû ya ku partiyêñ siyasi û komeleyêñ pişeyî yên ku xebat li dijî desthilatdarêñ Îraqê dikir derdixist. Li ser hemî asteng û tengasiyêñ çap û weşandina wan, ew digehîste xelkê û kartêkirina wê li ser xelkê kurd hebû. Ew rojnamegeri dikare bibe du beş: rojnamevaniya senteral ya ku ji aliye serkirdayetiyyen wan partian ve dihat derxistin; rojnamevaniya lokal ya ku ji aliye liq û komîteyêñ wan partian li deverên cuda cuda yên Kurdistanê dihat weşandin. Wê rojnamegeriyê bi çavêñ kurdî rastiya jiyanê li Kurdistanê berçav dikir û

armanca wê ya serekî ototnomî bû ji bo kurdan di hundirê Îraqeka demokratîk de.

Di salên 1976-1984an de şerê birakujiyê, yê di navbera hêzên kurdî de, di rojnamegeriya wan de jî cihê xwe girt û her ew şer û ew şerê gotinan di radyo û rojnameyên wan de bû egera dilsariya xelkê kurd û şervanên wan û devberdanna gelek kesan ji endamtiya xwe di wan partîyan de. Paşî ew hemî partî di Bereyê Kurdistanî de gihane hev û şerê birakujiyê rawestiya. Rojnamegerî jî di na-verok û babetên xwe de bêtir nêzîkî xwendevanan û daxwaz û pêwîstiyêwan bû û bû serkaniya informasyonên cihê baweriyê bo xwendevanên kurd. Lê armanca wê her ma otonomî bo Kurdistanê. Li ser rûpelên wan rojnameyean dihat diyarkirin ku yekgirtina hêzên siyasiyên kurdî rêka êkane ye bo bi destveanînan serketinan. Ji navên gi-ring di rojnamevaniya wê qonaxê de: *Xebat* - organa PDK, *Rêbazi Nwê* - organa YNK, *Pêşeng* - organa PDGK, *Rêgay Azadî* - organa Partiya Sosyalist ya Kurd, *Berey Kurdistanî* - organa Berey Kurdistanî.

Li ser rûpelên wan rojnameyean û bi taybetî di *Berey Kurdistanî* de pirs û problemên tevgera rizgarixwaza kurd û dîrok û paşeroja kurdan hatin munaq-şekirin.

Gelek partiyên di *Berey Kurdistanî* de rojname û kovarên xwe yên bi zimanê

erebî jî hebûn. Li deverên di bin kontrola hêzên çekdar yên kurd de, herweha yeketiyêñ xwendinkar û lawên kurd jî rojnamegeriya xwe derdixist û ew rojnamegerî rengdana siyasetên wan partiyan bû yên ku ew yeketî û komeleyên pîşeyî pêvegirêdayî bûn. Digel hindê ku ew rojnamegerî jî aliyê hukumeta Îraqê ve qedexekirî bû û kesê ku pê re bihata-na girtin tûşî çarenûseka reş dibû, lê xelkê hemcara û her yekî li gor meylêñ xwe yên partînî û siyasiy ew rojnaname û kovar dixwendin.

Piştî serhildana adara 1991ê û bi egera ketina leşkerê hevsozan bo nav wê parçeya Kurdistanê, pirraniya axa wê derê ket bin kontrola kurdan. Evca bo cara yekemîn piştî sala 1974ê azadiyêñ mezin li ber kurdan vebûn, û rojnamegeriya heta wan gavan ilegal bû, dest bi weşandina xwe ya legal kir.

Çend navên rojnamegeriya piştî 1991ê:

- Alay Azadî, organa Hizbî Zehmet-kêşanî Kurdistan.
- Alay Şoreş, organa Alayı Şoreş.
- Azadî.
- Baban.
- Berey Kurdistanî, organa Berey Kurdistanî.
- Birayetî, PDK, rojnameya rojane
- Bûn
- Demokrasî, kovara siyasiy-kulturî-civakî, serbixwe.
- Esta.

- Gazi.
- Gelawêjî Nwê.
- Gulan.
- Heng.
- Herêm, rojnameya Hukumeta Herêma Kurdistanê.
- Karwan.
- Kurdistanê Nwê, YNK, rojnameya rojane
- Peyman.
- Raman.
- Rêbazî Nwê, organa YNK.
- Rêgay Azadî, Partiya Sosyalîst ya Kurd.
- Rêgay Kurdistan, organî Herêmî Kurdistan hîzbî Şîyu'î Ìraq.
- Rûnakî, organa Hizbulay Şorîşgérî Kurd.
- Serab.
- Serbexoyî, organa Pasok (Partî Serbexoyî Dîmukratî Kurdistan).
- Wêran.
- Xebat, organa PDK.

Ez li dûmahiya vê berpervedana bi lez bo rojnamevaniya kurdî li başûrê welatî çend navên rojnamegerî ji destpêkê hefta destpêka salên heftêyan ku min ji "Raberî rojnamegerî kurdi" û nivîsinc ji rojname û kovarine kurdî wergirtine, li jêr berçav dikim:

3. Bangî Kurd 1922.
4. Rojî Kurdistan 1922.
5. Bangî Heq 1923.
6. Umêdî ïstîqlal 1923.
7. Jîyanewî 1924.
8. Diyarî Kurdistan 1925.
9. Jîyan 1926.
10. Yadgarî Lawan 1933.
11. Ziban 1937.
12. Jin 1939.
13. Hawarî Kurdistan 1946.
14. Hetaw 1948.
15. Hewlêt 1950.
16. Ray Gel 1959
17. Azadî 1959.
18. Xebat 1959.
19. Birwa 1960.
20. Dengî Kurd 1960.
21. Rastî 1960.
22. Kurdistan 1961.
23. Hewlêt 1962.
24. Raperîn 1963.
25. Dengûbas 1965.
26. Birayî 1967.
27. Rûnakî 1969.
28. Hawkarî 1970.
29. Jin 1971.
30. Dengî Cûtyar 1971.
31. Birayetî 1972.
32. Bîrî Nwê 1972.
33. Birayetî 1974.
34. Paşkoy Birayetî 1975.

#### **Rojname:**

1. Têgeyîştinî Rastî 1918.
2. Pêşkewtin 1920.

#### **Kovar:**

1. Bangî Kurd 1914.

2. Zarî Kirmancî 1926.  
 3. Peyje 1927.  
 4. Diyarî Lawan  
 5. Runakî 1935.  
 6. Zanistî 1938.  
 7. Gelawêj 1939.  
 8. Dengî Gîti Taze 1943.  
 9. Nizar 1948.  
 10. Êre Bexdaye 1950.  
 11. Peyam 1952.  
 12. Hîwa 1957.  
 13. Hetaw 1954.  
 14. Şefeq 1958.  
 15. Pêşkewtin 1958.  
 16. Rizgarî 1959.  
 17. Dengî Qotabyan 1959.  
 18. Çareserkirdinî Kiştûkal 1959.  
 19. Bilêse 1959.  
 20. Newroz 1959.  
 21. Afret 1959.  
 22. Huner 1959.  
 23. Niştiman 1959.  
 24. Hîway Kurdistan 1959.  
 25. Rojî Nwê 1960.  
 26. Ronahî 1960.  
 27. Îraqî Nwê 1960.  
 28. Jiyan 1960.  
 29. Edîbî Îraqî 1961.  
 30. Nirkey Cutyar 1963.  
 31. Dengî Pêşmerge 1963.  
 32. Tûtin 1964.  
 33. Raber 1966.  
 34. Gizing 1967.  
 35. Kadir 1968.  
 36. Karî Millî 1968.  
 37. Silêmanî 1968.  
 38. Rizgarî 1969.  
 39. Tişk 1969.  
 40. Beyan 1969.  
 41. Birayetî 1970.  
 42. Zanyarî 1970.  
 43. Gêtî Pûl 1970.  
 44. Defterî Kurdevarî 1970.  
 45. Xebatî Qotabyan 1970.  
 46. Hewlêr 1970.  
 47. Şorişî Kiştûkal 1970.  
 48. Çiya 1970.  
 49. Perwerde û Zanist 1971.  
 50. Nûserî Kurd 1971.  
 51. Birayetî 1971.  
 52. Dengî Mamosta 1971.  
 53. Riwange 1971.  
 54. Rojî Kurdistan 1971.  
 55. Gizing 1972.  
 56. Estêre 1972.  
 57. Amanc 1972.  
 58. Birî Nwê 1972.  
 59. Nûserî Nwê 1972.  
 60. Kulîçî Edebiyat 1972.  
 61. Huşyarî Kirêkaran 1872.  
 62. Korî Zanyarî Kurd 1973.  
 63. Baba Gurgur 1973.  
 64. Bo Pêşewe 1973.  
 65. Roşinbir 1973.

### **Çavkanî:**

1. Beyan, 20/1987. Dr. Kemal Mezher Ehmed di "Kurdistan le salekanî Şerî Yekemî Cihan da", çapa Stokholmê ya sala 1990ê di rûpela 40ê de

- dibêje: "ji hejmara yekê heta hejmara sêyê pêkve  
72 rûpel in, wate her hejmareka wê 24 rûpel  
bûn".
2. Dr. Kemal Mezher Ehmed, Le salekanî Şerîf  
Yekemî Cihanî da, Stokholm, 1990, rûpel 40.
  3. Eynî çavkaniya jorîn, rûpel 40-41.
  4. Eynî çavkanî, rûpel 42.
  5. Eynî çavkanî, rûpel 42.
  6. Eynî çavkanî, rûpel 42.
  7. Dr. kemal Mezher Ehmed, Çend rûpel ji dî-  
roka gelê kurd, Stokholm, 1991, rûpel 128.
  8. Nuri Şaweys, Min mudekratî, Dîmeşq, 1985,  
rûpel 8, bi erebî.
  9. Sabir Eli Ehmed, Şe'bun bîla sehîfe yewmiye,  
Kurdistan, 1989, rûpel 27-28, bi erebî.
  10. Roşinbirî Nwê, Bexda, 10.1979, hejmar 77,  
rûpel 31-34.
  11. Roşinbirî Nwê, Bexda, 1979, hejmar 77, rûpel  
32.
  12. Kemal Reûf Mehemed, Salih Qeftan û ye-  
kem.govarî Silêmanî, Karwan 78, 1989, rûpel  
119.
  13. Dr. Kemal Mezher Ehmed, Çend rûpel,  
Stokholm, 1991, rûpel 129.
  14. Bangî Kurdistan, hejmar 1-14, 1918
  15. Eynî jêderâ jorîn.
  16. Rewşen, kovar, hejmar 2, payiz 1988, rûpel  
28.
  17. Cemal Xeznedar, Raberî rojnamegerî kurdi,  
Bexda, 1973, rûpel 26.
  18. Edmonds C. J., Kurd û turk û ereb, Bexda,  
rûpel 272-273, bi erebî.
  19. Eynî çavkanî, rûpel 273.
  20. Eynî ya berê, rûpel 273.
  21. Fetah Ebdulla T., Problemy rozwoju i  
upowszechniania kultury kurdyjskiej w  
Iraku, Warszawa, 1978, bi polonî.
  22. Dr. Kemal Mezher Ehmed, Çend rûpel,  
Bexda, 1991, rûpel 131.
  23. Cemal Xeznedar, Raberî rojnamegerî kurdi,  
1973, rûpel 30.
  24. Edmonds C. J., rûpel 15.
  25. Kemal Reûf Mehemed, Salih Qeftan û yekem  
govarî Silêmanî, Karwan 78, 1989, rûpel 118.
  26. Eynî jêderâ jorîn, rûpel 107.
  27. Cemal Xeznedar, Raberî rojnamegerî kurdi,  
1973.
  28. Fatah Ebdulla T., Uniwersytet w sulejmani i  
jego rola w latach 1968-1978, Kultura i Spo-  
Leczenstwo, Nr 3-4, 1978 r, str. 336.
  29. Gelawêj, hejmar 1-9, 1943.
  30. Cemşid Heyderî, Çil sal be ser derçûnî ye-  
kem jimarey govârî Nizar, Berbang, hejmar 8,  
1988, rûpel 40.
  31. Eli Ebdulla, Tarîx El-Hizib El-dîmuqratî El-  
Kurdistanî ûlî el-mu'temer el-salis, Kudistan,  
1968, rûpel 151.
  32. Sabir Eli Ehmed, Şe'bun bîla sehîfe yewmiye,  
Kurdistan, 1989, rûpel 12.
  33. Xebat, organa PDK-Îraq, Hejmar 600,  
08.1989, rûpel 15-16.
  34. Berey Kurdistan, organa Berey Kurdistanî,  
hejmar 16, 01.1990, hejmar 20, 09 1990, hej-  
mar 22, 11.1990.

# XIZMETA XELÎLÊ ÇAÇAN Û MALBATA WÎ



WEZİRÊ EŞO

**I**sal, gava em 100-saliya rojnamegeriya kurdî didine kivşê, em navê camêrekî welatparêz, rojnamevan û nivîskar - Xelilê Çaçan Mûradovê rehmetî bi dilekî baristan bi bîr tînin, yê ku di nava 24 salên (ji sala 1957a hetarı sala 1981ê) serokatiya radyoya kurdî li Yêrivanê kiriye. Ez dixwezim di vê gotarê de bi cûrê bîranîna derheqa wî û karkirina wî de gîlî kim, çîmkî min gelek salan bi wî ra kar kiriye.

Xelilê Çaçan mîrekî maqûl î giran bû, pêra jî berbihêr û rûnerm. Wî bi xeysetê xwe yê qenc rûmeteke bilind qazanc kiribû.

Çaxê ez îro di derheqa Xelilê Çaçan de dinivîsim, dixwezim seba xwe û xwendevanê kurd zelal bikim, ka kîjan û çiqasî emekê wî di nava dereca pêşdabırîna çand û edebiyata kurdan de bi temamî û xwesma li Ermênistanê. Pey mitalên demdirêj ra min sê şertên kîrhañ cuda û kivş kirine, nava kîjana de keda Xelilê nemir gelek e.

Berê ewlin ew teşkîldarekî dûrdîtî bû. Wî dora xwe-redaksyona xeberdanêñ kurdî de-hêzên ronakbir yên kurdêñ jêhatî civandin ser hev û hereketê wan de xercki-rinê bona hişyarkirina gelê kurd, yê ku îro li Kurdistanê şerê azadiyê yê çekdariyê



Xelilê Çaçan teşkildarekî dûrditi bû

distan hatiye perçekirinê, ku bi wê yekê meremên dewletên Roavayê yên xirab hindava xwe de tevlihev bike. Û hedê kesekî tunebû tixûbê vê siyaseta resmî serobin bike. Lê car-carna bi saya Xelilê Çaçan ew tixûb ji bo karê gelê kurd bi fesal dihate teribandinê.

Xelil Mûradov hereketekî mezin xerc kir seba bi hezara nimûnên hunurmendiya kurdan ya stranbêjiyê ji windabûnê xilas bike û ser qeytanê qeyd bike. Ez şahidê wê yekê bûme, ku bi çi teherî dengbêj û sazbendên kurd di redaksona xeberdanê kurdî de diciviyân û gelek caran hema odehyen wê de cêribandin derbaz dikirin.

xwes kirîye. Wek welatparêzekî şewat wî rî dida propagandakirina bir û baweriyan rizgarkirina gelên bindest û xwesma yê kurd. Û wê derecê de wî carna nevs û quliga xwe dikire bin qeziyâye, ji ber ku gelek caran sînorê siyaseta dewleta Sovyet diteriband. Kî nizane, ku dewleta Sovyetê herdem dilê wan dewletên Rohilata Nêzik û Navîn dikirî, navbera kijana de Kur-

Dengê def, zurne, meya, bilûr, dihol û tembûra kurdî herdem li avahiya radyoyê bela dibû û xelkê digot: "Di redaksyona xeberdanên kurdî de her roj dewat û şayî ye..." .

Bi saya Xelîl Mûradov bi sedan nimûnên stran û miqamên kurdî fonda radyoyê dewlemend kirin û iro radyoguhdar bi wana şâ dibin. Xêن ji stran û miqaman, hêna wî de gelek radyokompozisyon (şano, piyes) hatin hazirkirin ser hîmê radyopî-êsen nimûnên zargotina kurdî, nivîskarênen kurd û ermenî.

Xelîl Mûradov ji bilî vê karkirina teşkîldariyê ya giran û bi rûmet, pêra digîhand ya efrandariyê ji miyaser dikir: wek rojnamevan û nivîskar. Ew xudanê 5 pirtûkan û bi sedan miqala ne. Lê çi heyf, ku pey mirina wî ra 16 sal derbaz bûne ji, lê heyâ niha jî pirtûkeke wî, ku piranî nimûnên folklora me ne, çapnekirî maye, ew jî wî çaxî, ku iro bi dehan çapxaneyên kurdî hene.

Bi saya weletparêzî û xerîbdostiya serokê radyoyê bû, ku gelek kurdên ji welatên derva û Kurdistanê li redaksyona xeberdanên kurdî diquesidîn û pê radyoyê dipeyi-vîn. Rehmetî merd-merdane stranên kurdî dida kurdên Kurdistanê û bi wê yekê kareke mezin dida şuxulê propagandakirina hunermendiya kurdî ya dengbêjiyê.

Bermaliya wî - Eznîva Reşîd ji sala 1955a (ji destpêkê) hetanî sala 1982a peyvkara (spîkêr) radyoya kurdî bûye. Kurê wî - Têmûr rojnamevan e. Bêtirî 20 salan di rojnamên "Riya Teze" û "Dengê kurd" û radyoya Yêrivanê de kar kiriye, endamê Yekîtiya Rojnamevanê Moskow e. Keça Têmûr-Mîdiya, faktûta rojnamegeriyê ya Ünîvîrsîteya Moskow ya dewletê xilaz kiriye.

Bi tevayı 4 kesên vê malbeta rojnamevanen profesyonal 75 salan xizmeta çand û edebiyata kurdî kirine, gelek nimûnên folklora me ji windabûnê parastine.

Em iro nivîskar û rojnamevanê kurd Xelîlê Çaçan Mûradov bêyi haziriya wî bi bîr tînin, lê baristaniya ber dilê me ew e, ku karkirina wî ya welatparêzîyê wê ji bo gelekan bibe nimûne. Em iro gelekî dilşa ne ku serokê radyoya kurdî ew bû. Bi saya wî evqas nimûneyên zargotina kurdî gihîştin roja me û di şiyarkirina gelê kurd de roleke mezin lîst. Wê di dîroka çand û edebiyata kurdî de navê Xelîlê Çaçan bi tipêñ zérîn were nivîsandin. □

# DERDÊ BÊDAWÎ



KEMAL FEWZÎ

Ez kîjan jana birî-nêñ koçberiyê, kîjan êşa rûpelên qederê vekim! Hê jî tu kes welatê min ê bêkes ku li ser kurdê di rewşa şînê de ji bêzarî û dilêşiyê digrî nabihîze û guh nadê! Van rojêñ dawî yên ger-mahiya tîrmehê, hemwelatiyêñ min ên li Ruhayê, Mûsilê, Mêrdînê, Diyarbekirê, Edenê û Konyayê ku laşêñ xwe ber bi bêdawiya siya bêdeng ve beridin, tînin bîra min. Ez bawer im ku ew heryek ji wan mi-riyêñ bi giyan ên ku pênc sal berê koçî de-verêñ bêhewar kirin niha di nav gorêñ ra-

westî û nediyar de, di bin perdeya jibûr-kirinê de xemilî ne. Ez dîsan jî di van rûpelên şînê de -tevî ku nikarim dengê xwe bi pêniyîsa xwe ya şikestî bigihînim guhêñ kerr û bêhîs- dixwazim hinekî din bigirîm.

Dîsan ev heyv bûn. Ev heyvîn ku hejariya zivistanê di germahiya xwe ya çavşor de vedîşartin. Komeke penaber û hejar a ku ji zarûzêç, jinûmêr û kal û ciwanan pêk dihat, li ber selexaneya Ruhayê civiyabûn û pêl didan hev, diçeli-qîn û hevûdû dehf didan. Dora wan ji teref cendermeyên biçek û polîsan ve hatibû wergirtin. Kî bûn ew mirov?

Ew malbatêñ kurd ên esilzade bûn ku demekê di zozanêñ wan ên şîngeh û dewlemend de keriyêñ pez diçêriyan; di daristanêñ wan ên zimrûdî de her weke ku şîna fro ji berê ve bi bîr bînin, bilûrêñ biderd dinaliyan; di daristanêñ wan ên zimrûdî de, kehêlan bi dengêñ xwe yên pirrawaz ve dihîriyan.

Ew bûkêñ bêbira, bêbav, bêmêr û bêkes bûn ku mêtêñ xwe yên leheng ber bi riya şêhîdiyê ve dişandin û pişt re jî ji bo gepek nan diketin ber pêşîra mirovîn ji mirovantiyê bêpar, numûneyêñ nemerdiyê, kesêñ hemdîn lê dijminê netewe û namûsê.

Ew diyêñ çavbihêşir û dilşewitî, ba-vêñ porsipî û bi çavêñ bêmefer bûn ku zarokêñ xwe di riya xîlafetê de bi serfîmizdan dişiyandin riya mirinê!

Ew zarokêñ bêkes û tazî bûn ku bay

û birayêñ xwe di sînoran de ji dijmin re, diyêñ xwe di riyêñ berfin de ji axê re dihiştin!

\* \* \*

Polîsan ji bo ku vê komikê ji hev belabike, tim û dayîm ew qamçî dikirin û cendermeyan jî ew bi sîngoyêñ xwe ditirsandin. Lî çi feyde! Komika ku ji bo demekê ji hev bela dibû dîsa li hev diciyiya, komî ser hev dibû, mirovan hevûdû dehf didan û bi ser hev dişidiyan. Kesêñ ku canêñ xwe bi zor rizgar dikirin, di destan de tevî firaqeke ji axê çêkirî ji nav civatê xwe dikîşandin; ê ku qismetê xwe werdigirt cehd dida ku xwe ji wir dûr bixe.

Wan, ji bo xwîna germ a ku ji qirika mîhîn serjékirî diherikî bikirin, hevûdu diêşandin. Wey li halê wî ku destevale vegere! Hoqkeyek xwîn bi 25 qurûşê zîvîn dihat firotin. Lî yên ku pereyêñ wan tunebûn dê çibikirina? Xetera mirinê ji wê re jî dermanek dida dîtin: Ji hestiyêñ ku li zaboqan dihatin avêtin tu şop nediman. Zarokêñ ku kom bi kom li serê zaboqan civiyabûn hestiyêñ ku bi dest dixistin, bi keviran hûr dikirin û pişt re jî ew dixwarin.

Rojek ji wan rojêñ Ruhayê ya germ bû. Dûrî bajêr li cihêñ xewle, di bin siya darêñ bêpel de, jinêñ jinebî û mirovîn xizan û bêkes bi birçtiyê re tekoşîn dikirin û dimirin. Li wan cihêñ bêdeng

ku riya tu rêwingiyêن biyanî bi wir ve nedîcû, ciyêن tenha ku tu kesan nedix-west bibîne û lê bigere, ji ber zilma mirovantiyê dengê nalînêن kûr dihatin.

Dema karmendêن belediyeyê berî şe-veqê bazdidan ku li cesedêن bêkefen bi-gerin daku wan veşerin, di bin siyêن ta-zî de çav bi komikek hestiyêن mirovan diketin û bi paş ve vedigeriyan. Dihatin wir daku mirovên rojek berê dîtibûn veşerin. Ci mixabin pirraniya caran ce-sed jî nedihatin dîtin. Tenê didîtin ku kesen di nav ax û keviran de, di halê pe-rişaniyê de diperpitîn, her roj hê bêtir kêm dibûn. Ev rewş bû sedemê balki-şandinê. Karmendêن ku her roj diçûn van serdanêن mirin û hejariyê û desteva-la vedigeriyan, êdî bêtir li dora xwe geriyan û bi dîqettir bûn.

\* \* \*

Şeveke xerîbiyê ya kûr û jî heyveronê xeyidî, bi siya xwe ya çîlmisi û westiyayî bajar nixumandibû. Karmandan ji bo meraqa fîrbûna rewşê bi karê xwe ve bazdidan. Ji koncaleke tarî û çîvanek ve hinek deng dihatinbihîstin, dûmanek zirav û lawaz bi aramî bi jor ve hildikişîya. Xuya bû ku li wir tiştek hîs kiribûn. Li wir birrek mirovên ku xwe dabûn hawîrdora agitekî dîtin. Ew civateke pe-rişan a mirinê bû ku ji tîrsa êrîşa mirinê ya bêbext, bi perçeyek goştêن bira yan jî xwişkeke xwe yên ku ji wan veqetiya-

bûn û bi riya bêdawî ve çûbûn, jiyana xwe xistibûn bin garantiyê.

Roja din dora wan rebenan xistin bin çemberê. Hê di nav de du roj derbas nebûbûn, ew rebenêن ki li benda miri-na hev bûn û bi van mirinan hinek din jî jiyana xwe dirêj dikirin, tev bi hevre bi carekê miribûn.

Di sala 1917 an de Ruha dîsa rojek ji van rojêن germ dijiya. Çend tabûtêن ri-ziyayî ku ji çavan dûr û bi dizî dihatin girtin, di hêla din de bi erebeyekê ve bi meşa giran û çalak ve ber bi goristanê ve dihat şandin. Min pirsî. "Dîsan ew in" gotin.

Belê ew! Ên ku ji Bedlîsê, Mûşê, Wanê, Erzeromê diyar diyar koç kiribûn bi ser rîyan ketibûn tune bûn? Ha ew in! Bêkesen ji axa Ruhayê ku li teselî û ra-westina bêdawîtiyê digeriyan. Ax, belê ew! Lawêن ji herêmeke bêxwedan bêyi ku gepek nan bibînin, bêkes û bêwelat miribûn. Ew bûn ku derdêniha ji me re weke mînak hiştine ku bidawî nayêن. Ü dê bidawî neyêن. □

Jin, hej. 24, 1919

Ji tirkî: MIHEMED DEHSIWAR

## **GERMA DÜRBÜNÊ EVİNÊ ÇEDIKE**

Ji lêvan şeranî kete lêvên min  
ez têr jê rewa bûm  
ji awir û nerînan  
welat ji pêlên ava çavêن te  
birînê kûr digre û derman dike  
Di hembêzkirinê de baranek xinavî  
li germê mirî dibarîne û  
jiyanekê nû jê te tîne.  
Bayê bihara rengîn  
dikeve goristana miriyan  
wan ji mirinê hişyar dike  
lê dema tu ji min dûr dikevî  
ez bê hiş û raman dimînim.  
Pênuş û tiliyên min  
naramûsin ku  
helbestan çêkin.  
Çima mirin?  
Çima dûrbûn?  
Çima nedîtin?  
Ku bi agirê wê dişewitin  
Û dûmana tibûnê  
jê dide der û winda dibe  
Di nav êş û janan  
Dûrbûn û nedîtin.

## **BÊWAR İBRAHÎM**

# GELŞA TESPİTKIRINA ROJÊN ME YÊN TAYBETÎ

MEMDUH SELİM BEG



Dî hejmara "Jî-nê" ya 14an de, bi munasebeta pîrozkirina serêsalê, gelşike hêjayî mu-naqşeyê tê pêşkêş-kirin:

Gelşa tespîtkirina  
rojên me yêñ taybetî.

Di vê nivîsa xwe de ne ku ez ê van rojan tespît bikim; ez ê girîngiya tespîtkirina wan teyîd bikim. Çaxa "Jîn" serêsalê pîroz dike lê ji bîranîna rojên ta'l jî paş de namîne. Bi rastî kurdan, para xwe ji gelek êşen van demeên dawî girtin. Ev mîletê ku gelekî sadiqê wezîfeyêñ xwe

ye, ji hebûna wî ya maddî bêtir, hêza wî ya manewî saxlem e -him jî pirr saxlem e - ku di riyên Şerqê de ji rojhîlat bigre heta bi rojava gelek mirî daye, gelek eziyet û cefa kişandiye, lê li gel vê jî wek her miletê zindî dîsa jî clametên liberx-wedanê nişan daye û dide.

Em rojên wiha ta'l çuqasî dibînin bila bibînin, lê dîsa ewê yek jî nikanibe wezîfeyên me û pêşeroja me ya ronak jî bîra me bibe û ew rojên berê yên mezin û bextewar ku me ew wek netewe borandine bi me bi de jibîrkirin.

Însan dibêjin ku bûyer muweqet in. Di jiyanâ mirovekî de hin rojên jiyanê yên borî, hin demênu ku meriv kanibe wan bi kêf, bi dîqet bi bîr bîne, yanî hin bîranînên şîrîn hene! Bi taybetî jî gava meriv bi hev re rojeke aidî ferdekî ya jî aidî çend ferdên malbatê bi bîr tîne, ji meriv re dibe wek xemrevîniyek ku dilê meriv pê fireh dibe; li hember rojên ta'l yên hatine dîtin û yên ku ewê werin dîtin hêz û ezmeye nuh dide ruhan!...

Ji bo civatêni ji gelek însanan hatine meydanê jî ev yek wiha ye. Qet civatek tuneye ku hin bîstikêni(kat/dem) ku tesîrek mezin li ser jiyanâ wan ya tevayî û müşterek nekiribe nejiyabin.

Ferdên civatêni ku nikânin xwe ji dîn(ol) dûr bihêlin, her roj wacibêni xwe yên dînî bi cî tînin û rojên xwe yên taybetî yên dînî jî dikin wesile ku ji Xwedayê xwe merhametê bixwazin. Di

rojên wiha dînî de gelek însan, xeydêni xwe yên kevn ji bîr dikin û pêwîst dibînin ku di der heqê hemnijadêni xwe de daxwazêni baş niyaz bikin. Bi piranî jî rojên wiha di ruhê me de cezbkirineke îlahî şiyar dike. Em rojên wiha muqedes bi bîrkirineke ji xwe ber dipêni.

Rojên me yên taybetî ên civakî ji me re dibin wesile ji bo ku em bi malbata xwe re, bi hevalêni xwe re, bi cîranêni xwe li çolan, di nav mîrgan de, li cihêni kêf û şahiyê bigerin, kêf bikin û hezkirin û kêfxweşiyêni xwe ji hev re diyar bikin.

Ji bo netewan tiştê esasî yê girîng "rojên taybetî yên netewî" ne. Rojên wiha di jiyanâ netewî de hin pageh(seknok), hin merhele ne. Di van rojan de hemû şadî û derdêni hatine dîtin û kişandin, bîranînêni ta'l û şîrîn ên netewî, bûyêrêni dîrokî û jîna pêşîyan têni ber çavêni mirov û ji bo ku rojên ta'l dubare nebin û rojên bextewar ji nuh ve bêne jîyin hêzeke nuh tê mirov.

Rojên taybetî rojên kêfxweşiyê ne. Bi hev re kêfkirin, şadî û ken bi qasî ku mafê mileta ye, yeko yeko mafê ferda ye jî. Di rojên wiha de ji bo miletan fer-senda wan a xwenaskirinê heye. Di rojên din de kesenê dixebeitin, kesenê ku bi endîşa jiyanâ şexsî meşxûl in, lê di "rojên netewî" de bi şexsiyeta netewî ya bilinde re, di dereca herfî bilind de meriv dikeve têkiliyê. Di deqîqeyêni herfî heyatî de, (mesela gava dixwaze mafekî

xwe bide guhdarîkirin) ruhê netewî wê rojê xwe nişan dide û radibe pêdarê; wek ku bête îmtihankirin.

Ew şairên ku dixwazin berhemên mezin bixuliqînin çawa ku muhtacî heyecanê ne, di ruhê miletande jî "heyecanê" wiha pêwîst in; rojêni wiha taybetî idmanêni wiha ne ku hêza heyecana netewî dixin kerasekî pirr taybeti. Rojêni netewî, bi rengekî wiha xulasayêni serpêhatiyêni borî ne ku di van rojan de wek rojeke here ava û ji ber çavan wenda bibe dîrokek tê jiyîn û ji dîroka ku ewê bê jiyîn jî xeber tê girtin.

Naseki samîmî, Ewrûpiyekî dostê netewê me, rojekê ji min re wiha gotibû:

- Rojêni we yên taybetî pirr kêm in. Du cejnêni (eydiyêni) we yên dînî hene û ji rojekê-du rojan ne zêdetir jî rojêni we yên netewî hene. Hûn van rojan ji bi hawakî xweşik nadin jiyandin. Kêmayiya rojêni we yên taybetî, carê, nişan dide ku hûn ne xebatkar in; ji ber ku yên pirr dixebeitin li rojêni bînvedanê (istirahetê) digerin. Ya duduyan jî, îspat dike ku we xweza (tebîet) baş tetkîk nekiriye. Bêyi viya jî, dîsa îspata wê ye ku hûn fêri teslimiyetê bûne, hûn her tişti di halê xwe de dihêlin, we di jiyana xwe ya netewî de tu bîstikêni (katêni) girîng neborandiye. Vana hemû quşûr in, divê hûn rast bikin.

Bi qasî ku hişê min diçû ser min berşîv da hin aliyêni van gotinan. Lî rastiya gelek aliyêni wan jî qet nayê îñkarê.

Me got ku "jiyandina rojêni netewî maf û wezîfa me ye." Ji bo ku em ji vî mafê dîrokê daye me feydeyê bibînin û vê wezîfa xwe bi cî bînin, divê em rojêni xwe yên taybetî yên ji hev cihê tespîti bikin. A ji dîrokna û ji xorstan re mijareke ji lêkolînê re musâid.

Bêyi rojêni dînî yên taybetî, kîjan rojêni kurdan yên netewî û civakî yên taybetî hene? Evana ji kîjan çavkaniyêni dîrokî derketine, ji kîjan kanalan herikîne hatine? Mesela wer xuya dibe ku ser sal bi Newrûza İraniyan re yek e; ev ji ber ci ye, ya jî were ye? Ji bo ku roja "Ala Kawa" vebûye wek rojeke taybetî bête qebûlkirin, bêyi ku Kawa wek tarîx kurd be, ma gelo hin sebeb û neticeyêni ji van sebeban peyda bûne jî tune ne? Divê bête gotin, "rojêni kurdan yên civakî û netewî ev in, kokêni wan yên tarîxi û sebebêni wan jî ev in." Divê ev yek bête gotin û were ortê. Wek netewe-yekî dîrokî, li ser me wezîfeye ku em rojêni xwe yên taybetî bizanibin. Me hetta nuha wezîfa naskirina xwe îhmal kir. Ji riyêni xwenaskirinê yek jî zanîna rojêni me yên taybetî ye û ya din jî divê em van rojana di wexîde de bidin jiyandin. Ev her wisa nêzîkbûnek berbi rehêni dîroka me ya medenî ye, destpêkek e.

Ez dixwazim bibêjim ku, em rojêni xwe yên taybetî tespîti bikin û wan di jiyana xwe ya netewî de bidin jiyandin. Kurdêni ku xwe kêm nas dîkin û bi xelkê jî xwe kêm didin naskirin, divê êdî

fêr bibin ku di dîrokê de çi bûne û îro  
ci ne. Naveroka nava vê gotina dirêj ev  
e:

Divê em xwe nas bikin û bi kesên din  
jî bidin naskirin, jî ber ku ev "xwenas-  
kirin û dannasîna bi kesên din" dibe çâ-  
reyek ku em qîmeta wezîfeyê xwe yên  
netewî bizanîbin û mafêñ xwe jî bi ke-

sên din bidin qebûlkirin; ev çare jî ji bo  
ku em kanibin wek neteweyekî bijîn  
muheqeq pêwîst e. □

*Jin, hejmar 16, 1919*

Ji tîrkî: **ZINARÊ XAMO**

# XWE BINAS...

**CELADET ALİ BEDİR-XAN**

Belê xorto xwe binas, lê ne ser pelekî, xwe qenc, bi dehkere û bingeh binas.

Xorto! Heke te hejmara Hawarê a pêşîn xwendîye, divêt bizanî û bête bîra te ko min ji Hawarê re bi vî deng û awayî dest pê kir û di xêza wê a pêşîn de gotibû:

"Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Herkesê ko xwe nas dike dikare xwe bide nas kirin". (Hawar, sal 1, hejmar 1, rûpel 1, yeksemb, 10 gulan 1932)

Îro ez vedigerim ser vê gotinê. Tu îro ji berê ji wê çaxa ko ev xêzên ha hatine çapkirin xwendatir û zanatir î. Belê ezê îro van gotinan ji te re rave kim, ji hev derêxînim û mana wan bidim zanîn û te ji te re bidim naskirin. Da ko tu, hûn bi te-vayî, bikarin xwe ji biyaniyan re, ji cîhanê re bidin nas kirin.

Heyina te, heyina miletê te, tenê bi hatin nasînê tête pê. Hetanî ko tu meyî naskirin, xwe medî nasîn, di nav koma miletan de cihê te nîne.

Ev kitêboka ha ji bona vê yekê hatiye nivîsandin. Belê armanca wê ev e: Te ji te re dane naskirin.

Tu kî yi? Ji kîjan milet û nîjadî yi? Zimanê te ci ziman e? Tu berê çawan bûyî? Îro di ci halî de yi? Jê çawan dikarî bifilitî?

Qenc bixwîne, rind bala xwe bide, hin berên wê jiber bike. Paş ko te ev xwend û seh kir, nas û hevalên xwe te bide xwendin û ji nexwendîyan re bi xwe bixwîne û bide zanîn.

Heke te holê kir, bi gotin û pendêñ min ve çûyi, tu xortê min î, xortê miletê xwe yi, sezayê şabaş û pesn î. An ne... ji xwe destêñ min ji te dibin.

Pendêñ Ayina Kurdaniyê

Xorto! Jîna miletê me bi herawayî rojeke qewemandinê ye. Lî ev roj ne

mîna rojêñ din e. Saetêñ wê ne bîst û çar lê bêhejmar in, roj tê de bi carêñ bêpîvan diçit ava û hiltêt.

Tu di roja qewmandinê de zayî, tê de dijî, heye ko di wê rojê de bimirî jî. Ji xwe tu ji jînê bêtir ji bona mirinê hatî dînyayê.

Ev jîn ji me re gerek e ji bona ko em di dema xwe de wê bidin ber çavê xwe û bimirin.

Xorto! Tu çîlê miletekî kevn, nîjadekî mezin î. Pêşiyên te di rûpelên dîrokê, di gorinêñ gernas û camêran de raketî ne. Tu kurê kurdan, neviyê Medan, dahatiyê Ariyan î. Lî ûro ne tu yî, dîlê, reben û belengaz, jar û qels, dewletek î û bindest î.

Lê te sond xwariye, li ser bext û xencera xwe. Sibe tu yî aza serefraz, bextiyar, kamiran, serdest û bi serxwe bî. Te ev rê ji xwe re bijartiye û tê re diçî. Hêj gelek neçûyî. Tenê çend sale in ko tu tê de yî. Carinan diçî, carinan disekinî şas dibî, ecêbmayî dimînî, li dora xwe dînihîrî, xwe bi tenê dibînî, didî nependîyan.

\* \* \*

Ev pêlek e em tevde bi tiya çiyakî asê ve diçin. Herçend em ji cihê xwe ê pêşîn dûr dikevin hawîr, çarnikar fire dibin, ba tê de xurt e, pêşîya me pê da bandev û bahos e.

Belê rê, rêke asê, bi kevir, pêşîya me lat û ferşinin zinar, kop û gaz in. Lingêñ me de ne sol, ne pêlav dimînin. Carin hene, em kirasêñ xwe diçîşînin û ji lingêñ xwe ên birîndar re pêreşkan çêdikin.

Bî destêñ me re çîmêñ hesinîn hene. Serêñ wan dikevin kuç û berên rê. Ew wan dialêsin, bi rêva û pê ew kurt dibin, em di ser wan re ditewihin, pişta me du ta di-bit. Lî herçend çîmêñ me kin, piştêñ me du ta dibin rêya me jî ew çend kurt dîbit.

Rojin hene li me tarî ye, roja me girtiye. Lî em bi ruhnahîya dilêñ xwe hawîdora xwe dibînîn.

Şevin hene xew li me diçit, lê em di hişyarî û di ramana armanca xwe de canêñ xwe divesihînin.

\* \* \*

Xorto! Te ji dîroka mîletê xwe, karek li ser xwe girtiye. Ew barekî giran e. Ji xwe barêñ giran para mîran, para mîran barê giran in. Te ew li pişta xwe kiriye û daye kaşa çiyayêñ ko bi rê ve bilindir û asêtir dibin.

Di wan de ne bervarine şeverê ne jî şop û rêça pêşîyan diyar in. Em bi xwe, bi ling, dest û neynokêñ xwe di wan kaşan de rînen nû vedikin, şopa xuşînok û dew-

likan dihêlin û pêş de diçin.

Di paş me de karwanekî dirêj, rêuwyêñ bê hejmar hene ko di wan neqeban re dê biberin.

Herçend hildikişî û ji deştê dûr dikevî, diwestî, lê ew çend zexm û xurt dibî. Hawîr diguhire, tiştinîn welê dibînî ko bi te nenas in. Ji dûr ve leyланan de, dinyake nû, ji bo te nû bi xwe kevn lê jibîkirî, dibînî.

Ew der gulistan, gulştek e. Tê de avêñ zelal diherikin, mêtgên tengereng wek keskesorêñ ezmanî diçirisin. Darêñ wê tev kesk û bîşkivîne, xelkê wê delal, ciwan û xurt, herçî mêt zava herçî jin hêj nû bûk in. Ew dinya tu bi xwe yî, ew kurdanî ye.

\* \* \*

Carinan lingêñ te dişemitin, dikevî xwîşeyan, di şawan re diçî, di ber zandoran re disezinî, li kûriya wan dinihêrî. Çavêñ te şevereş têñ, xîlmaşî dibî, dilê te jîbir ve diçê, pêlekê li wê dimînî. Erd qelaç e, şînahî ne diyar in. Di dora te de tenê çend pel tihnav hene. Bibihna wan di xwe dikî der, hişyar dibî û didî rê.

\* \* \*

Xorto! Te berê xwe daye mizgeftike welê ko ji awîze û fanosêñ wê tenê ruhniya xweşiyê diherike. Tu tê de di ruhnî û tariyêñ wê de bi xwe bihesî bîr bibî, bîrewerî heyina xwe bibî. Tu ê bizanî ko heta niho neyînê de bûyî.

\* \* \*

Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye. Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e. Armanca te li ber te sekînî ye. Di şeklê mirovekî de ye. Tu lê dinihêrî, ecêbmayî dimînî.

Herê tu dibînî, dest, ling, mil, pol, parsû, paruhan hertişten wî hene. Lingê wî yê rastê berepêş, yê çepê berpaş diçit. Laş di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêş, ne ji paş. Ji ber ko ji aliyekî pêş ve, ji aliyê din paş ve tête kişandin.

Tu zanî çîra xorto? Lewma ko herdu ling ne yek in. Navbera wan de yekîti nîne. Divêt, tu bixebeitî van herdu lingan bi aliyekî ve bilivînî.

\* \* \*

Xorto! Çarnikar girtiye. Di aliyêñ rojhilat, rojava û nîvro de sê miletêñ din hene. Çav û guhêñ xwe bel kirine li te fedikirin. Lê ne ji bona qenciyê. Hersê ji dijminêñ te ne.

Tu iro di bin nîrê wan de yî. Te dişidînin. Bi xwe ditirsin. Ditirsin ko serê xwe rakî. Ji xewa xwe a giran û kevn hişyar bibî û hertiştî bîr bibî.

Belê tu hêj ciwan î, zaro yî, nezan î, hov î. Lê bi xurtiya milên xwe bi wan dikarî. Ew gihaştî ne, pîr in. Mezin zexm û xurtırbûna wan nemaye. Her weku tu zêde bikî ewê kêm bikin. Gava pelên direxkan şîn dîbin, yên darêن kevnare diweşin. Di-gel xurtiyêن xwe ditirsin. Ji ber ko xurtiya wan derevkî ye. Bi top û tivingan e. Lê bi xwe bi laş û canêن xwe kal û komik in.

Belê xorto ew dixwazin ko tu ji wan re bibî xoşikî. Kirine serê xwe te daxewin. Zimanê te jêkin û yên xwe bi devê te ve bikin. Da ko tu nikarî kurdaniya xwe bi lêv bikî. Lê tu metirse. Ew nizanin ko avên erdê bi ziwakirina pingavêن ruyê erdê naçike.

Dîsan nizanin ko kurd ne avzêm in, kanî ne. Bi dagirtina çem û rûbar bête girtin jî serê kaniyê nayê. Ew dizê û di ber bendan de dippingire, rojekê li wan tête hev di ser wan re diherike û wan di bin pêlên xwe de hildiweşîne.

\* \* \*

Xorto! Tu ji bona hişyariyê dixebeitî. Milet nivistiye. Di xew de ye. Ji lewra tête kuştin. Yên te di xewê de bûn. Ewan bi ser yên te de girtine. Ma mirovêن hişyar ko di xwe dikin der têne kuştin.

\* \* \*

Xorto! Rêya te dirêj, armanca te hêj dûr e. Lê tu bi rê ketîyî. Herçî ko bi rê dikeve digihe jî. Armanca te aramanca çend nifşan e. Ne tenê aramanca te û nifşa te. Gelek rîwiyêن din dê bêñ û bidin ser şopa te. Her rîwi riya armancê kurt dikit. È nû ji wê dest pê dikit ko pêsiyê wî li wê hiştiye. Rêya te ji ya nifşen din asêtir e. Ji ber ko gîsinê xwe dikî erdekî welê ko hêj tu gîsin lê neketîne. Zeviya te beyar e. Divêt gîsinê te ji pola bit, destê te hesin.

\* \* \*

Xorto! Bi ser kela me de girtine. Ji derive dijmin dirêjî me kiriye. Ji her milî erîş. Di hundurê kelê de şerekî din, bê eman û ji ê pêşîn mezin û dijwartir heye. Şerê me bi hev du re ye. Di mal de ji dijmin.

Herê Xorto! Birfîna me a mezin û xedar dêxs e, berberî ye, jana dêxsê ye. Em sîngjar in. Ji derive serma li me dixe. Li hundur em bi janê dikevin. Di nav xwe de em çend ber in. Berekî kiçik serê xwe daniye li ser sînga miletî, Li hilavêtina dilê wî

guhdar bûye û ji xwe re bê deng û pêjn dixebite. Li dermanê nexwesê xwe digere.

Berekî din heye, li wan temaşe dike. Peyayên vê berê dibînin ko wan tiştek anîye pê û hero ditînin. Li wan didexisin. Hingê ew ji dil dikin tiştekî bikin. Lê mîna tiştê çêkirî an ji çêtir nikarin bînin pê. Lê heye ko bi awakî arîkariya çêkiroxan bikin û ê çêkirî pêşve bibin û bi ser xin. Lê dexsa wan nahêle. Ax ew jana xedar bi pêşira wan girtiye, wan diêşîne, dikuje.

Ji ber ko çênekirine û nikarin çêkin, naxwazin ên din ji çêkin. Çiku ji wan re ne pesn e, ji wan re pê tu nav û deng çênabe. Û holê çavê xwe didin xirabiyê. Ji nekêr-hatiya xwe bi tevr û bivir li ser avahiyêن ko hinekî din lêkirine, radibin. Li wan dikevin, lê bivir û tevrêن wan ne li avahiyân lê li ling û ejnûyêن wan dikevin.

Tu zanî Xorto ew wek ci û kî ne?

Ew mîna wî mirovî ne ko serê xwe di ser stuyê xwe re tewandiye û li sînga ezmanê zelal tif dike. Tu bi xwe bîr dibî ne, ko gilêz li wan vedigere û dikeve rûyên wan. Ji xwe rîvîn bûn, yekcar dibin seg. Belê xorto! Dexisiyê tu kuştî, berberiyê tu mirandî, belaviyê tu kevandî. Hin hene dixwazin bixebeitin, lê tu kes naxwaze li ber destê yekî din de bixebite. Dil û çavê herkesî di ser destiyê de ye. Herkesê dixwaze bibe axa, lê çavê tu kesî di peyatiyê de nîne. Ji lewra di nav me de axa nînin û herkes axa ye. Lê tu ê holê nekî. Tu bi awakî din bixwedî bûyî û hatî gehandin. Belê tu ji li mezinahiyê bigerî. Tu ji dê bixwazî bibî axa. Lê ne bi vî rengî.

Xorto! Guh bidêr. Rind bala xwe bide. Berê pêşîn tu ê bêxî serê xwe ko tu xulamî millet û paleyê welatê xwe yî tu ê xizmeta wî bikî û ji bona wî bixebeitî. Dîsan tu ê bizanî ko axayêن rastîn ew in ko xulamiya milletê xwe dikin, ên din tevda axayêن derewîn in.

\* \* \*

Dema ko tu dixebeitî qet li dora xwe menihêre. Heke ên din dixebeitin an ne. Herçî ko dixebite karê xwe pêk ditîne [tíne] û karê tu kesî bi xebata yekî dîtir naçe serî. Herdar bi pelên xwe sayedar e, ne bi pelên darêñ dorê.

Tu ne bi tenê yî. Di dora te de hinêñ din ji hene ko dixebeitin. Heke te tiştek pêk anî li dora xwe fedikire [fekire], li tiştekî welê bigere ko bi yê te bêtir û tekûz bibit. Hûn hemî ji bona avahiyekê dixebeitin. Her kî ji we hîmê wî daniye Xwedê jê razî bit. Pesn jê re bit, heqê wî ye. Hûn ji herin dar û qîş, herî û kevirî peyda bikin. Dîwar an banekî wî çêkin. Navdidaniyê bidin. Lê ne ko bidexisin.

\* \* \*

Tu ketiyî cînariya yekî ko avahiyek bi du mezelan anije pê. Tu di xwe re wê xurti-yê dibînî ko bikarî avahiyek çend tayîn û mezelîn ber pê bikî. Li avakirina mala mezin bi xerabkirina a kiçik dest pê meke.

Belê Xorto! Di dewra xwe de kêm û zêde, kiçik û mezin, civat, kom, civanokan dê bibînî.

Di dinyayê de tu tişt nîne ko tekûz bît. Di hertiştî de, nemaze di karên nû dest-pêkirî de, pirê caran, kêmanî heye. Heke te ew kêmanî dîtin, hima dirêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya danîyan bikî û wan kêmaniyan bîdilînî.

Hilweşandina sitûnekê hêsanî niye. Huner di rastkirina sitûna xwêl de ye.

\* \* \*

Xorto! Holê bixebite, an bixwe çêke an arîkariya ewan bike ko çedikin, ava dikin.

Lê heger tu nikarî bi xwe çêkî, ne jî arîkariya çêkiroxan bikî hingê bi ên çêkirî şâ û kêfxwes bibe. Ji ber ko ew ji bona te, ji bona miletê te hatine çêkirin. Nav di wan bide, wan bipesinîne.

Xorto! Te dît ko bazekî kevroşkek girtiye. Mebêje, ma girtina kevroskê jî tiştek e. Lê bêje te xezalek girtiye. Ji bona ko baz li xezalê bigere û bide pey wê. Xorto! Min got heke tu nikarî çêkî. Lê bawer bike, ewle be ko te dil hebe tuyê bikarî jî. Herçî ko dixwaze dikare jî.

\* \* \*

Wekî tu dixebeitî dexesker ji dora te kêm nabin. Tu guh mede wan, gotinêwan damêne ber dilê xwe.

Heke di riya xebata xwe de şemîtî û ketî, tuzanî ew ê ci bikin. Mebêje ko ew ê bêni bi destê te bigirin, birînê te derman bikin. No, ew ê ji hev du bipirsin, gelo lingê wî neşikiyaye.

Bi xebata xwe bi nav û deng bibî. Xelkê qenc, xelkê welatparêz pesnê te dê bidin, tu ê giram bibî. Ên dexasok tu zanî dê ci bikin! Mebêje ko bi xelkê re çeplikan li te xin. No, dexsa wan nahêle. Ew ê bêjin: Ma evî ci kiriye, ji bona xwe xebitiye û bi nav û deng bûye, di herderî de pesnê wî didin. Ma ev jî tiştek e.

\* \* \*

Xorto! Herçî ko bi te berberiyê dê bikin ji te bêtir in. Ji xwe di dewra gelekkî de stirî bi hezarî ne.

Ew di nav xwe de nexwêş bibin, pev biçin ji, li te dibin yek, destên xwe didin hev. Ji ber ko ji te kêmîtir in. Kêmaniya wan wan digihîne hev.

Ji xwe di tebîetê de ji welê ye. Tiştên qenc û héja hindik in, nehêja û békér zahf in.

Ma tu nizanî ko di gundekî de du sê hespêñ kihêl hebin, di garana wî de bi sedan ga û çelek û dewarêñ reş hene. Li nik xelkê gundi ne piraniya garanê, lê hindikayiya hespêñ kihêl bi qedir û héja ye.

\* \* \*

Herwekî min got tu guh mede wan. Herçî ko eleyhdariya te dikin, li ber wan bikeve, ji wan mexeyide. Ew peyayêñ nekêrhatî û mivro ne. Nikarin, nizanin, ji lewra kurt û pist û kutkuta wan e.

\* \* \*

Xorto! Xebata te mîna dengekî ye. Ma deng bi pifkirinê tête vemirandin. Keda te mîna çirayekê ye. Ma çira kengê bi deng û pêjnê temirîye. Tu her bixebite, qet mesekine, karê xwe bi ser xe.

Dengê te ko ji pifkirinê natirse ew ê her bilindtir, çira te ko bi pêjnê nalerize ew ê her geştiir bibe.

\* \* \*

Keçê! Di van gotinan de para te ne hindik e. Keçê! Tu keça wî camêri, jina wî mirrovî, diya wî xortî yî ko min şîret lê kir û kar û xebata wî şanî wî da. Belê keçê, ev xortê ha xortê te ye. Di mehdikê de te ew lorand. Di dawetê de te jê re tilîland. Di roja qewmandinê de te nav di wî da. Ji xwe tu berekê wî yî.

Keçê! Min ji te divêt, tu xortê min welê bixwedî bikî û bigihînî ko li pesn û şabaşan sezâ bit û lome jê mebit. Keçê! Tu di her kar û deravî de arîkara xortê min i. Tu ê pê re bijî, pê re ji bimiri. □

*Hawar, hej. 18, 1932*


Ji tîpêñ erebî: **EMİN NAROZİ**



# JIYAN Û RAMANÊN

## MÎR CELADET BEDIR-XAN

ZERDEŞT HACO



**M**îrêñ Botan kî bûn? Mihemed Emîn Zekî di pirtûka xwe de: *Kurtiya Mêjûya Kurd û Kurdistanê*, wergera Mihemed Elî Ewnî, ya ku li Qahîrayê sala 1936, derket, di rûpelên 142 - 146 de dibêje, di pey ku dewleta Eyûbiyan mîrî, ango hikûmeta Zenkî ji navê rakir, mîriyek, ango hikûmeteke kurdî ji Azîzan li Cizîra Botan hate çêkirin. Vê mîriyê Cizîra Botan û navçeyên wê di bin hêza xwe de birêvedibirin, heyâ mîriya Bayinderiyan, yên ku tirkuman bûn, hat û Botan xiste bin destê xwe. Belê vê mîriya Bayinderiyan pir dirêj ne kir, û **Azîziyan** careke dî welatê xwe vegerand û xiste bin destê xwe.

Azîzî di welatê xwe de demeke dirêj, nêzîkî du sedsalan serbixwe bûn û karî bûn azadiya xwe biparêzin, heyâ Osmanî hatin. Hingî ew ketin bin destê Osmaniyan.

Yek ji vê malbata Azîzan **Şerefxanê Evdilezîz** bû, yê ku di sala 1585an de mîritî li Cizîra Botan dikir. Xwendegeha pêşî, ya ku li Cizîrê vebû, navê wê "Xwendegeha Sor" bû, û ew bi gotina Şerefxanê Evdilezîz hate avakirin. Ji vê xwendegehê piştre gelek nivîskar û helbestvanê navdar weke Ehmedê Xanî

derketin. Di sala 1821ê de Mîr Bedir-Xanê kurê Evdalxan kete cihê bav û bapîrê xwe. Ew hingî 18salî bû. **Mîr Bedir-Xanê Evdalxan**, mîrê paşî ji vî bavkî bû, yê ku hê li ser axa Kurdistanê mîrîti dikir. Gava vî mîrî keys li Osmaniyan anî, wî rî li ber wan girtin û dest bi berxwedanê li dijî wan kir.

Piştî zi salî, ango heyâ bi sala 1842 wî karî bû beşekî fereh ji xaka Kurdistanê di bin serekatiya xwe de bigihêne hev. Ji navça bakurê gola Urmiyayê heyâ bi Rawendûz û Mûsilê li başur, wî hemû bi dest xwe ve anî û kire yek. Wî perên zîvî bi navê xwe derxistin. Li rexekî "Mîrê Botan Bedir-Xan" hatibû nivîsin û li rexê dî sala 1258 koçî hatibû nivîsin.

Gava ku mîr Bedrixanê Evdalxan gelek guhertinên nû di Kurdistanê de kirin û kara xwe ji bo Kurdistanâ mezin kir, hikûmeta Osmaniyan bi hemû xap û rî-pênen xerab xwest, ku wî ji rî bibe. Piştî ku wan dît, ku mîr bi derew û tolaziyêن wan behwer nake, wan leşkerekî mezin, bi serekatiya Osman Paşa şiyande ser wî.

Li ber çemê Zayıtûnê, nêzîkî gola Urmiyayê leşkerê herdû aliyâ ketine singa hev. Piştî şerekî gelekî dijwar, yê ku tê de hijmareke mezin ji tîrkan hate kuştin û tîrk ber bi paş ve diçûn. Mîr Yezdan Şêr, kurmamê Bedir-Xan û serekê leşkerê kurdan, bêbextî li kurmamê xwe kir û xwe bi çend serleşkerên xwe ve gîhande tîrkan. Wî xwe gîhande tîrkan û bi hêviya ku ewê êdî bibe mîrê Botan, şerê gelê xwe kir. Belê dîse leşkêrê Osmaniyan di şer de biserneket.

Hê ji nû piştî 8 mehan ji xap û derewên Osmaniyan, wan karî bû bi navê dî-nê misilmantiyê leşkerê kurdan bişikênin. Di şer de mîr Bedir-Xan dîl hate gitin. Osmaniyan ew, birayê wî yê mezin Mîr Salih, birayê biçûk Ased, herdû kûrên wî yî mezin û birek ji endamên hikûmeta wî bi xwe re birine Stembolê.

Ji Stembolê ew sergomî ser girava yûnanî Krêtayê kirin û li wir cezayê ku Osmaniyan dabûyê xwar. Piştî ku cezayê wî ne ma, sultanê Osmaniyan rî dayê ku here Şamê. Ew li Şamê ma, heyâ ku çû dilovaniya Xwedê. Li wir ew di gorista-na Şêx Xalidê Nexşebendî de, li taxa kurdan li Şamê hate veşartin. Li ser quba wî ev gotina ha hatiye nivîsandin: "Al-Fatiha, Mîrê Cezîra Botan, Mîr Bedir-Xan Azîzan, bila dilovaniya Xwedê li ser wî û xwedîyên wî be, sala 1287 koçî."

Ji destpêka sala 1848an ve Osmaniyan dest bi sergomkirina zaroyêñ Bedir-Xan kiri bû. Piraniya wan anîn û li Stembolê hiştin, da di bin çavan de bimênin.

## Mîr Emîn Alî Bedixan (1851 - 1926) kî bû ?

Hijmara zaroyêن Bedir-Xanê Evdalxan giha bû 96 zarokî. Gava ew çû dilovaniya Xwedê ji van 96 zarokan 21 kur û 21 keç mabûn. Ji ber vê yekê kurên wî yî mezin berpirsiyariya jinbayen xwe û ya xuh û birayen xwe yî biçûk dabûne ser milên xwe û li wan dibûn xwedî.

Di vê navê re mîriya dewleta osmaniyen berê xwe da zaroyêن Bedir-Xan û xwest bi leystikên rêzanî di riya wan re, ji ber pir bûn û xwedî nav û deng bûn, kurdan li xwe kom bike. Ji ber vê yekê wê 13 ji wan kirine paşa û yên mayî kiri-ne walî û zabit, lê ew li derveyî Kurdistanê danîn.

Tê zanîn, ku heya roja îro jî kesin ji malbata Bedir-Xanê Evdalxan li Misrê, li bajarê "Al-Fay-yûm" dijîn. Belê ew li wir ne bi navê "Bedir-Xan" têن naskirin. Li wir ji wan re dibêjin "Walî", ji ber ku ew di dema xwe de bûbûne waliyên wî bajarî.

Biser ku dewleta Osmaniyan gelekî xwe ji wan nêzîk dikir û ji bo ya dilê xwe ew dikirine paşa û walî, belê zaroyêن Bedir-Xan rojekê cihê bav û kalên xwe, Botan û Kurdistanâ xwe ji bîr ne dikirin. Ew li kû derê bane, dilgermî û hijkiri-na wan ji Kurdistanê re sar ne dibû. Dilê wan ji tiştekî tenê re lê dixist, ew jî rizgarkirina xaka bav û kalan bû. Ev evîna welêt û xebata bê westan di ber de hê bêhtir gur bû, gava wan dengê serhildanêن Yûnan, Balqan û Ereban dibihistin û hêviya wan bi pêkanîna armancêن wan ji wan re nêzîk dihate xuyakirin. Yek jî kurên mezin i Bedir-Xanê Evdalxan, Mîr Emîn Alî Bedir-Xan, bavê Celadet bû.

Mîr Emîn Alî Bedir-Xan di sala 1851ê de çêbû. Wî di xwendegeha Siltanan de, ya ku tenê ji zaroyêن mîran re li Stembolê hati bû avakirin, beşê mafwariyê, an-go hiqûq xwend û bi vê hisê wî weke mirovekî rewşenbîr vebû. Ew mirovekî ge-lekî jêhatî û şahreza bû. Wî karî bû êdî bi zaneyî bikeve meydana xebatê, nemaze piştî ku ew li ser destê helbestvan û welatperwerê mezin Haci Qadirê Koyî hati bû xwedî kîrin. Vî helbestvanê mezin gelek ji rewşenbîrî, zanîn û hijkirina Kurdistanê xisti bû dilê Mîr Emîn Alî Bedir-Xan.

Mîr Emîn Alî Bedir-Xan berpirsiyariya malbata xwe, weke kurê mezin, êdî girti bû ser milê xwe û di riya welatperweriyê re jî, rîçika bav û kalên xwe girti bû û keti bû xebata rizgarkirina Kurdistanê. Ji ber vê yekê di sala 1889an de wî û birayê xwe Midhet ji Stembolê berê xwe dane Kurdistanê. Wan li bajarê

Trabzunê komcivînek bi beg û axayên kurdan re lidarxist û arîkariya komcivîneke giştî dikir, da hêrişeye jinişkaneve berdine ser tîrkan û Kurdistanê rizgar bikin.

Belê berî ku ew dest bi şer bikin, tîrk di riya casûsên xwe re bi wan hisihan û hêzeke leşkerî gelekî mezîn bi ser wan de girt. Herdû rex ketine şerekî dijwar bi hev re. Ji ber mezînahiya hijmara eskerê tîrko, yê ku hê ji pêşî ve agadrî li ser hêza kurdî kom kiribûn, wî, karî bû di şerê ku di çiya û qelaçêن navbera Trabzun û Erzerûmê de çêbûn, biserkeve.

Bi vê ketina Mîr Emîn Alî Bedir-Xan û ya birayê wî Midhet di sala 1879an de, rewşa zaroyêن Bedir-Xanê Evdalxan li Stembolê gelek lawaz û qels bû. Ji ber berî vê serhildana Emîn Alî Bedir-Xan û ya birayê wî Midhet, du birayêن wan i din jî, Osman Paşa û Hisêن Kinan Paşa ji çavêن dewleta Osmaniyan keti bûn.

Vê yekê hişt, ku Siltanê Osmaniyan, Siltan Abdulhemîd bi xwe bikeve kar, da zaroyêن Bedir-Xan di bin çavan de bihêle û dest li ser wan danî, da ew bê emrê hikûmetê nikari bin xwe tevbîdin. Tîrkan hêza malbata Bedir-Xan, ya ku wê demê digiha 3000 mirov li Stembolê dizanî û dixwest rê hê ji pêşî ve li ber her tevgereke wan, bigire.

Bedir-Xanî ne tenê di nav gelê xwe de xwedî nav û deng bûn, belê dan û stan-dinê wan corecor bûn û bi gelek cihêن din ve hebûn, weke mînak têkiliyêن wan bi rûsan, frensîzan û îngilîzan re hebûn. Nemaze Ebdulrezaq Necîb Bedir-Xan, serekê beşê bixêrhatina mihvanêن Siltan xwedî têkiliyêن corecor bû.

Ji tirsa vê yekê Siltanê Osmaniyan bîryar stand, ku mala Bedir-Xaniya li nav Empêriyoma Osmaniyan ya mezîn ji hev ter û bela bike. Da karibe vê leystika xwe bibe serî, lê malbata Bedir-Xan ji armancêن xwe yî siyâsî re bikarbêne, mîriya Osmaniyan ew bi xwe ve girêdidan û ew di dewletê dixistin berpirsiyarêن mezîn, ji bo mînak Emîn Alî Bedir-Xan, Bavê Celadet bû bû mifetişê dadgeriyê li Stembolê, Enqera û Qonyayê. Belê bi ser vêqas nêzîkbûn û xweçêkirina dewleta Osmanî zaroyêن Bedir-Xan dev ji ya xwe bernedan. Piştî ku wan dît, ku ri-yêن eskerî li ber wan hatine girtin û di vî warî de hew dikarin xebatê ji welatê xwe re bikin, wan dest bi xebata çandî kir, da bikarin bi vî awayî gel û netewa xwe biparêzin.

Ji ber vê yekê em dibînin, ku wan sala 1898an li Misrê rojnameyek bi Kur-mancî derxistin û navê wê kirin "Kurdistan".

Gava sala 1906an serekê nûçebihîzê Siltan, ango serekê istixbaratan, Ridwan Paşa hate kuştin, Siltan ji xwe tirsîha û got, ku zaroyên Bedir-Xan in, yên ku bi vî karî rabûne. Bi taybetî navê Abdulrazaq Necîb Bedir-Xan û navê Elî Şamil Bedir-Xan di pirsa kuştina serekê nûçebihîzê Siltan de dihate gotin. Li ser vê ye-kê wî fermanek derxist, ya ku li gor wê zaroyên Bedir-Xan di nav sînorêñ dewleta Osmanî de werin dûrkirin. Bi vê wî Abdulrazaq Necîb Bedir-Xan û Elî Şamil Bedir-Xan sergomî bajarê Trîpolisê li Lîbyayê kirin.

Di vê sergomkirinê de dewleta Osmanî bavê Celadet Bedir-Xan, Mîr Emîn Alî Bedir-Xan û birayê wî Salih Bedir-Xan, bavê Rewşen Bedir-Xan pîreka Celadet, sergomî Sparta kirin.

Sala 1908 Siltan Abdulhemîd di bin bandora tevgera gelên di bin destê Osmanîyan de dihate mecbûrkirin, li gor bendêñ destûra dewletê ya sala 1876an bikarbêne. Naveroka bendêñ vê destûrê li ser azadî, dadmendî û wekheviyê dinav hemû gelên empêriyûmê de bû. Piştî ku bendêñ vê destûrê ji nû ve hatine hişkerikirin, ew welatperwer û rewşenbîrêñ kurd, yên ku bi destê mîriya Osmanîyan ji Stembolê hatibûne dûrkirin, dîsa vege riha. Bi vî awayî Mîr Emîn Alî Bedir-Xan jî dîse vege riha Stembolê û li wir dîsa kete xebata geşkirina rewşenbîriyê di nav mirovêñ gelê xwe de.

Sala 1908an Mîr Emîn Alî Bedrixan, Ceneral Şerîf Paşa, kurê Ubeydullahê Nehrî (Abdulqadir Efendi) û Ceneral Ehmed Zul Kafal bi hev re komeleyek li Stembolê avakirin û navê wê kirin "Komela kurdî ji bo bilindayî û pêşveçûnê". Piştî ku sala 1909an ev komele ji rexê cûnta "Tirkên Yekbûyi" ve, yên ku hikûmet bi dest xwe ve anî bûn, hate qedexekirin, van welatperweran komeleyeke din avakir û navê wê kirin "Komela kurdî Ji Bo Weşana Zanînê". Yek ji çalakiyên vê komelê ew bû, ku wê xwendengehek li taxa Cenberî Taş vekirin û Ebû-rehman Bedir-Xan kirin mudîrê wê.

Piştî ku zaroyên Bedir-Xan û serekên kurdan û din ji hev cida bûn, wan komeleyeke nû bi navê "Komela kurdî Ji Bo Kar û Barêñ Civakî" avakir.

Gava Siltanê Osmanîyan dît, ku hedan bi dilê zaroyên Bedir-Xan nakeve û xebata wan nayê rawestan, wî careke din fermana dûrkirina wan derxist. Heç Mîr Emîn Alî Bedir-Xan bû, ji xwe ew her serê demekê dihate sergomkirin, weke mînak wan ew şiyand van bajaran: Ek-ka û Nablus li Filistînê, Salonikî li Yûnanistanê û bajarêñ tîrkan weke Anqera, Sparta û Qonyayê.

Gava ku kemalîst di sala 1922an de ketine Stembolê, wan fermaña kuştin û sergomkirina weltperwerên kurdan da. Ev fermaña ha bi taybetî liser Bedir-Xaniyan bû, ji ber wan digot, ku ew li xirakirina dewletê digerin. Di nav navênu ku di wê fermanê derketin, navê Mîr Emîn Alî Bedrixan û her pênc kurên wî Sureya, Celadet, Kamîran, Sefder, Tewfiq û kurê Sureya yê mezin Heqî jî tê de bûn. Li gor vê yekê ev welatperwerên ha mecbûr dibûn zû xwe vêşérin û ji Stembolê birevin. Mîr Emîn Alî Bedrixan tev kurê xwe yî mezin Sureya karî bû xwe bigihêne Misrê û li bajarê Qahirayê bi cih bibe. Heçî Celadet, Kamîran, Tewfiq, Sefder, Tewfiq û Heqî bûn, wan di Sûriyayê re karîbûn ji destêne kemalîstan birevin.

Sala 1926an Mîr Emîn Alî Bedir-Xan li bajarê Qahirayê çû dilovaniya Xwedê. Wî li dû xwe 6 kur û keçek hiştin. Navê keça wî Mezyet bû. Navênu kurên wî li pey hev ev bûn: Sureya, Hikmet, Celadet, Kamîran, Tewfiq, Sefder û Bedir-Xan bûn.

Piştre kemalistan paşnavê Bedir-Xaniyan guhertin, navê hînan ji wan, yên ku li Tirkiyayê mayî kirin "Çınar", yên hîne din kirin "Kotayî" û yên li Misrê mayî, bû "Wali". Yên din î mayî bi paşnavê xwe yî berê, angò bi paşnavê "Bedir-Xan" man.

### **Mîr Celadet Bedixan (1893 - 1951), jiyan û ramanênu wî**

Mîr Celadet kurê Mîr Emîn Alî Bedir-Xan e û neviyê mîrê paşî yê Botan, Mîr Bedir-Xan e.

Herdû jînêne bavê wî, ya pêşî û ya paşî çerkes bûn. Celadet kurê jîna didiwan bû. Navê diya wî, "Senîhe" bû. Piştî birayê xwe yî mezin Hikmet, Celadet li Stembolê di roja 26.04.1894an de çêbû.

Wî li Stembolê salênu xwe yî pêşî jî derbaskirin. Ew di maleke dewlemed, mezin û xwedî nav de mezin dibû. Wê demê bavê wî Mîr Emîn Alî Bedir-Xan mirovekî dewlemed bû. Ji derveyî wê ew mirovekî gelekî welatperwer û rewşenbîr bû. Ji ber hikûmeta Osmaniyan dest li ser wan danî bû û wan nikarî bû vegeerin Kurdistanê, bavê wî deriyênu xwe ji denbêj, çîrokbej û helbestvanênu kurd re vekiri bû û ew ji Kurdistanê dîkişandine ba xwe, da zaroyênu wî hînî ziman, tor û rabûn û rûniştina kurmancî bibin. Ji derveyî wan wî mamosteyênu zimanênu din jî ji zarokênu xwe re digirtin, weke mînak ji zimanê yûnanî, frensizî,

inglîzî û rûsî re, da ji bona zaroyên wî van zimanên cihanê yî giring zanibin.

Ji ber xebata bê westan, ya ku Mîr Emîn Alî Bedir-Xan di ber rizgarkirina Kurdistanê de dikir, her wekî ku min lipêş jî got, hikûmeta Osmaniyan ew ser gom dikir. Mîr Celadt jî bi bavê xwe re gih li Stembolê, gih Edirna, gih li Qonîya, gih Enqera, gih li Filistînê li Ek-ka û Nablus û gih li Saloniki li Yûnanistanê bû. Wî di xwendeghênen van bajaran de xwendina xwe ye sereta û ya amadeyî, ango lîsa bire serî. Belê ew li dûriyê li kû bana dilê wî bi welatê wî ve girêdayî dima. Ev tîh û dilevîniya welêt malbata wî hê ji zarokiya wî ve di dilê wî de çandi bû. Raste ew li sergomiyê dijîn, belê dildariya welêt ew kêliîkeke nediberdan.

Gava Mîr dibe 18salî, dikeve fakulteya cengdariyê, dixwêne û weke zabit jê derdikeve. Piştî di cenga cihanî ya îê de beşdar dibe. Wî di rojnameya xwe "Ronahî" de, hijmar 25, sala 1944, nivîsiye, ku di sala 1917an de di yekîtiyeke leşkerên Osmaniyan de nêzîkî gola Urmiya zabit bû.

Herwekî ku min li banî jî got, piştî ku kemalistan di sala 1922an de Stembol xiste destê xwe, wan fermana kuştina weltperweren kurdan û di nav wan de jî navê Mîr Celdet Bedir-Xan derxist.

Wê demê Celadet û birayên xwe revîne Elmaniyayê. Li Elmanyayê jî dilê wî ji tiştekî tenê re lê dixist, ew jî rizgarkirina Kurdistanê bû. Ji ber vê yekê wî di rex xwendina xwe re, xwe tev tevgîra pêşmergeyên Elmanan dikir, da tev wan hînî şerî pêşmergâyetyîyê bibe.

Gava serhildana Şêx Seîdê Piran di sala 1925an de destpêkir, wî yekser dev ji hertişî berda û çû xwe tev serhildanê kir.

Piştî şikestina serhildana şêx Seîd ew careke dî vege riha Elmanyayê û xwendina xwe di beşê mafwariyê de, ango di hiqûq de bire serî. Wî dixwest hê li Elmanyayê bimêne û nameya doktora binivîse, belê bavê wî Mîr Emîn Alî Bedir-Xan li Misrê nexweş keti bû û ew ji ber vê yekê bi bavê xwe ve çû.

Piştî ku bavê wî Mîr Emîn Alî Bedir-Xan li Misrê sala 1926an çû dilovanîya Xwedê, ew li Misrê ne ma û berê xwe da Bêrûtê, mala mamê xwe Xelîl Ramî Bedir-Xan. Belê li wir jî hedan pê ne diket, nemaze piştî ku serhildana Şêx Seîd têkçûbû, ji ber vê yekê ew hat û xwe gihande welêt û têkilî bi serek û gîrgirekên kurdan re kirin. Wî xwest careke din kurdan li hev bicivêne û rêxistîneke nû avabike, ya ku hemû kurd xwe tê de bibînin û bi hev re şoreşike mezin ji bo

rizgarkirina Kurdistanê rabin. Piştî xebateke bê westan wî karî bû di roja 05.02.1927an de li bajarê Bihemdûn, li Libnanê civînekê ji serek û gîrgirekên welatperwerên Kurdistanê re lidarbixe. Di wê civînê de dev ji hemû komelên berê berdan û komeleyeke nû bi navê "Xoybûn" avakirin. Di wê demê de dilvîn hebû li Çiyayê Agrî dest bi serhildanê were kirin. Ji ber vê yekê wan Îhsan Nûrî Paşa rîberê giştî yê vê serhildanê danî.

Konê Reş, birêz Selman Osman, yê ku min piraniya agadriyên vê mijarê ji wî girtine, di pirtûka<sup>I</sup> xwe de dibêje: "Ka em navê hinekan ji wan ên ku komela Xoybûn avakirine bi nav bikin, bêçawa rehmetiyê Cemîlê Haco roja 24.01.1990 li bajarê Tîrbesipiyê ji min re gotiye:

Mîr Celadet Bedîr-Xan, Haco Axa û kurê wî yî mezin Hesen, Hemze Beg Meksî, Zaroyêñ Bozan ji kehniya Ereban û gelek axa û gîrgirekên kurdanî din, nemaze ewêñ ku wê gavê ji Tîrkiyayê revî bûn."

Konê reş di pirtûka xwe de berdewam dike û dibêje: "Li bajarê Tîrbesipiyê Mîr Celadet xebata di nav welatperwerên kurd de dikir û bi taybetî bi Haco axa û zaroyêñ wî re... bi vî awayî Mîr di nav mala Haco de nêzîkî sînor dijî û gelek roj li gundêñ wan derbaskirin, weke li gundê Mizgeftê, gava mihvanê Çeçanê Haco bû. Konê Reş dibêje: "Li wî gundî latek hebû, Mîr diçû û li bin siha wê rûdinişt. Ji ber wê yekê ew lat heya roja îro bi navê "Lata Mîr" tê binavkirin. Car bi car ew ji gund diçû bajarê Hisîçe û li wir wî bingihê rîzimana Kurmancî danî.

Hikûmeta Ferensa hingî Haco axa dûrî hidûd kiri bû û li Hisîçe dest li ser danî bû. Gava Mîr dihate Hisîçe, ew dihate ba Haco axa.

Ji Sûriyayê Mîr piştî vê çû û xwe gîhande şoreşa Agrî, da ji bona li tenîşa Ci-neral Îhsan Nûrû Paşa û İbrahîm Paşa Têlî li dijî leşkerên tîrko bikeve şer.

Gava şoreşa Agrî di sala 1930î de şikest, serdarêñ şoreşê hew dikarîn li bakurê Kurdistanê bîmînin. Ew revîn û çûne İranê. Wê demê Mîr Celadet ji çû İranê. Li İranê ew çû û bi darî Şahê İranê, Şah Pehlewî ket û xwestina arîkariya kurdan jê kir. Belê Şah ber bi daxwaziya wî ve ne hat û ji wî re got, ku ew dixwaze ji dêla wê ve wî bike qunsulekî İranê li welatekî ewropî, belê Mîr ev yek ne kir. Gava Şahê İranê dît, ku Mîr li Kurdistanê yekgirtî û serbixwe digere, wî ew destqeydkirî ji İranê da derxistin û şiyande İraqê.

Ingilîzan, yêñ ku hingî dijminatiya kurdan dikir, serdariya İraqê dikir. Gava

Mîr Celadet giha Îraqê wan ew yekser xiste bin çavan, ji ber wan dizanî ew kî ye û tirsâ wan jê hebû. Heya kurdên Îraqê bi xwe jî ji tirsâ Ingiltzan ne diwêrin tengî wî bdin. Ji ber vê yekê Mîr careke din vege riha Sûriyayê.

Di 25.08.1930 de hikûmeta Ferensayê hemû endamên komeleya Xoybûnê ji ser hidûd rakirin û ew sergomî Şamê kitin, di nav wan de Mîr Celadet Bedir-Xan, Haco axa û zaroyê wî, Dr. Ehmed Nafiz û birayê wî Nûreddîn Zaza, Qedrî Can, Ekrem Paşa, Mihemed Cemîl Paşa û Hemzayê Meksî ...

Li Şamê Mîr Celadet giha wê yekê, ku kurd bi rengekî giştî ji rexê xwendinê û zanînê ve gelekî bi paş ve mane. Wî êdî çara rizgarkirina Kurdistanê di hişyar-kirina giştî ya gelê kurd de didît. Wî digot, ku gelê kurd hînî xwendin û nivî-sandinê bibe, wê rewşa tehl e, ku ew tê de dijî nasbike û rabe çareyeke giştî jê re deyne. Mîr dizanî, ku heyâ gel bigihe vê hişyariya ha, xebateke dirêj û dijwar di-vê. Wî dizanî, ku ev hişyarkirin jî tenê di riya zimanê gelê kurd te kare were ki-ritin. Tenê di riya hînbûna nivîsandin û xwendina zimanekî kurdî netewî yekgir-tî te gelê kurd wê kari be bi hebûna xwe weke neteweke serbixwe bihise. Û ji bona lêkirina avayıya yekkirina zimanê kurmancî divê alfabet weke kevitê pêşî ji vê avayıyê re were danîn.

Ji ber vê yekê wî êdî xwe da çêkirina alfabetike kurdî, ya ku wî bingehê wê hê di sala 1919an de danî bû û xwest rojnameyekê bi wê alfabetê ji Kurmancan re derxe. Mîr Celadet di rojnameya xwe "Hawar" de, ya ku wî piştre derxist li ser danîna alfabetê dînivîse, ku di sala 1930î de, ji ber ku hikûmeta Sûriyayê li Şamê dest li ser wan danî bû, wî xwe şev û roj daye rîsimana alfabetâ kurmancî. Mîr Celadet dixwest, ku kurd kul û derdêن xwe, çîrok û helbestêن xwe û wêjeya netewa xwe êdî bi zimanê xwe binivîsin û ne bi zimanê derveyî weke erebî, fari-sî û tirkî.

Di roja 26.10.1931ê de wî destûr ji hikûmeta Sûriyayê stand, da rojnameya xwe "Hawar" derxe. Di 15.05.1932an de wî hijmara pêşî ji Hawarê da çapkîrin û wî heyâ bi roja 15.08.1943an 57 hijmar jê dane derxistin. Pişti HAWARê, Mîr kovarek din bi navê "Ronahî" da çapê. Ronahî roja 01.04.1942an derket û heyâ bi sala 1945an 28 hijmar jê derketin.

Mîr di hijmara zoan de sala 1933an li ser roja bibîranîna salekê ji derketina HAWARê vê yekê dînivîse:

"Govara HAWAR bingîhê zimanê me daniye. Divê em zanibîn ku ziman hî-

mek ji hîmêñ hebûna me ye. Bê ziman em nikarin bi gelên din re weke gelekî azad, yê ku bi serbilindiyê hatiye naskirin, bijîn. Ji ber hemû gelê dinyayê jî li ser zimanê xwe halo difikire. Ew gelê bindest, yê ku zimanê xwe ji bîr ne kiriye, weke yekî ku di hebsê de girtî be, lê mifta deriyê hebsê di destê wî de be, roja ew bixwaze, kare derkeve. Belê ew gelê ku zimanê xwe ji bîr bike, weke yekî ku di hebsê de girtî be, lê mifta hebsa wî di destê dijminê wî de be, dijmin deriyê hebsê lê naveke. Vêce heçî em kurd in, hê mifta me di dest me de ye.”.

Bi 3 mehan berî ku Mîr Celadet kovara xwe HAWARê derxe, wî li bajarê Hisîçe komelyek avakîr, ji bona ku ew li wan kurdêñ ku ji bakur di serhildanêñ kurdî de revî bûn û hati bûn xwarê, xwedî derkeve. Berpirsiyarêñ vê komelê li Hisîçe Hesenê Haco û li Şamê Dr. Ahmed Nafiz Beg bûn.

Ji roja pêşî ve, gava ku Mîr Celadet giha bajarê Şamê tiştekî wî ne bû. Rewşa wî ya diravî û armancêñ ku ew ji bo wan dixebitî gelekî ne li gorî hev bûn. Hemû milk û mewdanê wan i, ku hebû di sergombûnêñ wan de tert û bela bû bû. Bi taybetî piştî ku kemalîstan sala 1924an dest li ser hemû hebûna wan danî. Her tişteku hikûmeta Fransayê dixwest bidiyê, wî ne digirt, da ji bo ew nikari bin wî bi xwe ve girêbidin. Di wê demê de Melik Abdullahê Haşimî ew xweste ba xwe û xwest cihekî bilind di dewletê de bidiyê, belê mîr ew jî ne girt, ji ber wî dixwest di bîr û behweriyêñ xwe de serbixwe û negirêdayî bimêne. Kula wî ya pêşî û paşî kurd û Kurdistan bû.

Li vir tê xuyakirin, ku Mîr Celadet odayeke biçûk, hîn û nizim li Şamê çêtir didit, ji girêdaneke li ser hisabê armancê û behweriyêñ xwe.

Sala 1935 Mîr Celadt keçmama xwe Rewşen Bedir-Xan, ya ku li Şamê mamooste bû, anî. Piştî hevanîna wan, wanî mala xwe li Şamê guhestê taxa Salihiyê û rewşa wan hinekî bi perên mamostayetiya pîreka wî Rewşen Bedir-Xan başdır bû. Di 21.03.1938an de keçek ji wan re çêbû û wan navê Sînem Xanim lê kir. Di roja 09.11.1939an de kurek ji wan re çêbû û wan navê wî kire Cîmşîd.

Di vê dema paşî de êdî pîreka wî û kurê wî Cîmşîd arîkriya wî di derxistina kovara HAWARê de dikirin, ango tîp li hev siwar dikirin û dibirin çapxanê.

Sala 1939an Mîr bû mudîrê şirketa ferensî ya Cigaran ”Rêcî”.

Sala 1947an hikûmeta Sûriyayê rê li ber vekir, ku di hilbjartinan de beşdar bi-be û bikeve parlementoya Sûriyayê. Belê gava wan dît, ku ewê li navçeyêñ Kurdistanê gelek dengan bistîne, wan ew girt û careke din vegerandine Şamê.


Di 15.07.1951ê, seet 9 sibehî Mîr Celadt Bedir-Xan li gundê Hêcanê, li nêzîkî Şamê çû dilovaniya Xwedê.

Heya roja îro çîroka mirina wî wilo tê gotin, ku ew li ser devê bîrê rawesta bû û bi qedera Xwedê wefat bû. Belê ez dixwazim îro niha û li vê derê bixim bîra rewşenbîr û lêkolînerên kurdan, ku gelek goman û şika min li ser vê çîrokê heye. Gava mirov xwe bi jiyanâ Mîr Celdat Bedir-Xan û malbata wî mijûl dike, mirov welatperwerine kurd dibîne, ku xweşiya gelê xwe û rizgarkirina kurd û Kurdistanê di ser her tişî re digirtin. Dijminê kurdan jî ev yeka han baş dizanîn û di Mîr Celadet û malbata wî de dijminên xwe yî herfî mezin didîtin. Ji ber vê yekê ez di wê bîr û behweriyê de me, ku mirina Mîr Celadet ne mirin bû, belê ew kuştin bû. Ku mirov fermana kuştinê, ya ku kemalîstan sala 1922an li dijî Mîr Celadet û malbata wî û nameya Mîr Celadet ji Kemal Atatürk re dixwêne, gava mirov derxistina wî destqeydkirî ji Îranê û tirsa Ingilîzan jî li Îraqê û Fransisiya û Ereban li Sûriyayê dibîne û mirov Mîr Celadet û hişyarbûn û hişê wî yî tûj têne bîra xwe, mirov tucaran nikare behwer bike, ku Mîr bi wê hesaniyê, li ser devê bîrê rawestîha bû, bîr jî bin ve xuriha bû û deng jî xizana avê hat û avê Mîr bi xwe re avête binê bîrê. Divê lêkolînerên kurdan bixin bar jî xwe te û li sedemên rastî, yên ku hiştin Mîr ji nav gelê xwe winda bibe, li arşîf û belgeyên daireyên nûçebihîz, ango istixbaratêñ dijminan bigerin.

Ez di dawiya gotara xwe de dibêjim Mîr Celadet Bedir-Xan îro jî sax e, ew di nav me de ye û ew ê di dilê gelê Kurdistanê de herheyî be. □

<sup>1</sup>Salman Osman, Al-Amîr Caladat Badirxan, Hayatuhu wa fikruihu, rûpel 52

# XENDEK



E. H. MIHEMED

**H**ewayek tije dû û gemar, tarîtiyek bêwext û gi-  
ran derve zavt kiribû; A., bi piyanoyek kevnar,  
melodiyên xemgîniyê, evîniyê û tenêtiyê lêdixist.  
Mûmek di xwelidanka li ser kêleka klavya piyanoyê  
de vêxistîbû. Pêlên dûyê cixarê li ber ronahiya mûmê  
wek ritmîn reqsa balerînan bilind dibû, lê ne spî heşîn... Dîwana Melayê Cizîri li  
ber destê A., li ser piyanoyê wek repertûara evînê disekinî; wêneyê Ehmedê Xanî  
yê bi dîwarê kêlekê ve hilawistî, welî berê wî li bişkojên piyanoyê be, xuya dikir!..  
Mûmê aliyekî yê rû, pişta dest û tiliyên A. û bişkojên piyanoyê ronî dikir û gewdê  
A. li ber ronahiya mûmê siyeke mezin dixist hundur!..

Ji nişka ve dengê piyanoyê, bi gîrrînek wek ya dengê motora minibüsên sîxoran  
hat birrîn...

A. bi dilekî xof, hêdîka deriyê balkonê vekir û ji jor de li kolanê nerî; farêن trim-  
pêl û teksiyên di kolanê de diçûn û dihatin, tarî û xumama giran diqelaştin û xu-  
nava baranê li ber ronahiya faran dibiriqî. Tiştê ku A. jê bi xof bû vê gavê bihuri  
bû.

Di vê navberê de, di oda aliyê din de B., pirtûka Çirokên Hezar û Şevezê dix-

wend.

B., pirtûk da hev û deriyê oda xwe vekir û ber bi A. ve çû; nêri elektrîk vemiriye û mûm vêxistiye û A. wekî xeyaletekî di hundur de bêdeng digere.

— Tu çima wiha xemgîn û bi xof î ? Qey tu ditirse ku ewê van rojana xwediyê malê me ji xênî dixerine ?

(Ji berko xwediyê xênî gotibû heta du rojan derkevin.)

— Herdu jî rast in, lê belê yek ji wan jî ji bo min ne xem e!

— Wê çaxê em biçin metbexê, ji xwe re xwarineke xweş çêkin; tu birçî yî.

Tevde çûn metbexê; çawa ronahiya metbexê vêxistin, bû pire pira baskên du kevakan. Kevok jî bêlis û hêlin di tariyê de wenda bûn.

B: Waye di sarincokê de pir cûreyên pincar û sewzên ter hene, em dikarin xwarinek pir xweş çêkin û çaxê ez ji kar hatim min hinek masî û şûşeyek araq jî anîbû.

— Belê, dizanim heke mirov çêke, mirov dikare tiştên gelek xweş çêke. Mixabin hinek tiştên din min rehet nahêlin. Dizanim, ez ê bi vî halê xwe her birçî, bêcîh û bêwär bim, lê divê ez çarçikên van wêneyên tevlihev ku di kûrahiya heşê min de digerin, ji hev vavêr bikim û bi hev ve girê bidim.

A. çû oda pirtûkxanê, maseyek piçûk ser tije kovar û pirtûkên belawela bûn, di nav tevliheviye ser masê de kompîtûrek kevn a berbar jî hebû.

A. lampa li ser masê vêxist û berî dest bi nivîsandina tiştina bike, wekî ketibe xendekeke kûr, welê di kûrahiya hişê xwe de, di herikandina hevakan de, li Metran û li coya ku Metran digot, "di ser re bazdidim û bazdidim!" digeriya.

Metran kî bû ? Çima di ser coyê re bazdida ? A. ji danasına coyê dest pê kir û ev teksta jêr nivîsî:

Aveke boş ji quntara çiyê derdiket û di coyek fire de diherikî ser zevî, rastî û bos-tanên li dorûberên avahiyê. -lê tiştékî xerîb bû, avahiyên wî welatî giş berewak, kun û kulek bûn, avahiyân qet hemetî li jiyana malbatî û jiyana hundurî nedikirin.— Li gorî mal û avahiyân, ewqas çîklên coyên piçûk yên cuda cuda jî ji coyê mezin belav dibûn. Her malekê coyekte wan ya taybetî hebû.

Av bi dorê bû, dor dihat kê wî/ wê av berdida ser coya xwe.

Ji ber ku avê binco dixwar, serkevanên coyan pir nazik dibûn ji xwe coyekî sax-lem, qayîm tune bû. Bi pêgavekê çaxa mirov di ser kîjan coyê re bazbidaya, dê ax û herî, an jî kevir ji teniştâ coyê têketana coyê. Co wekî damarên laşê mirovan, li ha-wîrdor belav dibûn, jîn û rih didan herêmê.

Di ser coyê re bazdan îhlalkirineke mezin bû! Kê bêrêziyek bikira dihat wê manê ku wî/wê di ser coyê re baz daye. Berî Metran hinakan di ser coyê re baz bidana

jî, lê li kiryara xwe xwedî dernessketin. Ji xwe hatina Metran a dinyayê jî belkî ne hatinek bixêr bû!

Şeva ku dayika Metran ketibû ser destê pîrikan, şevek sar û wekî ji xemgîniyê da- girtî be dikir bêwiqaet biqede, avahî hîn di bêdengiya tariya şevê de wenda bûn, nîv seet mabû ji berbanga sibê re, bayekî sar xezan, gelgele, qırş û qewalên payizê li ber xwe dibir, nalnîn zayîna jinekê tevlî tariya şevê û dengê bê dibû; wê gavê ronahiye melûl di kun û kulekên avahiyekê re da der, bi ronahiye re, nalîna çikêni zayînê û xûrmînî û fizîniya gulleyên mirinê li nav hev ketin!

Bilbeqeke xwînê di serê Canê re avêt, yekê jî xwe di jêra wê re avêt, yek diherîkî mirinê, yekê jî jiyan av dida, ji aliyê bilbeqa jiyanê ve navika zarokekî jê kirin.

Gulleyên topan, ronahiya avahî vemirandî bû, kes li dorûberê nema bûn, kun û kuleken li avahîyan hîn zêdetir kirîbûn, lê hîn jî findikek (mûm), di navbera zarokekî di pêçekê de û serê dayika wî de vêketî bû. Nalîn û pêjn ji dayîkê biliya bû, la- şê wê cemidî bû, xwîna ku li ber serê Canê, li paş balîfe bibû gol, li ber ronahiya findikê hîn dibiriqî, çaxê bê li pêtiqa findikê dida û bi aliyê sebî ve dişkand, rûyê wî yê çermisorî xwiya dikir û xirt xirt ji gewriya wî dihat...

Bi şeveqa sibê re, mirovên derûdor û cîranên Canê, ew bi dilekî bi keser û bi şe- wat binax kirin.

Kesekî ne pirsî: "Çima ? Ev ci top baran bû ?"

Ji ber ku pirsên wiha bêmane bûn, tiştekî rûtîn bû, di tariya şevê de ronahiye jî ku derê ve bidana der, dihat gullebaran kirin.

Xelef weke ku hinav lê biqerise û dest û lingên lê bêne girêdan, wesa sebiyekî pi- çûk ma bû di nav desten wî de, ji ber wê çendê diviya rojekê berî rojê ji xwe re ji- nekê bîne, da ko hem lawê wî xwedî bike, hem jî mala wî bi serûber bike. Ji Xelef re behsa Hindê hat kirin.

Hindê jî, hîn bûka salê bû, mehek mabû ku sala wê biqede, lê ma bû jinebî, za- roka wê jî ji ber çûbû. Zilamê wê bi pêlêkirina mayînekê miri bû. Piştî du meh di ser mirina zilamê wê re derbas dîbe, berê wê jî ji ber diçe. Ji xwe, ji tîrs û ji xofa "ecuc mecucen" mirovxwer, kêm ber û berhem bi sexlemî dixuliqin. – li vî welatî mirin, ne ji êşê û ne jî ji pîrîtiyê ye.-

Rojekê, bi hawayekî bêxemîl û xêlî, Hindê ji Xelef re dibin.

De axir roj, meh, sal û dem tûj û dijwar derbas dibûn; her çiqas lawik hîn sebî bû jî, Hindê dêmarîtiyek pir xedar jê rê dikir û navê wî jî kiribû Metran (weke ke- sekî ne ji ola wan)

Metran bêtir bi pêşîrên mitriban, qereçîyan hatîbû xwedîkirin. Carna jî hinek ji-

nên cîrana yên xwedî xêr danekî şîrê xwe didanê. Lê tevlî şîr û pêşîrên xulqiyetêن cuda cuda jî, Metranê piçûk tu carî têrnedibû.

Piştî Metran bi çapelka çû û pêve êdî ew bi xwe li çara têrbûna xwe digeriya, çaxê didit ku li nêzîkî wî, cewrikên dêlikê pêşîrên maka xwe girtine û dimêjin, ew jî diçû bi hewldaneke ji xwe zêdetir, devê xwe tavêt pêşirên dêlikê û dimêt. Mirov digot qey ew jî cewrikekî dêlikê ye, ne makê û ne jî cewrikan qet bela xwe di Metranî nedidan.

Wek gelek carên dî, dêlikê xwe dirêjî erdê kiribû û cewrikên wê jî li dora wê dilistin; Metran jî, wekî ku di germiya himbêza dayika xwe de, ji pêşîrên dayika xwe têr şîr mêtî û lê hîn serê pêşîrî di devê wî de mayî li ber bedena dêlikê, di xew re çûbû. Di nav pelçim û tayêna dara tuyê re, tîrêja rojê dida lameka wî, xunavek xwêhdan li ser enî û firnikên pozê wî dibiriqî, xwedî rûyekî girover, sorqemerê gir û tijî û stuyekî stûr bû, porê serê wî yê mezin bi meqesê hatibû qusandin û serê wî ketibû ser zikê dêlikê yê vale û pêşirek qermiçî di nav lêvên wî yên gij de bû. Temerîka li ser eniya wî şérînayıyek pir xweşik dida rûyê wî. Qirêj û girêza li ser sora-yiye giroveriya hinarkên rûyê wî wek erdê avî yê ku bêav mayî telîş telîş bûn. Des-tê wî di nav pirça dêlikê ya nerm de winda bûbû.

Diyar bû ku Metran qet li ber himbêzek wiha nerm û germ raneza bû. Bêzar û bêziman, derdê bêdayiktiyê giran bû.

Hindê jî xulqiyeteke pir xerîb bû, dê çi çax bi çi hawayî ji kê hiz bikira, dê neyare kê ba, ne diyar bû. Ew jî ketibû xefikekê, çiqas xwe dilivan sîxên xefkê ewqas zêdetir di nav rih û bedena wê re diçûn.

Carina difikirî, digot qey hemî kes ji delaliya wê diheside, wê çaxê her kes li ber çavên wê xirab dibû, ew tenê baş bû! Her gav kostumek li xwe dikir û yek jî ji xwe dikir. Hemî cureyên sorav û spîavan diceribandin. Carina digot: - Ez jî deh mîran xurttir û cengawertir im.

Carina jî digot:

- Xatûnek wek min delal û liberketî tuneye.

Lê tu mirêkan têra wê nedikir, belkî ji delaliya wê an jî ji hêrsa wê mirêk dişkes-tin. (Xelef halxweş bû an na ji destê wî nedihat hinde mirêk bistîne.)

- Gotina pêşıya ye:

- Mêr ew in ku bi hirçan re rakevin, an nexwe her kes dikare bi xatûnan re rake-ve.

Hindê jî tiştek ji hirçejinîtiyê re nehiştibû! Dîsa li ber mirêkê bû, ronahiya rojê bi kuna avahiyê re dida qolincen wê, qetekî siya wê diket ser aliyekî mirêkê û digot:

– Kî weke min ciwan, delal, tenik û zirav e ?

Her çend Hindê ev gotin çend caran dan pêy hev jî, lê mirêkê her bi ya xwe dikir: Gewdeyekî firehî ji bilindahiyê zêdetir, goşte bi zik û xavikên kélékan ve, xwe di bin cil û kembera komkirinê re jî berdidan xwar, stuyê wê di nav zexmîtiya milen wê de winda dibû, rûyekî wek devê bêrekê xwar û sehn û aliyekî rûyê wê wek şewitî be, welê reşqemîtî bû û du çavên şas, mirov digot qey çavên wê di nava eniya wê re derketîne, pozekî wek şelimekê û lêvinin şitol pê ve bûn, diranên wê jî diranan zêdetir wek kêliba bûn.

Her ku mirêkê "dîdar" rast nîşan dikir, esabêñ Hindê jî xira dibû, qırçınî ji diranan dihat, çav lê sor û zîl dibûn, destêñ xwe yên hirçinî kirin kulm, givaştin û bi gewetek wek ya hespekî rehwan, herdu kulmén xwe danîñ mirêkê, mirêk zûl zûl bû, Hindê wek hirçeve birîndar kir hîrînî û destêñ xwe avêtin devê xwe û çû ber kulekê, gilîza devê wê tevli xwîna destêñ wê dibû.

Xire xira nefesa Hindê, bi xwiyakirina Metran re kêm bû, weke ku fersenda tolhildana êşa xwe bibîne, welê bi lez û bez çû, perçeyek ya gulla topê, wek qetekewirekî li wê erdê bû, dest avêtê û daweşand, bi lêketina derbê re dêlikê kir qarîn û bazda. Ferxikên wê jî dan dûv, serê lawik jî zing û li erdê ket...

Hindê wek dest bavêje cewrikekî heram, welê bi destêñ lêwik girt û kaş kir.

Li ber coyê du quleteynêñ avê hatin çêkirin, yek zelal, yek jî şêlo bû û Hindê tev li kincan Metran sê caran di ava şêlo û çar caran jî di ya zelal da kir û her car jî di got:

– Ya Rebî tu ví heramî helal bikî.

Bi wî awayî dervê Metran hat helal kirin! Lê şîrê heram û herimî ketibû hundurê wî, mixabin çare ji helalkirina hinavê wî re nehat dîtin. Tenê, biryar hat stendin ku Metran bi kesekî re xwarinê nexwe û firaxa wî ya xwarinê jî her tim cuda be.

Ji mêtina şîrê herimî bû, ji ci bû, Metran ji sal û mehêñ xwe zûtir mezin dibû, gewdê wî jî tijî dibû.

Carekê, cardin şev bû, heyv li aşimanîn zîz dibû, ronahiya wê di kun û kulekan te tariya hundurê avahiyê diqelaşt, pisikê ji sitêra (kulîn) tije lihêf û doşek, xwe avêt ser dîwarê di nava avahiyê de, -dîwar nedigiha maxan, bi qasî nîv bejnê ji zemînê bilindir bû-, di ser dîwêr re jî bazda ser cihê Metran û bi zimanê xwe yê sorî tenik rûyê wî alast.

Metran ji xew rabû. Tîrêja hîvê di kuleka jor re dida hundur. Metran di kuleka li dîwarê kêleka xwe re cihê ku tîrêja heyvê didayê dît, Hindê, wek hirçekê li ser piştê dirêj bûbû, her du destêñ xwe avêtibûn pişt stuyê xwe, hingilê (memik) wê di qe-

lîşteka binçenga kirasê wê re fiştıqî û daheliya bûn, gewdê wê baş xuya nedikir, te-nê hingilê wê yê mezin, li ber ronahiya tîrêja hîvê baş xuya dikir.

Ji birçibûnê bû, ji "heramiya" hinavê wî bû, ji ci bû, nizanım. Carekê, Metran bi zikişkê di kulekê re çû ber Hindê û hêdîka destê xwe avêt hingilên wê û serê hingilê wê yê reşheşinî weke ku mara mêtibe, xist devê xwe, da ber niqa û mêt.

Hindê, wek nîv di xewn û xeyalan de û nîv şiyar be û evîndarê wê li ser sînga wê be, welê tezîneyeke xwes bi laşê wê de çû, xwe vekêşa.

Metran her çendî dimêt lê şîr jê nedihat, bîhneke dijwar a pîs ya dohn û xwîdana giran ximximgên wî şewitand û kuxiya, Hindê bi hawayekî ne li ser hişê xwe çengê xwe yê stûr danîbû ser stuyê wî, lêwik xwest serê xwe bi paş de bikişîne, lê Hindê şiyar bû, rewş fêm kir û kir qîrîn, avahî hejiyal..

Xelef ji nav cihê xwe yê ku li ber lingên Hindê bû, pekiya û rabû ser xwe, bê-hemd pê li qumça ronahiyê kir û ji nişka ve bû xurmîn û gurmina guleyên topan!..

Nobedarê li ser barûya (qûle) pêşberî avahî bû, baş nizanibû ka ronahî li ku de-re vêketibû, hema ji nişka ve ferманa lêreşandinê dabû. Baş bû ku Xelef zûka ronahî vemirandibû.

Hindê, şûşa merhema nermkirina laş ya li ber serê xwe, hema çawa bi dest xisti-bû, welê bi serê Metranê piçûk ve danîbû, xwîn, hêşir û merhem li ser rûyê wî tevlîhev bûbû.

Xelef biziya bû:

– Keçê, keçê, ciye, ci bû ?

– Cewrê te ez lewitandim, eve bû cara çendê di ser coyê re baz dide, tiştê xerab dike, ji bûyina xwe, ji heyvanê xwe de heram e, yan tu yê wî ji malê derxî bidî hin-nekan, yan jî ez nabim jina te ? Ecêb e, kesekî bi çavêن serê xwe dîtiye ku cewrikekî wiha piçûk, van kêtîrên (sucên) wiha xerab bike?!

Xelef bi serê xwe yê mezin û stûr ve şeqiz mabû, tiştek ji vê rewşê fêm nekir û got:

– De ka hema tu ci dibêjî kêfa te ye, delala min.

Ji bêdengiya dorûber, diyar bû ku bi xurme xurm û gurme gurma topan vê dawiyê tilafeta mirovan çênebû ye, hema hinekî avahî xerabûbûn, tenê yê xwîn jê hatibû Metran bû.

Xelef ma heyirî, zilamekî navsere bû, porê serê wî yê mezin ji pişta burhên wî ve-nediqetiya, porekî risasî zivir wek sîxên jêjû, her mûyekî wî ji hinda xwe ve radibû, rûyekî pehnî stûr, çavêن ingilîz û qurmûçekên rûyê wî wek tiliyên destan stûr bûn.

Xelef pêş (hilm) li ser pêşê dida cixarê, lawikê piçûk ji malê derxe, bavêje ber se-

qam û sermayê, ne karê aqil û wijdan e, lê li aliyê din miriyê laşê Hindê ye, laşê Hindê wek hezékê bû û ew ji têde dixewirî, di xewrê de bû.

Lê ci piçûk, ci mezin, Metran di ser coyê re baz dabû. Qewirandin li ser eniya wî nivisî bû!

Dem, şev, roj, meh, sal... wext û guhertin, wext û jiyan, ji bona Metran, mana wextê ci bû?

Zarokekî piçûk, seqem û kelek dojehî, avek sar yeke germ, Metran wek pola qayim bûbû li pêşber mercen xirab.

Her çendî piçûk bû ji lê mirovên li hawîrdor dixwest ku zarokên xwe ji Metran biparêzin û nhêlin zarok ji bi wî re biherimin û weke wî di ser coyê re baz bidin, lê zarokên bi çaxa wî re û jê mezintir lê kom dibûn û ew ji xwe re wek mîr û pêşvan didîtin.

Lê leqaba wî ya, "di ser coyê re bazdidim û bazdidim!" her li wî bû. Ji ber ku we-lê dihat zanîn ku wî di ser coyê re baz daye, lewra ji malê hatiye derxistin. Hêdî ew ferxeşerekî bi serê xwe bû, diviya ku ew hemî pêdiviyêni jiyana xwe, bi jîrîtiya xwe bi dest xe.

Ferxikên dêlikan û yên pisikan pir bala wî dikêşandin, xwarina ku bi dest dixist, gelek caran dibir bi wan re par ve dikir.

Metran ji bo hewcedariyêni xwe, êdî li her derê digeriya, ling dida ber xwe. Lê be-lê ji ber ku ew ji "baxçe" hatibû derxistin, lema ji tu cara nikarîbû biçuya nav wî baxçeyê ku li rexâ avahîyan bû.

Baxçe, li ser devê riya çûyin û hatinê bû, û tije darteam û fêkî, xox, müşmiş, sêv, incas, karçîn (hirmî), hinar, hejîr û hîn gelek texlitên mewan... xemleke îremî... Çaxa ku dinya germ dibû, li raserî birka (hawiz) li kêleka rê kolikek (holikek) her çar aliyêne wê vekirî dihat avakirin. Di wexteke kurt de, ev baxçe gihaştibû û hilperikî bû. Bi hewandin (fetihandin) û kedê an bi kirîn an ji wek mîrat mabû ji xwediyê xwe re, ne diyar bû. Lê baxçe wek cîh û war ev çend sal bûn bêtir bi navê Hindê dihat bi nav kirin, navê Xelef zêdê ne li pêş bû.

Rojekê Metran, ber co ber co qederekî çû û şünde, li ser kendalê raserî coyê rû-nışt. Co kûr bû, kendal nêzikî sê metran ji avê bilindir bû, ji çar şaxêni coya mezin, çîklê herî mezin bû, ji tîrêja rojê şewqa avê dida serçavê Metran. Av diherikî, Metran lêva xwe gez dikir, wekî kerba wî li tiştikî vebûyî û bixwaze kiryara di dilê xwe de bike.

Ji nişka ve germiyekê laşê wî girt, te digot qey bela li hespekî rehwan siwar bûye û daye dûv wî, welê xwe kir gurz û di ser coyê re baz da, bi bazdana wî re ax û ke-

vir tevde di coyê wer bûn; co pengiya (gumiya), pengav mezin û şêlo bû, xendek û çal tije av bûn.

Metran pişti qederekê li paş xwe ve û li pengavê nêri û bi qêrin û bi hêrs got:

– Di ser re bazdidim û bazdidim!

Pengav, pêl, xendek û co li paş man. Metran bi ber toz û dûmana riyâ xwe ket.

Av ji ser hin ciyan hat birîn, hinek cîh jî di bin avê de man...

Di vê nevbeynê de Hindê jî di nav "baxçe" de digeriya û terheke dara mêmê ya ter di destê wê de bû, dişkêñand, wekî ku ji terhê re bibêje, terhê ka ez ciwantir im an tu û terh jî li pêşber hewldana wê, bê mefer û bê bersiv bimîne û ev jî bibe sedemê qet qet kirina terhê!. Bi kerbek dijwar terh di nav destê xwe de dikir qet, hindî dît ku, av di coyê hilnayê, pêl xwe tawêje bin kolikê, û bêqam diherike ser baxçe, av nedihat hezimkirin, kolik pêl bi pêl ji rewşa avahiyê derdiket, bi teybeti jî "bexçika" ku şahidê jiyana wê ya veşartî bû, ketîbû ber pêlên av û heriyê!

Hindê kir qêrin û hawar:

– Hey wax, avareş bi ser me de hat!

Erd hişik, aşiman sayî, Hindê bi ber pêlên avareş ket!

A. dê nivîsandina vê çîrokê hêj bidomanda yan na ez pê nizanim, lê belê, nêzikî destê sibê bûbû, A. bi qerpe qerpa pehînên ku li derî diketin û bi zirîniya zîl û bi wîse wîsa dengê telsizên sîxuran ji cîhê xwe rabû, berî ku derî veke çû pencere vekir û wekî ji binê xendeke kûr de li aşimanan binêre û rûyê wî ber bi rojhiletê ve be.

Aşiman bi rengê kirasekî heşînêtari, bi tonê lacîwert û xemrî tevlihev bû, heyv wek rûyê keçekte delal a çardeh salî li ser rengên tîr dibiriqî, pêlek ewrê spî li doraliyê heyvê direqî, ci dîmeneke delal e? Mirov ji erdê hildikşîne aşimanan! Deriyê hesinî bi qirrîniya fişekan vebû. Erd, aşiman, bajar kuç û kolan gişt mismit, bêdeng û bêdengyedan bûn, "mirışkek" ji ya cîranan ji xwe şiyar nebû! □

# BRADER: "HUNER PERÇEYEK JI JIYANA MIN E"

**B**rader di sala 1958an de li gundeki Mêrdînê bi navê *Mûsika* hatîye dînyayê. Wî xwendîna xwe ya destpêk û navîn li herêma Mêrdînê xwendîye û paşê li Wanê dest bi koleja tendurustiyê kiriye. Ew ji ber stranên xwe li Wanê tê girtin û çend mehan di zîndanê de dîmîne. Brader paşê xwe bi hemû hêza xwe dide hunerê. Çi bigire ew ji sala 1976an û vir de bêî navbir stranan dibêje. Braderê ku ji mêt ve ye li Holandayê dijî, bi stran û awazên xwe cihekî taybetî di dilê guhdarê kurd de çekiriye.

**Nûdem:** *Te kengî û di bin kîjan şertan de dest bi hunerê kir? Çi bû ya ku tesîr li te kir, ku te got: "EZ ê li tembûra xwe bixim û bistirêm?"*

**Brader:** Li gorî tecrubeyên ku min ji jîyanê fêhm kirine, her hunermend gava ku tê dînyayê, ji xwe hunermend e. Dilê wî, xwîna wî, rehêن wî huner e; yanî di bingeha wî de huner heye. Mirov dikare nehêle yek bibe hunermend. Mirov dikare rehêن wî, fêhmên wî, kabiliyetên wî, bi tesîrên tiştin din kor bike. Lî di bingeha yekî de cewhera hunerî tune be, tu tesîr nikare wî yekî bike hunermend. Mumkun e fêrî ilmê akademîk bibe, û fêrî hinek instrumentan jî bibe, lî ew kes nabe hunermend. Yanî ger mirov pêncî salî avê bikelîne, ew av nabe qehwe. Lî ger tu avê bikelînî û qehwê tevlê bikî, ançax hingî ew bibe qehwe.

Ji bo hunermendekî bi kar anîna instrumentan bi awayekî tebiî tê holê. Ji xwe instrumenta herî girîng dengê însanan e. Lî ji bo rengê huner pirsa tesîrê tê holê. Ez ji bo xwe bibêjim: Ger ez li Afrikayê bihatima dînyayê, belkî min jaz an jî bluz bigota. Ger ez li Amerîkayê bihatima dînyayê, dibe ku min muzîka rock çêbikira û hwd...

Ez gelekî dilşa me ku ez li gundê Mûsika hatime dînyayê û li ber desten Silo Reşê mezin bûme. Bavê min dengbêj bû. Carinan dengbêj dihatin mala me û stranên gelerî û folklorî digotin. Wek Kinikê Berniştî, Mahmûdkê Tembûrvan û yên din. Her sal yek ji aliyê Serhedê dihate mala me. Navê wî Teyar bû. Gelek stranên xweş digotin. Wek strana Evdalê Zeynikê, Hemê Mûsikê, Bedew Canê, Derwêşê Evdi û hwd. Tesîra wî camêrî bi qasî tesîra bavê min li ser min çêbû ku ez iro stranên gelêrî distirêm.

Hunermendêne yên geleki hêja hene. Hurmeta min ji wan re heye. Ez dikarim bibêjim ku kek Şivan ji me re riyeke nû vekir û gelek tesîr li keç û xortan kir û ku ew stranêne kurdî bibêjin. Di eslê xwe de dema ku Şivan li bakur derket, li başûre biçûk Mihemed Şêxo hebû, lê tesîra Şivan tiştekî din bû. Ger min di sala 1975an de li Şivan guhdarî nekiribûya, belkî ez di sala 1976an de li bajarê Wanê ji bo stranêne kurdî neketima hepsê. Li aliyê din Îhsanî, Zamanî, Mahsûnî û Sûlari hebûn. Lê ew demek bû. Em hemû hatin guhertin. Dem hate guhertin. Ez hatim guhertim. Ev bûn çend sal ku ez li Ewrûpayê dijîm. Edî dengine din li ber guhêne min in. Eric Clapton, Joe Cocker, Van Gelis, Bob, Jimi û hwd... Tu bivê nevê ev tesîre li mirov û xebata mirov dike. Lê hew du hunermendêne kurdan hene, ku gava ez li wan guhdarî dikim, ez li ber dengêne wan mest dibim. Ew jî Şakiro û Mihemed Şêxo ne. Rehmetiyê Tahsin Taha jî gava me hevdu nas kir û têkiliyên me ges bûn, geleksî tesîr li min kir û çûna wî tesîreke din li min kir. Bi rastî jî Tahsin Taha geleki ji na-vê xwe mezintir bû. Ez geleki li Brader jî guhdarî dikim. Ez ji bo du tiştan li Brader guhdarî dikim. Yek ji bo ku ez kêmasyiyêne wî bibînim, ya din jî ji bo ku ez geleki ji dengê wî hez dikim.

– *Tu li dûriyê ci dikî? Tu bi ci dijî?*

– Ev çend sal in ku ez li Ewrûpayê karê hunerê didomînim. Ew edî bûye perçakî jiyana min. Karekî din ji min nayê ku ez bikim. Û rastiyeke din jî heye, ji bo ku mirov bikaribe bi karê hunerê jiyana xwe derbas bike, ew jî hunermendîyeke din jê re lazim e. Ez dizanim hunermendêne me hemî birçî ne. Em bi vê razî ne. Lê tiştin hene nayêne qebûlkirin. Ew jî golikti ye. Hunermend û golik geleki ji hev cuda ne. Partiyêne yên siaysî vê têkel dikin. Dema dengbêjên odan û mitribêne axan derbas bûye. Her hunermend xwedî maf e ku di nava rêkxistinan de bixebite û aktiv kar bike. Ev karekî welatparêzi ye. Lê nayê wê manê divê hunermend bibe golik û papaxanê wê rêkxistinê. Rêkxistin xîtabî sınıf an tebeqeyekê dike. Lê hunermend xîtabî gel bi giştî dike.

Îsal li gel karê muzîkê ez karekî din jî dikim. Ji aliyê produktionekî holandî ve pêşniyaza aktoriyê ji min re hat û min qebûl kir. Em niha filmekî kurdî bi hev re çedîkin. Di şertîn îtroyîn de, jiyana kurdekî nîvxwende li Holadayê tîne ber çavan.

Yanî ez dikarim bibêjim ku jiyana min e, ya te ye, ya wî ye... Wê film di televizyonêne Holanda, Belçika û Almanyayê de were weşandin. Ev serê şes mehan e em pê mijûl in. Heta niha tu rojnameyêne kurdî, pardon, tirkekurdî, cih nedane vê bû-yerê.

– *Qey nebihîstine, nizanîn...*

– Zanîn, zanîn. Lê mumkun e di rûpelên wan yên çandî de cihê vala tuneye(!).

– *Hunera te li welêt çawan bi pêş diket û li xerîbiyê çawan bi pêş dikeve? Ferg heye*



Brader: "Pêşketina muzîka miletekî bi jiyana wî ya sosyal, aborî û siyasi ve girêdayî ye"

*an na? Ger hebe, çi ferq heye?*

– Li welêt çavkanî gelek bûn. Ev ji bo pêşketina hunermendekî îmkanekî bingehî ye. Îmkana din a bingehî jî temashevân û guhdar in. Em hunermendên xerîbiyê ji van herdu nîmetan dûr in. Lê li xerîbiyê azadiyek biçûk heye ku ferqê dixe navbera vir û welêt. Mesele niha tekstên min, miqamên min hemî li ber çavêن min in. Ez çi gavê bixwazim, ez dikarim bê tirs tekst û melodîyan çebikim. Lê li welêt ne wisa bû. Gelek tekstên min hê di qulikên dîwaran de ne. Tirs û xof hebû. Lê dîsa jî xwezî bi welat û ne bi vê serbestiya pûç û vala...

– *Di derheqa muzîk û muzîknas, dengbêj û hunermendên kurdan de hêviyên te çi ne?*

– Pêşketina muzîka milerekî bi jiyana wî ya sosyal, aborî û siyasi ve girêdayî ye. Muzîka me ji aliyê çavkaniyêن xwe ve gelekî zengin e. Lê em ji van çavkaniyan istifade nakin, an jî em nikarin jê istifade bikin. Ev jî girêdayî jiyana me ya sosyal, aborî û siyasi ye. Gelek hunermendên me dixwazin herin li gundan bigerin û muzîka me ya otantîk derxin holê. Lê rewşê welêt dest nade. Ger insanên me di xema ruhê xwe de bin û di xema nanê xwe de bin, wê çi tesîra wî li ser muzîka wî hebe û çi tesîra muzîka wî li ser wî hebe? Tiştên ku ji ber van nexwesiyan difilite jî, li bazaar "Unkapani" tê firotin û herimandin. Tevî vê rewşa xerab jî muzîka me ji me

pêşdetir e. Bi taybetî li Kurdistana başûr ketiye warekî akademî. Pêwîst e hunermendêne me yên li Ewrûpayê dev ji dexesi û karyera xwe berdin û destêne xwe bidin hev. Dem dema ekîban e. Dema kolektîvbûnê ye. Divê tevgereke hunermendan ya li derveyî rîkxistinane were avakirin, bi hev re çalakiyan bikin, konseran li dar bixin, kaset û sêlikan derxin. Û ger bikaribin bi hev re kovareke hunerî û hebekî magazinî derxin. Muzîknas ew in ku gava berhemeke muzîkê derkete piyasê, ew jî bi pêñusa xwe tahlîla wê berhemê bike, ku xwediyê berhemê lezeteke din jê bigire. Carinan tahlîla berheman ji berheman xweştir e. Ev yeka ha jî hê min di nava me kurdan de nedîtiye.

*– Muzika te bi xwe?*

– Ez pêşıya xwe vekirî dibînim. Ez dixwazim muzîka do û ıro bi hev re bimeşînim. Belki ne xweş e, lê rastiya min ev e. Yanî aliyekî min Evdalê Zeynikê ye, aliye-kî min jî Millitano ye. Ez hêvidar im wê rojekê muzîknasên me cesaret bikin û ji bo raya kurdî tahlîla berheman bikin.

*– Civata kurdan di warê muzîkê de çawa ye?*

– Hunermend û civat dûrî hevdû ne. Ji ber vê yekê hevdû nas nakin. Salekê carêkê bi munasebeta Newrozê û çend caran bi munasbeta şevêne kulturî hevdû nas nakin. Em bi wê jî razî ne ger mirov bikaribe berheman pêşkêş bike. Gava guhdarênen me dengê tembûrê dibihîzin nikarin li cihêne xwe rûnêne. Ew tavilê radibin go-vendê digerînin. An jî ew rûdinîn û sohbetê dikan. Gundî, karker, entelektuel, sis-yasî hemî dikevin sohbetekê pirdeng. Li aliyekî din cirîda zarokan e.


Ez heyrana wî hunermendî bim ku ew têlêne tembûra xwe neqetîne û bernama xwe zû biqedîne(!).

*– Têkiliyên we hunermendan digel rîkxistinêne siyasî çawa ye?*

– Ger hunermendek di partiyekê de be û ji bo wê partiyê papagan be, borîzan be, di nezera wê partiyê de ew hunermendekî pir hêja ye. Dengê wî, tembûra wî gelekî xweş e. Te divê bila dengê wî weke ziqînya derî be. Ji aliye din ve, ew hunermend çiqasî xweş bibêje bila bibêje, ji bo partiyen din wek dengê tenekê ye. Ji xwe ne hunermend e. Di vê rewşê de ger alîkariya hunermendekî bikin mala wî dişewittînin. Heta hebe jê re dikan serhevdî. Wek meseleya "Deh pere û mîrikê cihû". Mîrikê cihû hemî malê xwe dayê, Hemowalîse hê digot "lê deh pere". Ma ne me alîkariya te kir?... Ew karê hunerî her gav dikare vala biçe.

Bi kurtî rîkxistinêne me di vî warî de gunehbar in. Hin parti hene hunermendan ceza dikan. Ne ji ber gotinêne wan. Yanî çîma weke wan nabêjin û nafikirin. Paşê ew mafê hunermendan nadîn wan. Ji bo şevêne xwe yên kulturî an jî ji bo Newrozan bang me dikan, lê em têr diçin û birçî vedigerin. Ez ci serê we biêşînim, gelek problemen weha hene. □

# NUHO AN JÎ KALO



ŞEREFXAN CİZİRİ

Dengbêjê hêja Bavê Kinê, Reşîtê Omerî xwedyiyê repretuareke fireh û piralî bû. Mirov dikarîbû ji gelek heremên welêt stran û epopan li ba Bavê Kinê bibîne. Wext dihat, Bavê Kinê muzîka govend û şâhiyan lêdixist. Wext dihat, qerf dikirin û mirov di-kenandin. Wext dihat, şerê di navbera aristokratên eşîrên kurdan de digotin. Li gorra civata ku ew lê dibû mîvan, daxwaziyêen guhdaran ji xwe re bingeh digirtin. Guhdar li ba Bavê Kinê pir bi qîmet bûn. Têkiliya (diyaloga) di navbera huner-mend û guhdaran de zêde baş bû û ewqasî ji têra xwe tije bû. Carna strana "Şeref-dînê Mîrê Mewaliyan", carna "Lê lê dînyayê", carna "Cembeliyê Mîrê Hekariyan", carna "Sekvanê Xuriki", carna "Sadûn Axayê Omerî", carna "Tajdîno", carna "Sa-lîslan Bavê Eli" carna "Hemê Gozê", carna "Çeto" carna "Nuho an jî Kalo" digot, erê mirov dikare vê lîstê pir dirêj bike. Lê ewqasî hewce nake. Dikarim bibê-jim ku Bavê Kinê deryaya hunerê bû. Wexta ku ew bi kemança xwe re dibû yet, roj dibû saet, saet dibûn deqîqe, deqîqe dibûn saniye. Di vê pevgirêdanê de, gotina wextê ji navberê dihate rakirin. Wext weke ava çemê Firatê diherikî û hemû kele-mên li ber xwe ji hevdû belawela dikirin. Wext, di sohbeta bavê Kinê de mîna bayê

kur bi lez dibuhurî. Di sala 1980 de, berî cûnta leşkerî li Tirkîyê, ez li Nisêbînê bû-bûm mîvan. Piştî çend salan li Swêdê min pir beriya welatê xwe kiribû. Zibêrê Evdela, (kesekî ji malbata axayên eşîra Omeriya ye û kurê meta min e), li ba min mîvan bû. Me bi hev re biryar da ku em şevekê bi Bavê Kinê re derbas bikin. Zibêrê Evdela di adînî rojê xebar şand ji Bavê Kinê re û ew jî ji nav herêma Omeriya hate civate me li Nisêbînê...

Reşîtê Omerî mirovekî dirêj, bi bejin û bal bû. Tiliyên wî ên ku li ser darikê kemançê dicûn û dihatin, wek mûman dirêj bûn. Ew tiliyên tenik û dirêj belkî mil-yon car li ser darikê kemançê çûbûn û hatibûn. Di tenikbûna tiliyên wî de hestêن hunermendiyê dida der. Di rûyê wî de pir qermîçonk hebûn. Di her qermîçonkê bi xwe de zanebûna salan kom kiribû. Ji qermîçonkan hunerekî kemîlî raber dida. Him di gewde û him jî di rabûn û rûniştina wî de, mirov dikarîbû li ba Bavê Kinê bi gelek awayan huner bidîta. Gelek caran tê gotin; "Her hunermend wek hunerê xwe ye." Lî di rastiya hunerî de, huner jî dişibiya hunermendê ku ew diafirand. Bi kurtî huner û hunermend hevdû temam dikirin, wek goşt û hestî bi hevdû ve gire-dayî bûn...

Bavê Kinê ber bi êvarî hate nav civata me. Civat tenê bi malbatî bû. Wek her gav hunermendê hêja li "cihê edebê" rûnişt. Di stran û epopén xwe de Reşîto gotina "cihê edebê" gelekî bi kar dianî. Gotina "cihê edebê" di eslê xwe de hiyerarşıya eşîrtî û kultura feodalî rave dikir. Bi kurtî di civata eşîrî û feodalî de herkes nikarîbû li her derê rûnişt. Cih hebû ji bona sermiyanê eşîrê bû, cih hebû ji bona mîvanan bû, cih hebû ji bona berdevkê sermiyanê eşîrê bû, cih hebû ji bona sermiyanê bavikan bû, cih hebû ji bona rîhsîpiyan bû, cih hebû ji bona xelkê bû, cih hebû ji bona xulaman bû, cih hebû ji bona naşîyan bû, cih hebû ji bona dengbêj û çîrokbejan bû û hwd. Hiyerarşıya cih an wek hiyerarşıya civatê bû. "Cihê edebê" ji bona her kesî eşkere bû. Herkes pêwîst bû li "cihê edeba xwe" rûnişt. Pergala civata eşîrtî wilo hatibû damezirandin.

Zibêrê Evdela gelekî hej strana "Nuho" an jî "Kalo" dikir. Di vê stranê de Zibêrê Evdela pir tişt ji jiyana xwe diditîn. Tifaq û hezjêkirina di navbera xal û xwarziyan de, yekitî û piştgirtiya wan di vê stranê de dihat zimên. Xal û xwarzetî ji pir aliyan de, bi mînakêñ pir zelal dihat xemilandin. Xal dihatin îdealîzêkirin. Di strana "Nuho" an jî "Kalo" de, jîyan û pratîka Zibêrê Evdela, li ber çavên wî ducar dibû. Kalo xalê Zibêrê Evdela tanî bîra wî û Nuho jî dibû ew bi xwe. Stran û jîyan, huner û realîta sosyal xwîn didan hevdû, hevdû geş dikirin û dibûn alîkarê hevdû. Mirovan jiyana xwe di huner de diditîn û jîyan bi xwe jî dibû huner...

Reşîtê Omerî hate cem me, li "cihê edebê" rûnişt û keysa xwe jî ji gotinê re xwes kir. Reşît bi hestekî xurt û bi kêfeke mezin hatîbî civata me. Hêdî hêdî û hûrik hûrik dest bi gotinê xwe ên hunerî kirin. Dengê Reşît bi atmosfer û herka stranan re xurt dibû û dikemîlî. Wek dîrokvanekî têgihiştî bûyerên sosyal li dûv hevdû radixistin û yet bi yet avaniya neqîsandina civata kurdan derdixist pêş. Wilo got;

"Ez Reşît im Bavê Kinê me  
Gurçika gê me  
Şairê dinyê me  
Ew ê ku min nahewîne mala xwe  
Ez bi zorê mîvanê wê malê me!"

Li welatê Hesenan û Heyderan dîsa çerxa dinyayê berûpaş dizîvîrî. Fitneyî ketibû nav eşîrên kurdan. Serriyanê Hesenan, Heyderan û Cibriyan bi navê Xalit Axa dîhat naskirin. Xalit Axa mirovekî degel û çavşor bû. Hemû tişt tenê li gora daxwazîyên xwe dimeşandin. Exlaqê eşîrtî avêtibû aliyekî û bi rêvebirîna eşîran jî tenê li gora kêfa xwe dimeşand. Ji her eşîrê jinek jî xwe re anîbû. Jinê herî bedew ên Xalit Axa bûn. Kengî bixwesta milkê hemû eşîran, Xalit Axa karîbû ji xwe re bibira. Dilê wî bibijiya kîjan jinê, qız an jî pireka zewîcî, ew bi zorê ji xwe re tanî. Xelit Axa zilamekî fenek bû û kesên wek xwe jî li dor xwe vehewandibûn. Serokê hemû fenek û keleşan, serxulamê Xalit Axa, mîrkuj, şêwirmend û cengawerê eşîrê jî Hemê Zerê bû. Di navbera Xalit Axa û Hemê Zerê de av nikarî bû derbas bûbûya...

Mirovan malê Xalit Axa bayêtana nav ava çeman, ew ê ava çeman biçikiya! Yanî Xalit Axa ewqas dewlemend û maldar bû. Xalit Axa fêris, box û beranên eşîrê li dor xwe vedihewandin. Bi van kesan zorbetî û xerabî bi eşîrê dikir. Fêris, box û beranen jî, ji bitiriya dinyayê gelek mekrohî dikirin. Dem zîvirî û derbas bû, sal bi dû hev de hatin, di navbera Xalit Axa û pismamê wî Nuho de fitneyî hate kirin. Di nava her du pismaman de nexweşî peyda bûbû û her du jî li ber hevdû û mahna bûn. Di dawiya dawî de, ji ber encamên pir hesanî Xalit Axa rabû berda Nuho û ew ji nava eşîrê qewirand. Norm û pîvanên eşîrê avêtin nav lingan. Hesenan, Heyderan û Cibriyan dengê xwe li dijî vê neheqiyê dernexistin. Nuho îcar mîrê bi tenê bû. Ew û darê rima xwe bûn. Nikarîbû berberî bi Xalit Axa û tevî eşîrê re, bi tenê bida meşandin. Xalit Axa hemû kes û malbatên eşîrê li dijî Nuho sor kiribûn. Nuho ji bêçaretiya xwe mecbûr ma, rabû mala xwe bar kir û çû konê xwe, qonaxekê durî ê Xalit Axa danî.

Çerxa cîhanê dîsa wek hercar dizîvirî. Bihar hatibû û dinya xweş bûbû. Du mîtirbê eşîrê li herêmê, ji xwe re li xelatan digerîyan. Serdana konê Nuho jî kirin. Nuho wek mirovîkî adil, pîr qedir û qîmet da van mitirban. Nuho û mevanê xwe heta berê sibehê lawje, şer û stranê kîf û evînê bi hevre gotin...

Xwişkeke Nuho hebû jê re digitin Gewre Xatûnê. Gewre Xatûnê qîzek bi ci awayî û bi ci terzî bû?

"Yeke anî bi deq û poz çelak e  
Yekê xemil datînê  
Paşîl tuştîrê û kemal keroşk e  
Bisk bi têlê û peşmal şînê  
Ser bi zérê û diran sedefê  
Kesî mirovê wilo nedîtine  
Zendik zer in koçerî ne  
Diran hûr in birincî ne  
Tu dibêjî; weke qeşayê di qirika wê de danîne  
Di nava serê wê de cil û şes kezî ne  
Tiliyên xwe ji mûm û şimayê birîne  
Siphân ji Xwedê re  
Tu dibêjî; newqa xwe ji keroşkê û çavêن xwe ji xezalê dizîne  
Xûrmîn dikeve toq û beniyan  
Şewq û şemala vê xezalê davêje çol û çiyan  
Davêje ser deryayê li ser pişta gamasiyan  
Tu dibêjî; Yarebî Xwedo!  
Ez bixwim û vexwim û li vê xîbsa xezalan bimeyzînim!"

Heta mirov dikare behs bike Gewre Xatûnê bedew bû. Ew kevoka ferxîn bû û ew xîbsa xezalan bû. Ew gulbarîn û lêvşekirî bû. Ew wek mîkewa li ser hêlinê bû. Bejna Gewre Xatûnê wek darê rimê zirav bû, newqa wê wek tayê rihanê bû. Wek şiveke hêzeran di nav avê de bû. Çavêن Gewre Xatûnê wek ên xezalan, wek libêن zeytûnan bûn. Gewre Xatûnê bi qasî bedewbûna xwe ji bi aqil û têgîhiştî bû. Di binê konê birayê xwe de pîrî caran bi tenê mabû. Wexta ku dengê kemança mitirba kir, hema bi dizîka çû aliyê oda mîvanan, li ser kursiyekî rûnişt û li mitirban guhdarî kir. Gewre Xatûnê bêdeng çûbû oda mîvanan. Li gora pîvanê eşîri Gewre Xatûnê nikarîbû li oda mîvanan rûnişta. Lê ew dîsa derbasî hundir bûbû. Wexta ku mitirb

çav li Gewre Xatûnê ketin; devê wan xwar bû, çavên wan beq bû û bi ser hev de şelişin. Nema zanîbûn ew ê ci bikin. Ji şashiya xwe kemança xwe berûpaş girtin, ji bedêla ku berbipêş li kemançê xînin, berbipâş dest pê kirin. Huner li vir betal bûbû û tenê çîzwîz ji kemança wan dihat. Nuho fêm kir ku li dora wî tiştek bütüye. Li dora xwe nerî û çavên wî li Gewre Xatûnê ket. Wê gavê fêm kir ku mitirbêñ me çima berûpaş li kemança xwe dixînin. Bi işaretekê piçûk ji Gewre Xatûnê re da fêm kirin ku ew divê derbasî aliyê malê bibe. Gewre Xatûnê derbasî aliyê malê bû. Piştî ku ew rabû, hêdî hêdî hişê mitirbêñ me dîsa hate serê van û wek hercar hunerê xwe bêqisûr berdewam kirin. Heta berê sibehê mitirban ji Nuho re lêxistin û stran gotin.

Di adinî rojê de Nuho gelek xelat dan mitirban. Nuho dixwast ku wana memnûn bike. Axayê ku têketa nava devê mitirban mala wî xerab dibû. Bi taybetî kesen xesis ji desten mitirban xelas nedibûn. Kesê ku mitirban bi başî behsa wan bikira ji, nav û dengê wan zû li odên ciwamîran belav dibû. Nuho ew yeka ha baş zanibû. Li gora kultura eşîri gerek axê tucaran dilê mitirbêñ xwe nehiştibana. Nuho ew adeta eşîri ji baş fêm kiribû.

Xweşikbûna Gewre Xatûnê hîn ji di dilê mitirban de mabû. Ji Nuho destûr xwestin ku herin xatûna xwe bibînin û ji bona pîrekên xwe hin xelatan bistînin. Nuho baş fêm kir ku mitirban biryara xwe dayê ku ew careke din Gewre Xatûnê bibînin. Hema wîna ji nemerdî nekir û got;

"Heçî hûn mitirb in, hûn ewladê eşîra me ne. De kerem bikin derbasî aliyê malê bibin."

Mitirb derbasî aliyê malê bûn û silav li Xatûna xwe kirin. Heta rojnîvro ji Gewre Xatûnê re lawje û stranên evîniyê gotin. Wek gayê ku li trênen binêre, li himberî hizn û cemala Gewre Xatûnê ew matmayî mabûn. Di dawî de xatir ji Xatûna xwe xwestin û têra pîrekên xwe ji xelat girtin. Lî ji hev re ji gotin;

"Xwedê teala diwazdeh xweşikbûn dane dinyayê, yazdeh ji vana danê Gewre Xatûnê û yet tenê ji li hemû qîzen dinyayê belav kiriye!"

Gera mitirban her berdewam bû. Konaxa ku wana nû berê xwe dabûne oda Xalit Axa li nava Hesenan, Heyderan û Cibriyan bû. Wek her gav oda Xalit Axa tije bû, fêris û egît, betil û pêhlewan li hev civiyabûn. Li dinyayê ci kêm û ci zêde ye, çerxa dinyayê çawa dizîvire, pêhlewan û fêris kî ne? Li ser wê yeka ha diaxivîn. Mitirbêñ eşîre ji li oda Xalit Axa li "cihe edebê" runiştin û dest bi hunerê xwe kirin...

Piştre gotin zivirî û hate ser xweşikbûn, qenciyê û xerabiyê... Mitirban behsa merdî, qencî û bedewbûna Gewre Xatûnê ji kirin. Hema heta ku ji wan dihat wes-

fê wê didan û qala edeb, aqil û marîfeta Gewre Xatûna dikirin. Gotinê wan zû bala Xalit Axa kişand. Gewre Xatûnê jê re bû kul û ket e dilê wî.

Pîrekên Xalit Axa di demên derbasbûyî de gelek caran dilê mitirbêñ eşirê hiştibûn. Kul û xezeba wan pir ketibû dilên mitirban. Fersend ji bo wan, ew fersend bû. Dest pê kirin li oda giştî, seba pîrekên Xalit Axa bikin.

Xalit Axa bi awayekî fedikoyî pirsa Gewre Xatûnê kir û got:

"Ma ew ê wilo jî li dinyayê hene? Na. Hûn mitirb jî ku we wesfêñ hinekan da, hûn wana dibin ber perê ezmanan. Na. Heger we seba wana kirin, hûn wana dixin bin heft tebeqê erdê, Xwedê mirovan ji we bisitîrîne".

Bi van gotinan, Xalit Axa dixwest ku ser meselê binixwimîne. Di baweriya Xalit Axa de ku mitirb dîsa hewedariyê dikin. Lê mitirban vê carê hewedarî nedikirin. Kêm gotibûn lê zêde ne gotibûn. Ji Xalit Axa re gotin; heger tu jî me yeqîn nakî, here ji pismamîn xwe Nuho bipirse. Gewre Xatûnê xwişka Nuho ye.

Xalit Axa heta niha nebihîstibû ku tu xwişkêñ Nuho hene. Ne tenê Xalit Axa, hin zilaman jî nizanîbû ku xwişka Nuho heye. Li ser hebûn û nebûna Gewre Xatûnê pir gotin hatin kirin. Di dawî de Hemê Zerê gotina xwe li serê derziyê xist û ji Xalit Axa re got; ew tibabeke ku te û Nuho we hevdû nedîtiye. Bişîne dû pismamî xwe û jê re bibêje ku te bêriya wî kiriye. Ji Nuho re bibêje; aliyekî porê te qusandî be û aliyê din jî ne qusandî be, ecele bike were. Nuho mirovekî diltenike, ew ê gotina te neşîkîne û zû bê. Heger ew hate vê derê û ku mesele jî rast be, piştî ku ji hespê xwe daket em ê serê wî jêkin û Gewre Xatûnê jî li te mehr bikin. Lê ku ji hespa xwe danekeve, kesek nikare tiştekî ji Nuho bike. Îcar tu jî heta ku ji destê te bê wîna ji hespê daxîne û dûra jî karê te xelas dibe...

Civatê şêwra xwe kirin yek. Du siwar şandin dû Nuho. Piştî demekê siwar gihan bin konê Nuho. Gotina xwe jê re gotin û zû vegeleyan bin konê Xalit Axa. Nuho di dilê xwe de got ku; îcar pismamî min li min hâtiye rehmê, ez divê herim cem û dûv re jî li nava eşîra xwe û çûnê kir. Hespê xwe kar kir. Li ber kon kir ku lê siwar bibe; Dî wê nave re Gewre Xatûnê pêjna tiştinan kiribû. Berî ku Nuho bimeşe, Gewre Xatûnê xwest ku bi birayê xwe re biaxive. Nuho li ser pişta hespê xwe, li xwişka xwe guhdarî dikir. Gewre Xatûnê got:

"Birayê mino, çavê mino. Mebêje xwişka min pîreke û tişta nizane. Berî ku tu here gotineke min bi tere heye. Xalit Axa zilamekî bêbext e. Gelek egîtên weke te bi bêbextî kuştine. Heger ku tu li ber devê konê Xalit Axa ji hespê xwe dakevî, ew ê bêbextiyê li te bikin. Here birayê mino here, lê ji hespê xwe danekeve û li bin konê Xalit Axa jî ranckeve."

Gotinêن Gewre Xatûnê ketin kerika guhê Nuho, wî lingêن xwe li zikê hespê dan û weke bayê bakur ji ba Gewre Xatûnê winda bû.

Navê hespê Nuho Zerdiko bû. Ji roja ku ji dayîka xwe bûbû, Zerdiko bi cehê kutayî, genim û kizinan hatibû xwedî kirin. Zerdiko hespekî esîl bû. Ji Nuho û pêde kes nikarîbû lê siwarbihata. Wek ba dibeziya. Di bezê de hevalê teyrik û tilûrên ku difiriyân bû. Heta ku mirov çavên xwe girt û vekir, Zerdiko giha deriyê konê Xalit Axa. Xulaman hespê Nuho girtin û Xalit Axa jî pêrgî wî de çû. Pişti silav, kilam û bi xêrhatinê, Xalit Axa xwest ku Nuho ji hespê dakeve û bê li bin konê wî rûnê. Nuho û Xalit Axa bîstikekê li ber hev dan. Lê Nuho ji hespa xwe daneket. Gotinêن Gewre Xatûnê di bîra wî de bûn. Nuho got: pisman, ez ji Zerdiko dana-kevim erdê. Heger hewcedariya te bi malê dînyayê hebe, malê min malê te ye. Heger pere û zêr ji te re lazim bin, dîsa ez ji te re amade me. Na, heger tu li min hatiyî xezebê, tu pismamê min ê mezin î, vaye şûrê te û vayê serê min. Ez rîzana eşîrê qebûl dikim. Fermo! Ya na zû mesela xwe ji min re bibêje, ka derdê te çi ye? Ez divê ecele vejerim ser mal û milkê xwe. İro Xwedê neke, heger hinek bênen talanê min bibin, wê çaxê him ji te re û him jî ji min re, dibe kêmasyiek mezin. Vêca derdê xwe zû ji min ra bibêje... Xalit Axa fêm kir ku Nuho ji hespê xwe danakeve. Mesele bi kurtî jê re got:

- Min bihîstiye ku xwişkek te heye, rast e an na?
- Erê, rast e.
- Ma xwişka te xweşik e, baş e, çawa ye?
- Îdare ye. Qîzêن Axa çawa bin jî, di stûwê wan de namînin.

Dilê Xalit Axa bi vê bersivê hênik nebûbû.

- Ciwamêr, baş jî birayén pisan e, de ka ji min re bibêje bê ew çiqasî xweşik e? Nuho hebekî bêyi dilê xwe û hinekî jî bi hêrs got;
- Ciwamêr, heta tu bixwazî xweşik e, wek wê li vê dînyaya gewrik kesek tuneye, lê ez nizanim bê ka derdê te çi ye?

Xalit Axa lê vejerand û got;

- Derdê min ew e; de ka vegere mala xwe, dest û lingêن Gewre Xatûnê hine bîke, çek û xemla wê lêke û wê ji min re bişîne.

Nuho bi carekê ve sar bû. Bi hêrs:

- Ev tiştên ku tu dibêjî ne kwîran dîtiye û ne jî keran bihîstiye. Vê yeka ha kesen tiredîn jî naecibînin. Ew ne li gora adetên me eşiran e. Heger tu Gewre Xatûnê dixwazî, dotmama te ye, were weke adetê wêna bixwaze. Em ê jî dest û lingên wê hine bikin, xemla wê lêkin û ji te re bikin bûk. Tu çima bi tiştên beredayî daw di-

ke? Tu çima gamêşan li pêşîyan diqelibînî?

Piştî van gotinan, Xalit Axa nerehetiya xwe anî zimên û bi carekê ve got;

– Ez nikarim wilo bikim, serê ku neêse pêwîst nake mirov destmalê lê girêde? Min ji te re got ku here û Gewre Xatûnê ji min re bişîne. Ez Gewrê Xatûnê niha dixwazim. Nuho bi dû ku hinekî sekinî, got:

– Ewa ku tu dibêjî zor e.

Xalit Axa di bersiva wî de bi zimanekî nexweş:

– Zor yan na, divê tu vêna wilo bikî...

Wexta ku mesele dibe darê zorê, Nuho edeb, qedir û qâmet datîne aliyekî. Dinya îcar serûbinî bûbû. Rêzana hemû tiştan xerab bûbû. Neheqî bi ser heqiyê ketibû. Piraniyê zora meraniyê bîribû. Nuho xezeba xwe komî ser hev kir û bîryara xwe ya dawiyê da. Çavêن wî sor bûbûn, ava reş bi ser çavêن wî de hatibû xwar, tevzinok bi laşê wî ve hilkîsiya bûn, weke gayekî ku şerab vexwaribe, dest bi pîkolê kiribû... Hema bi carekê ve li Xalit Axa vege riya û jê re bi zimanekî hişk got:

– Heger tu serê min jênekî, malên min mîrate nekî, mal û milkê min li eşîrê belav nekî, heger tu Gewre Xatûnê bi darê zorê li xwe mehr nekî, ez wiha wiha bi her sê jînê te bikim...

Ew gorina wî a dawî bû. Nuho gotina xwe got û lingêن xwe li zikê Zerdiko xis-tin û weke ba ji ber çavêن wan winda bû. Xalit Axa bang xulam û xizmerkaran kir ku Nuho bigirin. Lé awana berê qewle xwe kiribû. Kesî xwe ji cih nelivand. Hemê Zerê ji Xalit Axa re got;

”Ciwanî, mîrik Gewre Xatûnê bi xweşikayî da te, lê belê te xwest ku tu bi darê zorê daxwaziya xwe bi cih bîne. De îcar mîrê çê be û meselê hal bike...“

Xalit Axa dengê xwe bi dû Nuho de bilind kir û jê re got;

”Ez ji niha û pê de te ji nava hemû tixûbêñ eşîrê diqewîrînim û de here cehene-mê, bila îcar çavêن min tuçarî nema rûyê te bibînin...“

Dengê Xalit Axa gîha Nuho, wî jî hespê xwe da sekinandin û ji Xalit Axa re bi zimanekî nerm:

”Ciwanî, heger te ji serî de wilo gotiba, hewce nedikir ku me ew gotinêñ bêrê bidana rûyê hev û me hevdû bişkenanda. Ez ê ji welatê Hesenan, Heyderan û Cib-riyan derkevîm û herim devere kî ku tu qet nizanîbî ew derê kuderê ye.“

Pişt re jî Nuho zû ji ber çavêن wan winda bû...

Nuho bar kir. Piştî çend şev û çend rojan ew gîhaştin mîrga Xîrbêzil. Xîrbêzil li bîniya çiyayê Omeriyan li deşta Nisebînê bû. Derdora Xîrbêzil hemû şînahî bû. Mîrga Xîrbêzil tije gîha, hindeko, gul û nefel bû. Ava çemê Serêkaniya Omeriyan

jî, di ber Xirbêzil re derbas dibû. Nuho konê xwe yê çardeh stûnî li vir danî, ala şer di konê xwe de çikiland û heywanên xwe jî berdan nav mîrgê. Bi kurtî, Nuho ti-babekî li nav mîrga Xirbêzil ma. Dem hatin û çûn. Rojekê ji rojan ticarêن berxan hatin bin konê Nuho. Nêzîka şest berxên neqandî ji Nuho kirîn. Berxên Nuho de-qandî bûn. Ew li hemû welatê Hesenan, Heyderan û Cibriyan dihatin nas kirin. Ev kesên ticar di dawî de çûne bin konê Xalit Axa ku jê jî berxan bikirin. Xalit Axa xwediyê bi kerian pez bû. Xalit Axa berxên Nuho nas kirin û ji ticaran daxwaz kir ku jê re bibêjin ka ew berxên kî ne û wan ew ji kuderê kirîne. Bi bertîl û tirsê Xalit Axa cih û warê Nuho fêr bû...

Xalit Axa hema piştî kirîn û firotina berxan karê xwe û şer kir. Delêlî berdan na-va eşîrê û got;

"Em ê herin serê Nuho jêkin, malê wî mirate bikin û li eşîrê belav bikin, Gewre Xatûnê bi darê zorê ji Xalit Axa re bînin bin kon û bikin bûk..."

Xalit Nuho Kalo jî bi vê yekê hisiya. Kalo bi rastî kal bû, bi nav sala de çûbû. Ne-ma wek zemanê berê şer û ceng jê dihat. Pîreka wî Mîrê Xatûnê dest pê kir û nav di Kalo da;

"Kalo, guhê te bi guharo, serê te bi şaro, de rabe di hewara xwarziyê xwe de here. Nuho niha bi tenê ye."

Lê belê Kalo zû bi zû xwe neda ber barê xwe. Lê Mîrê Xatûnê gotina dawî jê re got; "Ya tu ê herî alîkariya xwarziyê xwe, yan jî ez ê nema ji te re bibim jin."

Mîrê Xatûnê Kalo li şer sor kir. Kalê bi temberî, bavê Hesen û Hisêñ jî, di dawî de bi ser xwe ve hat û germ bû...

Kalo pêşî xwe ediland û dûv re jî çû oda Xalit Axa. Cengawer û pêhlewanên Xa-lit Axa hemû li odê civiya bûn. Şêwr û müşêwra xwe datanîn. Kalê cindî xwediyê pîlanen hûr û kûr bû. Ji civata Xalit Axa re wiha got;

"EZ jî yek ji we me, hûn dizanin ku Nuho xwarziyê min e. Tenê daxwaziyek min ji we heye; gava ku we serê Nuho jêkir, malê wî mîrate kir û Gewre Xatûnê ji Xalit Axa re anî, ez jî dixwazim ku hûn Hespê Nuho, Zerdiko bidin min. Zerdiko zaro-ka mihîna min a Qemerê ye. Qemerê wek min bi nav salan de çûye, nema bikêri şeran te. Ez tenê Zerdiko ji we dixwazim, wekî din malê Nuho hemû ji we re..."

Xalit Axa daxwaziya Kalê cindî qebûl kir û Kalo jî kete nav refêñ şervanan...

Piştî çend şev û çend rojan, Xalit Axa û hezar û hefsed siwarêñ Hesenan, Heyde-ran û Cibriyan, nîvê şevekê li derdora mîrga Xirbêzil konê xwe vegirtin. Nîvê şevê ye, şev tarî ye, hin dibêjin; "Em ê nuha bigrin ser konê wî" Hin dibêjin; "Ew dik-a-re ne bi tenê be." Hemû kes fîkrêñ xwe dibêjin. Kalo jî pîlanen xwe li dar dixe. Ka-

lo got; "Em nikarin hema wilo zû herin û bigirin ser konê Nuho. Nuho mêtxasekî mezin e, ew tucarî bi tenê namîne. Em divê bimînin heta sibehê, heger mêtvanen Nuho hebin, ji xwe mêtvanen mezin tucarî li bendî taştê namînin. Ew ê zû herin. Na heger li ba wî tu kes mêtvan tunebin, wê gavê em ê bi rehetü Nuho bigirin û wî bikujin."

Gelek mirov, pişti çend roj rêuwiyyê westiya bûn, ew ji hal de ketibûn û qewet di wan de nemabû. Ji ber vê yekê pir kesan xwestin ku bi a Kalo bikin. Xalit Axa biryar da ku, ew divê bimînin heta sibehê. Şervan westiya bûn. Li gora wî Kalo rast digot. Şervan hemû ketin erdê, xwe li ser mêtgerê dirêj kirin û zû raketin. Kalo rahişt kurk û abayê xwe û çû li devê deriyê konê Nuho xwe dirêj kir...

Hespê Nuho Zerdiko, gelekî hîrehîr dîkir. Zerdiko dixwest ku qeydên xwe bîşkîne. Ji ber ku bêhna diya xwe Qemerê kiribû. Hîrehîr û keft û lepta Zerdiko, Gewre Xatûnê ji xewê şiyar kir. Gewrê derketê devê deriyê kon, dît ku bi hezaran hesp li dora konê wan in. Li ser darêñ rimên şervanan çûkên şevê dixwendin. Dê weledê xwe avetibûn. Gewre Xatûnê xalê xwe Kalo jî li devê deriyê kon dît û şaş bû. Bicarekê re jê re got; waweylê, ma ew ci ye xalo! Ev hemû kî ne, dawa wan ci ye?.. Kalo bi kurtî ji Gewrê re got;

"Em hemû xêliyên te ne. Em hatinê te ji Xalit Axa re bi darê zorê bibin û serê Nuho jêkin, malê wî jî mirate bikin û li eşirê belav bikin..."

Piştî hin gotin û lavlavan, Kalo mesele bi dirêjayî ji Gewrê re got; "Metirse ez xalê te me û ez li pişta Nuho me. Ji ber wilo ez hatime û ez hevalê xwarziyê xwe me. De here Nuho ji xewê şiyar bike, bila ew ji karê xwe û cengê bike. Tu jî here du çewal pişkulê devan deyne û çend baqê qırşan ji bavêje ser, dohnê gazê berde ser û agir berdêyê û bike ku virîna agir di ezmana re derkeve. Hawinê vala û mitik deyne ber xwe û bikute, çing û hey çing... Heta ku li me bû sibeh, wê çaxê Xwedê mezin e. Heger ku dîsa ranebûn, dîsa Xwedê mezin e..."

Gewrê çû binê kon, weke ku xalê wê jê re gotibû kir. Nuho ji xewê şiyar kir û mesele jê re got. Dûv re agirek dada ku virîna wî di ezmana re derkeve û hawin û mitkê vala danî ber xwe, çing û hey çing...

Deng çû Kalo û wî jî got; heyla ez bi qurbanê, ev şîretên xalo ne...

Kalo bangî Xalit Axa kir. Xalit Axa ji xewê rabû ser xwe û agir dît. Kalo hema wê gavê jê re got; ma min ji te re ne got ku binê konê wî tije ye. Belkî dehhezar siwarîn cengê dîbin kon de hene. Vêca divê em heta ro bê bêriya, bisekinin û piştî ku mêtvanen wî çûn, em ê dûra bigirin ser konê wî. Xalit Axa dîsa bi a kalo kir û ferman da ku heta ro bê bêriya kes ji xewê şiyar nebe...

Di vê navberê de Nuho Zerdiko ji şer re hazır kiribû. Zerdiko di cihê xwe de keft û lept dikir û xwe ji şer re hazır dikir. Nuho hespê xwe ji bona şer diediland û zînê Entabî li ser pişta wê dikir. Hema di wê gavê de jî rahişt şûr û mertalê xwe û wê gavê, bêhna şer kete pozê wî. Xwîna wî içar germ digeriya. Nuho rima xwe a du mofik jî di teniştâ şûr mertal de danî. Bi biriqandina royê re Nuho lingên xwe xis-tin pela Zerdiko û lê siwar bû. Nuho xwe berda meydana cengê. Di vê cengê de mirin hebû, tirs hebû lêbelê li dijî neheqiyêن bi serketin jî hebû. Nuho bi roniya royê re kete nava Hesenan, Heyderan û Cibriyan di xewê de. Du kemînê Hesenan, Heyderan û Cibriyan di xewê de kuştin û şervan jî içar hêdî hêdî bi xwe dihi-siyan. Êrişa Nuho ji nişkekê ve hatibû. Ewêن ku ji ber vê êrişê şelişibûn, ewêن ku hîna nîvxewî bûn, ewêن ku digot hacûc û macûc hatine talanêن me, xwe zû dane ser hevdû û bi carekê re hemû li ser serê Nuho bûne yek. Weke ku Bavê Kinê, Re-şîte Omerî jî dibêje; li ser serê Nuho qal û ceng bû. Meydana şer bûbû weke derya-ya bêbinî...

"Yêن bi çek û bi destê vala.

Tevî şivan û gavanan.

Li ser serê Nuho Ferman e".

Ere li ser serê Nuha bi rastî bûbû terpitoz û ferman...

Kalo dîsa pîlanêن xwe hûr li darxistin; Ji Hesenan, Heyderan û Cibriyan re bi zi-manekî xweş axivî; em hemû mîrov, pîşman û xwarziyêن hev in. Tu derdê eşîrê bi hevdû re tuneye. Nuho û Xalit Axa pîsmamê hev in, ka bila ew her du tenê bi hevdû re şer bikin. Ez û Hemê Zerê jî li hevdû. Vaye şûrê min û waye rima Hemê Ze-re. Kî zora kê bibe ewê yên din bibin mezinê hemû eşîrê. Ma wê çîma xelkên bêgu-neh bêne kuştin?.. Gotin geriya, bû xilbexilb, şêwir hatin danîn û di dawî de jî go-tina Kalo hate qebûlkirin.

Li meydana cengê Nuho û Xalit Axa, Kalo û Hemê Zerê ketin pêxêla hevdû. Kesî ji eşîrê navbendi nekir. Qewlê wana wiло bû. Di wî şerî de şûr û mertal, rim, gurz, destlepik û hwd, hatin bikaranîn. Şer gelekî dirêj bû lêbelê ez bi xwe naxwa-zim meselê li vir dirêj bikim. Nuho zora Xalit Axa bir û Kalo jî zora Hemê Zerê bir. Eşîran şêwra xwe kirin yek û ji hev re gotin:

"Kî ji we xurt be em raya te we ne, ma ya me ci ye?". Riya serokatiya eşîrê ji Nu-ho re nû vedibû. Ji bona ku aşitî pek bê, Kalo Gewre Xatûnê li lawê xwe Hisêyn mehr kir. Malê Xalit Axa li nava eşîrê belav kir. Pîrekên Hemê Zerê li xwe û yên Xalit Axa jî li Nuho mehr kirin. Nuho piştî vê bûyerê bû sermiyanê her sê refen

esîran. Hemê Zerê û Xalit Axa neheq bûn, çavşor bûn, bê exlaq bûn, kêtî bûn û li ser vê riyê jî çûn dinyaya gewrik. Şerê Nuho an jî Kalo bi wî awayî dawî lehat...

Di dema eşîrtî de stran û epopên popûler, ji bûyerên ku pergala eşîre xerab kiri-ne dest pê dike. Destpêka bûyera li ser xerabkirina rêzana eşîri avadibe û eşîran jî, ji adet û toreya xwe hêdî hêdî bi dûr dixînê. Ew ji pergala xwe bidûrkîtin, dikare di mijara jinan de, li ser mal û milkê dinyayê, li ser çavşorîyê, li ser neheqiyê, li ser na-kokiyên dînî, li ser heyfê û hwd. dest pê dike. Stran û epopên kevnare qîmetê de-ma xwe û demêñ ku bihûribûn tanîn zimêñ. Di rastiya xwe de ew nakokiyên han hemû jî politîk bûn.

Ew bûyer û stran dikarin bi hêsanî bibin senaryoyek ji filîmekî re, dikarin bibin romanek fireh li ser civata eşîriya kurdan... Tiştekî din heye ku divê ji mirovan re pir eşkere be. Di edebiyata devkî ya xelkê kurd de, tîpêñ civatî kesêñ pir xurt in. Him karekterên xerab him jî karakterên baş, xwedîyê desthilatdariyeke kesîn e. Struktura(avahiya) civata eşîri tê dide van tîpêñ xurt ku derkevin pêş. Tîpêñ xerab, xerabêñ xeraban e, tîpêñ baş jî başêñ başan e. Di edebiyata devkî de qarekterên zeif tune ne. Heger hebin jî, ew rolêñ sereke nalîzin. Helbet xerabî û başî li gora civatêñ berbiçav têne guhertin. Di civata eşîri û feodal de û di civatêñ kapîtalîstî de, pi-vanêñ xerabî û başiyê ne weke hevdû ne. Li gora exlaqê eşîri Nuho him başiyê tem-sîl dike û him jî di dawa xwe de heq e. Dîsa li gora exlaqê eşîri Xalit Axa xerabiyê dike û neheq e. Li vê derê mirovekî xerab bûye serokê eşîrê, ew serok jî divê li gora pi-vanêñ exlaqê eşîri bê guhertin. Xalit Axa bêbext e, normêñ eşîri avetîne nav lin-gêñ xwe, di desthilatdariya Xalit Axa de tirs heye. Xalît Axa, ji bona kêfa xwe a şex-şî, tore û adetêñ eşîra xwe anîye pênc peran û hwd.

Kalo jî di vê bûyerê de tîpekî enteresan e. Kalo di rastiya xwe de ji derb ketiye. Ew nema kare şeran bike û civatan bizîvirîne, tevgeran lidarxîne û serokatiyê bike. Di dema şer de serokatiya eşîran divabû ji hêla fizîkî de hinekî li ser xwe bana. Kalo bi nav salan de çûbû. Kalo xwedîyê tecrûban bû. Aqil û zanabûna Kalo, bi mîrxasî û hêza Nuho re dibe yok û biserdikeve.

Li aliyê din Kalo weke serokekî ku li pişta perdeyê û ne xuyayıye xwe dilivîne. Şer û bûyer li gora pîlanêñ Kalo dimeşin. Kalo him li meydana şer û civatê ye him jî veşartî tevgerê dike. Kalê zemanan bi rastî weke rejisorekî di filîmekî de, di vê bûyera Nuho û Xalit Axa de tevger kiriye. Ev rastî nîşanî mirov dide, ku di bin hiş-mendiya civata kurdan ya eşîri de, hergav kalekî zemanan heye. Ev kalê zemanan, wexta ku rêzana eşîri xerab dibe û eşîr ber bi tunebûnê de diçe, derdikeve nav civa-tê û rêzana eşîriyê jî nû ve tekûz dike. Di civata eşîri ya kurdan de mirovan hîna jî

ev hêviya xwe tucaran winda nekirine. Hergav bawer kirine ku wê hin kes, eşîrê ji nû ve li ser hevdû kom bikin. Ev kes, kesên îdealîzekirî nê. Di dema xerabûnê û paşveçûnê de, hêviya eşîran hergav zindî maye û li benda kalekî an jî xortekî zemana ye. Hêviya ku eşîra van mirovan careke din li hevdû vegere, tucaran zû bi zû namire. Ev hêviya xurt, eşîran hergav konservatîf dike. Wan xweparez dike. Avaniya eşîrî hîna xurtir dibe û ew bi wî awayî jî mekanîzmên xwe ên parastinê derdixînin pêş. Ev hêviya ku ewê eşîr careke din li xwe vegere, di nav hişmendiya eşîrên kurdan de mexel ketiye, teh daye û cih girtiyê. Di vê pevgirêdana kultûrî û civakî de, kal an jî xortêñ zemanan dibin weke garantiya bext, tore û exlaqê baş di nava eşîrên kurdan de. Kal û xortêñ zemanan dibin weke sîgorta ji bona civata eşîrî.

Ji aliyê din de jî tiştekî din heye. Di bûyer û strana Nuho an jî Kalo de, rastiyek sosyal heye ku dikare gelek caran ji ber çavan winda bibe. Di edebiyata devkî ya kurdan de, xerabî bi xwe ji nava refîn eşîrê derdikevin. Serdest û arîstokratêñ eşîran, ji hêla exlaq û îdeolojî, qîmet û praktilka sosyal de, hemû weke hevdû tevgerê dîkin. Nakokiyêñ di navbera arîstokratan de li ser bûyer û praktilkêñ xuyayî derdikevin meydanê. Li vir ne tenê nakokiyêñ çînayeti, lêbelê nakokiyêñ kesayeti, malbatî, pîvanêñ exlaqî, çavşorî, dilketin û danûstandinêñ bi pîrekan re û hwd. dikarin rolêñ sereke bilizin. Bi kurtî, sitîla birêvebirana eşîran jî geleki girîng e. Nuho û Xalit Axa pismamêñ hevdû ne. Nakokiya di navbera wan de li ser çewtiyêñ Xalit Axa dest pê dike. Koka nakokiyê ji nav malbata wan derdikeve. Helbet kesên ku fitneyê jî dîkin di nava eşîrê de hene. Ew jî rola xwe dilizin. Lê kirin û daxwaziyêñ Xalit Axa jî qet nayêne xwarin. Ewê ku li gora şerefa eşîretî tevgerê bike, nikare kirin û daxwaziyêñ Xalit Axa qebûl bikin.

Di vê bûyer û stranê de nakokiyêñ sosyal, ne di navbera çîna arîstokrat û çîna xulaman de ye. Nakokî di nav arîstokratan bi xwe de ye. Şer, şerê wan û xulam jî tenê alîkariyê dîkin. Hişmendiya çînayeti hîna li vir pêş de neketiye, çînêñ sosyal hîna jî hevdû baş venegetiyane. Hişmendî, di vê pevgirêdana berbiçav de, ne hişmendiya çînayetiye, lêbelê hişmendiya eşîrî ye. Lê dîsa jî heger mirov bê alî li mese-lê meyze bike û wijdanê xwe jî xerab neke, divê mirov di vê pevgirêdanê de bibê dilxwazê Nuho. Çima? Ji ber ku Nuho mezlûm e û Xalit Axa jî çavşor e. Ji ber ku Nuho mîrxas e û Xalit Axa jî fenek e. Sixletêñ Nuho sixletêñ başiyê ne û sixletêñ Xalit Axa jî, sixletêñ mekrohiyê, xerabiyê û çavşoriyê ne. Divê li gora sixletêñ mirovan, huner jî bîryara xwe ya rûspîkirinê an jî ya rûreşkirinê bide. Ji ber wilo jî, di vê Xalit Axa ji aliyê huner de bê mehkûmkirin. Hunermendê me Reşîtê Omerî, Bavê Kinê jî di hûnandina bûyeran de, vê xetê dide meşandin. Hunermend, cihê xwe li

ba kesên ku sixletên van baş in digire. Bi kurtî, heger tekoşîn ne li ser hîmê çînayetiyê jî bimeşe, di vê huner dîsa cihê xwe baş diyar bike. Ji ber ku huner divê ji aliyê sosyal de, hunerbûna xwe nîşan bide. Ji xwe hunerbûna sosyal jî di vê yekê de veschartiye. Realîzma hunerî di vê mijarê de kom bûye. Ma hunerê ku nikaribe li ba mezlûman û li ba sixletên baş cihê xwe bigre, bi rastî ka hunerî di kuderê wî de ye?

Di edebiyata devkî ya xelkê kurd de, rola jinêñ kurd piraniya caran gelekî zelal tê hûnandin. Di edebiyata xelkê de jin, ne weke ku tê gotin tenê darê şikestî ne. Jin hergav kaniya moral in. Ewa ku mîrxasiya zilaman jî derdixe pêş dîsa jin e. Jin weke ku pir caran tê gotin tenê ne pepûk e, ne reben e, ne evdal e. Di strana Nuho de Gewre Xatûnê ne pepûk e, di strana Sekvanê Xurikî de Qumrî Xatûnê ne reben e, Seyrê Xatûn ne evdal e, di şerê Hemê Gozê de, diya Hemo ne şikestiye, di strana Medîna mala Melê de, Medîna li hemberî kevneperestiya dinî tekoşîn daye. Di strana Derwêşê Evdê de, Adle, ku qîza Temir Paşayê Mili ye, li dijî pîvanêñ serdestêñ demê derketiye û lawikê Yezidî ji xwe re neqandiye û hwd. Her çiqas ev kesên ku me li vir anîn zimêñ, jinêñ aristokrat û serdestan bin jî, dîsa ew jî aliyê dîrokî de, ji bo nasnameya netewî ya pîrekên kurd, karin mînakêñ pozîtîf ava bikin.

Li vir tenê dixwazim balê bikşînim ser nasnameya netewî û gelî. Nasnameya jî-nêñ zehmetkêş mijareke din e. Lê tiştek jî divê ji mirovêñ kurd re pir eşkere be: Ew kesên ku hayê wan jî kultura civata kurdan tune be, bawer dikin ku jina kurd hergav kole bûye, hergav reben bûye û şikestî maye. Lê di rastiyê de ew ne dîtineke dîrokî ye, lêbele dîtineke ketûberî ye. Ewêñ ku nîşanê baş nizanîbin, gelek tifingan vala berdidin. Keşen ku nîşanê baş ditefsilînin tifingêñ vala bernadin. Bi raya min ew ditîn ji rastiya dîroka civata kurdan pir dûr e. Ev dîtin nihîlist e, nezan e, qure ye û tifingêñ vala berdide!... □

# "KURDISTANA ENFALKIRÎ DÎSAN TÊ ENFALKIRIN!"

*Ta wek agirê bin kayê bin di gel yêk  
Eger lehi be leşkerê we, bi qirşek*

Hacî Qadirê Koyî



XELİL DUHOKİ

**E**bdula Pêşew, di nav texa hejar û tepeseran de mezin bûye. Lewre jî ew bi hemî hêz û şıyanên xwe berevaniyê ji mafêن wan re dike. Ew bihayê aza-diyê dizane, ji ber vê jî li dij dijminan dixebite û he-wil dide ku pîlanên wan têk bide.

Belê, ew helbestvanekî kurdperwer e. Armanca wî ya herî girîng, serbestiya gelê kurd e û rizgarkirina Kurdistana dagîrkirî ye. Vê armancê hemû aliyên jiyana wî dorpêç kiriye. Lê dema mirov helbestên wî yên kevin û xortaniyê dixwîne, xuya dibe ku, ew di derya çavêن şoxekê de xeniqiye. Di evîna xwe de bi ser neketiye, bêhêvî bûye û birînên kûr di laşê wî de vebûne. Dr. Marif Xeznedar dibêje:

- Resenayetiya Pêşewî di hindê de ye ku, wî bi evîniyê dest bi vêhandina helbestan kiriye, çimki jiyana bi evînê dest pê dike. Paşî hizirkirin di bûnê de peyda dibe. An-go felsefe û paşê jî hizir û giyana netewayetî. Di qonaxeka diyarîkirî de, ev netewa-yetiye, evînî û hizirkirina di bûnê de, digirîte xwe û hunermendê serketî ew kese ku, evînê û felsefê di gel armancê netewayetî de biguncîne. Pêşew yek ji wan hel-

*bestvana ye.<sup>(1)</sup>*

Erê piştî ku gula evîna wî diçirmise, êdî hemî evîn û dilovaniya xwe, ji bo gelê kurd û texa hejaran terxan dike. Ew zû ji welatê xwe derdikeye, derbeder û mişextî welatên biyanî dibe. Hema ji têgehiştina xwe û heta nuha jî, li xerîbiyê dijî, lê welat herdem di nav xwîna wî de bûye.

Helbest li cem Pêşew, berî her tiştî, helwêst e. Ew bi rêya helbestê, dixwaze gelê xwe hişyar bike û li dij kêmâsi û astengan jî bipeyive û xelkê pal de ber bi serhildan û xwepêşandanê. Ew bi hemû hêz peyama xwe digehîne xelkê. Ew helbestê dike nan û av. Dike azadî û xweragirtin. Dike xebata germ û pêşveçûn. Ew pênuşa xwe tûj dike û peyvan dike fişek û bi nav çavên dijminan ve datîne. Ew heta set hestikên xwe girêdayî doza pîroz ya gelê kurd e. Helbestên wî bi xem, azar û nalînên xelkê kurd ve xemilandîne. Dr. Marif Xeznedar dibêje:

- Her mirov çêja nav derûna xwe di helbestên wî de dibîne. Hemû kurde hêviyên xwe tê de peyda dikan. Xudîkek e ku hejar û bêxwedî eş û azarên xwe tê de dibînin.<sup>(2)</sup>

Pêşew, xoştiviye û ji mêt ve cihê xwe di dilê gelê kurd de girtiye. Ew bi helbestên xwe, herdem di senger û çeperên kurdøyetiyyê de bûye. Lewre jî, helbestvan û rexnegirê Îranî yê bi nav û deng, Seyid Elî Salih, di lêkolîneke xwe de husan pesnê Pêşew dide û helbestên wî disengîne:

- Pêşew dizane ku helbest rengdana paqîjî û dilsojiya zarokane ye. Helbestên wî şêweyeke din ya giftûgoya mirovane ye ku di axiftin û diyaloga rojane de heye. Ew bi tenê perdê ji ser ruhê veşartî ya hest û atîfê ladide, bi rengekî wisan ku piştî xwendina helbestan, tu wilo dizanî ku tu jî, vê sozê, vî hestî, vê dîmen, derbirîn û peyamî dizanî, lê nayête bîra te. Erkê Xudayî yê şairî jî, ew e ku wan zanyariyên windabûyî û ji bîrkirî, ji tariyê rizgar bike û ronahiyê bidê. Belê, Pêşew yek ji helbestvanê herî xoştiviyênen gelê kurd e.<sup>(3)</sup>

Ew bi zimanekî sivik û rewan dînivîse. Her kes bi hêsanî dikare bigîhîje mebest û armancêñ wî. Zimanê wî xweş û sade ye. Di gelek helbestên wî de, form û neverok, pir bi hêz in û serketî ne. Mûzika wan nerm e û hêdî xwe tavêje guhên mirov. Ew yek ji helbestvanê rêza yekê ye û cihê wî baş xuya ye û piraniya xwendevanêñ Kurdistana dagîrkirî, wî nas dikan. Çimkî ew ji mêt ve ye ku li derveyî welat dijî û di gelek fêstîvalan de jî helbest xwendine û ji wan hinek ji veguheztine tîpêñ latînî. Helbestên wî yên tercumeyî zimanêñ, erebî, farisî, tirkî, rûsî, swêdî, danmarkî û italî jî hene.

Mamoste Hejar, ku zimanzan û nivîskarekî kurdperwer bû, bi forma klasik û



"Pêşew helbestvanekî rastgo û bi cerg e"

naveroka modern dinivîsi, pir bi helbestên Pêşew dilxweş bû û di hevpeyyînека xwe de wilo basa wî dike:

- Helbestên Pêşew serbest in, lê pir mana ne û naveroka wan ciwan e. Erê, ew helbestvanekî baş e.<sup>(4)</sup>

Dîsan Hejarê nemir, di cihekî din de jî dibêje:

- Berevacî hizir û boçûnên gelek kesên din, ez bi helbestên Ebdulla Pêşew dax-bar im û peywendiyêن min li gel bi hêz in û xebata wî cihê rêzê ye. Erê Şêrko Bêkes xelata **Toxoliskî** wergirtiye, lê eger biryar di destê min de buya, min ê ew xelat daba Ebdulla Pêşew. Ji ber ku di nav helbestvanêن ku bi forma serbest dinivîsin, e wî cihekî bilind heye.<sup>(5)</sup>

Belê, wî bi evînê dest bi helbestan kiriye. Ew aşiq e û di derya çavêن şoxekê de xeniqiye. Lê di civatêن paşdemayî de evîn qedexe ye. Nemaze di ya kurdî de. Yê hejar nikare bi hêsanî bigihîje ya dewlemend. Adet û torêن kevin, kirêt û nejê-hatî, rê li ber evîna wan digirin û hemû kuçe û kolanan jî kontrol dikin û dîtinê li wan dikine hizret. Lê evîn her wisa bûye û evîndaran jî, gelek caran rîyêن çareserkirina gitiftariyêن xwe ditine û xweşî û azadp peyda kirine. Çawa ku tevâyiya evîndarêن dinê li ber xwe didin û riyêن dîtina ji fesad û bekroka dûr, peyda

dikin û derdên dilên xwe derman dikin. Lê glek carê din jî, dikevine ber hing û dingên xem û azaran. Pêşew jî yek ji wan evîndara ye ku, ew jî bi agirê evînê şewitiye û negehiştiye mexsed û miradê xwe. Ew di vê helbesta xwe de, rewşa dilê xwe ya çirmisi û ruhê xwe yê damayî, xuya dike:

## PIRSYAREK

Li bîra min e,  
Sal: Dawiya şêst û şesê bû.  
Bajar: Zend û bask bû.  
Zivistan: Bazinekî reş bû.  
Êvar bû.  
Bo cara yekê,  
Min hest bi bertengiya bajatî kir.  
Te jî ew heste kir.  
Dûr çûyn...  
Li kuçeyekê, gchiştin hev  
Reng zerpetixî.  
Bêhinteng  
Ji sibera xwe ditirsayn  
Dar û dîwaran, çav hebûn!  
Dar û dîwaran, dev hebûn!  
Lê em, yaxî bûyn û me lanet  
Li xelkê bajarî kir!  
Me lanet li çavê bajarî kir!(6)

Her çend adet û titâlên xerab, asteng û kosp in di rêya bextiyariya evîndaran de, lê dîsan ew paqij in, kerb û kîn tiiji dilên wan nabe. Ji ber ku ew dizanin sedemên azar û eşen wan, kes û karên dilreq, adtên kirêt û nezanîn e. Civata me bi hemû hêza xwe li diji evînê ye û nahêle evîndar xweşiyê bibînin û bigihîjin armancêن xwe. Li vir, dema keçikê bi zorê didine mîr, evîndarê wê dikare gelek karên nebaş encam bide. Dilê zavê reş bike û serê malbata wê jî şûr bike û wan di nav civatê de bê rûmet bihêle. Lê ji bo xatirê evîna xwe ya paqij û dilovan ew vê yekê nake û jiyanâ wan jî têk nade. Ew bi tenê derdê dilê xwe vala dike û hestên xwe nişan dide.

## JI DESTÊ MIN TÊ

Ji destê min tê,  
Demjimêra bextiyariya te rawestînim.  
Ji destê min tê,  
Gustîla tiliya te pavêjim.  
Nama bextê te bişewitînim!  
Ji destê min tê,  
Hemî tiştan eşkera kim!  
Kîjan şeva te, xwes û geş e,  
Wê şevê pişî ciray kim!

\* \* \*

Erê cana min.  
Ger min bivê,  
Demjimêra bextiyariya te rawstînim.  
Ger min bivê,  
Gustîla tiliya pavêjim.  
Nama bextê te bişewitînim!  
Belge li cem min hene!  
Hezar belgên eşkera û xuya  
Belgên çar salên evîniyê  
Lê çi bikim!  
Evîna te, nehingek e  
Xwîna min ya fîryayî dixotin.  
Evîna te, rûbarek e,  
Kerba min ya teş dişotin.<sup>(7)</sup>

Mezinan gotiye: "Ber li cihê xwe bi seng e." Demê mirov ji welatê xwe derket û derbederî kolanên biyaniyan bû, hîngê çi tam û çej di jiyanê de namîne û tenêbûn, barê here giran e li ser dilê mirov yê çîrmisi. Belê, Pêşew gelek ji mîje ve ji welatê xwe derketiye. Her çend ji bo xwendina bilind bar kiribû jî, lê dîsa vegera wî ya welêt, astengeka mezin bû. Çimkî faşî li ser hukim bûn û wî ji ne dixwazt di riya wan te vegere û tekeve bin kontrola wan. Ji ber vê jî, derma xwendina xwe temam kir venegeriya, ji ber nexwest vegere himbêza faşîzîmê. Êdî neçar ma ku riyên jiynê

û paryê nan peyda bike. Wî li Lîbyayê kar kir û paşî jî, li Fînlendayê bû akincî û nuha derdê penabriyê dikêşê. Belê, ew pirniya xortaniya xwe ji welatê xwe dûr dijî, dîtina kes û karan, dost û hevalan, gund û bajarên Kurdistanê lê dibe hizret û bi tenê di xewnan de diçe seredana welêt. Çimkî welat di xwîna wî de ye. Werin em vê helbesta wî bixwînin û derdêñ wî binasin.

### ÇEND PEYV DI DERBAREYÎ DILÊ MIN DE

Dilê min mîna vagona tirênenê ye  
Hezar û yek rawestgeh hene.  
Li her rawestgehekê disekine,  
Rêwiyeckî li wir dihêle.  
Rêwiyeckî din dêl wî ve wî radike.  
Lê her ji demê dilê min bûye vargon  
Rêwiyeckî xeyidî tê de ye.  
Li qulaçeka vê dînyayê.  
Naête xwarê. Naête xwarê.  
Ev rîwî li pey navê xwe sergerdan e.  
Ev rîwî li pey çavê xwe sergerdan e.  
Ev rîwî, birîna min e.  
Ev rîwî girnijîn û girîna min e.  
Ev rîwî Kurdistan e.  
War û hêlîna yekem, evîna min e.<sup>(8)</sup>

Ew ji dil dixwaze, rewşa aloz û kembaxa gelê kurd, ji bo zarokan vegere. Ew dixwaze van karesat û wêrankirinê li welatê wî çê dibin, bike çîrok û helbest, ji bo ku zarok ji bîr nekin û her dem li ber çavêñ wan be. Ew dizane ku, dijminê gelê kurd har û dirinde ye, hemû riyan bi kar tîne, ji bo ku ci şûnewarâen vî welati jî nemînin. Bajar û gundan dişewitînin. Kultur û şaristaniyeta me binax dikin. Her tiştî berze bikin. Lewre ew zaroka agehdarî hemû rûdan an dike.

Belê, wî duwazde ders ji zarokan re nivîsne û divêneyê ji bîr kirin. Dî nav xwîna wan de bê û biçê, ta ku tola xwe bigrin û berevaniyê ji doza xwe ya adilane re bikin. Ew dizane zarok, xort û mîrên pêşerojê ne û avakirina vî welatê talan û wêrankirî, wê bikeve ser milêñ wan. Ew wan hişyar dike û rîhêñ xebat û xweragirtinê, di dil û mejîyêñ wan de diçîne. Bi hizreke kûr û bi form û navero-

keka geş û bi hevok û peyvîn resen, van dersan divehîne û ji zarokên Kurdistanê re dibêje:

Zarokno!

Hûn in ên ku pengavê bişilqînin.

Hûn in ên ku bîvelerza

sibe kaniyê biteqînin.

Hûn in ên ku sibe sinorêن çêkirî dişikînin.

Xelekêن zincîra qetyayî,

Girê didin û dişidînin.

Hûn in ên ku sibe li Qamişlî

Li Diyarbekîra şêx Seîdî

Li Silêmaniya birîndar

Li Mehabada Qazî

Baweriyê bi yek felsefê tînin.

Hemû têdigehêن:

Ewê kurd be, bereyê nû be.

Divê xarna rêya yekgirtina kurda pê be.<sup>(9)</sup>

Li her welatî gora serbazê winda heye û sîmbola qehremanî û mîrxasiya wî welatî ye. Lê mixabin welatekî me yê azad û serbixwe nîne, çîmkî dijminan ew dagîr kiriye û paşê jî hemû berhemîn wî ên sererd û binerd gişt talan kirine. Eve sedan sal in ku gelê kurd xebateka gerim û bê rawestan dike, lê hîn jî ji dest û pencêن dijminan rizgar nebûye. Her kes dizane ku bi sedhezaran şehîdên Kurdistanê hene û tu dikarî li her bosteka axê, gora şehîdekî bibînî. Dijminan her ci çekêن sotin û qirkirinê, yên giran û yên qedexe jî tê de, li dij gelê kurd bi kar anîne. Ev çend serîhildan û şoreshen kurdî ne ku li ber çavan bi xwîn, wêrankirin û şewitandinê tê diêin, lê gelê kurd her li ber xwe dide û bi bindestiyê razî nabe. Pêşew di vê helbesta xwe de, ji tevayıya cihanê re dide xuyakirin ku ev Kurdistan çehîdên wê pir in û her kes dikarte wan bibîne. Belgeyên vê yekê jî li hemî cih û deverên welatê me hene. Belê, dema wefdekk, xurûbek were seredana welatê me, ew tacegulên xwe li kîjan cihî deyîn jî, ew cih gora Leşkerê Winda ye...

## LEŞKERÊ WINDA

Dema heyetek diçe cihekî

Ji bo gora Leşkerê Winda,  
Dibe tacegulekê.  
Eger sibe  
Heyetek bê welatê min  
Ji min bipirse:  
"Kanê gora Leşkerê Winda?"  
Ez dê bêjim:  
- Ez benî!  
Li kenarê her coyê  
Li ser sekuya her mizgeftê  
Li ber deriyê her malê,  
Her dêrê,  
Her şikeftê,  
Li ser zinarê her çiyayî,  
Li ser dara her baxçeyî,  
Li Kurdistanê,  
Li ser her bosteka erdî,  
Li ser her gezeka esmanî,  
Me tirsel!  
Hinekî serê xwe biçemîne û  
Tacegula xwe deyne.<sup>(10)</sup>

Dijminên gelê kurd, berî sedan sala, xelkê me ji cih û warêن bab û bapîran derxistîne û mişextî deverên dûrî Kurdistanê kirîne û carna jî berê wan dane çol û biyarêñ germ û hişk. Bi vê pîlanê dixwazin kurdan ji hev cihê bikin û kûratiya sitratîci têk bidin û xelkê me di nav xwe de bîhelînin. Bi niyaza hindê ku me bikin erek, tirk yan faris! Hin caran warêñ me şewitandine û hin caran jî xelkêñ xwe anîne li ser cih û warêñ me bi cih kirine. Helbet ev ji bo wan xewneke, lê berdewam hewil didin. Nemaze di van sîh salêñ dawiyê de, li Kurdistanâ başûr encam dayîne. Belê, pîlanêñ wan ji bo bi erekirina kurdêñ başûr, ji mêt ve dest pê kirîye. Ji aliyekî ve bi hezaran gundêñ li ser sinoran bombebaran kirin û ter hişk bi hev re şewitandin, xelkê me veguhaztin ordogayêñ berteng û kirin bin kontrola leşkerê faşî. Bi hezaran jî veguhaztine deverên jêrî Îraqê û bi dehhezaran jî erek anîne ser gundêñ me û ji xwe re talan dikin. Pîlan û nexşa erekirina kurdêñ başûr bi germî dihat meşandin û bi hemî rê û şîyanêñ xwe li dij gelê kurd dixebeitîn. Dixwaztin kurdan ji mey-

danê rakin û doza pîroza wan jî binax bikin. Ev rûdan û birîn bûne sedemên nivîsîna çendîn çîrok û helbestan. Nivîskarêñ xweragir û kurdperwer, bi hemû hêzên xwe li dij van pîlanêñ genî rawestîyan. Lê dîsan jî, faşiyêñ Îraqê dikanibüñ gelek qonxan bibirin û erebkirina kurdan pêş de bibin. Wek li bajaren Ênsifnê, Akrê, Ênzala, Sêmêlê, sincarê, Kerkûkê û Xaneqînê. Qanûn derxistin ku yekî kurd ewê nikaribe erd û xaniyan bikire. Ewê nikaribe hotêl û xaringehan bi navê xwe çêke. Pere didan kurdêñ ji wan bajaran - nemaze ji Kerkûkê - derkevin û li bajarekî din jî erd pêşkêşî wan dikirn. Dixwestin bi hemû riyan kurdan ji hev belav bikin. Lewte vê rewşa aloz û bi tirs Ebdulla Pêşew hejand û ev helbest vehand. Werin em bi hev re bixwînin:

### **BI EREB KIRIN**

Ji esmana nehati me  
Ne mîvan im.  
Berî dîrokê,  
Kaniyek bûm li vira der bûm.  
Berî dîrokê,  
Agirek bûm li vira hêl bûm.  
Bar kin, herin !  
Ji bilî min, kanî kesêñ din têr av nakin!  
Ji bilî min, dargûz li kesê din sîberê nakin!  
Bar kin herin !  
Tovê we li zeviya me şîn nabe, dimre.  
Mêrga me di bin piyêñ garana we de agir e.  
Heta dartûya me jî ewê biazire  
Colankê ji bo zarokêñ we ranagire!  
Bar kin herin !  
Fêkiyêñ darêñ me, xav û kal in,  
Ava me şor e,  
Hingivê me di devê we de tal e.  
Bar kin herin !  
Bar kin herin !(n)

Dîrok şahid e ku berî nuha bi hezaran sal em li ser axa Kurdistanê jiyan e û belge-

yên me ji hene. Belê, hêştan dewletên deverê û sinorêniha tune bûn, dema ev welat hebû. Kes nikare vê rastiyê binax bike û navê kurdan ji nexşeya cihanê bibe. Lê mixabin ji serê sedan salan ve ye ku ev welat hatiye dagir kirin. Di demêni Osmanî û Sefewiyan de û heta digehîje dema Şerê Cîhaniyê yekem, ku bi vî rengî sinor hatin kêşan û welatê me di nav çar dewletan de dabeş kirin. Kurd gelekî aştixwaz e û bi dirêjiya dîrokê, zulm û sitem li tu gelên din nekiriye. Lê berdewam tada-yî, wêrankirin û sotin pişka wî bûye. Ji lewre vê ji tim berevanî li hebûna xwe kiriye û heta niha bi sedhezaran şehîd pêşkêşî vê doza xwe ya pîroz kiriye. Di gel hindê ji, gelê kurd alayê biratî û dostaniyê bilind kiriye, lê dijmin bi agir û asinî bersiva wî daye. Ji ber hindê ji, ew neçer maye ku, dest bavêje tivengê û xwe ji hêrişen hov û dirinda biparêze. Bi dehan karesatên diltezin û xwînawî hatine serê gelê kurd, ew ji bi destên rijêmên cîran, yên ku Kurdistan dagir kirine. Bo nimûne: Qirkirina gelîyê Zilan û ya Dêrsimê, serbirîna Mehabadê, karesata Helebçê, hêrişen enfala û reva mezin ya sala 1991ê. Eve hemû bi serê gelê kurd hatin. Ji aliyekî ve hemû birînên kûr in di dilê kurdan de û ji aliyê din ve ji pîneyên teş in bi navçavêni biratiya saxte û mirovatiya bêdeng ve! Lê dema kurd daxwaza azadî û serxwebûna xwe dikin, êdî ew şofînist û regezperist in, cudaxwaz û terorist in! Belê, Pêşew vê helbestê divehîne û ji tevaya gelên cihanê re dide xuyakirin ku kurd dixawzin ji pencen hovan rizgar bibin. Serbest û serbilind bijîn. Ew mirov in û xwe diparêzin.

### ÇIMA ŞOFİNİST İM ?!

Ev e Vêyetnamî,  
Bo Vêyetnamê serê xwe diçemînin.  
Felestînî, ji bo dilopeke avê,  
Bo her kevrekî felestînê,  
Dijîn û dimrin.  
Eger ez ji daxwaz bikim  
Di Kurdistaneke azad de  
Serbest bijîm wek mîran  
Neku parçekirî li bin nigan.  
Çima şofînist û xweperist im ?!  
Çima şofînist û xweperist im ?!(12)

Ew kurdperwerekê dilsoz e û Kurdishîyekî xemxur e. Ji bo wî Kurdistan yek e û

çî cudahî di navbera axa pîroz de nîne. Serê yekî li Qamişloyê diêşe, xwe jê re dike Espirîn. Destê yekî li Mehabadê dişkê, xwe jê re dike gulte û gopal. Yek li Diyarbekirê dikeve zîndanê, xwe jê re dike betanî û êzink. Ji bo birçiyê Silêmaniye, xwe dike nan û av. Ew Kurdistanî ye û di hevpeyvîneke xwe de, vê rastiyê dide xuyakirin:

- Ez xwe bi xelkê Qamişlo, Mehabad, Diyarbekir û Silêmaniye dizanim. Çend pîtey bi Hevlîrê dikim, hinekî jî xemxur û guhveçiniyê dengûbasen her bosteka axa Kurdistana mezin im.<sup>(13)</sup>

Ew ji bo Kurdistana azad û serbixwe dixebite, dinivîse û baweriya wî bi bilindkirina Alayekê heye ku ew li ser tevaya çiya, avahî û deverên Kurdistanê li ba bibe û xwe bihejîne. Ew di helbesteka xwe de, dilê xwe wisa bê perde û bi eşkerayı vala dike:

### ALA

Dostên min! Baş bizanin.  
Dijminên min! Baş bizanin.  
Min çuqasî bawerî bi Zerdeş, Avêsta û Xwedê heye.  
Hezar carî pêtir  
Min bawerî bi bilindkirina Alayî heye. <sup>(14)</sup>

Bi dehan boblat û karesatên mezin û dilşewat, di dîroka nêzîka gelê kurd de hene û hemûyan jî bi destên rijêma faşist û xwînrêj ya Îraqê encam dane. Her kurdek, belku her mirovekî ku navê Sedam bihîstibe, yekser dibêje: "Bikuj û xwînmijê gelê kurd e." Ma kî dikare karesata Helebce, qirkirina Enfala 1988 ê û heta digîhê reva mezin a bihara 1991 ê, ji bîr bike. Mîrov bêje celad, bikuj, sozanî, xwînrêj û Hitler jî hêsta kêm e. Belê, di gel van sitema jî, dîsan pirniya partiyê Kurdistana başûr, serok û nûnerên xwe dişînin cem Sedam û wî maçi dikan! Belê, ew maçen wan dilê pirniya xelkê kurd êşand û birînên wan jî kûr kirin. Heta dostên gelê kurd jî, hêbetî man û gelekan nerazîbûna xwe jî, beramber maçen wan diyar kirin. Ev yek bû sedem ku çendîn ronakbîr û nivîskarên kurd li dij binivîsin. Ebdulla Pêşewê şâîr, di helbesteka xwe de, bi hemî hêza xwe li dij seredan û maçîkirina serokên kurdan, bo Sedamê hov û dirinde, radiweste û lanetan lê tîne. Belê, Pêşew helbestvanekî rastgo û bi cerg e.

Ew berdewam helwesta xwe beramber tevayıya rûdanêñ gelê kurd destnîşan dike. Hemescid Hesen dibêje:

- Pêşew şâirekî bi navûdeng e, rastgoyî û netîrsî xesletên eşkere yên helbestên wî ne, wan maçêن serokêن kurdan ew hejand û bêhna wî teng kir, neçar ma ku di helbesteke xwe de, hest û helwesta xwe bide der.<sup>(15)</sup>

Ew helbesta xwe bi vî rengî dest pê dike:

### MAÇ

Ewê te givaştî dest nebû  
Ejdehayekî pêncser bû.  
Ewê te maçî kir rû nebû  
Dariştina yasa daristanê  
Dîwarê Berlîn  
Simê kerî bû.  
Ewê dikeniya dev nebû  
Navrana qehpê  
Binzikê kûçik  
Sopeka Hîtlerî bû.<sup>(16)</sup>

Pêşew gelek salên jiyana xwe li xerîbiyê borandiye û vê dûriyê dilê wî helandiye û birinêن wî kûr kirine. Ew bi dirêjiya bîst salan li derveyî welat maye. Bîst salên mişextiyê, dûr ji kes û karan, ji heval û dostan, ji gund û bajêren Kurdistanê. Ew di hevpeyvîneka xwe de dibêje:

- Bîst salên mişextxbûnê, ji bo min xwendingehuka xoştiviya Kurdistanê û xelwetgeheka nêzîkbûna neteweyî bû.<sup>(17)</sup>

Ew di helbesteke xwe de vê evîna mezin, bi vî rengî xuya dike:

Zevî distire ji bo baranê.  
Çiya ji bo teyrê baz  
Rûbar û çem ji bo nerawestanê.  
Roj ji bo asoyê  
Agirperêس ji bo ateşgehê  
Ba ji bo takê darê  
Stêr û hevv ji bo spêdê  
Ez jî ji bo te Kurdistanâ min.  
Ez jî ji bo te.<sup>(18)</sup>

Ebdulla Pêşew, dûr ji warê xwe jiya ye. Çimkî welatê wî di bin kontrola faşyan de bûye û wî jî neşiyaye vegere. Ëdî xewnan pê ve dibîne. Dilê xwe xweş dike hêviyên xwe geş dike. Her ew "Eger" bi xwe ronahiyê dide ruha wî û baweriyên wî bi vege-re mukum dike. ew mirovekî geşbîn e û li benda rojekê ye ku bi serbilindî û azad vegere. Çimkî ji bo wî, çendîn rêtîyên vejerê hebûn, lê diviya bû serê xwe biçemîne û bikeve bin sîbera faşyan! Wî ew nekir û derdê xerîbiyê kêşa û li benda roja geş ma. Belê, mirov ji vê helbesta wî xuya dike ku, welat di nav xewna wî de ye. Lewre ew dixwaze vegere û mîna berxikê sava, têr giya paqij ya deşt û zozanên Kurdistanê bixwe. Ji her kaniyekê, qurçeka avê vexotin. Mîna sivora, li ser dargûza bilize. Ew hemî rojîn zaroktiya xwe bi bîr tîne. Jiyan her ew e ya ku li ser gir, zîr û kolanên welat dibore. Ji lewre mezin dibên: Şam şekir e, lê welat şêrîntir e. Belê, eger welat û axa pîroz , ew qas şêrîn û xweş neba, ewê çawa hewqas xelke xwe li ser bidana şehîdkirin ? Jiyan bê welat nabe, werin em bi hev re vê heilbestê bixwînin, ka çawan ji kûratiya dil û mejîyê wî derdikeve.

### **EGER EV CARE BÊME VE**

Eger vê carê bêm:

Siharan, dê wek berxekî sava

Xwe di nav giya paqij de,

bigevizînim û têr giyayê tîj vecîm.

Ta biwestim û dê laşê xwe

Di xunava sar hisîm.

Eger vê carê bêm:

Wek sivorey, dê li ser dargûzên bilind bigerim.

Mîna ewrekî nizim,

Ezê li ser mîrgân kesk, çerxan vedim,

Wek şengebiyê, dê bi ser rûbarî de

Bi ser giş zinaran de, xwe şûr kim.

Ax! Bes vê carê bêm!

\* \* \*

Eger vê carê bêm:

Ezê ji serê memkîn her kaniyekê,

Qurteke av vexome.

Ezê hemiyan bikime diya xwe.  
Di her şikeftekê de,  
Ezê şevekê, serê xwe li ser kevrekî deynim û  
Gişan bikime landika xwe.  
Eger vê carê bêm...<sup>(19)</sup>

Wî bi dirêjiya bîst salan, welatê xwe di xewna xwe de didît. Lê xewna ruhê wî ya westiyayî aram nedikir û dîlê wî yê damay ena û geş nedikir. Ji ber hindê jî, dema Kurdistan rizgarbû, ew bi vî rengî pesin dide:

-Xweşirîn rojên jiyana min, rojên serhildan û rizgarkirina bajar û gundêñ Kurdistanê bûn.<sup>(20)</sup>

Belê, piştî bîst salên dûriyê, ew digihîje hêviyên xwe û di nêzîktirîn delîve de vedigere Kurdistanê, ji bo ku ji nêzîk de xebatê bike û rolekê di pêşveçûna gelê xwe de bibîne. Lê hezar heyf û mixabin ku, şerê birakuiyî, dîsan destpê dike û hêviyên wî dikuje. Ew bi hemî hêza xwe li dij şerê birakuiyî ye. Nikare vî şerî qebûl bike û bi baweriya wî, ci sedem nînin ku divê şerê birakuiyî bête kirin, divê neête kirin. Çimkî ji ziyanê pêvetir tiştekî ji bo gelê kurd naîne. Lewre ew bi aşkerayî dibêje:

- Li cem min, ci tiştek pakanê ji bo şerê birakuiyî nake. Pîstirîn şer, namerdîrîn şer, bênamûstirîn şer, şerê birakuiyî ye.<sup>(21)</sup>

Belê, ew vê carê bi çavêñ xwe şerê xwekuuiyî dibîne. Wî qet bawer nedikir ku ev şerenîxa partiyên kurdî - nemaze piştî peydabûna vê delîva dîrokî ji bo gelê kurd- bigihîje vê rewşa aloz û wêrankar. Ev cara yekê ye ku Kurdistanâna başûr bi vî rengî dikeve jér kontrola kurdan. Ew bi xwe bibine hakim û perlemana xwe helbijêrin û dewletê jî bi rê ve bibin. Hemî dinê bi çavekî din temasay doza kurdî dikir û wesan hîzir dikirin ku, kurd dikarin dewleta xwe ava bikin û demokrasiyê jî bi çespînî! Ji bo vê çendê jî bi her awayî alîkariya kurdan kirin. Ji aliyekevî ve, kurd ji êrişen Sedam parastin û xetta(parelela) 36an danîn û ji aliyê din ve jî bi dehan rêxistinêni mirovayetî hinartin û bi sedan gundêñ wêrankirî avakirin û Kurdistan xistin rewşek baştir û pêşketîtir. lê dîsan mixabin ku, partiyên kurdî, bi vî şerî, ruhê xelkê me jî kuştin, hêviyên wî binax kirin û êdî her kes hewil dide ku vê Kurdistanâna xweş çol bike û bi ci riya hebe jî xwe bigehîne welatekî Ewrûpa. Belê, xelk ji ber van karêñ ne kurdane û ne mirovane direvin û di dawiyê de Pêşew jî Kurdistan hêla. Çawa dikare bimîne:

-Li Bajarê Hevlîrê derketina derve mîrxasiyek bû. Min bi çavêñ serê xwe bira-



Birakuji, weşanen Avesta

û kirêt bibû. Xemên evînê û derdê dûriyê hind êşandibû ku, dema di odekê de gehîstîn hev, hevdu nas nekirin. Her yek bi aliye kî de çû!.

Belê, dema Pêşew jî, piştî 20 salan vege riya, dît ku welat wêran bûye û şerê birakujiyê jî birîn kûr kitine. Ëdî bi dilê şikestî, ji Kurdistanê derdikeve û vedige-re Ewrûpa. Lê ne vala û bê helwest. Berî ku derkeve li bajare Hevlêre semînere-kê dide û tê de, helbestên agîrîn li dij birakuji û partiyêñ kurdî dixwîne. Tif û lanetê li wan kesan tîne ku dibine sedemêm wî şerê qirêj û xwe kuj. Ew bi vî rengî li ser şerê birakujiyê dîniyîse:

### **BIRAKUJİ**

Di vî nîştimanê çarereş de,  
Çi maye we dabeş nekirî, mîna rezê xwe?  
Her bi şehîda serê me bilind bû,  
We ew jî kirin wek pezê xwe!?

kujî dît... Her dîl e û tê kuştin. Her beraet e û tê wergirtin. Her mal e û de-riyê wê tê şikandin. Her xanî ye û tê talan kirin. Her xortê kurd e û li ser bîr û baweriyêñ xwe ji mal tête deranîn û bê serûşûn dibe. Her namûs e û tê kirêt kirin... Kurdistana min ya Enfal-kirî dîsan tê Enfal kirin!<sup>(22)</sup>

Çîroka evîna Pêşew û Kurdistanê, mî-na eşqa qaremanêñ çîroka Somersit Momî lê hat: Sûre û Salî, du evîndarêñ mezîn bûn. Deng û basêñ wê evîna gerim li wan dûrûbera belav bûbû. Care-kê keşîvanekî pêwîstî bi karkeran hebû, êdî wî Sûre serxweş kir, di gel xwe bir û ji wê giravê dûrêxist. Ëdî vegera wî zehmet bû. Bi dirêjiya 30 salan keçik li benda wî bû. Di delîvekê de Sûre tê giravê. Lê evîndara wî ne mîna berê xweşik û rind mabû û ew jî pîr, qelew

Ditirsim pênûsekê helgirim.  
 Ditirsim kirasekî li xwe kim.  
 Rûyê we reş be.  
 We reng jî, dabeş kirin!  
 Bêjim: Xwendkar yan qutabî ?  
 Jin yan afret?  
 Rûyê we reş be.  
 Ta peyvîn nav ferhenga jî,  
 We dabeş kirin.  
 Du kinarêñ zêyê nemiran,  
 Xanî û Hacî jî, we dabeş kirin.  
 Ax, av û agir jî, we dabeş kirin.  
 Ka we ci hişt?  
 Ka we kî hişt?  
 Ta we qehpe, diz û rîbir jî dabeş kirin.  
 Mîna zirtekê gakuj, we nîştimanek kire du beş.  
 Bajar bi bajar, gund bi gund,  
 Lî her malekê, we agirdan jî kire du beş.  
 Xelkê dîrokek heye,  
 Me du dîrok hene.  
 Hemî dinê serokek lê bela ye,  
 Me ji wan jî, du hene!? <sup>(23)</sup>

Xelk Ebdula Pêşewî wek helbestvanê netewê kurd dinase. Ew sîmbola kurdayetiye ye û niha jî, li ser helwêsta xwe maye. Wî di nav tu rîexistin û partiyêñ kurdî de kar nekiriye, lê tevan rêz û hurmet jê ra girtiye. Ew li dij tevaya dagîrkeran xebitiye û her partiyeka kurdî, kêmasiyeka netewî kiribe, wî li dij nivîsiye û her kesê ku li dijî doza kurdî bûye, wî lanet û tif lê barandîye. Ew ji bo gelê kurd dinivîse, nemaze ji bo rîncber û hejaran. Lewran ew di dilê piraniya xelkê kurd de ye û cihêñ tiliyêñ wî jî, li ser nexşa helbesta nû ya kurdî heye.

Pêşew, helbestvanekî xwedan taqet û şıyanêñ bilind e. Zimanê wî cemawerî ye û ji bo hejarêñ gelê kurd dinivîse. Diruşmê wî yê here mezin, kurdayetî ye û ji bo kurd û Kurdistaneka azad û demokrat dijî. Helbest li cem wî, berî her tiştî helwêst e. Mîna piraniya şairêñ welatparêz, pêtir pîtey bi naverokê dike. Lewra jî, carna helbesten wî peyvîneka normal e û ji qalibê xwe derdikeve û dibe gotareka siyasî. Lê ew wê çendê jî, bi bawerî dike û wê rastiya xwe jî naveşêre.

Ebdulla Pêşew, di sala 1947ê de, li gundê Bêrkot, li nêzîk bajarê Hevlêrê ji da-yik bûye. Du salî bûye demê bavê wî mirî ye. Zaroktiya wî hewqas tal û dijwar bûye ku naxwaze bîne bîra xwe. Her li wî bajarî xwendina xwe qedandiye û di sala 1970 - 1973an de, mamosayî kiriye. Dûre çûye Sovyeta berê û di sala 1985an de, şehadetnama doktorayê li ser edeba kurdî wergirtiye. Her ji destpêka sala 1961ê û vir de, helbestan dinivîsîne. Niha jî li welatê Fînladayê penaber e. Min helbestên di vê lêkolînê de, bi kar anîn, ji tîpên erebî û kurmanciya jêrî kîrîne tîpên latînî û kurmanciya jorî. Hêviya min ewe ku, xwendevanê kurmanciya jorî, feydeyê jê bibînin û cîhana helbestvaniya wî, jî nêzîk ve nas bikin.

Heta niha wî ev berhemên jêr çap kirine:

1. Firmêsk û zam. Helbest, 1967.
2. Bitî şikaw. Helbest, 1968.
3. Şewnamey şairêkî tînû. Helbest, 1972.
4. Şew niye xewintan pêwe nebînin. Helbest, 1980.
5. Sedan sale. Belavoka helbestan, 1982.
6. Duwazde wane bo minalan. Helbest, 1985.
7. Birakuji. Helbest, 1994.

#### ÇAVKANÎ:

1. Pêşgotina dîwana Birakuijî 1997.
2. Her ew çavkanî, 1997.
3. Kovara Rabûn. Hejmar 9, sal 1994, rûp 67 - 68, Swêd. Soma ji farisî wergerandiye kurmanciya jêrî.
4. Rojnama Xebat, hejmar 610, sal 1991, rûp 9. Kurdistanâna başûr.
5. Kovara Rêgây Aşti û Sosyalist. Hejmar 26, sal 1991, rûp 147.
6. Şewnamey şairêkî tînû. Helbest, 1972, rûp 68, 69.
7. Her ew çavkanî, rûp 50 - 54.
8. Şew niye xewintan pêwe nebînim. Helbest, 1980, rûp 58, 59.
9. Duwazde wane bo minalan. Şam 1985, rûp 9.
10. Her ew çavkanî, rûp 28.
11. Her ew çavkanî, rûp 25, 26.
12. Her ew çavkanî, rûp 22.
13. Rojnama Kurdistanî Nwê. Hejmar 2692, sal 1992, rûp 6. Kurdistanâna başûr.
14. Duwazde wane bo minalan. Şam 1985, rûp 23.
15. Kovara Xermane. Hejmar 3, sal 1991, rûp 20.
16. Kovara Xermane. Hejmar 3, sal 1991, rûp 19.
17. Rojnama Alay Azadi. Hejmar 20, sal 1992. Kurdistanâna başûr.
18. Rojnama Berxwedan. Îluna 1991 ê, rûp 22.
19. Şewnamey şairêkî tînû. Helbest, 1972, rûp 73 - 79.
20. Rojnama Alay Azadi. Hejmar 20, sal 1992. Kurdistanâna başûr.
21. Birakuji. Hevlêr 1994, rûp 6.
22. Birakuji. Hevlêr 1994, rûp 7, 8.
23. Birakuji. Hevlêr 1994, rûp 15-18.

# ÎHSAN CULEMERGÎ:

## "Cembelî warisê textê mîrektiyê ye"

MUSTAFA ALADAG

**M. Aladag.: Tu dikarî xwe bi me bidî naskirin, Îhsan Culemergî kî ye?**

**I. Culemergi.:** Ez di sala 1944'an de li Culemergê hatime dinê. Malbata min ji eşîra Xaniyan e. Min di sala 1965'an de li Amedê zanîngeha mamostetiyê qedand. Min 8 salan li bajarêñ Kutahya, Uşak û Hekaryê mamostetî û rayedariya perwerdekariya gel a fermî kir. Di sala 1973'an de ji ber pirsgirêka netewî ez hatim surgûnkirin. Li ser vê bûyerê min jî dest ji karmendiya fermî berda û serbest xebitîm. Ez pişti 20 salan ji nuh de mamostatiya fermî dikim. Ez niha li Culemergê rûdinim.

— *Te destana Binefî Narin çawa berhev kir? Ji kê û ji ku alîkarî girt û te çima ew mîna romanekê nivîsand? Gava te ev roman nivîsand te ci dijwarî kişand?*

— Barîna zimanê kurdî ji aliyê nivîskî ve dewlemend nîne. Bes gencîneyeke bi gotinêñ devkî ve têr û tije ye. Her wekî hişakekê ye ber destê nivîskarêñ kurd. Gelê kurd piraniya destanêñ xwe bi rêzikên strana ve daye raçandin û neqîşandin. Strana Cembelî ye ku ew bûyer gihandiye me. Ev stran li her herêmekê cuda cuda di hate gotin. Ew gotinêñ ku li devera Hekarya winda bûne, min ew li herêma Behdînan dîtin. Yêñ ku li derdora Behdînan nedihatînbihîstin jî di devê denbêjîn Botan de bûn. Dema ku min ew berhev kirin, têra raçandina romanekê berhev bûn. Min gotinêñ dengbêjekî kurdê Ezdi (Silêman Xirşanî) yên mitirbekî gerokbeyzade (Hessen Eli Xencer) yên dengbêjekî Dihokî (Usîvî Ebû Xorta) û yên hin kesen din kom kirin. Béguman lêkolîna wê zehmet e. Tîrsa metîngiriyê û qîrêja bindestiyê mirovan xweş nade axaftin. Nivîskar her tiştekî mîna ava bîrê bi zora mila hildikşîne. Bazirgan û bikirêñ ziman û çanda bindestan kêm in. Xasma herêmên eşâîri. Ew bajarê ez lê rûdinim û min serpêhatiya Cembelî lê nivîsî, ber çavêñ çeteyê dewletê nivîsandina zimanê kurdî ji bazirganiya afyonê zêdetir sûc e û darazandina wê

jî zêdetir e. Ma ev  
ne dijwarfî ne?

– *Min pirtûka  
te xwend û gelekî  
jê hez kir. Te him  
destaneke kurdî  
berhev kiriye û  
him jî ew mîna  
romanekê nivîsan-  
diye. Tu xwe ro-  
mannivîs an jî lê-  
gerîner dihesibîni?*

– Ez lêgerînê  
maka hin xebaran  
dibînim. Roman-  
nivîs û nivîskar di  
hin cihan de lêge-  
rînvan in. Bê şik  
hin cûdahiyêñ  
wan jî hene. He-  
mî lêgerîner nika-  
rin bibin nivîskar  
û romannivîs. Lê  
belê hin caran ro-  
la nivîskar û ro-  
mannivîs jî wekî

ya lêgerîneran e. Ez bi nivîsîna pirtûkeke piçûk ve xwe ne nivîskar û romannivîs û  
ne jî lêgerîner dihesibînim. Ger wusa bûya wê çaxê hostayên dîwara jî dê bigotana  
em jî mîmar in. Karê nivîskar û lêgerîneran karekî domditêj û berfireh e. Dara ew  
diçînin jî têt fêkî ye. Berhema min hê wek şutulekê ye. Ger tu min mîna masiyekî  
di nav selika masiyêñ edîban de bibînî, wê demê dişêm bi vî awayî xwe bidim na-  
sîn. Ez ne masiyê rûbarê Dîcle û Ferêt im, ne jî yê gerava Wanê me. Ez di nav bor  
û sêpelên rûbarê Zê (Zapê) de mezin bûme. Giranî û firehiya ber û milên min jî li  
gor kûrahiya gerên wî çemî ne.

– *Te di pirtûka xwe de zimanekî herêmî bi kar anîye. Çîma zimanekî herêmî? Ma*



**İhsan Culemergi:** "Cembelyê Hekarî û Binefşa Narîn berê aşiq û evîndarên  
kurdan ji mitolojiyê kirine rastî"

*ev ji bo yekîtiya zimanê kurdî ne xelet e?*

– Li ba teşîrêsekê çi rîs hebe tevnê bi wê diraçîne. Jiyana min bi temamî li devera Hekarya derbas bûye. Beriya heft salan dema min ew pirtûk nivîsibû, li ser tevin û teşîya min ewqas rîs û reng hebûn. A din jî min xwest di nav van rûpelan de hinek peyvên devera Hekarya careke din vejînim û raberî xwendevan û zimanzanêñ kurd bikim. Hem devoka Hekariya ne devokeke tevlîhev e, ew zêde nehatîye bişavtin. Xelîl Xiyalî beriya gelek salan gotiye "dawiya zaravayê kurmancî dê li ser devoka Botan û Hekarya raweste". Ez bi xwe alîgirê zimanê neteweyî me. Min li gorî zanîna xwe cih cih bazdaye aliyê Botan û hin peyvên nuh jî min xistine nav. Him hevalê pêşgotina wê nivîsî û him jî hinek hevalên din gotin: "Xwezila gişk bi devoka Hekarya bûya". Xuyaye giş ne bi devoka Hekarya ye. Piranî bi devoka Hekarya hatîye nivîsîn. Yekîtiya zimêñ ne karekî sivik e.

– *Girîngiya destana Binefşa Narîn û Cembeliyê Hekarî di edebiyata kurdiya devkî de çi ye?*

– Girîngiya destanekê bi dirêjbûna temenê wê re tê pîvan. Ger ev destan ne gi-ring bûya ji çend sed salan heta niha ji ser zimanê gelê kurd ji Mûsilê, heta Serhedê û Dêrsimê belav nedibû. Di ferhengêñ kurdî de hember navê Cembelî "Lehengê eşqa kurdî" tê nivîsîn. Hem naveroka mijara wê, hem strana wê ya tamxweş ew daniye cîhekî girîng. Destana Cembeliyê Hekarî û Binefşa Narîn berê aşiq û evîndarêñ kurdan ji mîtolojîyê kirine rastî. Beriya Cembelî evîndarêñ kurd li dinya din (axîretê) digihîştin evîndarêñ xwe. Lê Cembelî û Binefşê dane xuyakirin ku viyana rast ew e ku li vê dînyayê tê jiyan. Gelê kurd bi qirna şevêñ dîrê, di rojêñ dîlan û cejnan de guhdarî li vê destanê kirine.

– *Di destanêñ evîndariyê de bi piranî evîndar di dawiya destanê de nagîhîjin hev. Ev bûyer destanan dramatîk dike û balkêşiyê dide wan. Lê di destana Cembelî de ne wisa ye. Ji bo çi ev bûyer wek destan tê hesibandin? Şert û şûrtêñ destanan çi ne?*

– Di destanêñ evîndariyê yên beriya Cembelî û Binefşê de aliyê efsanê giran e. Rêka gîhiştina wan ya li vê dînyayê hatîye birîn. Ji ber ku evîndar ne rasteqîn in. Cembeli zilamekî xwedan bawerî, xwenda, mîrxas, xîretkêş, sebatkar û rastgo ye. Ji ber rastdîtinê riya aqil hildibiêre. Ne zilamê hiş û xiyala ye. Dixwaze pireya tabûyan jî bişkîne. Lê evîndarêñ ku berî wî jiyan jî tabûyan pir tîrsiyane. Stûyêñ xwe zêde li ber şûrê qederê çemandine. Em vê li ba Cembelî nabînin. Şukirina Binefşê xerabûna perda keçatiyê nake xemeke giran. Naxwaze ji riya êqil derkeve. Cembelî egîdeki mîrxas e, lê ji bo bigihîşe evîndara xwe ew şîvaniyê jî dike. Rêka wî bi qasî ya Mem û Zînê û evîndarêñ din bi asteng û alozî jî nîne. Fitne û fesadêñ mîna Be-

ko li ber singa Cembelî nîn in.

Li gorî min, sedemêن herî girîng ku bûyer kirine destan ev in; Tê zanîn ku qiralê Îngîliza Edward beriya çend salan ji bo evîndara xwe terka textê qiraliyê kir. Cembelî beriya çend sed salan ew dergeh vekiriye. Bavê wî hukumdarekî kurda ye û ew kurê wî yê tenê ye. Yanî Cembelî warisê textê mîrektyiyê ye. Dest ji vê ber dide û dikeve pey keçeve koçer. Ma ev ne sedemek e ku bûyerê bike destan? Li ku derê hatiye dîtin ku kurê mîran ji bo evîndara xwe kulavê şivantiyê avîtiye ser milên xwe? Ji bilî wê, mîrxasî û lehengiya wî jî sedemek e. Nav barê destanan de aliyê giran lehengî ye.

– *Di pirtûkê de hinek tiştên modern jî derbes dibin. Mîna hîsa neteweyî û mafê jinan. Gelo di dema destana Binefşa Narînê de ev tişt hebûn ku te di pirtûkê de qal kîriye?*

– Ev pirsa te min di nav rexneyêن hin hevalên din de jî dîtin. Ji bo wê ez dixwazim bersiva wê berfireh bidim. Mîrekatiya Hekariya di tixûbê Împaratoriya Osmanî û Sefaviyan de bû. Li gorî peymana wan û Osmaniyan, nîvhikumeteke kurd bû. Diravê wan hebû û li ser navê xwe xutbe didane xwendin. Ew Osmaniyeñ ku sê parzemîn dagir kiribûn, bi dilê xwe ev mafan nedabûn mîrên Hekarya. Ya yeke-mîn ev giraniya herêmê ya wê rojê bala hin hevalan nakişne. Wê nîvserxwebûna dirêj ji aliyê çand û wêjeya kurdî de jî gelekî fêkî gihadine me. Prof. Qanadê Kurdo di pirtûka xwe ya Dîroka Edebiyata Kurdî de cîh daye 13 hozanêñ kurmanc. Ji wan 13 hozanen 7 heb ji Hekaryan in. 6 heb jî ji hemû kurmancêñ din in. Wê demê bajarêñ wekî Amed, Mûsil û Riha jî dîsa mezin û li cîhê xwe bûn. Lî mitrov di aliyê çanda kurdî de tu berhemêñ girîng li wan bajaran nebîne. Ji ber ku rewşa wan ya siyasi cuda bû. Waliyêñ Osmanî dema diçû şerê Sefaviyan Hekariya didîtin. Lî kurdê Amedê û Wanê her dem di bin zilm û zordariya wan de bûn. Wan nedihîsttin çanda kurdî pêş ve here. Edîbêñ kurd di nav mîrekên kurdan ên serbixwe de berhemêñ baş aşfrandine. Dr. Sadiq Bahadîn Amêdî ji bo devera Hekarya dibêje “Ew cîh warê zanistî, camêrî, xweşmîr û toreya kurdî bûye”. Dûrmayîna dijminê biyanî kêm be jî doza qewmiyetiye kevn tevna xwe raçandiye. Ma qey seydayê Xanî ji stêrkeke din hatiye vê deverê û gotiye;

Ger hebûya me îttifaqek  
Vêkra bikira me înqiyadek  
Rom û Ereb û Ecem temamî  
Hemîyan jî me re dikir xulamî

Seydayê Xanî bi xwe dibêje; "Her giyayek li ser reha xwe şîn dibe". Ew tiştên di derbarê qewmiyetê de di serê hin mirovên din de jî hebûn. Lê wî kire nav rûpelê pirtûka xwe. Mirov bîr û baweriyêne xwe ji der û dora xwe hildide. Berxwedana Kela Dimdimê di salêne 1610-20'an de ye. Yanî 30 sal berf bûyîna Ehmedê Xanî ye. Xanî Mukrî, zilamekî herêmî ye û graniya wî jî tenê li devera Mukriyan tê dîtin. Ji herêma Hekarya, Botan û Behdînan bi sedan mîrxas û egîd bi dil besdarî berxwedana kela DIMDIMÊ bûne û hatine kuştin. Li rêzikên destana Kela Dimdimê binihêre:

Hat lawikê Hekarî  
Şûrê wî xwîn jê dîbarî  
Got; Qebala min ordiya Nîzarî  
Hat lawikê Ertûşî  
Şûrê wî xwîn jê dîbarî  
Got; Qebala min ordiya berojî.

Ma heger xîreteke qewmiyetiya kevnar li ba xortan nebûya karê wan li ber Kela DIMDIMÊ ci bû? Mîrê Hekarya yê Botanê û yê Behdînan gelek ji Xanê Biradostî mezintir û xurttir bûn. Kelîna xwîna qewmî berê wan mirovan dabû berxwedana Kelê. Bêhna qewmiyetiya kevn ya Benî İsrâîlî û Erebî ya di nav kitêbên pîroz Tewrat û Quranê de jî tê pozê mirovan. Hem di serê Cembelî de dîtina qewmiyetê di rîza duyemîn de ye. Di rîza pêsiyê de, evîndariyê hêlinâ xwe çêkiriye. Dema birc û kelatêن Hesenkeyfê dibîne "Mezinahiya xaka kurd û bindestiya wan tê bîrê". Lê dîsa jî serkaniya vê ilhamê jî seydayê Xanî ye. Ev rêzikên wî dide ber dirêşan.

"Bifikir ji Ereb heta ve Gurcan  
Kurmancî ye bûye şibhê bircan"

Li Amedê xancî dipirse; "Ma hûn nikarin bi hev re dostanî û yekîtiyê çê bikin?" Piştî bersiva wî dest ji van gotinan berdide û dibêje: "Ew êşike giran e ne jana îro ye, ya qîrn û çaxa ne". Serê Cembelî û hin giregirên navêne wan di pirtûkê de derbas dîbin de, hin dîtinêne qewmiyetâ kevn hene. Ew jî ji bo devera mîrekî kurd ku yekî nîv serbixwe pêwîst e ku gelek kîmasî neyêne hesibandin. Min ji bo zimanê romanê dewsa peyva qewmiyetiye peyva netewî bi kar anîye. Ez bawer dikim ew dibe sedemê xelettêgîhîstinê.

Navê du jinê bi nav û deng jî di pirtûkê de derbas dibe. Ji wan yek Helîme Xatûn e ku mîratiya Hekarya kiriye. Ya din jî Atiye Xanîma Bosnayî ye. Ku ew jî çekera konfederayona eşâriya baskê rast û baskê çep e. Ger di vê deverê de jin nebûna xwedî maf ew ê çawan nebûna bûbûna mîr, rayedar û rêvebirên gel. Him kurdan beriya hezar salan gotiye: “Şêr şêr e, ci jin e ci mîr e”


– *Te ji zargotina kurdî romanek afirandî ye. Li gorî te vê gavê rewşa zargotina kurdî ci ye?*

– Qedexekirina zimanê kurdî, valakirina 3000 gundên kurdan û koçberiya gelê kurd ya bajarêñ mezin û welatên biyanî ziyanêke mezin daye zargotina kurdî. Bi milyonan mirov ji bingehêñ xwe hatine qetandin û dara zargotinê gelek pelên xwe dawesandîye. Warê zargotinê ji bo nivîskarêñ kurd pir girîng e. Ger strana Cembelî di destê me de nebûya me nikarîbû ev bûyer derbasî edebiyata nivîskî bikira. Zargotin qotika me ye ronahiyê ye. Em xwe di wê de dibînin. Lê mixabin li aliyekî asîmîlasiyon, li aliyê din jî koçberî wê dide windakirin.

– *Têkiliyên te bi Nûdemê re yek û yek nuh dest pê dike. Tu ji bo Nûdemê ci difiki-ri? Rexneyên te hene. Heger hebin, ci ne?*

– Min heya niha du hejmarêñ NÛDEMÊ xwendine. Kovareke dewlemend û rêzbilind hate ber çavêñ min. Ez bi xwendina wê pir kêfxwêş û dilşâ bûm. Xwezil min hemû hejmarêñ wê xwendibûna. Ez naxwazim ev gotinêñ min wek rexneyan, lê mîna daxwazêñ biratî û hemwelatiyekî werine pejirandin. Devera Hekarya ji bo mirovên cîhê mala wî û cîhê karê wî ji hev dûr be, dibêjin “Mal Hemkan, banahî li Çemkan”. Hemkan û Çemkan du gundên ji hev dûr in û hevrazê nav û deng SÎWARA XELÊ di navbere wan de ye. Rewşa NÛDEMÊ jî hinekî nêzîkî naveroka vê gotinê ye. Ger derfetên wê hebin, bila weşanxana xwe ji Çemkan bar bike û were rex mala xwe ya Hemkan, dê pir baştir bibe. Lê ez dîsa jî ji bo vê xebata bi rûmet û bargiran xwedîyê wê Fırat Cewerî û hevalên wî yên xebatkar û zehmetkêş pîroz dikim. Ez wek giraniya çiyayê CÊLO ji wan re silavan dişinim û dîsa ji bo wan serkeftin û pêşveçûnê dixwazim. □

# EM ÇAWAN GIRAMIYÊ BIDIN MIRADO?



TOSINÊ REŞİT

Berî kurtedemekê hejmara Nûdemê ya 21ê gîhîste min. Tiştekî şabûnê ye ku pirs û problemên di kovarê de têñ bilindkirin û ronîkirin, di çarçeva armancêñ kovarê yên bingehîn de, roj bi roj firehtir û kûrtir dîbin. Nûdem pîrsêñ çanda kurdî bi piralî râberî xwendevanan dike. Vê carê strana kurdî bûye tema. Di vê hejmarê de çend gotarêñ hêja li ser strana kurdî hene.

Ev bêtîrî sî salî ye, ez û xanima min Nûra Cewarî stran û awazên kurdî berhev dikin. Van salêñ dawî herdu keçen me Zozan û Aza jî ketine bin vî barê giran. Me bi qasî deh hezar stran û miqamên kurdî, yên folklorî berhev kirine û em hê jî berhev dikin. Ji ber vê jî ez dixwazim hinek fîkrîn xwe di derbarê van gotarêñ çapbûyî de bibêjim.

Strana kurdî, çawan bi tekst, wisan jî bi awaz pir dewlemend e. Bi baweriya mîn ew beşê folklorâ me yê lape hêja ye. Çawan Şivan Perwer jî li cihekî gotiye, zordaran gelê me ji xwendin û nivîsandinê bêpar hiştine, me jî ji neçariyê derd û kulên xwe, hesînê dilê xwe, giş bi stranan dane der.

Em bêne ser gotarêñ çapbûyî. Sidqî Hirorî di gotara xwe ya strana berxwedanê

de bi nimûna starnêne Tehsin Taha cih û rola strana berxwedanê di jiyana gel de tîne ber çavan. Bi rastî ji strana berxwedanê iro perçekî jiyana gelê me ya pir girîng e û ji bo hişyarkirin û geşkirina hesinêne netewî roleke pir mezin dilîze.

Zeynelabidîn Zinar di gotara xwe ya "Starana kurdî û pêvajoya wê ya dîrokî" de dinivîse: Stran ew tişt e ku bûyerek ji aliyê dengbêjan ve bi kês û nikil, bi dengekî qalind û dirêj û tewîndar tê gotin. Stranêne bi vî babeti bê muzîk in, lê di şûna muzîkê de gelek tewin têne kişandin...

Berî gişî ne rast e ku stran bi dengê qalind bê stran. Eger mirovê distrê bi rastî dengbêjê hosta be, marifeta wî ya sazbendiyê heye, ew dikare bi dengê zirav ji bistirê. Ya duwemîn stran bê muzîk nabe. Stran berî her tiştî sazbendî ye, muzîk e, ew bi awaz, qeyde, miqam û melodî tê stran.

Ger stranêne kurdî bê muzîk in, wisan e semfoniya Bethoven û Çaykovskî, opera-yen Verdi ji bê muzîk in. Nirxê strana kurdî berî her tiştî awaz, muzîka wan e ku pir dewlemend e, kûr e, pirreng û pirceleb e. Ev ne baweriya min tenê ye, ev baweriya sazbendnasen profesyonel e, ci yên kurd, ci yên biyani. Hê ji problemeke kurdnasiyê ya mezin e, lêkolîna stran û awazên kurdî ya zanyarî bikin û vê dewle-mendiya çanda me raberî gelê xwe û gelên mayîn bikin. Stranêne kurdî serbilindiya çanda me ye. Lê ji talebextan re heta gelek ronakbîrên me ji bi çavekî bicûk li vê pirsê dînihêrin.

Di gotara Z. Zinar de şaşiyek ji heye ku ez bawer dikim ewê ji têberdana teknikî be. Jêderka(çavkaniya), Xalo ez girtî me li xerîbiyê ku xwediyê gotarê çawan perçeyek strana Kawis Axa ya li ser Şêx Mehmûd raber dike, ne rast e. Ew jêderk ji strana "Elî Xarziya" ye ku dîsa Kawis Axa distirê.

Şerefhan Cizîrî di gotara xwe ya "Bûyer, huner û henermend" de ku esseyeke fel-sefi ye, bi nimûna Reşîdê Omerî û strana wî: Sadûn Axa, cih û rola hunermend di sistêma eşîrtiyê de tîne ber çavan. Ev ew dem e ku xortêne sosyalist hê çanda gelerî li gor ya pêşverû û paşverû par nedikirin. Ş. Cizîrî di gotara xwe de analîza pêwendî û têkiliyên navbera hunermend, cşîr û malbatêne serekeşîran tîne ber çavan. Ew têkilî bi sedsalan hatine çêkirin û di vê sistemê de herkes cihê xwe dizane. Ji ber vê ji Reşîdê Omerî, dengbêjê eşîra Omeriya, wek masîyê di avê de aza ye û dikare bêje: Ez şâîrê dinê me/ Yê ku min nehewîne mala xwe/Ez bi zor mîyanê wê malê me.

Pirsên di vê gotarê de têne ronîkirin ji bo dîroka çanda kurdî pir girîng in û ez hê-vîdar im wê zanyarê me yê jêhaflî vî karî bidormîne.

Ez dixwazîm hinekî dirêj li ser gotara Süleyman Demir, ya bi sernivîsa "Ji bo gîramiya Mirado" rawestim. Gotar, ew mikurhatina nûnerekî nivşa şoressgerên kurd

yên sosyalist e, ku di dema xwe de, di salêن heftiya de giramiya hêja nedane huner û hunermendêن gelerî, li wan xwedî derneketine, li dijî zordariya dewletê ji wan re nebûne pişt.

Hema di vê hejmara Nûdemê de em dixwînin, Eyşe Şan di nava bêdengî û tenêtiyê de, ji welatê xwe dûr, li Îzmîrê wefat kiriye. Ev yek dide kifşê, wekî em îro jî li hunermendêن xwe xwedî dernakevin. Ez bawer nakim Eyşe Şan ji wan hunermen- dan kêmîtir bû, ewêن navêن wan di van gotaran de derbas dibin.

Lê, em vegerin ser gotara Süleyman Demir. Gotar balkêş e, bi kel, bi dil û can hatiye nivîsandin. Ew dinivîse: Mirado muzîka kurdan a ji her babet tesîra biyanî dûr û pak digirt. Muzîka bav û kalan digot. Lê, li gor mantiqê siyasi û dîrokî yê dema wî, hemû tişîn kevin, "kevnar û nebaş û paşverû bûn". Ji ber ku nivşê nû, bi helwesta xwe ya nihîlist, destûra hilweşandinê dida dijminan û asimîlasiyona wan, ya bi plan. Nivşê nû ji dana destûrê bêtir, bi wê helwesta nihîlist alîkarîya wan dikir. Ü nûnerekî wî nifşî bi dilşewatî kûr dinale: "Ax çi tofan bû... çi talankerî bû, çi zalimî û bextereşî bû, çi êş û şermezarî bû." Ji bo ew zalimî, bextereşî, şermezarî, bête lêborîn, S. Demir, pêşniyaz dike: "Ez hêvîdar im ku wê kurd rojekê peykerê wî çêbikin, herin mala wî peyda bikin, ji nû ve jê re bi dilê wî raxin, bi tabloyêñ Gund û bajareñ ku wî ji wan hez dikir, bixemîlinin, lê deynin û bikin muzeya wî." S. Demir bawer dike ku "Kîjan miletê din be wê wilo bike." Na, hogirê hêja, ez di vê pirsê de ne bi te re me. Miletêñ mayîn wê wisa nekirana û divê kurd jî wisa nekin. Bê guman ez ne li dij im ku peykerê Mirado û hunermendên wekî wî werin çekirin, malen wan bikin muze. Lê ev pirsa duyemîn e. Ne divê em giramiyê ji bo stran û awazêñ Mirado bidinê, ne wisa ye? Eger wisa ye pirsa yekemîn ew e ku mîrata Mirado li dû xwe hiştiye, stran û awazêñ wî, çiqas ji destêñ me tê ji windabûnê biparêzin, bikin hebûna gelê kurd ya heta hetayî. Ji bo vê jî divê em niha (sibe wê dereng be) bikevin herêmên Nisêbînê, Midyatê, Hezexê, Stewrê, Kercewsê, Batmanê û Qamışlokê, Gund bi Gund, bajar bi bajar bigerin, kasetêñ dengê wî, gişan berhev bikin. Paşê wan dengbêj û hunermendan bibînin, yên stranêñ Mirado dibêjin, divê li wan herêman mirovêñ wisan hebin, starnêñ Mirado ji wan jî derbasî ser kasetan kin. Paşê divê tekstêñ stranan bêne nivîsandin, notayêñ stran û awazêñ wî bêñ nivîsandin û bi gotareke li ser jiyan û hunera wî, bi tevahî mîna pirtûk bê çapkirin. Ger em îro vî karî bikin, ewê sibê ji Mirado te peyker bê çekirin, lê dema em nekin, piştî bîst-sî salêñ din bes ji gotara te wê nifşê nû bizanibin ku huner mendekî wisa hebûye, lê wê ev yek ne bes be ku peyker ji wî re bê çekirin. Ü nifşê bîst-sî sal şûn de bê, ewê ji bo me bêje "çî nifşekî nezan bûye, ku çanda xwe nepa-

rastiye". Ji talebextan re ev wek sî salî ye ku em vê yekê dibêjin, lê yên guh bidin me kêm in. Em giş bi Evdalê Zeynikê serbilind dibil. Yaşar Kemal wî dike Homerosê kurdan. Lê Homeros bi Ilyada û Odyseya xwe bi hezar salan ma. Yunaniyan bi hezar salan ev epope parastine, gîhandine rojên me û kirine serbilindiya gelê xwe. Lê ji Evdalê Zeynikê ci maye? Û ji bo yê maye jî winda nebe em ci dikin? Em tu tişti nakin. Lê ji bo ku Evdalê Zeynikê ji bo nişê pêşerojê nebe gotineke vala, divê iro pêşewitiyên çanda kurdî her yek li herêma xwe li gund û bajaran bigerin, ji dengbêjan stranê Evdalê Zeynikê gişan berhev bikin, tekst û notên wan binivîsin û wek pirtûk çap bikin. İro hîn em dikarin tiştekî bikin. Ger me ev karê ha kir, baş e, ger me nekir Evdalê Zeynikê nabe Homerosê kurdan.

Z. Zinar gotara xwe wisa temam dike: "Berî ku ez dawî li vê nivîsa xwe bînim, dixwazim vê bibêjim ku strana kurdî iro li ber mirinê ye. Lê mixabin û sed carî mi-xabin, ew stranbêjiya bi şaneşin niha li bakurê Kurdistanê ketiye ber xırıxa mirinê û dengbêj nema dikarin dengbêjiya xwe bikin, ne kes êdî hewesa xwe li wan tînin û ne jî ew şevbuhêrk mane. Ji ber ku asimîsiyona dijmin bê pertav di van çend salêن dawî de tê meşandin; ji hezar û sêsedî bêtir radyo û televizyonêن tirkî daketi-ne holê, her roj bi sedan kovar û rojaname tên belavkirin. Ji van zêdetir û tişte herî sosret jî ev e ku niha çar kurd nikarin li ba hevdu şevbuhêrkekê bikin, lewra civata ji du kesan zêdetir hatiye qedexekirin!

Îcar ray û tevdîra vê yekê ev e ku hemû roşenbîr û siyasetmedarêن kurd xwe se-ferber bikin; çiqas stranê ku hene bicivînin û têxin şerîdan, sêlik û belgeyan û wan ji mirinê rizgar bikin."


Belê divê em folklorâ xwe bi giştî û sazbendiya xwe ya gelerî bi taybetî, ji mirinê rizgar bikin.

Tiştekî berbîn e, wekî li başûrê Kurdistanê hinck kar hatiye kirin, pirtûkên stranêن Hesen Zîrek, Elî Merdan, Resûl Bêzar Gerdî û çendekên mayîn bi notayêن wan ve çap bûne. Stranê wan û wisan li dengxanêن mîna radyoya Bexdayê ya be-şa kurdî de tên parastin. Lê hunerê dengbêj, hunermendêن wek Mirado hê jî bêx-wedî mane û divê em li wan xwedî derkevin.

Bi wê yekê re tevayî ku em stranê xwe ji mirinê û ji windabûnê biparêzin, divê lêkolîna wan stranan ya zanyarî bê kirin. Taybetiyêن sazbendiyêن (muzîka) kurdî bêne dîtin, ewêن ku sazbendiya me ji ya gelên cîran cihê dikin. Hema ew taybetî gerek bibin bingeh, hîm, binax ji bo hunermendêن kurd yên profesional, yên iro û yên pêşerojê.

Gelên pêşketî stran û awazêن xwe yên gelerî wek sed, sed û pêncî salî berê berhev

kirine, notayê wan nivîsandine û çap kirine. Gelên li dor me, yên agaha min pê heye ermeniyan, gurcan, ev kar sed sal berê dest pê kirine. Lî em hê jî di guhê gê de ne. Şermezariya mezin ew e ku ronakbîr, rîexistin û weşanxaneyê kurdî hê jî giraniyê nadîn vî karî. Ez bawer dikim, ku piştî bîst-sî salêñ din ewê pêşewîtikî çanda kurdî wê wek S. Demir binivîse: Ax çi tofan bû ! Ci êş û şermezâr bû ku me di dema xwe de guh neda karê berhevkin, lêgerîn û çapkirina stranê kurdî. Me hebûneke çawan ji destê xwe berda, winda kîr. □



Ev hersê pirtükêñ Weşanêñ Dengê dikarin ji navníşanêñ jêr werin xwestin:

Deng Yayıncıları  
Tarlabaşı Cad. No: 232 / 4  
Beyoğlu-İstanbul

Ziya Laçın  
Postfach 131831  
41045 Wuppertal-Almanya

# DÎSA ÇEND GOTIN LI SER ZIMANÊ ROJAN HAZIM

LALEŞ QASO

**B**îrêz Rojan Hazim, bawer bike gava min nivîsa te a ku di Nûdemê hejmara 24an de derçû, xwend, mîna ku ez ji dara tewafê bikevîm wilo li şêx û mişayix û melayiketan ecêbmayî mam! Bawer bike, min li ser navê te fedî kir.

Ezbenî mesela me ziman bû. Helbet mirovê ku ji xwe re biecibîne dikare si-qêfnameyan binivîsîne. Ew tiştekî dîn e. Belê mesela me ne ku te ê li ser şexsiye ta min binivîsanda; min bike zimandirêj, sefilê fîkrê, çîçik û filan û bêvan. Te, nivîsek di Nûdemê hejmara 19an de nivîsibû. Ez ji wek xwendevanekî vê kovarê, li ser pergala zimanê te di hejmara 21ê de hinekî sekînibûm. Çawa heqê te heye ku tu wek nivîskar an feylezof di kovarê de bînivîsînî, heqê xwendevan jî heye ku li ser ziman an li ser hin dîtinên te di vê kovarê de bînivîsîne. Dibe ku tu deryaya zanistê bî, ev ji bo kurdperestekî wek min serbilindayî ye; belê wî heqî nade te ku îcar tu jî li ser navê zanistê heqaretê bikî. Dibe ku min çewt nivîsî be ma nabe qey? Çawa nabe! Dibe ku ez bi zanyariya te a bêhempa agahdar ne bûbim, min tu wek xwe şagirtî dîtibe û zimanê te rexne kiribe. Ma na be? Belê dibe! Dibe ku min xwe serserkî avêtibe çala genim, îcar ma dibe ku mirov însanekekî li ser kodikek genim di hindurê çalê de bikuje û temamê genim di xwinê de bihêle! Îcar ci yanî?

Baş e ku te bi xwe nivîsiye. Te xwe ji ber hin gotinêñ min engirandiye û tu bi xwe wan gotinan pêşkêşî xwendevanan dikî. Tu dînivîsînî:

**"Çend nimûneyên sefaleta fîkrî ya xwendevanî.** Her di serî da ez dê çend gotinêñ wî yên orjinal yên reşkirî rêz bikim!" Û tu rêz dikî:

"Hevok xwar saz bûne. Ne vêl e gelo? Ahenga zimêñ xera nake gelo? Ziman nexweş kiriye. Ziman dîsa bi ser hev de guvaştî ye. Bêjeyên pirecêb. Çawa biru-

kubîne! Ziman pir selixandî ye! Çewt nivîsiye. Bi ku de şeg bikin? Hevok çendî vêl in. Pir belawela ye. Bi kurmancî nabe. Li kurmancî nayê. Di kurdî de nabe. Di kurdî de tuneye.

Xwendevanî nivîsara min ya nêzîkî deh rûpelî, bi navê zimanziyê, bi van gotin û termen li jorî, rave kiriye! **Eve çi sefalet el!**

Yanî niha bû çî! Ez heyran Hazim, ma çêdibe ku ji bo van gotin û termên li jorîn mirov ji "Xwendevanî" re "Çûçelok, kurk, qirereş, zimandirêj" û hwd. bibêje? Ev çawa ronakbîrî an feylezofî ye! Baş e, gava min pesnê zimanê te bida te ê di bersiva min de ew siqêfname binivîsanda gelo? Bawer nakim. Te xwe tam daye dest ezbenî. Bêhna xwe fireh bike, ez ê hema bêhnikek din bêm ser mesela bê min "demagojî," li te kiriye an min rast gotiye. Min hîç ne dixwest ku dawiya rexneya min wilô bizivire. Belê te rê li devjenkê girt. Min dixwest ku bi te re tenûrê bisincirînim. Belê te lehî li tenûrê rakir. Dawet belav bû reqs bi min û te êdî nema dibe. Ez nikarim bi te re derxînim serî.

Birêz Rojan, ne ez te ne jî tu min nas dikî; ne min bi te re ne te bi min re xwariye û vexwariye. Îcar ji ber hindê çenabê ku "Dilreşî" yeke min bi te re hebe. Çimkî berî her tiştî ez te nas nakim. Ji bîr meke gerek te "zikreş" bigota, ne "Dilreş." Hîn ji serî de te gotin çewt bi kar anîye. Neyse ez ê li ser bê tu çiqasî nizanî zimên bi kar bînî nesekinim. Berî ku ez ji bîr bikim, digel ku C. Bedir-Xan botî bû û bingehê edebiyata kurd a klasîk mentîqa Botan bû, wî camêri gramereke botanî ji me re çenekir. Ew ji devoka botiyan reviya û gramera xwe li gor kurmanciya giştî saz kir. Tu ji bîr dikî ku gramera wî di nav kurdan de rûniştiye. Tu ji bîr dikî ku bi deh milyonan kurmanc wê tucarî bi devoka botiyan nepeyivin û nenivîsinin. Dev ji devoka xwe berde û bibe alîgirê zimanekî giştî. A te ne karekî întelektuelî ye ezbenî. Di zimanê me ê nivîskî de xelkê me ê soran, "Belam, belê," zaza û kurmac "belê" û tu jî "belêm" bi kar tînî. Gerek te jî wek me hemiyan binivîsanda. Zimanê te ji zimanê kurmancan ê nivîskî bi carekê ve cihê ye. Tu tadeyê li xwe dikî ezbenî.

Ku em bênen ser mesela xwe û te û zimên.

Berî her tiştî ez ne mirovekî zimanas im. Belê ji bo ku mirov zimanê yekî wek te rexne bike, îcar hîç pêwîst naake mirov zimanas be; yan jî hinekî gramerê bîzanibe. Çimkî di vekîta te de mantiq tune. Xwe aciz meke, ez ê bêm wê derê.

Tu di kovara Nûdemê hejmara 19an de agadariyek wilô dide xwendevanan:

**"Nota Nûdemê: Li ser daxwaziya nivîskêr, em têkilî zimanê wî nebûne."**

Yanî çî? Tu ewqasî zimanzan î hal!

Nûdemê ne baş kiriye ku têkilî zimanê te ne bûye. Nûdemê bi vê yekê neheqî li xwendavanen kiriye. Kovar ne ji bo xwediyê kovarê û nivîskarên kovarê, ji bo xelkê kurd derdikeve. Li gor saloxdanan li dor sê hezar mirovî xwendevanen vê kovarê hene. Ne heqê te heye ku tu bibêjî, "têkilî nivîsa min nebin" û ne jî heqê Nûdemê ye ku têkilî nivîsan nebe. Wezifeya redaksiyonê ci ye? Redaksiyona ku wê nikaribe têkilî zimanê te bibe, gerek têkilî zimanê nivîskarên din jî nebe. Gelek nivîskarên ku dixwazin wek te devoka mentîqa xwe bi kar bînin hene. Gelo wezifeya redaksiyonê tenê hemalî ye? Yanî her nivîsa ku jê re hat yekser têxe çapê û belav bike? Yek din, ser çavan, bila bi devoka te nelîze. Belê dîsa jî heqê te tuneye ku tu bibêjî "têkilî nivîsa min nebin." Di nivîsên te û ên me hemiyan de berî her tiştî, tîpêñ zêde û kêm hene. Redaksiyon bi kêmanî divê bêjeyên wilo serast bike. Mesele di vî warî de tu di rûpelê 13an rêza 17an de, "nimûne," di rûpelê 19an rêza 3an de jî "nimune," di rûpelê 13an rêza 19an de "hemu," di rûpelê 16an rêza 8an de "hemû," di rûpelê 16an stûna duduyan rêza 3an de "bi van xasyeta" û hwd. dinivîsînî. (Hejmar 19) Bi vî awayî gelek şaşiyên te hene. Îcar ev karê redaksiyonê ye û tu jî dibêjî ku ez qebûl nakim. Ev ci nefşmezinî ye!

Di nivîsa te de mantiq tune û tu nahêlî ku redaksiyon jî têkilî nivîsa te bibe. Tu, di rûpelê 12an rêza 9an de "manayekê," di rûpelê 13an rêza 1ê de "manaya-ke," di rûpelê 19an rêza 6an de "maneke" dinivîsînî. Te ev bêjeya ha bi vî awayî gelek caran nivîsiye. Ez ji te re dibêjim ku tu bê qûral dinivîsînî. Tu, di rûpelê 14an stûna duduyan rêza 19an de "heta," di rûpelê 16an rêza 15an de "hetta" dinivîsînî. Bi vî awayî "heta" te ev bêjeya ha heft carî û bi awayê "hetta" jî heyşt carî nivîsiye.

Tu, di rûpelê 21ê rêza 1ê de "welatê xwe..." û dîsa di vî rûpelî rêzên dawî de "welitekê bi dest diêxe" dinivîsînî. Ez ji te re dibêjim ku zayenda "welatê" nêr e. Ü zayenda "welitekê" jî mê ye. Ü tu jî min bi zimandirêjayiyê tawanbar dikî ezbenî. Wilo bersiv nabe. Hem tu şaşiyên gramerî dikî û hem jî ji ber ku ez te bi vê yeka ha agahdar dikim, tu pêl min dikî.

Tu, di rûpelê 13an rêza 26an de "ew li milekê" û di rûpelê 21ê rêza 16an de "li milê dî" dinivîsînî. Bêqûral e ev. Zayenda "milekê" mê ye. Ü zayenda "milekî" jî nêr e. Yekê ji xwe re hilbijêr e. Ya milê + milekî û ya mila + milekê binivîsîne. Wilo kêfî nabe. (Hejmar 19)

Birêz Hazim tu dibêjî ku;

"Xwendevan li ser hindek bêjeyên ku bi forma nêr an jî mê bi kar hatine jî di-

sekine û dibêje ku, bo çi ‘dem’ nêr bi kar hatiye?” Û tu di vî warî de rûpelekî dinivîsinî. Ezbenî tu min bi “demagojiyê” sûcdar dikî û tu bi xwe li ser navê min demagojiyê dikî. Min tiştekî wilo nenivîsiye. Yanî bi rastî ewqasî jî nabê! Wilo dixuye ku nivîsê pir tesîr li te kiriye. Ev yeka ha jî ji aliyê psîkolojîk de te xweş rave dike. Min ne gotiye ku ji bo çi Hazim “dem” nêr bi kar anîye. Ez baş dizanim ku “dem” li hin mentîqan nêr û li hin mentîqan jî mî tê gotin. Wek vê gelek gotinên din jî hene ku li hêlekê mî û li hêlekê nêr tên bi kar anîn. Ey xwendevanino, li hejmara Nûdemê a zîê li nivîsa ku min li ser zimanê Rojan Hazim nivîsiye dîsa binerin. Eger min tiştekî wilo gotibe ez ê pîvazeke bûnîsrî bi guhê xwe ve daliqînim. Yana çî!

Birêz Hazim, tu min bi **“sefaleta fikri”** tawanbar dikî û tu dibêjî:

*“Dîsa xwendevanê me serê xwe ji ber gotin û hevokê min li dîwaran dide! Çi ye? Rawestek! Ev gotine jî ji nav hevokê mûçink kirîye, ser û çavên paragraf û hevokê pelixandine, bêje ji manaya ku di hevokê da xuyayî, dûr kirîye! Hevoka min ev e: Jiyan ne rawestek e. Jiyan bi serê xwe bizav e, tekoşîn e. Li vê derê mexseda bi kar anîna ne rawestekê anku jiyan nasekine, bizav e an jî jiyan ne statîk e, dînamîk e. Bi gotineke dî; rawestek ne li şûna, belêm bi manaya statîkê bi kar hatiye! Vêca xwendevanî ew bêje, ji wê manaya xuyayî ya di nav hevokê da, bi mexsedeke neqenc dûr kirîye. Aşkera ye ku gotina ne rawestek e bi manaya ne statîkê bi kar hatiye. Li vê derê rewşa jiyanê hatiye ravekirin. Belêm xwendevanî ji ber negatîvi û dilreşîya xwe, ew bêje li zimanê xwe alandîye û ne polemîkeke stewr jî, bi timamî zimandirêjî li ser kirîye.”*

Baş e ku te bi xwe a min jî nivîsiye. Min ji serî de gotibû ku te bi siqêfan rê li devjenka ilmî girtiye û ez ê tiştekî ilmî ji te re nebêjim. Belê ez hîc nikarim gotina “zimandirêjayê” daqurtînim. Ji ber hindê ez mecbûr im bibêjim ku, li gor pîvanên ilmî di vir de nivîs pêşker e yanî “belîrleyici” an meqseda dil pêşker e? Helbet nivîs pêşker e. Rexnegir wê li ser gotinan an li ser meqseda dilê te bisekine? Helbet wê li ser gotinan bisekine. Gotina te a li ser kaxetê “objektîv” meqseda dilê te ê nedîyar jî “subjektîv” e. Tu fêm dikî bê ev “sefilê fikirê” ci dibêjî? İcar tu dinivîsinî ku, “Jiyan ne rawestek e. Jiyan bi serê xwe bizav e, tekoşîn e.” Û tu bi danîna du niqteyan ( . )du carî davî li hevokê tînî. Yanî hevokekê diqedîne. Te berî wê, piştî wê çi gotibe rexnegir elaqedar nake. Em ê niha vê hevokê deynîn û bi awayekî gramerîrave bikin:

**“Jiyan ne rawestek e.”** Di vir de jiyan kirde (subjekt) û rawestek jî pêvebera

(komplementa) lêkera bûyinê ye. Îcar pêveberên lêkara bûyinê dikare navdêr an jî rengdêr bin. Rengdêr rewşa dînamîk û navdêr jî rewşa statîk dide. Di vê çarçovê de du mînak:

- 1)Heso jîr e.(dînamîk)
- 2)Heso textor e.(statîk)

Heso kirde, jîr - textor pêveberên lêkera bûyinê ne. Îcar di vir de gava ku em pêvebera bêjeya **rawestek** û **jîr** û **textor** didin ruyê hev, em dibînin ku rawestek ne li jîr, li textor dinere. Yanî rawesteka te bûye navdêr. Yanî bûye navdêrekî wek birek, tevşo, kelbetan, frêñ û hwd. Hevoka te maneyeke dînamîkî nade. Ji ber ku rawestek wek navdêr bi kar hatiye, nade. Di şûna "**ne rawestek**" de gererek rengdêrekî guherbar û domdar (dînamîk) bi karbihata. Balkêş e, ez zorê didim wî ku "rawestek" di hevokê de navdêr e, (statîk) e. Û ew jî dibêje ku min rawestek bi maneya dînamîk bi kar anîye. Îcar gava yekî din bi awayê dînamîk zorê bidêyê, ew dikare bibêje ku min bi maneya statîk bi kar anîye. Eva te ne pîvaneke ilmî ye. Helbet ez baş dizanim ku te "rawestek" ne bi maneya frêñ nivísiye. Belê ji xwe problema min jî bi te re ew e ku tu dev ji wan gotinê bêma-ne berde!

Birêz Hazim te di hejmara 19an de "Ronakbîr kedkarê mejî ye,ew bi karê mejîyî ve mijûl e... Berhemên mejîyî" nivîsbû. Ü min jî gotibû ev gotin li zimanê me nayêن, bi kurmancî nabe û hwd. De îcar ka em ê binerin bê te çawa bersiv daye min, hêja ye ku em hemû bi hev re bixwînin.

*"Di dawiyê da jî disa li ser hevokan diseleine û li ser vê hevoka min (ew bi karê mejîyî ve mijûl e) wisa dinivîse: 'Ez fêm nakim bê çima tu nabêji, ew bi kareki intellektuelî dadikeve an mijûl dibe'*

Niha eve gotine? Ev ci ji xwe razîti ye? Mirovê ku ji etîka gotinê misqalek têhîn wernegirtî wisa dibêje!! **Hem paşê ev tarz gotine jî bi serê xwe sefaleta fikri ye!** Du mirovên cuda tarîf, teswîr anjî ravekirinê wektî hev anjî bi yêk qalib bêje û hevokê nakin! Herkes tiştekê bibêje û termêن ku ji nava dil û mejîyê xwe dibîşkîvin, teswîr û rave dike û tîne ziman. Ziman ne matbû ye ku mirov qalibên bêje û hevoka hilgire û di nava nivîsarê da bi cih bike!. Ez karê ronakbîrîyê wisa rave anjî teswîr dikim! Kesek dî li goreyi xezîneya gotinê xwe cudatir rave dike. Belêm vêca têgihîna van ravekirina ji, **kapasîteya zanahiyê dixwaze**. Mirovên ji zanînê dûr helbet fêm nakin! Xwendevanê me disa ji zanahîya li ser zimanî dûr wisa dibêje: 'bi kareki intellektuelî dadikeve.' Xwendevanî bi vê gotinê jî édi bi timamî

## *xwe kiriye stûna sefaleta fikri!*

Erê ezbenî bersiva min bide. Pêwîst nave tu xwe bikî taca zanistê. Ji xwe xuya dike. Ravekirina bêjeyan tiştek e û lêkirina bêjeyan tiştek e. Yanî axaftin û nivîsandin tiştek e û ravekirina wan tiştek e. Ez ji te re dibêjim ku tu bi kurmancî nikarî bibêjî "Ronakbîr kedkarê mejî ye, ew bi karê mejîyî ve mijûl e!" Tu çima gotinan bi vir de û wir de dibî û heqaretê li min dik? Bi zimanê te, ez tiştekî "konkret" yanî dariçav datînim, û ji te dixwazim ku tu jî li gor pîvanê "morpholoji" ya zimên û hevoksaziya zaravayê kurmancî min biversivînî, ku gelo bi rastî mirov dikare bibêje "Ronakbîr kedkarê mejî ye, ew bi karê mejîyî ve mijûl e" weh!

Birêz Hazim tu dibêjî:

"Xendevanê nivîsarê di nav halê agresîvîyê da, piranî zimanekî nekubar, bêrêz û vulger bi kar anîye. Yêk du cara jî gotina 'birêz' bi kar anîye! Ew ne awayê mirovê zana û bi xwe bawer e."

Ê ne tu nizanî bê te bi xwe ci zimanekî kubar û birêz û xweş û maqûlane bi kar aniyî! Naxêr, min ne du carî, tam çar carî ji te re **birêz Hazim** gotiye. Ma çar carî ne bes e qey ezbenî? Baş e ser çavan, ez ê graniya xwe deynim ser birêzan.

Birêz Hazim, tu ji min re dibêjî:

"Demagojiya xwendevanî ya li ser vê xalê jî bi tinê sefalet e! ...Xwendevanê me li milekê zirbîna xwe hilgirtiye destê xwe..."

Îcar ev zirbîn ci ye! Min ev gotin fêm nekir. Dengê wê jî bi min pir nexweş hat! Hema çibe bila ji te re be. Ez rica dikim ku tu vê gotinê êdî tucarî bi kar neyînî.

Birêz Hazim, tu dibêjî ku xwendevanî:

"Vê carê jî hawara xwe gihandiye Celadet Bedir Xan. Ji ber ku navê Celadet jî bi awayekî feodalî û prîmitîv bi kar anîye, divê kurt li ser bisekinim. Wisa dibêje xwendevan, Xwediye vî zimanî Celadet... 'Ev tarze tercîheke helbet! Belêm ne terzê mirovê pêşketî ye. Ev tarze herweha şikandina rûmet û mezinahîya Celadet Bedir Xan e ji. Ew ne xwediye vî zimanî ye! Ew kedkarê herî mezin yê vî zimanî ye! Li alîyê dî ji, ew ne tabû ye! Bi navê qedir girtina mirovên hindê birûmet, gotinê wisa, bi yek gotinê sivikî ye!'

Birêz Hazim, hem tu dibêjî "tercîheke helbet" û hem ji tu wî mirovê ku ew tercîh ji xwe re kiriye sergende û beredayî dibînî. Baş e ser çavan.

Berî her tiştî ez ne mirovekî pêşketî me. Yanî ez tam kurdperest im. Digel ku tu li Ewrûpayê dîjî, tu nabînî ku dinyaaya me hîn jî tije xwedan û şeytan û pêximber in. Binere ezbenî, ez Ehmedê Xanî pêximberê xwe û Celadet Bedir-Xan ji xelîfeyê vî pêximberî qebûl dikim. Eger te heta niha ji nivîsên min ev aliye min ê paşverû yanî reaktîoner -kêfa te ji van gotinan re tê-fêm nekiribe, te çewtiyekê mezin kiriye! Qey tu Celadet wek otorîte qebûl nakî? Tu nekî wê bibe ci yanî! Tu ji kê hînî vê nivîsê bû? Ezbenî, ma îro li meydanê ji bilî C. Bedir-Xan tu otorîteyên me hene? Ez dibêjim na. Baş e, gava ez hewara xwe negihînim wî camêrî, ma ez ê bigihînim kêt? Eger gava ez xwe nekim bin qapûtê wî, ez ê çawa bikaribim zatêن wek te qanîh bikim ku dev ji "kerdi" û "kîrê" hekari berdin û bi "ku" û "kû"ya Mîr Celaderî binivîsinin? Binere bê tu di gotara xwe a bi ser-nivîsa "Kritikerî û Etîk" de ci dibêjî.

*"Emê bêne ser gotinêñ kî û kû! Li hêla Hekari û Behdîna di şûna kû derê da kî derê bi kar têt. Serda ji her bi wê manayê, ev formêñ kerdi û kîrê ji bi kar têñ. Bonimâne: Tu dê çiye kerdi? Anîj tu dê çiye kîrê?"* Û tu vê mesela kû û kîrê dirêj dikî û diçî. Erê ezbenî tu çîma min fêm nakî! Ez ji te re dibêjim ku C. Bedir-Xan gramera me ne li gor devoka "kerdi" û "kîrê" hin mentiqeyan saz kiriye; tu çîma dev ji devoka xwe bernadî, tu bi "ku" û "kû"ya kurmanciya giştî nani-vîsinî û te bi "kerdi" û "kîrê" hekariyan girtiyî û tu habela dinivîsinî waweylê!

Birêz Hazim, tu ji min re dibêjî:

*"Xendevanî xwe kiriye stûna sefaleta fîkrîl.. Xwendevanê me ji mala wî ava be, hema qet çu tişt nebîhistîye! Ew adeta di geraveke sefaleta fîkrî da melevaniya dîke!"* û hwd.

Erê yanî niha tu bi Xwedê kî ev ji gotin el! Baş e ser çavan. Hema berî her tiştî ez dizanim ku navê serokwezîrê Swêdê Göran Persson e. Îcar gava li min biqewime ez ê bikaribim navê serokwezîrê Danîmarkayê ji hîn bibim. Ezbenî ew "teza" te bi kêt nehat. Hem li gor ilmê psîkolojiyê mirovê ku sefilê fikirê be, zir ehmeq e. Û zir ehmeq ji tucarî nikarin navêñ tişt û miştêñ biyanî ezber bikin. Naxêr ew nebû, tiştekî din bibêje.

Birêz Hazim tu ji min re dibêjî:

*"Di çîroka Sonika kîrêt ya H. C. Andersen da; weki sona kurk dem têt û ji ser*

*hêkên xwe radibe, çûçelok ji hêka derdikevin û gotina wan ya pêsiyê dibe ev: 'Dinya çende mezin e!'*

*Helbet heqê wan hebû wisa bêjin. Ji wê dinyaya tenge hêkê derketibûn û hatibû dinyayeke firehtir. Dayika wan lê vedigerîne û wisa dibêje:*

*- Ma hûn dinyayê hindê dizanin! Dinya heta serê dî yê bexçeyî dirêj dibe. Ji wê derê jî pêda, heta zeviyêñ qeşeyî dirêj dibe...*

*Belê vêca heke xwendevanê me jî piçekê xwe biliwîne dê bizane ku dinya û helbet Kurdistan jî ne tinê gund anjî bajarkê wî ye"*

Tobe ya rebî de were û safti bike! Yanî niha tu bi qedirê Resûlê Ekrem kî cielaqa min û van çîçik, mirîşk û dîk û elok û filan û bêvanan bi hev re heye ez nizanim!

Baş e ser çavan. Di vir de pir vekiriye ku tu dixwazî ez ji te re bibêjim, kurkên gundê me ji kurkên gundê we bêtir dikirin xutxut, hêkên gundê me ji hêkên gundê we mestir bûn û her çendî çîçikên gundê we mezin bûn jî, belê ji ber ku tepoxî bûn wek çîçikên gundê me ne gerok bûn. Tu vê dixwazî ne wilo? È ne ez ê wilo nebêjim. Ez ê tiştekî din bibêjim.

Di sala 1981ê de li Beytülşebabê gundê Kelatan, çend rojekî ez bûbûm mîvanê Miho Dijwar. Rojekê min dît ku jîna wî a mezin bi hêrz:

"Vî dîkilî tro jî hindik mabû ku çavê Hitikê birijanda. Bavo em ê ji ber vî dîkilî qe ji vî gundi bar nekin!.."

Ji min werê dîkil teyrek e. Min jî di bersiva wê de;

"Hiç mereqa meke ez û Miho em ê sibehê wî dîkilî bikujin. Ma nizm an bilind difire?.."

Birêz Hazim ez li mentîqa te hinî navê dîkil bûm ku dîke. Îcar ev jî dide peytandin ku çîçikên gundê me bi rastî pir gerok bûne. Eger gava tu zorê bide min ez ê xwe berdim çiyayê Bezinan û gund bi gund li nav mamxuriyan û hwd. bîgerim. Gelo tu hatiyî mentîqa min nav omerî û bûblaniyan? Sitilîlê bi nav û deng e! Gerek te dîtibe.

Birêz Hazim vê carê jî tu ji min re dibêjî:

"*Li ser vê nezanîya xwendevanî mirov dikare tinê wê anekdota qirereşê (Corvus corone) bêje; gerçî ev anekdote piranî li ser hevrik anjî hevrikan tête gotin, belêm qeydi naake bila vê carê li ser me bel! Ji qirereşê rewşa çûçeloka wê pirsîne û wê jî gotiye ku çûçeloka wê li ber dilê wê weki çûçika ankayê ye. Anka, anjî zumrudi anka firindeya herî sipehî û bedew e, lê di rastiyê da nîne. Ew di xewn û xiyalan û*

*di çirokan da heye. Belêm digel hindê jî, ew bûye sembola sipehîti û delaliyê! Vêca berê herkesê li ber dilê xudan gelekî sipehî û şirîn e. Ahenga zimanê nivîsara min jî, li xwendevanî xweş neyêt jî, li ber dilê min ahenga herî xweş û şirîn e. Niha hûn werin ji min bipirsin ka ahenga zimanê xwendevanî, ku hetmen bo wî jî anka ye, bo min çawan e? Zimanê wî yê şikestî, bo min hind bêaheng hat, belêm dîsa ve ji ber hewcetiya berpirsyariyê, min sebir û xweşbinî nişan da û li ser reşbek-lek(!) a wî hinde dirêj nivîsi!*

*Belê! Vêca xwendevanî xwe kiriye hem dozger, hem dadger û li milê di jî xwe kiriye şêxulislam anjî ayetullahê fitoyê. Xwendevanî fitû nivîsiye! Camêr rûniştîye û tixûbê dev avêtina nivîsarê jî bezandîye û xwe bi xwe fitû daye ku dev bavêje ahenga zimanî jî!*

Welatê me tije pez û dewar û teyrûtilûr in. Kultura me a li ser heywên bê-hempa ye. La Fontaine bi xwe ewqas çîrok ji kurdan girtine. Pêwîst nedikir ku te ji ansîklopediyan, "**Corvus corone**" bigirta, xwe bigihanda teyrê Ankayê ku bi dû mirina Mûsa pêximber de bûbû dijminê zarokan, zarok dikuştin û dûra jî bi nifira Xenzal pêximber neslê wî ji dinyayê ditefe. Erê çîma tu bi çîrokêن civata kurd li min naxînî û tu bi "**Corvus corone**"ê ansîklopediyêن ewrupî êrîşî min dikî? Di vir de du tişt derdikevin meydanê, ya tu kultura civata kurd nizanî û ya jî tu bi van bêjeyêن wek "**Corone**" jîritiya xwe şanî me dikî!

Birêz Hazim, dibe ku tu ziman bizanibî, belê tu nizanî binivîsinî. Îcar gava ku mirov hem nizanibe binivîsîne û hem jî bi zimanekî biyanî bifikire û binivîsîne, nivîs pir beloq dibe. Dibe ku tu vê yekê nebînî, xwendevan dibîne. Tu bi tirkî difikirî û dinivîsinî. Hem tu ê herk û ahenga zimên xerab bikî û hem jî gava yekî wek min li xwe qewimand, tu ê jê re "zimandirêj" bibêjî. Tenê hema jî xwe re li vê gotinê binere:

Tu, min bi nefmeziniyê súcdar dikî û tu dibêjî; "... *Ew vê idenîtetê û xebata xwe, wekî çekeke şantaj û reşkirinê bi kar nayînin. Ew dilnizm û sade ne*" Ezbenî di kurdî de **dilnizm** tuneye. Yanî ne "tenê li gund û bajarkê" min. Li Hekarê jî kurd wilo nabêjin. Tu ji tirkî digirî. Tu, "**Alçakgönüllü**"ya tirkî wek "**Dilnizm**" pêşkêşî xwendevanan dikî. Di tirkî de "**Alçak**" nizm e. "**Gönül**" jî di derbarê dil de tê nirxandin. Di kurdî de **nefspiçûk**, "**Alçakgönüllü**"ya tirkî bi xwe ye. Yanî gava me got, "Bozo mirovkî **nefspiçûk** e, ew bi tirkî dibe, "Bozo **alçakgönüllü** bir adam dir"

Baş e, ci heqê te heye ku tu di şûna bêjeyêن kurdî ên rûniştî de, bêjeyêن fitqo-

yî dixî zimanê me?

Baş e brêz Hazim, tu gotara xwe a di hejmara 24an de bi 23 rûpelan diqedînî û sernîvisa wê jî bi vî awayî lêdikî, "Kritikerî û Etîk" Hîn ji serî de tu çewt lêdikî. "Kritikerî û Etîk" Yanî çi? Tu hem xwe însanekî zimanas dibînî û hem jî tu gotara xwe bi gotinêñ biyanî ku di şûna wan de tam bi kurdî hene nanivîsînî. Di vir de du tişt têñ bîra mirov, ya tu dixwazî zanatiya xwe pêş me bikî û ya jî tu ziman nizanî ezbenî. Ez jî te re dibêjim ku tu di warê zimên de ne çêker, xerabker e. Di vir de tenê dengêk yanî fonemek (jî ber ku kéfa te ji van gotinan re tê fonem dibêjim), bi kurdî ye. Ev típa ha (û) bi serê xwe tu maneyê nade. Û, a, o û hwd. çi be ew jî ew e. Di nav soranan, zazan û kurmancan de "Kritîk" wek rexne, "Etîk" ji wek **tore û exlaq** hatiye qebûl kirin. Ronakbîrêñ kurd hemû "Rexne, tore, exlaq" dînivîsînin. Sernîvisa te gerek wilo ba, (**Rexnegirî û exlaq**) an jî (**Rexnegirî û Tore**) Îcar gotara te bi gotinêñ wilo tije ne. Binere ez ê careke din ji te re îspat bikim ku a te ne zimanasi ye, tiştekî din e. Temaşe bike bê te çi û ne çi di vê gotara xwe de nivîsiye:

"Kiritîk, etîk, desantralize, primît, ekstremîzm, spontane, diskalîfiye, erozyon, egoist, amator, profesyonel, konsantrasyon, kadastrof, handîkap, pozisyon, sematîk, konkret, abstrak, sendrom, siyanet, diskusyon, metodê empatîyê, operasyon, egosantîzm, waqayî klînîk, evolusyon, hipernegatîv, agresîv, kategorî, matbû, anekdot, reaksiyon, polemik, kronîk, îndîrek, negatîv, pozitîv, aktuel, tansiyon, komentar, argument, norm, jîmnastîk, objektîv, projektor, orjinal, refleks, proses, fonksiyon, mekanîzma, kontrol, aktîv, branş, statîk, dinamîk, element, identîtet, micid, tecbîz, ekol, estetîk, formul, mucehez, sistematîk, tema, perspektîv, kompozisyon, tekst, vulger, fonetîk, morfoloji, sînonîm, etîmoloji, nuans, aksan, jektor, şantaj, oksijen, motîvasyon, portre, analîz, obje, pasîv, izole, paragraf, metal, prepozisyon, relativ, detay, misyon, muzmîn, hîpermîyop, ajîtatîv, propaganda, alternatîv, komple, barometre, metronom, word bilind' û hwd. Hîn jî hene belê min ewqas nivîsi.

Beri her tişî di prensîbêñ zimanasiyê de mîrovekî zimanas, di nivîsekê de ni-kare ewqas gotinêñ biyanî binivîsîne. Baş e brêz Hazim, eger zimanasi û intellektuelî bi zanîna van gotinan be, ha ji te re çend gotin jî ji tûrikê min: Word perfekt, word nizim, microsoft word, ready set go, anpassa, infoga, flender, kwit, window û hwd. Te dît bê ez çawa ne kêmî te me.

Bêhnikêkê biponije û li min guhdar bike: Dema ku min an yekî din wek van gotinêñ te ên ewrupî, gotara xwe bi gotinêñ erebî an tîrkî nepixand, gelo tu ê nebêjî ev çi kafîrstanî ye! Yanî gava min got îzacae, nesrullahî, wettînî wezeytû-

nî, summe, kizabiyyîn, qedesellahûsirrehû, zalîke, ell beqere, besell, sennora, ya hebîbî, meter, muxerebbîn, welemyelid, lemyûled, qulhû, şitgûl û hwd. gelo tu ê nebêjî ev çawa cesaret e! Mirov çawa dikare ewqasî zimanê mileteki piçûk bixîne! Mirov hin gotinê biyanî dixe zimanê xwe, belê ne bi vê ecêbê!

Birêz Hazim ez ji te re dibêjim ku tu ahenga, heta exlaqê zimanê xerab dikî.

Binere tu di rûpelê 64an rêza çaran de wilo dinivîsinî:

*"Xudanê nivîsarê di nav halê agresivîyê da, piranî zimanekî nekubar, bêrêz û vulger bi kar anîye."*

Ez jî ji te re dibêjim ku mirov nikare bibêje, "Xudanê nivîsarê **di nav halê agresivîyê da...**" Gava em li ferhengên biyaniyan li bêjeya "Aggressor" a latînî ku di frensî de wek lêker (aggredî) û wek rengdêr (agresiv) bi kar tê dinerin, em dibînin ku tam kurdiya "agresiv" (êrişker e). Îcar wî çaxî jî nabe ku mirov bi kurmancî bibêje, "Xwudanê nivîsarê di nav halê **êrişkeriyê da...** zimanekî nekubar bi kar anîye."

Tu zimanê me bêmirêz dikî. Ji sed mînakan mînakeke din: Tu di rûpelê 54an rêza 8an de, "Taybetîya **krîtikê** ya herî girîng..." dinivîsinî. Baş e ez ê jî vê gotina te bi erekbî û tirkî li dengê kurdî siwar bikim ka bê wê çendî xweş bê guh:

Taybetîya **neqîdê** ya herî girîng...

Taybetîya **eleştiriyyê** ya herî girîng...

Erê çima tu nabêjî, "Taybetmendiya **rexneyê** ya herî girîng..."

Dema ku di kurdî de **krîtik = rexne** be û rexne jî di zimanê me de rûnişti be, tu jî mecbûrî wek me hemiyan binivîsinî? Helbet em ê gotinê biyanî derbasî zimanê xwe bikin. Belê ne gotina "**agresiv, krîtik, word bilind**" û hwd. Careke din em ê li sernivîsa rûpelê 57an binerin bê ka te çi nivîsiye?:

**"Krîtikerî û elementên idenîtîtyê krîtikrîyê"** Yanî çi? Te di vir de ne tenê gotinek biyanî lêkiriye; te bi gotinê biyanî hevokék li dengê kurdî siwar kiriye. Tu ne baş dikî ezbenî. Îcar ji ber ku ez van çewtiyên te ên mezin şanî te didim, heqê te tuneye ku tu jî min re "zimandirêj" bibêjî?

### **Ji bo xwendevanan gotina dawî:**

Ez ji xwendevanan hêvî dikim ku nivîsên min û ên birêz Hazim bidin ber hev û bi çavekî rexnegirî bixwînin. Hazim di kovara Nûdemê hejmara 19an de gotarek bi sernivîsa "Ronakbîr û Ronakbîrlî" nivîsibû. Min jî di hejmara 21ê de li ser zimanê wî gotarek nivîsibû. Li himber vê, birêz Hazim di hejmara 24an de bi sernivîsa xwe a "Krîtikerî û Etîk" min dibersivîne. □

# REXNE Ú REXNEGİRÎ

N. ZAXURANI

**W**eke ku tê zanîn, bi berhemkirina berhemên edebî re, rexneya edebî jî mîna heval û hogirekî, di nav pêvajoya hunerî bi xwe de peyde bûyiye. Ji bo vê yekê jî, karmendiya (wezifa) rexneya edebî ew e ku li ser analîzkirina berhemên edebî kar û xebateke bêhampa li dar bixe, li ser wan bi gelek alî bikole, da ku bi vî awayî jî xwendevan di derbarê mijarê berhemên edebî de bibine xwediyê agahdariyeke bi teng hunerî.

Ji xwe, ji ber hoyênu ku têne zanîn, edebiyata me ya netewî jî aliyê rexneya edebî ve li gor edebiyata netewî ya welatên din yên ku di warê rexneya edebî de bi pêş ketine gelekî qels e. Mînak; li welatên Ewrûpa Rojava, ji destpêka sedsala nozdehan ve bi gesbûn û balbûna edebiyata netewî yan van welatan re, di serpêhatina dem û dewranan de, hêdî bi hêdî rexneya edebî jî şax da. Ev yeka ha, li welatê me jî bi gesbûna şaxên hunerî yên cur bi cur re li ser dînamîkên xwe ber bi xemilandina xwe ya edebî ve diçe. Ango bi saya berhemkirina berhemên hunerî, rexneya edebî jî tê afirandin. Bela vê yekê jî, herdem tevgerên edebî bi xwe re rexneya edebî jî anîne pê.

Ji xwe, hebûna rexneya edebî li ser bingehê edebiyata hunerî bi goşt û can dibe. Bi taybet jî, li ser naveroka wê ya ku bi îmajên hunerî û ideolojiyê ve tê rapêcan, hebûna xwe ya bi pîr alî didomîne. Divê rexnegir berhemên hunerî / edebî yên ku di serdema wî / wê de hatine afirandin bi gelek alî şîrove bike, bîr û baweriya wan ya bi teng ideolojîkî pêşkêşî xwendevanan bike, helwesta xwe ya di derbarê wan de bi zimanekî zelal diyar bike. Lewra, bi saya vê yekê mirov dikare hînî awayê şîrove-kirina jiyana civakî / netewî ya ku nivîskarê berhemê jê re berdevkiyê dike, bibe.

Mîna tê zanîn, nivîskarên berhemên edebî, vê berdevkiya xwe bi rast û rê nakin. Bi alîkariya îmajên hunerî nivîskarên berhemên hunerî di jiyana karekterên edebî de bi alîkariya peyvîn wan û bi saya peywendiyêن wan yên bi hevûdu re, pêk têniñ.

Bêguman, ev îmajên hunerî bi saya kompozisyonêن gelekî hûr û kûr yên cur bi cur û vegotinêن ji hev cûda yên zimên têne hûnandin. Ji bo mirovê ku di warê edebiyatê de nepispore, zelalkirina naveroka berhemên hunerî ya ku bi rêsandina awayê (şiklê) wan yê tevlihev hatiye hûnandin, gelekî sext e. Divê ku di vî warî de rexneya edebî bibe piştgir ji bo van kesan da ku ev kes bikaribin naveroka berhemên edebî hîn bibin. Bêguman, rexnegir bi awayekî bi rêk û pêk nerînê xwe yên di derbarê berhema edebî de pêşkêş dike, wan bi gelek aliyan dinirxîne. Lîbelê, di-vê baş bê zanîn, her rexnegir li gorî nerîna xwe ya felsefi û estetikî berhemên hunerî dinirxîne û bi vî awayî ji nirxandinêن ji hev cûda têne pê di serpêhatina dîroka rexneya edebî de. Ji bo rexnegirêن sosyalist remana ku ji aliyê nivîskarê berhema hunerî di naveroka berhema xwe ya edebî de bi cih û wat kiriye, diyardeya (fenomena) herî serekî ye. Lewra, awa (şikl) li dorbera vê diyardeya serekî tê rapêçandin.

Ji ber vê yekê ji, rexnegirêن ku berhemên edebî bi awayekî konkret lê, bi perspektiveke ramangirî analîz dikin, dikarin di kar û xebata xwe ya rexnegirî de biserkîn.

Baş e, ci peywendi di navbera rexneya edebî û zanistiya edebî de hene?

Bi qasî ku tê zanîn, karmendiya serekî ya rexnegiran ew e ku, di derbarê berhemên edebî de li gor hinek amanc û berjewendiyêن hêzên civakî bi perspektiveke ku bi geşbûna dîrokê re digunce, binirxîne û şîroveyêن bi pirr alî divê di nirxandinê xwe de bi kar bîne.

Li pêşberî vê yekê, karmendiya zanistiya edebî ew e ku taybetmendiyêن balbûna zanyariya edebî ligel qanûnêن wê yên ku şax û parêن xwe berdidin nav kûrahiya ji-yana civakî û serpêhatina dîrokê, şîrove bike. Bi awireke bêyî ku mirov li ser têkiliyêن di navbera wan de mijûl bibe, mirov dibêje qey tu peywendi di navbera van herdu diyardeyêن hunerî de nînîn.

Lîbelê, divê baş bê zanîn ku zanistiya edebî ya ku qanûnê objektif yên geşbûna hunerî bi gelek alî dikole û şîrove dike, nabe ku mirov ji derveyî berjewendiyêن ro-jane bigre. Heger ku mirov weha kir, tê wê wateyê (manayê) ku mirov zanistiya edebî ji jiyana netewî û civakî qut dike. Lî mixabin, gava ku heya mirov ji dîroka zanistiya edebî hebe, mirov dibîne ku herdem nerînê weha yên netekûz - ku bûne kelem li pêşberî geşbûna zanyariya edebî - di nava tevgerêن edebî de li ber xwe da-ne ji bo ku bikaribin hebûna xwe bidomînin.

Lewra, tevgerên weha yên bi vî rengî yên “edebî” bi vê nerîna xwe bi tenê nave-roka berhemên edebî ji peywendiyêن civakî û yên îdeolojîkî bêpar nahêlin, herwe-ha ev tevgerên bi reng “hunerî”, vê rastiya rap û rût jî serûbinî hev dikan: Ji ber ku ev tevgerên bi reng “hunerî” ji bîr dikan ku zanyarêن zanistiya edebî jî birrek ji jiyanâ civakî ne, di nava prosesa dîrokî de cihê xwe digirin û bi vî awayî jî dibin xwedi-yê hinek nerînên felsefi, estetikî û yên olî di serpêhatina jiyana civakî de. Bi saya van nerînên xwe yên civakî jî, zanyarêن zanistiya edebî îdeolojiyekê temsîl dikan. Bêguman, ev îdeolojiya ku ew temsîl dikan, bivê -nevê li ser xebata wan ya edebî bandorekê dike. Ji vê yekê wîrdetir, ev bandor li şêweyêن wan yên xebatê, li ser materiyalêن wan yên ku di prosesa berhemkirina edebî de bi kar tînin, xwe dide di-ayar kirin.

Vêca, mîna ku bi hêsanî tê xuyakirin, di navbera rexneya edebî û zanistiya edebî de peywendiyêن organîkî hene. Rexnegirê ku berhemên edebî bi perspektiveke ci-vakî û li gorî ra û şewrên tevgereke edebî analîz dike, heger ku bixwaze vê karmendiya xwe bi nerîneke dîrokî ya zanistî pêk bîne, divê ku di derbarê qanûnên hunera edebî de xwediyyê agahdariyêن bi rîk û pêk be. Ançex, bi saya van agahdariyêن bi rîk û pêk dê bikaribe taybetmendiyêن berhemên edebî pêşkêşî xwendevanan bike. Ji ber vê yekê jî, reneya edebî ji bo geşbûna xwe encamên zanistiya edebî ji xwe re dike bingeh. Bêguman, li ser vî bingehî, ji alîkî ve rexneya edebî bi gelek alî dipış-kive, ji aliyê din ve jî ronahiya xwe tavêje ser geş û balbûna hunerî di serpêhatina dem û dewranan de.

Ji aliyê din ve jî, heger ku zanistiya edebî karmendiya xwe ya bi reng dîrokî bîzane ku divê ew geş û balbûna zanistiya edebî ya bi gelek alî bi awayekî hûr û kûr binirxîne û lê bikole, hingê jî zanistiya edebî nikare xwe bi carekê jî rola rexneya edebî dûr bixîne. Lewra, zanyarêن zanistiya edebî çiqasî bixwazin xwe jî kar û barê ro-jane yê serderma xwe dûr bixin jî, divê ku ew bi perspektiveke ku qonaxêن edebiyata netewî şîrove dike, binerin. Ançax, mirov bi perspektiveke weha dikare di derbarê edebiyata netewî ya îtroyîn de bibe xwediyyê têgîhiştineke bi rîk û pêk. □

# CIVAKA IT Ú PIRSA KURDÎ\*

MURAD CIWAN



Mîvanê hêja axaftina min li ser civaka teknolojiya agahdarî û ragihandinê û tesîra wê li ser pirsa Kurdî ye. Bi kurtî dikare bê gotin "civaka IT û pirsa kurdî." IT, kurtkirina du gotinên îngîlizî ye; Information Technology. Loma jî ji vê civakê re tê gotin IT Society. Carinan jî bi navê Information and Communication Technology Society (Civaka teknolojiya agahdarî û ragihandinê) tê binavkirin.

Gelo hilhatina civaka agahdarî û ragihandinê, tu guhertinê di pirsa kurdî de bi xwe re tîne, rewseke nû di vê pîrsê de çêdike an na? Bi kurtî ez dixwazim li ser vê rawestim.

Civaka agahdarî û ragihandinê, li ser bingehê teknolojiya herî nuh a agahdarî û ragihandinê rû daye. Globalîzebûna civaka ser ruyê erdê jî li ser vê teknolojiyê pêk hatiye. Loma jî meriv dikare bêje ku civaka agahdariyê hemû xusûsiyeten jiyana globalîzebûyinê di nava xwe de hildaqurtandine û civaka agahdariyê, bi vê maneyê qonaxeka nû û pêşketîtir a civaka globalîzebûyî ye. Bi awakî din, civaka ragihandinê, navê merhela nû û pêşketîtir a civaka globalîzebûyî ye.

Loma jî, min divê ez di destpêkê de bi xetên stûr û bi kurtebirî li ser globalîzebû-

yinê jî çend tiştan destnîşan bikim. Berê ez ê li ser globalîzebûn û otomatîzebûna civaka ser ruyê erdê û jiyanâ tevayî rawestim û pişt re ez ê werim ser mesela civaka ragihandinê.

Helbet ev pirs, ne ji bo me kurdan tenê, ji bo hemû civakên dinyayê; hetta ji bo Awrûpiyan bi xwe jî pirseka gelek nû ye. Li Awrûpayê û tevayıya civakên rojava, ev pirs, gellek tê minaçeşekirin. Maneya civaka agahdarî û ragihandinê ci ye û jiyaneka çawa di warê aborî de tîne? Di rojêñ pêş de, di warê siyasi û civakî de dê ci bi xwe re bîne? Ev pirsêñ hanê li cem wan bi xwe jî pirsini taze ne.

Ya din, belkî em bifikirin ku ev pirs, pirtir ya wan welatan e, ku ji alî teknolojiyê û demokrasiyê de pêşkeftî ne. Dibe bê fikirin ku ew ji xwe heta iro jî di qonaxeka jiyanê ya pêşkeftî de bûn û niha ev qonaxa nû ya ku em bahsê dikin li ser esasê civaka wan peyda bûye. Qonaxeka nû ya ji bo wan e ku ew ketine destpêka vê. Dibe ku meriv bifikire ku ev pirs ji bal wan ve bê minaçeşekirin di cîh de ye, ne tiştîkî fuzûlî ye. Lê gelo em kcs an ronakbîrêñ civakên welatêñ paşdemayî, her wekî yên kurd ku hêja dewleta me nîne, em parce ne, em bêdad û bêmaf di rewşeka dijwar de ne. Tiştîn ku têñ serê milletê me nayêñ serê tu milletî. Di rewşeka wiha de ku bi hezaran pîrsiyarinî din hene, gelo em çawa dikarin pirseka wiha minaçeşê bikin.

Helbet heke meriv bi vî awayî bifikire, piçekî para rastiyê tê de heye. Lê gava min bala xwe da vê pîrsê, min ji wê yekê hereket kir ku teknolojiya ragihandinê, ev civaka ku pê re ava dibe û têkiliyêñ vê civakê yên aborî, siyasi û kulturî hin tişt bi xwe re anîne ku cara pêşîn belkî wekî yên hemî civakên dinyayê, ev mesele bi pîrsa me ve jî girêdayî ye. Belkî ji wan jî bêtir qedera çareserkirina pîrsêñ kurdî bi vê meselê ve bestî ye. Eger em perspektifî û xusûsiyeten wê li ber çav bigrin û li wê moxila pîrsêñ civaka xwe xin, ne dûr e ku îmkanêñ mezin li ber me vekin. A ji ber vê yekê, min viya ez vê buyera nuh minaçeşê bikim. Gelo têkiliya wê bi mesela me ve ci ye? Em dikarin ci bikin di vî warî de? Li gora qenaeta min, di dîroka Kurdistanê de hema em bigrin ji du sed salan; ji tarîxa liberxwedanêñ mîrekiyêñ kurdan bi vir de (ku bi dewletêñ zilhêz ên wekî Iran û Osmaniyan re ji bo mafêñ jiyanâ xwe, şerîn xwe yên dawî yên man û nemanê dan, lê têk çûn û ku pişt re gelê kurd bi gellek awayêñ din serî hilda) heta iro cara pêşîn e ew sistêma ku li ser ruyê erdê peyda dibe bi daxwaz û perspektifîñ kurdan re jî lihevhatî ye. Sistêmêñ ku heta niha di qada navnetewî de; hê ber berbiçavtir di ya Rojhilata Navîn de hebûn; ci sistêma aborî û siyasi, ci têkiliyêñ navbera millet û dewletan bin, sisteminî welê bûn ku kurd her çendîn bi qasî milletên din ên dinyayê ku ji bo serbixweyî û azadiya xwe serî hildidan zîrek û zana jî bûn, cardin ew rewşa dinyayê ya ku ji wê demê he-

ta îro hebû, li gora ciyê cografi û geopolitîkî yê kurdan rê nedida ku kurd bi ser kevin.

Ev pirseka dûr û dirêj e, ji ber ku mijara me pirseka din e ez dirêj nakim, weka tesbîtekê destnîşan dikim. Qesda min ji vê yekê ev e; ji dema liberxwedan û serîhil-danên mîrekiyan bigre heta îro ew potansiyela kurdan a ku hebû; ya serok, zana û ronakbîrên kurdan, ya têkoşer, serîhilder û şerkarên wan, bi kurtî ya civaka kurdan a bi her awayî ji yên milletên Rojhilata Navîn û yên Afrîkayê, yên melik û seroke-şîrên wan ne kêmîtir bû, her çendin kurdan jî bi qasî wan milleran li ber xwe didan û bi qasî wan zîrek bûn jî, rewş ew bû ku, bi qasî wan serkeftî nedibûn û maf bi dest nedixistin. Meriv dikare bêje ku her çendin barana ku "rehmeta Xwdê" ye gellek caran dibariya lê tu carê li rezê kurdan nedida.

Îhtîmal e, cara pêşin baranek tê ku dikare li rezê kurdan jî bide. Çimkî rehmeteka welê ye ku ji xwe hêzên xurt û pêşkeftî, wekî hemî caran jê îstîfade dîkin lê hêzên herî jar, bêtaqet û bêkes jî dikarin para xwe jê werbigirin.

A bi vê maneyê ez dixwazim li ser vê pirsê rawestim; çend nuxteyan diyar bikim. Berî ku ez werim ser pirsê, min divê ez xalekê diyar bikim. Helbet ez dizanim ku ev, pirseka nû ya piralî ye. Di civîneka wiha de wext nîn e ku meriv bi kûr û dûrî li serê raweste. Di meseleyeka nû ya piralî de ez nikarim îddîa bikim ku ez ê karibim wê bi hemî zelaliya wê li ber çavan raxim. Na, ez dixwazim wekî perspektifekê, wekî çend xetên bingehîn meselê bidim diyar kirin. Bi hêviya ku ev destnîşankirin ba-lê bikşîne, ronakbîrên kurdan jî li serê rawestin û wê minaçeşê bikin; bê gelo ji alî kurdan de maneya vê rûdana nuh ci ye...

### Civaka agahdarî û ragihandinê

Tesbîteka Karl Marksî heye ku wî li ser guherîn û pêşketinên civakan kiriye. Ew, gava tehlîla guherîna civakan a dîrokî dike, dibêje ku lihevkirina navbera hêzên berhemhênanê û pêwendiyêñ berhemhênanê dîbin dînamîzma pêşveçûna civakan. Di jiyanâ civakî de pêşketineka berdewamî di hêzên berhemhênanê de heye û ev proses tu carî ranaweste, hêzên berhemhênanê her û her diguherin. Di civakê de ji bo ku guherîn û nuhbûn li ser kar bin, divê pêwendiyêñ berhemhênanê li gora se-wiya hêzên berhemhênanê bin û bi wan re lihev bikin.<sup>(1)</sup>

Îro, rûdanekê serî hildaye ku em dikarin bêjin hêzên berhemhênanê yanî ku ilm û teknîk; bi taybetî elekrototeknîk û bîyoteknîk gîhaştiye qonaxeka welê û bi lez û bezeka welê pêş ve diçe ku berhemhênan ber bi otomatîzebûyin û elektronîzebûy-

nê ve diçe, welê lê tê ku di demeka ne pir dûr de, ji bili karûbarên ilmî, lêkolîn û keşfan, koordinékirina xizmetên civakî û berhemhênanê, wê her der otomatize bibe. Ji niha de alet û ezmûnên elektronik, robot û komputer di seranserî jiyana civa-kên welatên pêşkefti de serdest bûne. Têkiliyên agahdarî û ragihandinê di tu demê de wekî iro muhra xwe li ser şikilwergirtina civatan nexistine.

*Hêzên berhemhênanê* yên nuh; ên agahdarî û ragihandinê ên bingehê otomatize-bûyinê gîhiştine qonaxeka welê bilind ku ew pêwendiyên berhemhênanê û pişt re yên piralî yên civaka îndustri, nikarin xwe bi wan re lihevhatî bigirin. Derdi Kevin hemberî van hêzên berhemhênanê, hin ji wan perçê dibin an ji holê radibin û di şûna wan de pêwendiyên nuh tên avakirin. Lê hinan jî hê umrê xwe temam neki-riye, bi vî an wî awayî li ber xwe didin. Proseseka civakê ya têkilhev a piralî û ren-gareng li dar e. Em dikarin bêjin ku niha, em di navbera du civakên ji hev cuda de ne. Em li dawiya qonaxa civaka îndustriyê û destpêka civaka ragihandinê ne. Da-wiya civaka "kevn" û destpêka civaka nuh derbasî nava hev bûne. Loma jî têkiliyên wan jî bi hev re di nava hev de dijîn.

Ev têkiliyên nuh ên civaka post-îndustriyel (pişt-îndustriyel) çi ne? Yek ji xusûsi-yetan ew e ku li ser ruyê erdê globalîzebûyin heye. Ilim, zanebûn û ew aletên herî pêşkefti yên ku iro peyda bûne û bi sureteka nedîti ber bi pêşve diçin, bingehekî welê li ser ruyê erdê ava kirine ku jiyana civaka me ya iroyin jî çarçeva dewletên millî derketiye; hebûn û jiyane transnasyonel ji bo pêwandiyên berhemhênanê û herwiha ji bo avayiyên civakê yên ku li ser wan bilind dibin rû daye. Di sermiyan, kar û xizmetê de, di çûn û hatin û gerra însanên ser ruyê erdê de û di pêywendiyên pir alî yên rasterest û biwasite de, di jiyana kulturî û ya siyasi de transnasyonalîze-bûn bûye xusûsiyeteka berbiçav. Di encama vê de wekî tê gotin "dinya piçûk bû-ye".

Sermiyan ji her demê pirtir bûye multînasyonel û di ser de jî warê berhemhêna-nê ji herêmî an nasyoneliyê derçûye û bûye transnasyonel. Maneya vê çiye? Pir-nasyoneliya sermiyan ne tiştekî nuh e. Vê rewşa sermiyan û şirketan hê di destpêka sedsala me de dihat dîtin. Lê diyardeya iro imkaneka welê daye ku şirketên mezin ên multînasyonel careka din bi muazzamîyeka nedîti û bi wan hebûnen xwe yên berbelav ên ser ruyê erdê, xwe dîkin yek. Her derê ser ruyê vê kurreya me, dibe wa-rê berhemhênanâ wan. Qîmeta cî û mesafê ji bo wan nemaye. Merkezên wan dikarin li Stockholm, New York an Londonê bin, beşekî karê wan û buroyêwan li Sîngapurê, beşek li Hamburgê, yeka din li Sydney an Bankogê be. Ev ji alî ber-hemhênanê an biserxistina xizmetekê tu astengan li ber wan dernaxe. Her beşekî

karê wan dikare li derekê bimeşe û mal an xizmeteka ku di van hemû merkezan re derbas dibe, dikare di heftiyekê an rojekê de derkeve piyasê. Ezmûnên agahdarî û ragihandinê gîhaştine merheleyeka welê ku ji bo idarekirina van dezgehêن dewasa, talîmatdayin û hînkirina kargiran, amadekirina cîvîn û konferansan qîmeta cîh û mesafê nêmaye. Her beşekî kargiran dikare li wan bajarêن binavkirî bin û berpis û kargêrrêن wan her sibahî beriya destpêkirina karan dikarin ji dûrê bi saya torre elektronîk cîvînan bi hev re bikin, bîryaran wergirin û belavî ser hemû karmendêن xwe bikin.

Transnasionalîzebûn û jîholêrabûna qîmeta mesafe ya navbera mekan û zemanan di warêن din ên jiyana aborî de jî wiha ye. Her wekî gava berî hefteyekê krîze-ka aborî li Malezyayê destpêkir û borsa li wir serûbinî hev bû, ev krîz bi wê derê mehdûtkirî nema, pê re pê re di eynî roj û saetan de borsa Amerîka, Awrûpa, Japonya û yên welatêن din jî ketin krîzê û serûbin bûn. Yanî dinya welê piçûk bûye ku sermiyan, kar û xîzmet bi işe saet, deqîqe, hetta saniyan xwe ji quncikekî dinya-ye digihînin yekî din.

#### **Di dema derbasbûna ber bi civaka îndustriyê de avabûna millî û navnetewî**

Berê, gava însan ji civaka çandiniyê derbasî civaka îndustriyê bûn, pêwendiyêن aboriya girtî û hudûdêن dewletêن piçûk ên feodal hilweşîyan, di şûna wan de baza-reka vekirî ya berfirah û dewletêن millî dest bi avakîrnê kirin. Avabûna dewletêن millî bi wî awayî bû ku, ya derebegekî êrîş bir ser derebegêن dora xwe yên ji etnîsîteya xwe û heta hin caran jî yên ne ji etnîsîteya xwe jî, desthilatdariya wan ji holê rakir û di şûna wan dewletan de dewletka millî ya ji etnîsîteyekê pêkhatî ava kir. Yan jî avabûna dewleta millî bi lihevkirin û xweyekkirina çend derebegan pêk hat. Pêkhatina dewletêن millî a bi van herdu awayan, pirtir li Awrûpayê rû da. Li Asya û Afrîkayê mîr, serokeşîr, reisekî dînî an zanayekî, eşîr û derebegiyêن ji etnîsîteyekê dan dora xwe, li hemberî kolonyalîzmê û dagirkeriya biyanî şerekî rizgarîyê da û dewleta xwe ya millî bi vî awayî ava kir.

Dewletêن feodalî rabûn, di şûna wan de dewletên firehtir ên millî avabûn. Da-weya desthilatdariyeka millî hat kirin ku milletekî li hemberî milletê din hudûdê hegemoniya xwe ya millî diyar kir, ku ev, wek mafê milletan ê tebîî hat dîtin da kes nikaribe dest bidiyê, tecawuzî wê bike. Pirsa tayînkirina qedera xwe bi destê xwe jî ji vê bawerî û qebûliya cîhanşumûlî bingeh wergirt. Milleran, rabûn wekî zirxêن tankan hudûd li dora erdêن xwe yên millî kêşan, ordiyêن mezin ava kirin û dan ber

van hudûdan, ji bo çûn û hatina mal û sermiyanan, bazirganî û seyehetê gumruk ava kirin û bac û xerac danîn. Dest bi millîkirinê kirin. Ew dewlemendiyênu ku li ser axa wan bûn û di destê biyaniyan de bûn ji wan sitendin, hin xistin bin milkî-yeta dewleta xwe ya millî û hin dan hemwelatiyênu xwe. Hetta hin dewlemendiyênu ser û bin erdê ên girîng ji hemwelatiyênu xwe jî wergirtin û kirin malên dewletê. Mesela millîkirin û mîrîkirina (devletleştirme) petrolê, av, çem, gol û daristanan, ya madenê bin erdê û hwd. ew karûbarê avakirin û tekûzkirina hegemoniya millî bû ku di çarçeveyêne dewletêni millî de dibûn.

Li hemberî mal û sermiyanê milletên din xwedî li mal û sermiyanê xwe yê millî derketin. Yen li Tirkiyê mezin bûbin divê di bîra wan de be ku heta van salêna dawiyê jî her salê kampanya dihatin li dar xistin ku xelk malên biyaniyan nestînin an nexwin ên jicâ bistînin. Tarîx eßkere nîşan dide ku li hemberê burjuwaziya ermêni, rûm an yahûdî dewleta tirk mil da burjuwaziya tirk, îmkan, mal, milk û sermiyanêwan bi awa û riyênen rengareng ji wan stendin û dan burjuwaziya tirk.

Heke meriv teşbîhekê bike, meriv dikare bibêje ku her milletî makîneyeka welê ya bizix ava û tekûz kir ku karibû li hemberî makînên zirxpûş ên din hebûna xwe biparêze.

Bi vê zirxpûsiyê re hin xusûsiyetên din jî hatin. Awayê avakirina dewletêni burok-ratik ên merkezî yên unîter, bûn awayê piraniya van dewletan. Hukmî siyâsi, carinan jî (wekî li Asya û Afrikayê) yê siyâsî-eskerî hegemoniya xwe li ser muessesên dewletê yên din û li ser civaka sivil danî, paytext bi berpirsiyarî û fermanan hat çekdarkirin ku hukmîn herêman qels bûn, idare bi her awayî ji paytextan hatin kirin. Li wan hin welatêni Awrûpayê yên federal û desentralize avakirî jî, piranî belki li ser esasê lihavkirin û konsesusekê fermanrewatî di navbera desthilatdariya merkezî û yên herêmî, an eyaletî de hatin parvekirin jî formasyona merkezî û burokîtiya wan xwe da diyarkirin, rola dewlet û burokîtiya di jiyanâ aborî, siyâsi, civakî û kulturî de xwe da hîskirin.

Di nava van dewletêni millî de, gellek grûb an sub-grûbêni etnîkî, yên millî, dînî, mezhebî, kulturî an dialektili hatin piştguhkîrin; hatin ïnkarkîrin an ihmalkîrin. Di halê herî baş û niyetçak de ji bo "yekîti, hebûn û xwediyarkirina millî" an berjewendiyêni millî, ev xusûsiyetên sub-grûbî hat xwestin ku bêni rakirin. Li piraniya welatan mafêni wan ji wan hatin stendin an ïnkarkîrin, zor û neheqî li wan hat kîrin. Ew li ber yekîtiya millî wekî bend hatin nişandan. Vê yekê rî da ku li gellek welatan bi navê hebûn û yekîtiya millî an suverînîteya dewleta millî, hin millet an eqalîyetên din hatin bindestkirin.

Ev yek li Awrûpayê jî û li derên din ên dinyayê jî bi vî awayî pêk hatin. Mesela gava hat gotin fransiz an dewleta Fransayê, hat îddîakirin û ji bal dinyayê jî hat qebûlkirin ku dewleta Fransayê ji milletekî pêk tê ku ew jî milletê fransiz e; hebûna korsikî, katalonî, baskî û hinêñ din yan hat înkarkirin, an îhmalkirin, ew ji mafêñ xweîdarekirin, pêşdexiastin û geşkirinê hatin bêparhiştin. Îngîlttere jî bi vî awayî bû. Mafêñ îskoçî, galî û valan ji bo xatirê "yekîtiya millî ya îngîlîzan" hat binpêkirin, heta belkî ew civak wekî stîriyê ser riya vê yekîtiyê hatin dîtin.

Ka em bifîkirin carekê ku em kurd bibûna xwedanê dewletekâ millî, me yê konsepta milletê kurd bi çi awayî diyar bikiraya: Li welatê me ji bili kurdan, ermêni, suryanî, asûrî, keldanî, rûm, yahûdî, tîrk û ereb hebûn. Em ji alî diyalektan ve kurmanc, soran, dimilî, lor û hewramî û hin zaravêñ dinê ji hev cuda ne. Em musulman, êzîdî, xiristiyan û yahûdî ne. Em sunnî, elewî an ehlê heq in. Terîqetêñ cuda di nava me de hene. Di rîwêke wiha de me yê milletê kurd û xusûsiyetêñ wî yêne gelempêrî yêne muşterek bilind bikiraya, lehceyek bikira zimanê resmî û yêne din îhmal bikira, me yê belkî mafêñ wan grûbêñ etnik ên din, wan cudatiyêñ din, mezheb, ziman û herêman nedana wan. Çimkî diviya me milletek pêk bianiya. Her wekî li Tirkiyê welê bû. Ji bili Tîrkan, ji bili xusûsiyetêñ wan ên gelempêrî û muşterek yêne din hemî hatin înkarkirin û îhmalkirin, hebûna me kurdan û millet û eqaliyetêñ din nehat qebûlkirin, gava me doza mafêñ xwe jî kit, em li ber yekîti û pêşveçûna millî wekî bend û stirî hatin dîtin.

Vî awayê avabûna dewleta millî, an vê konsepta millî ya ku hat qebûlkirin ne xas e bi Tirkiyê tenê ve, her çendî di warê bidestxistina maf û azadiyêñ grûb û herêman de Hindistan ji Tirkiyê sed û heşte derece cuda ye jî, li wê derê bi xwe jî behsa dewletekâ millî ya tenê tê kirin û muşterekiyêñ milletê hindî yêne giştî têñ ber-pêşkirin, mafêñ grûb û herêman tê îhmalkirin. Loma jî çendîn her welatî di guherîn û pêşveçûna xwe de riyeke taybetî daye ber xwe jî, ev hin xusûsiyet in ku li seranserî dinyayê ji derbasbûna civaka çandiniyê ber bi ya îndustriyê damga xwe kêm zêde li avabûna dewlet û civakan xistin, pişt re paralel bi dereceya bicîhbûn û geşbûna demokrasiyê, ev xusûsiyet her çendîn li hin welatan bere bere zeif bûn jî heta iro her hatin.

### **Ber bi civaka agahdarîyê ve avabûna dewletêñ millî û rewşa navnetewî**

Lê iro ku em ji civaka îndusrîyel ber bi civaka agahdarî û ragihandinê ve diçin, taybetiyêñ ku bi vê civakê re rû didin; yanî pir-nasyonelîzebûn, transnasyonelîzebûyîn

û internasionalîzübûyina sermiyan, kar, mal, xizmet û kulturê, rabûna mesafeya navbera cihan û tiştên her wekî din, darbeyeka mezin li vî zirxê dewleta millî dixin.

Bi vê yekê qesda min ne ew e ku dewletên millî ji holê radibin. Na, dewletên millî hene û wê hê hebin jî. Lê rewşa nuh welê lê kiriye ku dewletên millî wî zirxê xwe ji xwe dikin. Em avabûna îro ya welat û civakên Awrûpayê bidin ber çavêن xwe: Avabûna Yekîtiya Awrûpayê ku gumrik ji navbera endamên vê yekîtiyê rakiriye, sermiyan, mal û xizmet bi serbestî ci li Awrûpayê û ci jî heta dereceyekê li hin welatên derveyî wê jî diçin têن, çûn û hatin û danûstendina civakên dinyayê bihev re, ew perspektifên ku hemû dewletên dinyayê ji bo rojên pêş didin ber çavêن xwe diyerdeyên vê yekê ne. Li Yekîtiya Awrûpayê parlamento, hukumet, wezaret û muesseseyên müşterek ê rêvebirinê ava bûne. Dadgehêن navnetewî û yên Awrûpayî biryaran didin ku dewlet û hemwelatiyên dewletan mecbûr in guh bidin van dadgehan. Pereyekî müşterek wê têkeve tedawulê.

Rola Miletên Yekbûyi, ya NATOyê û rêexistinê navnetewî an herêmî yên din ji nuh ve tê minaçeşekirin û ew ji nuh ve tê avakirin. Tevgerên demokratik, ên havirdorparêz, maf û azadîparêz, sendikayên karkiran yên navnetewî dadimezirin, yên damezirandî geş û xurttir dixin. Çapemenî û medya, unîversîte û dezgehêن zanistî yên din kar û barekî li ser esasê qadeka navnetewî dimeşînin û hwd.

Ev rûdan hemû derbeyekê li wî zirxê millî didin û wê diperçivînin, darbeyê li sisistema wê fermanrewatiya burokratik a merkezî ya dewletên millî dixin. Dewletên millî mecbûr dixin wî zirxî ji xwe bikin, dev ji beşeka girîng a wê fermanrewatiya xwe ya merkezî ya burokratik berdin. Gotineka serokkomarê Tirkîyê Suleyman Demirelî hebû ku digot "em ê qereqolên xwe şefaf bikin". Ji qewlê wî ve dewletên millî yên ser ruyê erdê destpê kirine xwe şefaf dikin, derî û pencereyên nuh di diwarên xwe de vedikin. Mişterekiyeke nuh bi yên dî re peyda dikin. Wê avayıya hişk a merkezî qels bibe, desentralîzasyonek di dewletan de rû dide, dewlet ji warê aborî û bazirganiyê û gelek aliyên jiyanâ civakî vedikişê û büçük dibe. Civaka sivil di jiyanê de bêtir dibe xwedanê insiyatîfê, dewlet bi rastî jî edî dikeve bin xizmeta hemwelatiyan, herêm mafêن hin warêن fermanrewatiyê ji merkezê distînin. Herêmên cografi, millet û kîmasiyêن millî grûb û sub-grûbêن millî, dînî, mezhebî û kulturî digihîjin mafêن pirtir. Hemû ew hebûn û dewlemendî û cudayıyên ku di nava van dewletên millî de hebûn ji tengasiya bihçikander a wê zirxpûşiyê rizgar dixin û bîhnekê vedidin, imkana pişûdanekê ji xwe re dibînin.

Em bi xwe dibînin ku di dema me de li Awrûpayê di dewletan de desentralîzas-

yoneka berfirehtir rû dide, herêm zêdetir dibin hukumran, li cihên wekî İspanyayê, İngiltereyê, Fransayê bi referandûm û bi riyên lihevkirin û konsensusan, herêm, millet û grûbêñ etnikî mafêñ xweidarekirinê distinîn. Dewletêñ sosyalist hilweiseyan, ji bin kavilêñ wan gellek dewletêñ mezin û piçûk ên din derketin. Ew bi xwe jî iro xwe mecbûr dibînin ku mafêñ zêdetir bidin herêm û grûbêñ nava xwe. Tirkîye bi xwe jî iro tevlî wê barbarî û paşdamayina xwe behsa piçûkkirina dewletê, de-sentralizebûnê û gellek tiştên din dike. Em bala xwe bidin İsrailê. İsrail ku dewlete-ka piçûk e di nava bîst dewletêñ erek de û di rewşeka ew qas dijwar de ye, ew bi xwe jî ji bo ku li Rojhilata Navîn ji bo milletê xwe rewşê normalize bike, da ev mil-let di bazar û bazirganiyeka serbest a berfireh a herêmê de cihê xwe bigre, pê qayil dibe ku heta dereceyekê mafê otonomiyê bide filistîniyan, pirsgirêkên xwe bi ere-ban re çareser bike û bi wan re têkeve nava jiyaneka navnetewî ya serbest. Bi goti-neka din ji bo ku sermiyanê yahûdî di nava ereban de di herêmê de serbesttir here were qebûl dike ku beşek ji fermanrewatiya xwe teslimî filistîniyan bike. Nexwe İsrâîl idî wê yekê dibînin ku dinyayeka wilo peyda buye ku jî iro pê ve meriv ne mecbûr e bi wan rê û dirbêñ berê têkiliyên xwe bi erek û filistîniyan re bimeşîne, meriv dikare têkilînî din ên li ser esasê jiyan hemdem a nuh deyne û bi saya wan jî bijî, serbilind be, di garantiya pêşveçûn û dewlemendbûnê de be. İsrâîl bi zîrekî-ya xwe vê rastiya nuh dibînin û iradeyek li cem wan heye ku ber bi wê de gavan bavêjin.

Di vê civaka nuh a agahdariyê ya internasyonalizebûyî de ferd, bi serê xwe bihêz-tir dibe, wekî hemwelatiyekî, ferd, li gora do iro azadtir û bihêztir e. Seks li bheme-rî grûba xwe ya etnikî, dînî, mezhebî an kulturî azadtir dibe, grûbêñ piçûk li hem-berî grûbêñ mezin, kîmasiyên nava dewletî li hemberî milletê serdest an ê pirranî, herêm li hemberî fermanrewatiya merkzi ya burokrazik û hemû hemwelatiya sivil, anku civaka sivil li hemberî dewletê, li hemberî burokrasiya navendî bihêztir û azadtir dibe. Ev xusûsiyetek an hê rasttir tendensek e ku bi hatin û pêşveçûna civa-ka agahdariyê re xwe nîşan dide.

### **Ji sistema kontrolê ber bi sistema zanyariyê**

Di vê prosesê de iro rewş hatiye derekê ku civak ber bi otomatizebûyinê ve diçe. Komputer bi hemû awayî ketiye jiyanê. Berê qonaxê ber bi wê yekê ve ye ku ji xey-nî xizmetên giştî, karûbarêñ koordînasyonê û yên ilmî û lêkolînan; li fabrike, di-kan, banke, buro, bazar û warêñ din ên berhemhênanê, hemû karûbar û bi-

zav bi bêyî destlêdanê dê berhem û encamên xwe derînin û bidin xizmeta însaniyete. Îmkan derketiye ku ji bili wan warêن binavkirjiyan tam, li wan deran ji nîv-otomatîze bibe. Yanî di jiyanâ aborî û xizmetê de para hersedêya (prosenta) rola însanan wê gellek kêm bibe.

Prosesa rola komputerê ji roja ku derketiye û heta îro ji sedî sed hatiye guhertin. Berê komputer ji bo wê yekê hat lidarxistin ku wekî bankayekê agahdarî û zanînan di heqê buyer û însanan de tescîl bike û bi vî awayî di destê dewletê û burokrasiyê de bibe wasiteya kontrolkirin û çavdêrîkirina însanan, civakan û bûyeran. Dewletê ji bo kontrolkirin û garantîkirina nîzam û intîzama heyî, komputer bikar dianî. Bi vê rola xwe komputer di destê mekanîzma burokratik û desthilatdariyêni siyasi de li hemberî hemwelatiyan dihat bikaranîn. Lî îro piştî pêşveçûna komputerê ber bi sistema agahdarî û ragihandinê; piştî derçûna internet, intranet, multîmedia, sistema vîrutel a li ser esasê interaktîviyê, komputer bi esasî ji wasitetiya kontrolkirinê derket, rola mezintir a wê welê guherî ku di destê hemî hemwelatiyan de bû sistema agahdarîwergirtin û ragihandinê.

Îro torreka ragihandinê ya welê li ser esasê agahdariyê ava bûye ku ez dikarim li malê, li ber komputera xwe rûnêm û bi hemû unîversîte, zanîngeh, kutubxane, medya, hukumet, parlamento, arşîvxane, laboratuar, alim, zana, hunermend û kesen normal ên ser ruyê erdê re yên ku xwe bi internetê ve girê dane têkilî deynim. Ez dikarim ji Swêdê di çend saniyan de xwe bigihînim merkezeke ji wan merkezên binavkirî yên Japonyayê û heke ew der ne bi dilê min be, piştî çend saniyên din dişêm xwe bi bingeheka dinê ve girê bidim, ew agahdariyêni ku ji min re lazim in, ez, wan ji wan navandan ji bo xwe bînim. Heke min daxwaz, hêvî yan ji pirsek hebe ez dikarim ji wan bikim û ew ji piştî du sê deqîqeyan dê bersîva min bidin. Ez dikarim li mala xwe rûnêm û bi xeta internetê xwe bigihînim rojnameyên Tirkiyê bixwînim, pişt re biçim yên Amerikayê û pişt re ji biçim yên Misrê bixwînim ku ji bo van hemû karan nîv saetek derbas nebûbe. Ez dikarim ci xeber an rismê ku di wan de ji min re lazim in, bînim, kopya bikim, di komputera xwe de bi kar bînim. Ez dikarim li mala xwe taqîba hemû ajansên dinyayê bikim û ew xeberên min divê bibihîzim an bixwînim.

Ez bi riya posteya elektronîk dikarim nameyan ji nivîskarên rojnameyan, ji parlamenterên welatên cuda, ji mamosteyê xwe yê mektebê yan ji hevalên xwe re bişînim û ew dikarin piştî çend deqîqeyan bersîva min bidin. Di torra ragihandina internetê de grûbêñ cuda yên guftûgo û minaqaşeyan ava bûne ku gellek pirsên cuda yên jiyanê minaqaşe dikin. Her yek ji wan li quncikekî dinyayê rûniştiye û bi hev

re danûstendinê dîkin. Ez dikarim tevî minaqeşeya wan bibim. Ez dikarim wekî ku ez bi telefonê bi yekî re diaxivim bi wan re biaxivim.

Di mesrefa van hemû pêwendiyen de ji bilî endametiye ka piçûk a mehane; em bêjin heke ez li Swêdê bim û yet ji wan li Japonyayê be, mesrefa ku ez serê deqîqe-yê bidim qasî wê mesrefe ye ku wekî ez bi yekî ji bajarê xwe re biaxivim.

Heke ez lêkolînekê dîkim an meqaleyekê dînîvîsim an ji bo tişekî din min agahdariyek divê, ez dikarim navê wê yan jî gotinekê ji behsa wê li programê légerînê bikim, ew di navbera çend saniyan de li ser wê behsê çend metin û dokument li ser ruyê erdê yên bi torra û neterê ve girêdayî hene bicivîne û lista wan bîne têxe komputera min, ez di komputera xwe de dikarim yeko yeko li wan binêrim. Dokumentek dikare ji kutubxaneya Stockholmê be ya din ji ya Qahirê û ya din ji ya Tokyoyê ya din ji ya Sydneyê be. Ji bo berhevkirina van agahdariyan êdî ne lazim e ez bi rojan li bajar û kutubxane û arşîvên ser ruyê erdê bigerim, ku ne perê min, ne wextê min û ne jî taqeta min têrê dike. Hemû van tiştan di navbera çend saniyan de komputer ji min re dike. Ji bo min êdî mesela dûrbûn û mesafê ji holê rabûye, her çendî ez li Östersundê jî rûdinêm, mesafeya hemû kutubxaneyê dinyayê ji bo min bûne qasî hev. Ew jî ew mesafe ye ku di navbera serên pêçikên min û tûşen komputerê de ye. Gava min serê pêçika xwe gihand tûşê nexwe min xwe gî-hand wan bîblîyotekan jî.

Maneya vê ew e ku wekî şexs, wekî hemwelaî îmkana bidestxistina agahdariyê ji bo min gellek xurt buye; ez dikarim hem erzan, bi perê bêrika xwe, hem zû; di mudetê çend deqîqe û saniyan de û hem jî pir; bi milyonan dokument bicarekê de û ji çar quncikên dinyayê agahdarî wergirim, û bi her derê dinyayê re pêwendiyen deynim fîkrêن xwe pêşber bikim û istîfade ji fîkrêن din bikim.

## Multimedya

Wê agahdariya ku ez distînim ne tenê ji tekstan pêk tê. Sîstema multîmedyayê ya ku derketiye, agahdariyê bi tekst, bi deng, bi şikl û grafik û bi filmên biliw dide min, grafik, şikl û film li ser esasê 3 bejneberiyê (dîmensiyoneliyê) û bi deng re jî ji bo min dinyayeka welê ava dike ku hema hema wekî dinya rastîn e. Mesela em bêjin li serê ciyayekî Kurdistanê pêşmerge, an gerîlayek heke komputerek, telefoneka mobil û modemek pê re hebe li gel kamerayekê ew dikare di wê gavê de filmê şerî bikêse, li Awrûpayê bigihîne navenda televîzyona Medê û piştî nîv saetê, di nûçeyan de, ne ku her tenê bi tekst lê bi deng û film jî nûçeya şerê wan li ser ruyê erdê

belav bibe. Heta ez bi xwe li mala xwe tenê bi saya komputera xwe dikarim wê xemberê bibihîzim û temaşe bikim. Em kesên ku têkiliyên wan bi internetê re hene, wekî şexs dikarin deng û wêneyan ji bo hevdû bişinîn.

### Ferd bihêztir û azadtir dibe

Rûdana han wê yekê jî diyar dike ku bi hebûna vê sistema ragihandinê kes û cîvakanî bîhêz ji xwe fêdê ji vê digrin lê kes, hêz an grûbêq qels ên xwedanê kêmîmîkan jî dibin xwedanê îmkaneka xurt a bidestxistina agahdarî û zanînê, xwediyarkrînê, xwenîşandanê, dibin xwedanê îmkana bihîstandina dengê xwe.

Em bêjin ez nivîskarekî kurd im. Min kitêbek nivîsi. Heta niha rewş welê bû ku heke weşanxaneyekê kurdan xwe da ber wê kitêbê û ew çap kir jî, îmkanên min û yên wê weşanxaneyê nîn in ku kitêba min-li hemî welatên Awrûpayê, li nava kurdan belav bike da ew bibînin û wê bikirin. Ji ber wê jî pirrê caran heke kitêba min hêja be jî, ji ber bêîmkaniya belavkirinê, di destê weşanxaneyê de dimîne û nayê fitrotin. Heke hin zanînê hêja jî di wê de hebin kurdêñ xwendevan ji wê bêpar dimînin. Yan jî em bêjin hêzên me kurdan yên siyasi li Tirkiyê rojnameyan didin weşandin. Lê li Tirkiyê dezgeha belavkirinê weşanan di destê rojnameyên wek Hurrîyetê de ye. Ew ji bo ku ji fikrêñ rojnamên me ne razî ne, wan belav nakin. Dimîne ku hêzên me yên siyasi bi îmkanên xwe yên rëexistinî wê belav bikin ku ew jî gellek mehdûd e û kil û kîmasî tê de peyda dibin. Xwendevanê kurd bi berfirehî ji xwendina wan rojnameyan bêpar dimînin.

Lê îro bi saya torra internetê îmkanek peyda bûye ku wekî siyaset, wekî grûbek nivîskar an wekî nivîskarekî bi tenê heke min rojnameyek derxist an kitêbek nivîsi, ez jî dikarim qasî Hurriyetê xwedan îmkan bim kitêba xwe an rojnameya xwe di torra internetê de bicîh bikim ku dinya hemû çiqas dikare biçe bala xwe bide Hurriyetê ew qas jî dikare bide kitêb an rojnameya min.

Vê gavê Özgür Politika her roj dikeve internetê, îmkana xwendina wê jî ji alî teknîkî ve qasî îmkana xwendina wan hemû rojnameyên mezin ên ser ruyê erdê ye. Ev torr, yeka wisa ye ku ne gumrik û hudûdan, ne otoriteya dewlet û ordiyan, ne jî sansuran nas dike. Özgür Politka çawa li Awrûpayê tê dikeve mala min, her wiha jî dikare here li Diyarbekirê têkeve mala yekî kurd yan li serê çiya ber destê grûba şerkarên kurd di şikeftekê de. Nexwe teknîkê îmkaneka wiha daye ku ji bo belavkirina fikr û zanîna xwe îmkana yên ku bi milyaran pere dikarin li rojnameya xwe bikin û yên ku belkî nikarin hezar kronî serf bikin buye yok. Ev diyarde ya wê yekê

ye ku ferd û grûbêñ piçûk çiqas bi hêz bûne û çiqas azadî bidest xistine.

Cardin em numûneyekê ji xwe kurdan bidin. Em bêjin ku grûbeka çekdar a şerkerên kurd li çiyayekî digerin, şer dikin û di şikeftên çiyê de xwe disitirînin. Teknik hatiye merheleyeka welê ku heke komputereka seyar, telefoneka mobil û modemek bi wan re hebe ew dikarin ji wê şikefta ser çiyayê Kurdistanê di riya û interne-tê re pêwendî bi parlamento ya Stockholmê re, bi merkeza zanîngeha kurdî re ya ku em bêjin li Awrûpayê ye, bi Unîversiteya Oxfordê re, bi rojnameya New York Times re, bi bîblîoteka Petersburgê re an bi fakultera tibbê ya Universiteya Kentucky re deyinin, hem agadariyêni li ser kurdan, hem zanyariyêni tibbî yên xweparastin û tedawiyê, hem nûçeyêni dinyayê, hem kursêni ziman hem jî zanînen siyasi, eskerî û teknikî û hwd ji bo xwe werbigirin û li wê derê programekî çêkin, pê xwe bigihînin. Hetta hin ji wan dikarin ji wê derê qeyda xwe li unîversiteyekê ji unîversiteyêni Awrûpayê çêkin, dersêni wê taqîb bikin, pirsan ji wan bikin, wextê imtîhanê pirs ji wan re werîn, bersîvîn xwe binivîsin û bişînin, yan jî guhdariya dersan bikin û bi telebeyêni sinifê re li ser wê dersê têkevin minaçeşyan.

Yan jî em bêjin ku doktorek heye di wê grûba şerkeran de, şerek çêbûye û yet ji pêşmergeyan birîndar buye, divê ew emelyat bibe, lê li nik doktorî kitêb û agahdarî nînin. Ew doktor dikare bi unîversite an nexweşxaneyeka Awrûpayê re têkilî deyne, pirsiyaran ji doktoran bike, doktor pirsiyaran ji wî bikin heta risman bişîne an filmêni 3 bejneberî (dîmensiyonel) ên vîrtuel ên li ser laşen însanan bi hemû teferuatêni xwe di arşîvîn wan unîversite an fakulteyan de hene, ew bi xwe li wan binêre, bibîne, bikaribe li ser birînê bigihîje neticeyekê, tiştê lazim bike û jiyana wî pêşmergeyî xelas bike.

Di torra ragihandinê de bajarîn ava bûne ku ji wan re bajarêni vîrtuel tê gotin. Ez li mala xwe, li ber komputera xwe rûdinêni, xwe bi ûnternetê ve girê didim, navnîşana bajarekî ji wan bajarêni vîrtuel didim û diçim ber dergehê wî bajarî, ez dikevim bajêr. Heke ez cara pêşin çûme wî bajarî û min divê ez warekî li wî bajarî ava bikim, gerrek û taxêni wî bajarî hene, kolan û ceddeyêni wî û li ser wan kolanan ji avayıyêni vîrtuel hene ku ez dikarim biçim xaneperekê (home page) ji bo xwe tê de hilbijêrim, kirê bikim, têkevimê, agahdarî, zanyarî, rism û muzîka li gora dilê xwe tê de ava bikim, li gora dilê xwe bixemîlinim. Ez dikarim ji wê malê xwe bi wan merkezeni vîrtuel ên ser ruyê erdê girê bidim ku min divêni. Di wî bajarî de, ez dikarim ji mala xwe derkevîm biçim bazara bajêr, meydana kirîn firotinê, dikanan, qehwexaneyêni vîrtuel ên ciyêni sohbet û minaçeşyan. Li wê derê, hin minaçeşya siyasi dikin, hin li ser sporê diaxivin, hin behsa têkiliyêni jin û mîren dikin, hin li

ser dînan sohbet dîkin. Zanîngeh, arşiv û şêwirgehêن wî bajarî hene ku ez dikarim biçim ji wan fêdê bistînim. Hilbijartinêن wî bajarî hene, ez dikarim li ser avabûn û geşbûna bajêr, li ser xizmeta wî bajarî û li ser hilbijartina serokbelediye û berpirsiyaren wî bajarî, dengê xwe bidim, fikra xwe diyar bikim. Hemşehriyêن wî bajarî jî yecko yeko dikarin pêwendiyän bi min re deynin.

### Peydabûna dinya sisiyan

Maneya vê çiye? Hin alim hene diyar dîkin ku bi avabûna vê civaka agahdariyê di jiyana însanan de sê dinya pêk hatine. Ev sê dinya ne ew sê dinya ne ku ji teoriya Maoyî hatibûn avakirin. Ji van dinyayan yek jê dinya fizîkî ya me ye, dinya maddî ye ku em tê de dijîn.

Dinya duduyan, ya xewn û xeyalan e ku gava meriv dikeve xewê, an bi roj ji xwe ve biçe meriv dikeve dinya xewnan an a xeyalan, meriv tê de dijî, buyer têne serê meriv, meriv pêwendîyan bi der û dora xwe ya xeyalî re datîne; buyer, ji dinya fizîkî gellekî wêdetir e, zeman û mekan jê re nîn in, meriv xwedanê taqeta wêdetir a dinya maddî ye; meriv difirre, bi cin û lawiran re rûbirûyî hev tê, mesafe ne xwedanê qîmetekî ye, gah meriv li vî serê dinyayê ye gah li serê din e. Heke meriv ji odayekê derbasî odayeka din bibe ne lazim e ku meriv di dergeh an penceran re derbas bibe, meriv hema çek li odaya din e. Meriv dikare dêw be û di eynî saniyê de bibe mês, meriv dikare bimre, vejî û hwd. Di vê dinyaya xewn û xeyalan de her tişt dikare bibe. Lê heke meriv şîyar bû, her tişt wenda dibe û meriv dibîne ku meriv li ciyê xwe ye, tu eser jî wê dinyayê li ber meriv namînin.

Dinyaya sisiyan jî ew dinya ye ku jê re dinya virtuel yan jî sîbermekan (cyberspace) tê gotin. Ev dinya, ne wekî dinya fizîkî ye, meriv dikare di vê dinyayê keve, ne mesafeya zeman û ne jî ya mekan jê re heye, ew tiştên ku di dinya xewn û xeyalan de hene hema hema bi tevayî di vê dinyayê de jî hene, hudûdê vê jiyanê, xeyalên mirov in, yanî xeyalên mirov heta ku derê biçin bi mesafa hudûdê wan xeyalan meriv di wê dinyayê de dijî. Ji odayekê bêyî ki di derî û penceran re, di pêpelûkan re derbas bibe, meriv dikare derbasî odayeka din bibe, ji vî welatî meriv dikare biçe Norveçê, ji wir jî biçe Japonyayê an welatekî din. Ez dikarim biçim ji xwe re di kütubxane û zanîngeh an qehwexaneyêن wan welatan de biggerim. Bes ev gerr, gerreka virtuel e, ne fizîkî ye. Lê ne wekî dinya xewn û xeyalan e jî, ez diçim wan deran, dikarim agahdariyan bi awayê tekst, deng, grafik û filman jê bînim, ez dikarim pêwendî bi însanan re deynim sohbet û minaqaşeyan bikim, ez dikarim têkevim hil-

bijartinan, serokê komeleya xwe, partiya xwe ya siyasi, serokbelediyê xwe, heta reis-wezîrê xwe hilbijêrim, ez dikarim dersê bixwînim û dersan bidim. Yanî ez tê de dijim, ez dikarim bi saya mudaxeleya xwe bi rastî jî di wê dînyaya vîrtuel de û di dînya maddî de guhertinan çêbikim. Bi mudaxeleya hinên din guhertin dikarin di min de çêbibin, heke ez di şikefteka serê çiyê de bim jî bi saya wê ez dikarim jiyanâ pêşmergeyekî birîndar xelas bikim.

Heke ez li Diyarbekirê rûniştibim jî bêyi ku polis karibin min bigrin an rî li ber min bigrin biçim merkezaka zanîngeheka kurdî ya vîrtuel, li ser ziman, edebiyat, dîrok û rewşa civakî ya kurdan agahdarî ji bo xwe bibînim, agahdariyan bidim hevalbendêن xwe yên siyasi yan jî hemwelatiyêن xwe û agahdariyan ji wan bistînim û li Diyarbekirê li nava milletî belav bikim.

Ev dînya ne dînyaya xewn û xeyalan e ku meriv ji xew şiyar bibe her tişit difirre diçê, na, dînyayeka interaktîv e ku meriv tê de dimîne, kar dike, dibizive û berheman dide. □

Dewama wê di hejmara bê de

(\*) Bingehê vê nivîsarê, bi kurti di 15-ê meha 11-ê ya 1997-ê de li Stockholmê, li Înstituya Kurdi weki seminer hatiye dayin û bi armanca weşandina di rojêن pêş de ji bo Med TV hatiye kêtandin. Li vê derê, ew ji nuh ve hatiye nîvîsin û berfirehkîrin.

# LA ROCHEFOUCAULT

FAWAZ HUSËN



**M**îrzadeyê Marsillac, François de la Rochefoucault (1613-1680). La Rochefoucault (Laroşfûko) li Parisê di sala 1613an de di malbateke ji malbatên herî nijadbilind de tê dunyayê. Ew dixwaze, di despêkê de, di warê siyasetê de ciyekî mezin bigire.

Daxwazên wî dişikin û bêhêvî û bedbîn, ew xwe bi tenê dibîne. Ew xwe ji civata nijadbilind û fermandaran dûr dixe. Ew di sala 1652an de vedigere ser erdêن xwe û li ser dek û dolabêن mirovan bi kûrahî dirame. Ew dîtin û serpêhatiyên xwe di Les Maximes-an de dide. Ew bîranînên xwe jî dinivisîne lê, wek La Fontaine, ew bi sâya gotinîn xwe dengdar dibe. Ew ji her tiştî sar dibe û dilê wî ji civata mirovan dişikê. Ji ber vê yekê jî, gava ciyek di Akademiya fransî de ji bo wî çê dibe, ew naxwaze bibe endamê wê. Mirina lawekî wî di sala 1672an de jî gelekî lê kêt dike û nêrîn û dîtinîn wî li ser bingeha jjyanê hêna hişk û tûjtir dike. Ew di sala 1680 de dimire.

La Rochefoucault nêrîn û baweriyên xwe li ser mirovan, li ser civatê, li ser dîrokê, di çend hevokêñ kurt û dagirtî de radixîne. Mirov dikare her hevokê bike babe ta pirtûckekê, an, bi kêmanî, beşekî pirtûka rastiyê. La Fontaine û Perrault çirokekê dîbêjin ta ku di dawiya wê de ew nêrînên xwe bipeytinîn. La Rochefoucault seraser

baweriya xwe dibêje. Ew bûyer û serpêhatiyan diguvêse, tenê cewhera wan, şîreya wan, dide.


Serpêhatiyêن La Rochefoucault bêguman gelekî li tarîbûna nêrînên wî û hişkiya baweriyêن wî kîr dikin. Ew di warê siyasetê de dişikê û mirovnehiz dibe. Ew ji xweperestiyê, ji pozbilindiyê nefret dike, ew ji kesêن civata xwe bêhêvî ye. La Rochefoucault nigara dilê mirovan dikişîne, sûretê xuyê civatê digire. Ew civatnas û mirovñas e. Ew bingeh û destgeha tevgeran berbiçav dike. Nivîskar hîsêن bilind li dora xwe di danûstandinêن mirovan de nabîne. Ew tenê xweperestinê, durûtiyê, nepakiyê li dora xwe dibîne.

Gotina "maksîm" ya fransî ji gotina latînî "maxima sententia" hatiye. Meneya wê ji "fikra herî giring" e. Ew rastiyek ebedîn dibêje. Ji gotinêن Maksîmêن La Rochefoucault:

- ◆ Mirov nikare zuq ne lirokê û ne li mirinê binêre.
- ◆ Qelsîtiyek e eger mirov gelekî ji xwe nerazî be. Kerîtiyek e eger mirov gelekî ji xwe razî be.
- ◆ Xwehîzkirin ji hemû şelafan mezintir e.
- ◆ Dilovaniya mîran piraniya caran tenê siyasetek e ta ku ew bi wê kêfa gelan ji xwe re bînin.
- ◆ Em giş têra xwe xurt in ta derdêن kesêن din, kesêن ji bilî xwe, hilgirin.
- ◆ Mirov pêşneyariyêن xwe tenê bi gelek çavfirehî didin.
- ◆ Em hîn bûne rastiya xwe ji kesêن din veşîrin ku dawî, em wê ji xwe ji vedişîrin.
- ◆ Gava mirov naxwaze ku pesnê wî bê kirin ew dixwaze dubare bê pesinandin.
- ◆ Eger tu bixwazî bi rastî hevaltiya xwe ji yekî re diyar bikî, tu ê ne kîmasiyêن xwe jê re xuya bikî lê tu ê bihêlî ku ew yên xwe bibîne.
- ◆ Mirov çêtir dibîne ku ew tiştên dijwar dijî xwe bîbêje ku ew ji binî ve tiştekî nebêje.
- ◆ Dilpaqijiya daxwazêن kesane, mîna çeman e, ew di ava deryayê de xwe winda dîke.

# KOVAR Ú ROJNAMEYÊN KURDÎ

LOKMAN POLAT



Lêkolînvanekî kurd li ser kovar û rojnameyên kurdi lêkolineke dirêj kiribû û gîhiştibû vê encamê; ji sala 1900î û hetanî sala 1997an 563 kovar û rojname ji aliyê kurdan ve (kurdên herçar parçeyên Kurdistanê ve) hatiye weşandin. Lêkolînvanê kurd ku navê wî Hesen e û li Fransa-yê dijî; ji min re got ku; "dibe ku hêj gelek kovar û rojnameyên din hene ku min navê wan nebihîstiye." Min li listeya wî mîze kir, bi rastî jî navê hinek kovarênu ku li Swêdê derketibûn di listeya wî de tunebûn, me ew nav jî lê zêde kirin.

Kovarênu xwerû bi kurdî bi pirranî li Swêdê derdikevin. Di hêla ziman, çand û edebiyata kurdî de xebata herf berbiçav û balkêş li Swêdê dibe. kurdên ku ji ber sedemên siyasî koç kirine û hatine li Swêdê bi cîh û war bûne, gelekî xebitîne û li ser çand, ziman û edebiyata kurdî berhemên giranbiha afirandine. Li Swêdê gelek kovarênu xwerû bi zimanê kurdî hatine weşandin û gelek ji wan jî hêj têne weşandin. Weşanxaneyên kurdan yên li Swêdê bi sedan pirtûkên xwerû bi zimanê kurdî weşandin e.

Wek tê zanîn îsal, sala 1998, sala 100 saliya rojnamevaniya kurdî ye. Lê çi heyf e ku di sedsaliya rojnamevaniya kurdî de tu rojnameyeke kurdî ya rojane tuneye. Li

Tirkiyê rojnameyek û li Ewrûpayê jî rojnameyek rojane ji aliyê kurdan ve têne wêşandin, ew jî bi zimanê tirkî ne. Rojnameya xwerû bi zimanê kurdî rojnameyek hefteyî ye (Azadiya Welat) û ew jî li Stenbolê derdikeve. Kovarên kurdî bi piranî yêñ mehane û sê mehî ne.

Li Tirkiyê gelek asteng li pêşberî weşanên kurdî hene. Kovar û rojnameyên kurdan ji alî zagonê dewleta tirk ve têne qedexekirinê, têne girtinê yan jî cezayên peran yên pir giran li wan dibirin û ji alî aborî ve wan qels dixin û loma jî gelek weşanên kurdan bi vê şeweyê nikarin weşana xwe bidomînin. Hinek kovar û rojnameyên kurdan jî ji ber ku têne qedexekirinê mecbûr dimînin navê xwe digehurînin. Wek mînak; Rojnameya "Roj", paşê navê xwe guhart kir "Nûroj", û piştre jî bû "Pêşeroj". Rojnameya "Azadî", bû "Dengê Azadî", bû "Ronahî" û niha jî navê wê bûye "Hêvi". Rojnameya xwerû bi kurdî ya hefteyî "Welat", bû "Welatê Me" û niha jî bi navê "Azadiya Welat" weşana xwe didomîne. Hinek kovarên mehane û rojnameya rojane jî (Ülke, Yeni Ülke, Gündem, Ülkede Gündem, Yeni Politika, Özgür Politika û hwd.) mecbûr man ku navê xwe guhertin.

Di pêşveçûna çand û zimên de kovar roleke girîng dilîzin. Her kovar girîngiya xwe heye. Hemû kovarên kurdî li gorî xwe xizmet kirine û dikin. Di dema me de - û di demên berê de jî- her çiqas bazara weşanên kurdî qels be jî, ronakbîrên kurd yên welatparêz bi ezim û fedakariyek bê hempa cehd kirine ku kovarên kurdî bi weşînin. Hê jî yên ku kovarên kurdî diweşînin fedakariyeke mezin nîşan didin, ji alî aborî ve dikevin tengasiyê jî, lê dîsa wezîfeyên xwe yên pîroz bi cih tînin.

Ez di vê nivîsa xwe de dixwazim kovarên ku hê jî weşana xwe didomînin, hejmârên wan yên dawîn bi xwendevanan bidim naskirin. Hinek kovarên kurdan hene ku bi temamî yan jî tenê nivîsek yan du nivîsên kurdî diweşînin hene, min behsa wan nekir. Wek mînak: Kovara Deng, Özgür Halk, Stêrka Rizgarî, Yeniden Newroz, Yurtsever Gençlik, İnsiyatîf, Rojbaş, Cudî, Bulten û hwd. Hinek kovarên xêzikî jî li Almanyayê derdikevin, ew hemû jî bi tirkî ne. Ez tenê navê wan dinivîsim. Jina Serbilind, Stêrka Ciwanan, Zûlfikar, Bawerî, Serxwebûn. Li Berlinê bi navê "Lêkolîn" kovarek derdikeve hejmarek wê bi kurdî derket, hejmara din bi kurdî û almanî, hejmarek jî xwerû bi tirkî derket. Lêkolîn dê bi kîjan zimanî bê weşandin ne diyat e. Ji xwe ew bi rêk û pêk nayê weşandin. Wek stêrka Gelawêj salê carekê derdikeve. Loma min cih neda danasîna wê.

Bi hêviya ku ev kovarên kurdî di sala 1998an de jî jiyana xwe ya weşanê bidomînin. Em ji wan re di sala 1998an de serfîrazi û serkeftinê dixwazin.

## **Kovarên ku li Swêdê derdikevin û hê ji weşana xwe didomînin ev in:**

ROJA NÛ (1978), ARMANC (1979), KULÎLK (1980), HÊVÎ (1981), BERBANG (1982), DÎDAR (1992), NÛDEM (1992), ÇIRA (1995), HELWEST (1995), DUGIR (1995), JÎNDAN (1996), AVAŞIN (1996), NÛDEM WERGER (1996), ROJBAŞ (1996), İNSİYATİF (1997), VATE (1997), YAYIN DÜNYASI (1997)

## **Kovar û rojnameyên ku niha li Tirkîyê derdikevin:**

ÜLKEDE GÜNDEM, PêşerOJ, HÊVÎ, NÛBIHAR, YENİDEN NEWROZ, DENG, ZEND, ROZA, JÛJIN, WAR, ÖZGÜR HALK, YURTSEVER GENÇLİK, YENİ YAŞAM, AZADIYA WELAT, JIYANA REWŞEN, STÊRKA RIZGARI

### **ROJA NÛ**

Roja Nû di sala 1978an de dest bi weşanê kir. Wê demê bi kurdî û tirkî wek rojname derdiket. Roja Nû paşê şikil guhart û ji forma rojnameyiyê bû kovar û tenê xwerû bi kurdî derket. Ev şo hejmar e ku wek kovar ji sê mehan carekê xwerû bi kurdî derdikeve.

### **KULÎLK**

Kovara zarokan Kulîlk ji nû ve dest bi weşanê kiriye. Kovara Kulîlkê di sala 1980 de dest bi weşana xwe kiribû û jiyana xwe ya weşanî hetanî sala 1993an meşandibû. 47 hejmarên wê derketibû. Paşê wê weşana xwe dabû rawestandin. Hetanî sala 1997an Kulîlk derneket. Di sala 1997an de Kulîlkê dîsa dest bi weşana xwe kir. Niha Kulîlk ji aliyê komela “Mala Kultura kurdi” ve tê weşandin. Hetanî niha hemû li set hev şı hejmarên kovara Kulîlkê derketine.

### **HELWEST**

Kovara Helwestê kovareke hunerî, edebî û çandî ye. Wê di 95an de dest bi weşana xwe kiriye û ji sê mehan carekê li Stockholmê derdikeve.

### **ÇIRA**

Çira kovara “Komeleya Nivîskarêñ Kurdi Li Swêdê” ye. Çira sê sal e ku weşana xwe didomîne. Hetanî niha 11 hejmarên wê derketine. Bi piranî nivîsêñ lêkolînî têde têne weşandin.

## **NÜDEM**

Kovara Nûdemê di sala 1992an de dest bi weşanê kir. Ev şes sal in Nûdem bê rawestandin derdikeve. Bi vê hejmara di destê we de Nûdem gîhîştiye hejmara xwe ya 25an.

## **NÜDEM WERGER**

Bi navê Nûdem Werger kovarek wergerê derket. Hejmara yekem a kovara Nûdem Wergerê 238 rûpel e û kovarek berz e, ji aliyê naveroka xwe ve gelekî dewlemend e. Xwedî û berpirsiyarê kovarê Firat Cewerî ye. Bi giranî wergerên li ser edebiyatê tê de hatine weşandin. Armanca kovarê ya bingehîn ev e ku; edebiyat, çand, felsefe û zanîstiya dînyayê bigihîne kurdan, wan bi kurdan bide fîrkirinê.

## **DUGIR**

Kurdên başûrê piçûk vê kovara kulturî derdixin. Ew ji sê mehan carekê li Stockholmê derdikeve. Hetanî niha 6 hejmarên wê derketine.

## **VATE**

Vate xwerû bi zaravayê zazakî derdikeve. Vate di sala 1997an de dest bi weşanê kir. Hetanî niha du hejmarên wê derketine. Vate ji sê mehan carekê li Stockholmê derdikeve.

## **BERBANG**

Berbang, organa federasyona komeleyên Kurdistanê li Swêdê ye. Ev 12 sal in ku ew jîyana xwe ya weşanê didomîne. Hetanî niha 103 hejmarên wê derketiye.

## **DİDAR**

Dîdar kovara ciwanêñ kurd e. Ew ji jisê mehan carekê li paytextê Swêdê, li Stockholmê derdikeve.

## **ARMANC**

Di nav weşanêñ kurdan yên li Ewrûpayê weşana herî temendirêj piştî kovara Roja Nû, Armanc e. Armancê 19 salan weşana xwe domand. 179 hejmar hate weşandin. Di mehîn dawî yên sala 1997an de Armanc kete nav krîzê. Hemû endamêñ redaksiyona wê istîfa kirin. Redaksiyonek nû nehat damezrandin. Loma jî çend mehan weşana wê hate rawestandin.

## **AVAŞİN**

Avaşin kovara Enstituya kurdi ya li Stockholmê ye. Heta niha 6 hejmar derketiye. Avaşin kovarek sê mehî ye û di dema xwe de derdikeve.

Avaşin herçiqas kovareke çandî û edebî be ji, carna nivîsên siyasi jî diweşîne. Avaşin giraniyê dide ser edebiyata gerîla.

## **JİNDAN**

Jîndan kovara sê mehî ye, li Stockholmê derdikeve. Hetanî niha pênc hejmarêni Jîndanê derketiye.

## **YAYIN DUNYASI**

Yayin Dünyası - Cihana Weşanan- kovara danasına pirtûkan e. Di sala 1997an de dest bi weşanê kir. Ji du mehan carekê, salê 6 hejmar derdikeve. Hetanî niha sê hejmarêni wê derketine. Di vê kovarê de digel danasına pirtûkan di her hejmarê de bi yek - du nivîskarêni pirtûkan re li ser berhemên wan hevpeyvin tê çekirin. Ev kovara ku bi kurdî û tirkî derdikeve, ji aliyê Gabar Çiyan ve tê idarekirin.

## **BİRNEBÜN**

Kovara Kurdên Anatoliya Navîn

Komek Kurdên Anatoliya Navîn li hev civiyane û dest bi weşana vê kovarê kiri- ne. Xwediyyê kovarê Haci Erdogan e.

Bîrnebûn kovarek hunerî, çandî û siyasi ye. Hetanî niha 3 hejmarêni wê derketi- ne. Di hersê hejmarêni wê de li ser kurdên Anatoliya Navîn gelek nivîsên balkêş he- ne.

## **ZEND**

Zend kovara Lîkolîn û Lîgerînên Zanistî ye û ji aliyê "Enstituya Kurdi" ya li Sten- bolê ve ji sê mehan carekê tê weşandin. Enstituya Kurdi di sala 1996an de çend hej- marêni kovara Zend yên taybetî ji bo ceribandinê derxistin. Di sala 1997an de dest bi weşana kovarê ya normal kirin.

## **NÜBIHAR**

Nûbihar kovara mehane ye. Kovara çandî, hunerî û edebî ye. Ew ji mehê carekê di bin berpirsiyariya Sabah Kara de li Stenbolê derdikeve. Hetanî niha 55 hejmarêni

wê derketine. Nûbihar di her hejmarê de li ser babetên girîng û bi giranî li ser pirs û pirsgirkên doza kurd disekine. Nûbihar bi çavekî dînî (olî) meselan dinirxîne. Kovar xeteke olî û welatparêzî dimeşîne. Ew, dîtinêن Îslamê bi welatperweriyê ve dihûne. Ferqeko pir mezin di nav kovara Nûbihar û kovarê din yên Îslamî de heye.

## AZADIYA WELAT

Azadiya Welat rojnameyek hefteyî ye. Ev bû çend nav digehurîne, lê dîsa jî weşana xwe bê rawestandin didomîne. Di weşanvaniyê de domandin tiştekî girîng e. Giranbihayıya wê weşanê yek jê jî bi pîvana domandina weşanî tê nîrxandin. Di dîroka rojnamevaniya kurdî de yekemîn rojnameya hefteyî ya xwerû bi kurdî "Welat" bû. Paşê bû "Welatê Me" ú niha jî bi navê "Azadiya Welat" weşana xwe didomîne.

## JIYANA REWŞEN

Kovara Jiyana Rewşen mehê carekê mîna organa Navenda Çanda Mezopotamyayê li Tirkîyeyê derdikeve. Ew berê bi navê Rewşen derdiket, piştre navê wê kirin Jiyanâ rewşen. Çend hejmarênen wê yên pêşîn bi kurdî û tirkî derketin. Niha tenê xwerû bi kurdî derdikeve.


## WAR

War kovareke lêkolîn û légerînê ye, di sala 1997an de li Stenbolê dest bi weşanê kiriye. Hetanî niha du hejmarênen wê derketine.

## ROJNAMEYA EHMEDÊ XANÎ

Li Beyazîdê (ku mezelê Ehmedê Xanî lê ye.) çend kurdêñ welatparêz ji bo ku navî Xanî yê nemir bidin jiyandin, bi navê "Ehmedê Xanî" rojnamek hefteyî derdixin. Rojname nêzîkê du salan jiyana weşana xwe berdewam kir, lê paşê ji ber sedemên aborî weşana wê hate seknandin.

Di nav rûpelên rojnama Ehmedê Xanî de jiyana Ehmedê Xanî, berhemên wî, gotinêن pêşıya, nivîsîn ji edebiyata kurdî, ji zargotina kurdî çîrokêñ gelêrî, kilam û stran û hwd. dihatin weşandin. □



# JİNAV WEŞANAN

**D**i van  
salên dawi-  
yê de, bi  
taybetî li  
Swêdê ge-  
lek pirtûk  
ji bo zaro-  
kan hatin  
weşandin.  
Piraniya  
pirtûkên



ku hatine weşandin û têne weçandin werge-  
rên ji swêdî ne. Lê digel vê, cih bi cih nivîs-  
karên kurdan jî meyla xwe berdane ser ede-  
biyata zarokan û hindik be jî ew ji bo zaro-  
kan dînîvîsinin.


*Baxçê Zarokan* ku ji aliye Aram Gernas û Farid Nadhar ve bi du zaravayên kurdî (kurmançî û soranî) hatiye amadekirin û di  
nava weşanên Apecê de derketiye, di vî warî  
de mînakeke baş e. *Baxçê Zarokan* ji şêst û  
pênc stranan pêk hatiye û digel notayên  
wan hatiye amadikirin. Ev metoda han jî

dike ku pirtûk ji bo dibistanan û ji bo ma-  
mosteyên muzîkê pir bi kêt were.

Ev pirtûka ku bi naveroka xwe mîna  
baxçeyekî zarokan e, bi wêneyên delal hati-  
ye xemilandin. □

**Baxçê Zarokan**  
Amadekar: Aram Gernas û Farid Nadhar  
Weşanên APEC

**M**e -  
**R**e  
**Avis** pirtû-  
ka Helîm  
Yûsiv ya  
duwemîn e  
ku di nava  
weşanên  
Avestayê  
de derketi-  
ye. Berî ni-



ha bi demekê jî bi navê *Mîrî Ranazin* pirtû-  
keke Helîm Yûsiv derketibû. Weşanxaneya  
Avestayê karekî baş dike ku tixûbê serxetê û

binxetê radike û nivîskarê binxetê pêşkêşî xwendevanên serxetê dike.

Helim Yûsiv berê bi erekî dînîvisand lê vê dawiyê derbasi nivîsandina kurmancî bûye. Ji xwe, *Mêrê Avis* jî berê bi zimanê erekî derketibû. Lê nivîskîr ew wergerandine kurmancî û pêşkêşî xwendevanên kurd kirije. Di çapemeniya erekî de, ji bo çapa wê ya erekî ev rexneya Xalid Xalife di kovara Elêf de (Qibrîs, 1992) hatîbû nivîsandin:

"Çirokêni *Mêrê Avis* bê cil û terîş, tazî xwe pêşkêşî me dikin; cihaneke nexuyayı, erdeke necotkirî, Helîm Yûsiv bi zimanekî pexşaneyî û bi xeyaleke taybetî vê cihanê ji nû ve û bi şeweyeke hunerî ava dike. Ji peyvîn rojane û naskirî cihaneke nenas û seyr saz dike. Ji bilî vê, bi tinaziyêne tal ken dike kar dijî desthilatiyên ku li civakeke li paşmayî zorê bi kar tînin. Helîm Yûsiv nivîsarakî ku mirov dikare di pêşerojeke nêzîk de gelek hêviyêne mezin li ser ava bike." □

**Mêrê Avis**  
**Helim Yûsiv**  
Weşanên AVESTA

**M**îna tê zanîn gerokêñ cewrûpayî bi gernameyên xwe navdar in. Di sedsalen 17, 18 û 19an de û berê jî gava ew derdiketin rîwîtiyêñ dirêj, wan bîranînên xwe, tiştîn ku diditîn, gel û mileten ku ew pêrgî wan dihatin, dîn û zimanên cûda dînîvisandin û an li welatêñ xwe çap dikirin an jî mîna belgename ji nivşen li dû xwe re dihiştin. Riya gelek gerokêñ weha bi Kurdistanê jî ketiye û wan li ser kurdan, li ser ziman û

edebiyyata wan, li ser rabûn û rûniştina wan, li ser folklorâ wan û herweha li ser ruhuyeta wan jî gelek tiştî nivîsan-

d i n e . G e l e k tiştîn ku ji aliyê gerokan ve hatine nivîsandin fro ji bo kurdologan dibin çavkaniyêñ baş. İsmet Şerif Vanlı di vê berhemâ xwe de ku ji frensizî hatîye wergerandin *Batılı Eski Seyyahlarım Gözüyle Kürtler ve Kurdistan* li ser gerrok û gernameyên hin gerokan radiweste. Ev pirtûka ku di sala 1977an de di nava weşanên Özgürlik Yolu de hatîbû weşandin, ji nû ve li Stembolê di nava weşanên Avestayê de derketiye. □


**İsmet Şerif Vanlı**



**Batılı Eski  
Seyyahların Gözüyle  
Kürtler ve Kurdistan**


**Batılı Eski Seyyahların Gözüyle  
Kürtler ve Kurdistan**  
**İsmet Şerif Vanlı**  
Weşanên AVESTA

**E**v pirtûka Xelîl Duhokî ji nivîs û lêkolî-nêñ wî yên ku berê di kovarêñ cihê cihê de hatîbûn weşandin pêk hatîye. Lêkolîn û gotarêñ di vê pirtûkê de bi giranî li ser şî-



jî danasîna nivîskarên başûr e di vê berhemê de cih girtiye. Mîna tê zanîn Duhokî heta niha gelek antolojiyên şîr û çirokanêñ kurdêñ başûr bi latînî pêşkêşî xwendevanêñ kurd kiriye. □


**Peyv ú tablo diaxivin**  
Xelîl Duhokî  
Weşanêñ Jîndan



Rafiq Sabir şirove kiriye û gelek şîrên wî ji tîpêñ erebî wergerandiye tîpêñ latînî. □

îr, çîrok, roman û hin babe-têñ din yên edebiyatê ne. Wekî din jî, hin ji xebatêñ D u h o k î yên bingehîn ku ew

**A**lı Bîcer ku bi xwe şâîr e û ji ber fikrêñ xwe yên siyasi bi salêñ dirêj di girtîge-hêñ Tirkîyeyê de raza ye û niha li Swîsreyê dijî, hevpeyvînêñ bi Mehmed Uzun re ku di kovar û rojnameyêñ cihê cihê de hatibûn weşandin kom kirine û mîna pirtûkekê di nava weşanêñ Belgeyê de li Tirkîyeyê daye



çapê. Di van hevpeyvînan de Mehmed Uzun li ser zimêñ, li ser rola zimêñ ji bo miletan, li ser jiyana surgunê û li

ser rewşa edebiyata kurdî radiweste. Berî niha bi demekê jî dîsan çend pirtûkêñ Mehmed Uzun bi tirkî di nava weşanêñ Belgeyê de derketibûn. □


**Bir Dil Yaratmak**  
Mehmet Uzun  
Amadekar: Ali Bîcer  
Weşanêñ Belge

**E**v berhem a ha jî li ser şâîrê navdar Rafiq Sabîr e. Xelîl Duhokî bi pêşgotîne ke dirêj xebat, ziman û hunera Ra-

**X**ebat Arif şâîrek ji kurdêñ başûr e û bi zaravayê soranî dinivîsîne. Di ber şâîrtiya xwe de ew hem şîrên kurdî werdigerîne swêdî hem jî berhemêñ swêdî werdigerîne kurdî. Wî di vî warî xebatêñ baş kiriye. Ev berhema wî Geranewey Estêrekan ku ji



şîrên wî mên Medenî Ferho  
yê da- denî Ferho  
wîyê pêk roj bo roj  
hatiye, bi zêde dibin.  
herdu alfa- Bi riya şîr,  
beyan, an- çîrok û vê  
go bi alfa- dawiyê jî bi  
beya erebî riya româ-  
û latînî ye, nê Medenî  
lê bi zarava- Ferho navê  
yê soranî ewe di cî-



Xaltika Zeyno

ye. Ji şîrên Xebat Arif bêhna xwezayê, ren-  
gê evinê, êşa biyanistanê difûre. □


**Geranewey Estérekan**

Xebat Arif  
Weşanên APEC

hana edebiyata kurdî de aktuel hiştîye. Xal-  
tika Zeyno ku ji 387 rûpelan pêk hatiye,  
mîna ferhenga lêgerîna li pey peyva kurdî  
ya resen e. Ew jiyana Kurdistanê ya do û îro  
di nava hûnandineke folklorîk û bi awazekî  
destanî radixe ber çavan. □

**Xaltika Zeyno**  
*Medenî Ferho*  
Weşanên Dozê


**W**wendevanên Nûdemê Medenî Ferho  
ji weşanên Nûdemê jî nas dikin. Heta  
niha du berhemên wî di nava weşanên Nû-  
demê de derketine. Lêbelê hejmara berhe-




**R**ojnameya Welat, *Welatê Me* û paşê jî Azadiya Welat di pêvajoya rojna-  
megeriya kurdî de, di warê pêşdexistin û aktuelhiştina ziman û edebi-  
yata kurdî de roleke berbiçav listiye. □

Rahandê kova-reke teorî, kulturî û şiroveyî ye. Berpirsiyarê kovarê Hîwa Qadir e. Kovar bi kurmanciya jêrîn û bi

alfabeya erebî li Swêdê derdikeve. Di vê hejmara 3-4 1997an de ev nivîsên ha hene. Berzan Hestiyar, Cemal Xembar, Çûman Herdi, Dilawer Qeredaxî, Refîq Sabir, Şer-



ko Bêkes, Farûq Refîq, Merîwan Wirya, Hîwa Qadir û Hendirîn bi şîrên xwe; Aram Kakey Felah, Rêbwar Heme Rehîm, Rêbwar Sîweylî, Rêbin Herdi, Şêrzad Hessen, Ebdila Serac, Eta Mihemed, Goran Babaelî, Farûq Omer bi kurteçirokêni xwe ev hejmar xemilandine. Ji bili şîr û çirokan, kovarê giranî daye wergeran ji. Di vê hejmara de F. R. çirokek ji farîşî û Evdila Rehîm, Hîwa Qadir û Dana Raûf ji çend babetên edebî ji swêdî wergerandine. Kovara Rahandê di vê hejmara xwe de çend rûpel ji ji danasîna pirtûkêni kurmanciya jêr re ve-terandine. □



Di pêvajoya sed salî de, rojnamegeriya kurdî bedelêñ mezin dayel!


**Jİ WEŞANÊN NÛBIHARÊ DU PIRTÜK**

Yeğeninin kaleminden

# **Bediüzzaman'ın Hayatı**

Gözden geçirilmiş 4. Baskısı

4. Baskı



**Ji me bixwazin**

**GAZIYA MIN  
BERHÎM PAŞA**

Nûbihar

**Gaziya min  
Pirtûka Şîrîn Berhîm Paşa**

**Nû DERKET**

Kıztaşı Cad. Kuriş Apt. No:51/3Fatih-İST.  
Tel:(0212)-533 75 88 Faks:(0212)-524 00 38

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

**G**er hewesa te li ser şîr, çîrok, roman, rexne, hevpeyvin, lêkolîn, hûner, sînema û hwd. hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê NUDEMê!

**G**er tu bixwazi ji tevgera hûner û edebiyatê ya herçar perçeyên we-lêt haydar bibî û edebiyata dînyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdi bixwini, disan bibe aboneyê NUDEMê!

**N**ÜDEM dixwaze ji avakirina edebiyata kurdi re bibe alikar, tu ji aî-karîya wê bike; bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdi re bibim alikar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê / aboneya NÛDEMê.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek., Ewrûpa 80 DM.

**Nav û paşnav.....**

**Adres.....**

V2 karte dugutin; li fotokopiya wê li ser adresâ NÛDEMê bişnin. Çer ku ew bigitije me, em e NÛDEMê digel karta aboneyê ji te we bişnin.

"Heyfa min gelek ji kurdê me re dihat. Min roj û şev  
gazind dikirin, çi qa kurmanc hene hemî mêt û jêhatî  
ne, çire holê bêmarîfet û sin'et mane! Nivîsandin û  
xwendina hemî kurda çire nîne! Ez li van kul û derda  
jar û kal bîbîm, heyirî mabîm. Nuho ji Xwedê teala şî-  
kir dikim, ew cerîdeya te li ser qencyiya kurda derêxistî  
ya te ji me re rêkirî, hat û ket destê min. Heçku çi qa  
miradê min hebî, hasil bîn. Qencyî li ser dinê de hew  
qa dibit, mezinayî li vî zemanî hew qa çêdibit..."

*Seyid Tahirê Boî, KURDISTAN, 1898*